

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

war

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ



KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

WAR

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ



KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

WAR

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ

Ji Sê Mehan Carekê Tête Weşandin
Üç Ayda Bir Yayımlanır

Bûha: 5.000.000 TL

**KOR Reklamcılık Basın-Yayın
Tic. ve San. Ltd. Şti.**

Sahibi ve Sorumlu Yazışleri Müdürü:

Turgut ERSOY

Tîprêzî-Mîzampaj: WAR

e-mail: kovarawar@hotmail.com

Çapxane/Matbaa: Berdan Matbaası
Tel: (0212) 6131211

Cîyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:

Kazım İsmail Gürkan cad. Hamam Sk.
Yavuz Han No: 2 Kat:3/3
Cağaloğlu/İstanbul
Tel: (0212)

NAVEROK - İÇİNDEKİLER

Pêşkêş

Kürt Sorunu Hakkında Birleşmiş Milletlere Sunulan Kasım
1968 Tarihli Bildirge/ 7

Mir Kamuran Bedirxan

Bikurtî Mêjûya Bîra Neteweyî/ 14

Dr. Marif XEZNEDAR

Michael Chyet:

Kurd bi qîmeta zimanê kurdî nizanin!/17

Hevpeyvîn: Sîrwan Hecî Berko

Jibo Bîranîna Roşinbîr û Zimanzanê
Gewre yê Gelê Kurd: *Şikur Mistefa/21*

&

Sinorêk Li Nêwan Azadî û Berelayî da Heye/ 23

Şikur Mistefa

Rolê Roşinbîrên Kurd li Karê Sîyasî da/ 32

Ferhad Şakelî

Liser Çîroka Kurdîbi *Helîm Yusiv* ra Hevpeyvîn/ 47

Koçgiri'den Mahabad'a Kürt Ulusal Hareketi/ 52

M. Emin ASLAN

Etîmolojîya Zimanê Kurdî/ 83

Abdurrahman UÇAMAN

Gotinên ku ji Kurdî Derbazê Tirkî Bûne-I/103

Seîd VERROJ

Kurtiyek Ji Jîyan û Serhatîya *Hemzeyê Mîksî*;
Rewşenbîr û Xebatkar û Sîyasetvanê Gelê Kurd/ 127

Qedrîcan

Tewrat û Welatî Medan/ 131

Mehmet UZUN

Siyahpoş/ 146

Wergerandina jibo tîpên latînî: Cemîl AMEDÎ

Perçe/ 156

Roşan Lezgîn

Pêşgotin

Her çiqas hinek bi derengî be jî, bi tevî hejmarek nû cardin **WAR** bi xwendevan û dilxwazên xwe yên hêja ra rûbirû dibe. Em bawer dikin ku her carê hun jî qasê me biheyecan li benda **WAR**-ê ne. Xwendevanên birûmet, bawer bikin heta ku ji destê me tê, em dixwazin her carê mijarên balkêş û dewlemend pêşkêşê we bikin. Lê kêmasîyên me hebin jî, ku hene, divê hun lihemmer me xweşbîn bin.

Cografya ku em liser dijîn, di dîrokê da wekî gelek caran îro jî bûye biyava (seha) şerên navnetewî û herêmî yên dijwar. Her wekî encama Şerê Yekem û Şerê Duwem, hêzên desthelatdar ên dinyayê û bi taybetî jî Amerîka dixwaze herêmê ligor pêdivîyên berjewendîya dewleta xwe û sîstema sermîyandariyê ji nû ve sazbike yan jî sazûmanek nû dirist bike. Bi serokatîya Almanya û Fransa jî Yekîtiya Awrupa, dewletên herêmî û hinek dewletên din jî jibo berjewendîya xwe dixwazin statuya heyî biparêzin. Di vê çarçoveyê da li seranserê Rojhelata Navîn dê guhartinên nû çêbin; hem ji aliyê cografya sîyasî û aborî ve û hem ji aliyê kulturî ve.

Bi kurtî be jî, jibo pêdvîya guhartinên sîyasî û kulturî me divê çend gotinan bêjin. Yekemîn eve, ku di Rojhelata navîn da bigîştî çanda îslamî serdeste, ev yek potansîyelek radîkal a dîndar di nava xwe da dipê û ji întegrebûna bo sîstemê jî astengek mezin e. Jibo vê yekê divê ev asteng bête hîlanîn yan jî bêtesîrkirin. Ya duyemîn, sazûmana berîya nûha ku liser gelek şaşî û neheqîyan ji aliyê îngilîzan ve hatibû diristkirin; ya herî girîng jî ev bû ku dewletên herî bihêz ên herêmê, liser mîrasiya zor dewlemend a împêratorîyetî û nasname îslamî, xwestin bizordestî û biserdestîya etnîsîteya xwe dewletên netewî yên yekreng û unîter peyda bikin. Ev sîyaset jî bûye sedemê bêistiqrarî û şerên dijwar ê navxwe û herêmî. Di encama vê sîyasetê da jî ne tenê qetlîyamên qewmî û civakî, her weha qetlîyamên kulturî jî hatine çêkirin. Em Kurd, wek mîlletekê kevn û binkî(nîştî) yê vê herêmê dixwazin ev neheqî û xeletî yên dîrokî bêne serrastkirin, her mîlletekî liser axa xwe bibe xwedî desthelata xwe ya netewî. Ancax bi vê awayê zûwakirin û çareserkirina serkaniya hinek pîrsîrêkên netewî û civakî mimkun dibe. Eger aliyekî berjewendî û hebûna xwe liser înkarkirin û tunebûna "yê dî" bifikre, nemimkune bihevra têkilîyên cîrantî û mirovî bidomin.

Di vê çarçovê da divê em di derbarê mijarekê dî da jî çend gotinan bêjin. Herçiqas nûha alozî û dubendî hebin jî, û ji aliyê Konseya Demî ya Hikumeta Iraqê ve bête redkirin jî dewleta Tirkîyeyê bi girtina biryara parlamentoyê dixwaze eskerê xwe bişîne Iraqê û bi taybetî jî herêma Kurdistanê. Gelek diyare ku ev biryar di pratîkê de bête bicîanîn, dê gelek tiştên nexweş derxîne holê, bi taybetî jî di navbera Kurd û Tirkan da. Bi tevî ku hîn esker

neşandine jî, gelek faşîst û nijadperestên Tirkan gef û gûrran li Kurdan dixwîn û mafê xwe yê dema desthelatîya Osmanî tînin ziman û liser Musil û Kerkukê heq îdîa dikin. Em Kurdên Tirkîyeyê ji vê yekê nerehet in, naxwazin dewleta Tirk eskerên xwe bişîne Irak û Başûrê Kurdistanê. Jibo vê yekê em bangê hemû gelên dinyayê dikin, digel wê di serî da bangê dewleta Amerîka û hemû dewletên Awrupî û herêmî dikin û dibêjin, bo Iraqê ji çûyina eskerê dewleta Tirk û hemû dewletên herêmî yên din ra bibin asteng! Lewra çûyina eskerê Tirk bo Iraqê, dê encamên pirr nexoş derxînin holê.

Xwendevanên birûmet, di vê hejmarê **WAR**-ê da jî hunê bi balkêşî û kêfxweşî hinek belge û nivîsên nû bixwînin. Wek berdewamîya "dosya rewşenbîr, bindest û deshelata sîyasî" me sê nivîsên balkêş ji soranî wergerandiye ser kurmancî.

Heta bi dertketina hejmareke nû ya Kovara **WAR**-ê di nav xêr û xweşiyê da bimînin.

WAR

KÜRT SORUNU HAKKINDA BİRLEŞMİŞ MİLLETLERE SUNULAN KASIM 1968 TARİHLİ BİLDİRGE

İng. Çeviren: **Bawer UÇAMAN**

I

Ekselansları U Thant
Genel Sekreter
Birleşmiş Milletler
New York, NY

Kürt ulusu halen fiziksel varlığına yönelik topyekün bir ölüm kalım tehlikesi altında yaşamaktadır. Halen bu ulusun tepesi üzerinde ciddi tehditler sallanmakta ve bir yanılsamadan başak bir şey olmayan göreceli sessizliğin ardında devasa bir gerilim yatmaktadır. Bu sessizlik ileride çok ciddi bir patlamayla sonuçlanabilir ve bu da 1961'den beri Irak hükümetlerinin Kürtlere karşı uyguladığı jenosit hareketinin yinelenmesine neden olabilir.



Kamuran Bedirxan

Kürtlerin tarihi antik çağlara dek dayanır. Bugün, M.Ö. 6000 - 9000 arasındaki dönemde Kürt nüfusunun kendisini üretim ekonomisi çerçevesinde yeniden organize etmek için rekolte (tüketim) ekonomisinden döndüğü bilinmektedir.

Hint-Avrupa soyundan olup dilsel olarak ta İran dillerine bağlı olan Kürt ulusu insanlık geleneğinin büyük değerlerine dayanan görkemli bir tarihe sahiptir. Kürt ulusu son 25 yüzyıl boyunca aynı aileden 25 kral tarafından yönetilmiştir.

Günümüzde Irak'ta 80.000 km² alanda (Irak'ın toplam yüzölçümü 444.442 km²'dir) 2.000.000 Kürt (Irak'ın toplam nüfusu 7.000.000'dur) yaşamaktadır. Kürtlerin tarihi bir kahramanlık öyküsüdür ve Onun modern tarihi kendi kaderini tayin için bitmek bilmeyen bir mücadeleye tanıklık etmektedir. Buradaki amaç Kürt tarihinin detaylarını anlatmaktan ziyade Irak hükümetlerinin 1961'den beri rejimi ne olursa olsun Kürtlere karşı yürüttüğü jenosit savaşını kısaca anlatmaktır.

1961 ve takip eden iki yıl içinde, uçaklardan toplara dek en modern silahlarla donatılmış Irak Silahlı Kuvvetleri, amacı Kürtlerin soyunu ortadan kaldırmak olan bir savaş yürüttü. Bu yüzden Kürt ulusunun tüm üyelerinin General Mustafa Barzani'in taşıdığı isyan bayrağı altında toplanmış olmalarında şaşılacak bir şey yoktur. Kendilerine dayatılan savaşta gösterdikleri kahramanlık sayesinde Kürtler, Irak Devrimi Ulusal Konseyi'ni Mart 1963'te "Kürt Ulusunun Ulusal Hakları"nı tanımaya zorladı.

Kürtler bu sözlere inandılar ve bunların gerçekleştirilmesi için temaslara başladılar. Ancak, görüldü ki tüm temaslar ve görüşmeler Kürtleri aldatma niyetiyle yapılyordu. Şubat 1965'te Irak İçişleri Bakanı Subhi Abdulamid "Irak'ın ne şimdi ne de gelecekte Kürtlere otonomi verme niyetinde" olduğunu ilan etti ve yeniden Irak silahlı kuvvetleri tarafından yürütülen vahşi savaşta Kürtlerin kendi topraklarını kahramanca savundukları çarpışmalar yaygınlaşmaya başladı. Ağır kayıplarına rağmen Kürtler teslim olmadılar ve Irak yönetiminin askeri olarak yenildiğini ve Kürtlerin sesini boğmakta başarısız olduğunu kendisine zorla kabul ettirdiler. 29 Haziran 1966'da Irak eski başbakanı Abdurrahman Bazzaz, Kürt Devrimi'nin önderleriyle, özünde Kürtlere otonomi hakkını tanıyan ve buna saygı gösterileceği sözünü veren bir antlaşma imzaladı. Askeri bir darbe Bazzaz'ı saf dışı bıraktı ve sonraki hükümetler Kürt halkına yapılan bu taahhütleri reddetti.

O zamandan şimdiye dek iki yıl geçti ve Irak'ta hükümetler ve rejim değişti. Irak liderleri Kürt Ulusunun kimliğini yadsımaya ve otonom yaşama haklarını inkar etmeye çalışıyorlar. Kürtler Irak'tan ayrılma talebinde değildirler. Onlar sadece ulusal bir azınlık olarak yaşamak (ki, toplam nüfusun yaklaşık % 30'unu oluşturmaktadırlar), kendi dillerini konuşmak, kendi okullarını açma ve kendi ilişkilerini yönetmek istiyorlar. Ancak bu temel haklar Bağdat yönetiminin gözüne kesinlikle abartılı talepler olarak görünmektedir.

1961'den beri defalarca alevlenen bu savaşta Kürt Uluğu 60.000'i aşkın kayıp vermiş ve 3.000 köyü tahrip edilmiştir. Bu rakamlar hayali değildir. Son yıllarda Kürdistan'ı ziyaret eden yabancı muhabir ve gözlemciler bu gerçeğe tanıklık etmişlerdir.

2 Temmuz 1963'te Moğolistan Halk Cumhuriyeti, Irak Hükümeti tarafından Kürt halkına karşı işlenen jenosit suçunu Birleşmiş Milletler Genel Kurulunun bir sonraki (18.) oturumuna getirmeye karar verdi. Yine aynı yılın 9 Temmuz günü, Cenevre'de düzenlenen BM Ekonomik ve Sosyal Konseyi'nin 36. oturumunda Sovyet delegasyonunun başkanı Konseyin gündemine alınması için "Irak Hükümeti tarafından Kürt halkına karşı yürütülen jenosit politikası" konulu resmi bir mektup sundu. Yine unutulmamalıdır ki

eski BM Savunma Sekreteri Robert Macnamara Ortadoğu hakkında konuşurken, ABD hükümetini endişelendiren üç sorundan birinin Kürt halkına yapılan kötü muamele olduğunu söylemişti.

Kürt halkının bir ulus olarak varolma hakkı modern zamanlarda da hukuki ve uluslar arası garantiler kazanmıştır. 1920 tarihli Sevr Antlaşması'nın "Kürdistan" başlıklı bölümünde ve 62, 63 ve 64 nolu maddelerde bir Kürt Devleti'nin kurulması gereği ortaya konmuştur. Bu anlaşmanın 64 nolu maddesine göre bu bağımsız Kürt devletine Kürdistan'daki (Irak) Kürtlerin gönüllü üyeliğine Müttefik Devletlerin bir itirazı olmayacaktır. Politik manevralarla Kürdistan'ın bu parçası Kürt nüfusunun isteğinin aksine Irak içinde tutuldu.

24 Aralık 1922 tarihinde Milletler Cemiyeti'ne resmen sunulan Britanya Hükümeti ile Bağdat rejiminin ortak deklarasyonunda Irak içindeki güney Kürdistan'ın otonomi hakkı için aşağıdaki koşullar öngörülmüştü:

"Majestelerinin Britanya Hükümeti ve Irak Hükümeti, bu sınırlar içerisinde bir Kürt hükümeti kurulmak üzere Kürtlerin haklarını tanırlar. Yine umarlar ki, Kürt grupları bu hükümetin biçimi üzerinde en kısa zamanda bir uzlaşmaya varırlar. Bu gruplar ekonomik ve siyasi ilişkilerini Majestelerinin Britanya Hükümeti ve Irak Hükümeti ile tartışmak üzere sorumlu delegasyonlar göndereceklerdir."

Bu deklarasyonun koşullarını yerine getirme konusunda Irak hükümetinin payına düşenler daima askıya alınmış ve asla tamamlanmamıştır. Kürt bölgesinin otonomisi için Irak içerisinde pek çok ayaklanma oldu ancak bunların tümü Bağdat hükümeti tarafından güç kullanarak ve kanlı bir biçimde bastırıldı.

Kürt ulusunun önderleri uzun yıllardır uluslararası vicdanın uyanması ve Irak hükümetine çağrıda bulunarak, çok geç olmadan ve kendilerine karşı yeni bir savaş başlatılmadan, Kürt halkının temel haklarını tanımaya davet etmesi için yardım çağlıklarına uluslar arası kuruluşların dikkatini çekmeye çalışıyorlar.

Mir Kamuran Bedirxan
Komuta Elçisi
Irak Kürdistanı'ndaki Kürt Devrimi Konseyi
New York, 15 Kasım 1968

II

Ekselansları U Thant
Genel Sekreter
Birleşmiş Milletler
New York, NY

Ekselans,

15 Kasım 1968 tarihinde sunma şerefine ulaştığım notada, Irak hükümetinin yükümlülüklerini yerine getirmeyi reddetmesi sonucu Kürtler ile Bağdat Hükümeti arasında ortaya çıkan tehlikeli duruma ekselanslarının dikkatini çekmiştim.

Ekselanslarının da bileceği gibi, Kürt bölgesinin yarıdan fazlası (yaklaşık 80.000 km²'lik bir alan) Kürtlerin tam kontrolü altındadır ve buralarda 1961'den beri zaten de facto olarak otonom bir Kürt yönetimi bulunmaktadır. Sonuç olarak bu bölge Kürt egemenliği altında bulunmaktadır ve bu bölgeye hiç kimse, bir tek Iraklı bakan bile Kürt yetkililerden izin almaksızın giremez. Bu durum yedi yıldır böyle devam etmektedir.

Bu gerçeklerin ışığında, Kürt sorununun bir iç mesele olduğunu iddia etmek herhangi bir Irak hükümeti için yanlıgıdan öte bir şeydir. Bu gerçekler Irak hükümetlerinin Kürt halkının tam otonomiye ulaşma konusundaki meşru taleplerini yok etmede başarısız olduklarını ispatlamaktadır. Bu hükümetlerin başarmış oldukları tek şey, ayırım gözetmeden düzenledikleri hava saldırılarında sivil nüfusa yıkım ve sefalet getirmek olmuştur.

Biz Kürtler barışsever insanlarız ve siz ekselansları tüm dünyada barış ve adaleti koruma konusunda en yüksek makam ve sorumluluğa sahip kişisiniz. Bu nedenle, Kürt Devrimi Komuta Konseyi ve onun lideri Ekselans General Mustafa Barzani adına siz ekselanslarına, daha önce benzer durumlar için yerinde bir davranışla yaptığınız gibi, Kürt sorununa müdahale edip adil ve barışçıl bir biçimde çözmek için bir Birleşmiş Milletler arabulucusu tayin etmeniz konusunda ısrar ediyorum.

Ekselansları, lütfen en derin saygılarımı kabul edin.

Saygılar.

Mir Kamuran A. Bedirxan
Komuta Elçisi
Irak Kürdistanı'ndaki Kürt Devrimi Konseyi
New York, 18 Kasım 1968

III

Ekselansları U Thant
Genel Sekreter
Birleşmiş Milletler
New York, NY

Ekselanslarına:
May 16, 1969

Kürt halkı ve liderleri Mustafa Barzani adına size bu ricayı yüksek bilgilerinize sunuyorum.

Bilinen bir gerçektir son sekiz yıldır ki kuzey Irak'ta yaşayan Kürt halkı, iktidarını askeri darbeyle elde etmiş Irak diktatör hükümetleri tarafından, karadan ve havadan şiddetli askeri saldırılara ve Kürt toplumunu beslenme, eğitim ve diğer yaşamsal gereksinimlerden mahrum bırakan amansız bir ekonomik ambargoya maruz kalmıştır.

Kuşkusuz ekselansları Irak'ın yakın tarihini iyi bilmektedir. Yeni Irak devleti, Birinci Dünya Savaşı'nın ardından Osmanlı İmparatorluğu'ndan koptu ve başına Britanya hükümeti tarafından Faysal kral olarak getirildi.

Her ne kadar Irak nüfusunun kompozisyonu birçok yerli azınlık arz ediyor olsa da, Arap çoğunluğun yönetimi başından beri baskın oldu ve diğer Arap olmayan nüfusun, özellikle de Kürtlerin meşru haklarını çiğnedi. Petrol kaynaklarının çoğunun Kürt bölgesinde yer alması ve Britanya'nın petrol çıkarları nedeniyle desteklediği Arap yönetimlerinin Kürtlerin haklarını ihlal etmeleri, birçok ayaklanmanın başlamasına yol açtı.

Ancak bu farklılıklar bir şekilde yatıştırıldı ve özellikle Kürtlere karşı ayrımcılığın azaldığı İkinci Dünya Savaşı sonrasında durum daha katlanılabilir bir hal almıştı.

Ne yazık ki, devrim döneminin gelmesiyle ve Arap olmayan nüfusun, özellikle de Kürtlerin toptan asimilasyonu ile aklını bozmuş genç Arap milliyetçisi militan subayların sahneye çıkmasıyla bu tablo değişti.

Bu Arap milliyetçileri tarafından Kürtlere karşı sürdürülen amansız ve vahşi savaş, günümüz askeri teknolojisinin ürettiği ve çoğu büyük devletin Kürdistan toprağından çıkartılan petrolle kazanılmış para karşılığında seve seve verdiği silahlarla yapılmaktadır.

Kürtler tarafından yapılan tüm samimi girişimlere rağmen Irak yetkilileri aynı anlayışla karşılık verecekleri yerde müzakerelerin yapılacağı ateşkes dönemlerini yeniden toparlanmak ve düşmanlıklarını sürdürmek için kullanmışlardır. Gerçek bir anlaşmaya en yakın olunan zaman Abdurrahman Bazzaz'ın başbakan olduğu Haziran 1966 oldu ve ardından gelen hükümetler her ne kadar aynı politikayı desteklediklerini ilan etseler de bu anlaşmayı tersine getirmemeye yönelik kaçamak tavırları yüzünden bir sonuç alınamadı. Irak hükümetleri ordularını düşmanca saldırılarına tekrar başlamak üzere hazırlamak için, tekrar çareyi sessiz kalmakta buldular. Sonunda bugünkü aşırı uç hükümet 3 Ocak 1969'da Kürt nüfusuna yönelik ayırım gözetmeksizin en barbarca saldırılarını havadan ve karadan başlattı. Bu operasyonlara ait önceki raporlara bakıldığında, bu defaki masum nüfusun can ve mal kayıpları diğer tüm operasyonları geride bırakacak boyutlarda olduğu görülüyor.

Kısaca bu, bilinen tarih boyunca orada yaşamış ve hayatları dahil her türlü dünyevi varlıktan mahrum bırakılmış ve bu uygulamaya sadece Irak'taki diğer uluslarla eşit bir biçimde demokratik bir rejim altında yaşama isteğine sahip oldukları için maruz kalmış çaresiz Irak Kürtlerinin acı öyküsüdür.

Bu nazik dönemde, Bağdat'ın diktatoryal, askeri yöneticilerinin insanlık dışı uygulamalarını siz ekselanslarının adalet duygusunun huzuruna getiriyoruz. Umuyoruz ki ekselansları masum ve savunmasız sivil insanların can ve mal kayıplarına bir son vermek için elinden gelen tüm önlemleri alacaktır.

Son olarak, siz ekselanslarının bu içinde bulunduğumuz vahşi dünyaya adilane bir düzen getireceğini ve Kürtlerin yok olmaya terk edilmeyeceklerini umuyoruz.

Ekselansları, lütfen en derin saygılarımı kabul edin.

Mir Kamuran A. Bedirxan
Komuta Elçisi
Irak Kürdistanı'ndaki Kürt Devrimi Konseyi
May 16, 1969

IV

BARZANI DE GAULLE'A YAZIYOR

"Kürt Halkı sizin için Vietnamlılardan daha mı az önemli?" Bu mesaj kuşkusuz dünyanın en yaşlı direniş savaşılarından geliyor.

Fransa'da, mağdur Kürdistan halkına yardım komitesi Irak'a verilecek silahların Kürtlere karşı kullanılmayacağını resmi olarak denetlenmesi için başvuruda bulundu.

Bu umutladır ki General Mustafa Barzani aşağıdaki mesajı General De Gaulle'a gönderdi.

General,

Gençliğinden beri halkının saygınlığı ve özgürlüğü için savaşmış yaşlı bir adamın bu içten ricasını iletmesine izin verin. Siz Avrupa'daki en büyük direniş liderisiniz ve ülkenizi kurtardınız; bundan ötürü Kürtlerin dağlı insanların altı yıldır verdikleri neredeyse umutsuz mücadeleyi anlamamanız mümkün değil. Dahası siz Fransa'nın, dünyaya siyasi özgürlük, tüm insanların kendi kaderini tayin hakkı düşüncesini vermiş ulusun başkanıdır.

Nihayet siz, Fransa'nın deniz aşırı ülkelerini özgürleştiren, her türden baskıya karşı çıkan ve özgürlük için savaşan herkesin gerçek dostu olan General De Gaulle'sunuz.

General, siz Vietnam savaşını kınamakta haksız değildiniz. Eminim ki Kürt halkının kaderi sizin için Vietnam savaşından daha az değerli değildir; eminim ki Kürtlerin kaderi sizin için Vietnamlılarınkinden daha az değerli değildir. Bizler ulusal varlığımızı koruma savaşımızda tamamen yalnızız. Birleşmiş Milletler bizi görmezden geliyor ve belli bazı büyük güçler, ülkemizin yıkımı için kullanılan modern silahları Irak'a temin etme konusunda yarışıyorlar. De Gaulle'un Fransa'sı bu yüzden bizim için tek umut olarak kalmıştır.

Iraklılar Fransa'dan silah talep ediyorlar. Bu silahların teslim edilmesi sadece ülkemizin daha çok tahrip edilmesine ve kadın ve çocuklarımızın katliamına yol açacaktır.

Kuran der ki: "Gökyüzünde her insan için dönüp dua edebileceği küçük bir cennet vardır." Bizim gökyüzümüzdeki cennet siz ve Fransa'sınız.

Mustafa Barzani

Bikurtî Mêjûyî Bîrî Neteweyî

Dr. Marif XEZNEDAR

I

Neteweyê Kurdê nûha wek hemû neteweyên Rojhelata Naverast li dawîya belavbûna dînê îslam bi vî navê tazeyî peyda bû. Bab û bapîran û komelanê xelkê pêş îslam navê taybetî yê wan bi xwe hebû wek netewe, herweha navê cografîyaya wan jî hebû wek herêm û navçe.

Ev rojgare şunwarê kevin çûye nav mêjûyî ew qonaxa şunewarî(arkolojî) pê dibên, ya mêjûyî pêş dînê mesîhî û îslamî. Li dawîyê ev mêjûyê navê şunwarê kevin ê komelên xelk ko ji binemalê, aşîret, hoz, tîre, millet, netewe pêk hatibûn li navçûn. Herweka navê şunwarê kevin ê cografîya li navçe û herêm û dewletê şar û malbendên millet ewan jî navê wan bû.

Li dawîya belavbûna dînê îslamê navê "Kurd" wek neteweyêk peyda bû, li paşan zaraveyê cografîya "Kurdistan" wek navê welatê Kurdan kevtê nav nexşeya cografîya ve. Liber ewe yê pîr-raniya herî zêde yê neteweyî çûye nav dînê îslamî ve, çarenûs kevtê dest ew dewletên bi navê îslamê ve fermanrewayîyê dîkir, belam navê resmî yan bi binemal û aşîret û tîre û hoz û navê serok binemaleyêk werdigirt. Emewî û Abasî dû binemalêk eşîretî qureyşî yê Areb bûn. Fermanrewayê gotî jibo hemû

misulmananên ser rûyî zewî bûn. Li dawîyê deshelat kevtê dest binemalê Turkê Moxolan wek Selçûqîyan.

Dewleta Osmanî bi navê Osman navêkî Turk wergirt; Sefewî, Qacawî navê xwe li dû binemalêk Îranî wergirtin ko herdûyan bi nejad Fars nebûn. Ta êsta jî dewleta Suudî bi navê li Suud navêkî Arebî yê cizîra Areb wergirtiye serokê binemalêk bûn.

II

Kurd li xakêkî şaxa wî da dejî û rûbarî zor li rûyî cografîya ve xaka wan dabeş kirîye biser herêmî cografî, wate her navçeyêk li deşt û pahnayîyek dirust bûwe, çîyayekî şax dewrî daye ya rûbar sinûrî navçeyekî diyar kirîye, bi vî cûre ev navçe cografîyane taybetmendîya wan bi xwe bûwe bineta binkeyêk bo dirustkirina deshelat bi navê mîrnişînî liser binçîneyê derebegî, ji kevnê kevin ve ev navçeyan bi hoyî mîrê kurd ve birêve diçûn û bi vê şêwe û desturêkî taybetî pêwendîya wan bi dewleta merkezî ya Îran û Turkê Osmanî ve hebûn.

III

Mêjûyî hezar salên dawî yê sîyasî bi sê qonax têperîwe:

1- *Ji seretayî heta paş belavbûna dîne îslam ta cengî Çaldêran(1514).*

Beşê piranîya vê qonaxê fermanrewayî Areb bi navê îslamê Kurdistan degirtîye, wate dewleta Emewî û Abasî. Li vê navberê da mîrnişînî Kurd bi nav ve bûwe, hendê car fermanberanî Kurd mîrnişînîyan birêve birîye, bibê ewe piranîya xelkê mîrnişînek Kurd bûbin, her çawa bê li hemû haletêk da biresmî ev mîrnişînan ser bi dewletî merkezî bûn.

2- *Ji cengê Çaldêranê ve ta cengî yekem ê giştî:*

Li dawîya cengê Çaldêran û serkevtina sultanê Osmanî bi ser şahî Îranê da bo yekemîn car xaka Kurd li rûyê siyasî ve bû bi dû beş, layenî rojhelatê kevtê nêv xaka Îranê ve û layenî rojavayî kevtê nêv xaka Turkî Osmanî ve. Li herdu parçeyê Kurdistan da mîrnişînîyan peyda dibûn. Birêvebirin liser bincî û binavanî şeweyê aşîretî bû, liber ewe berjewendîya herdu layan pêwendîya nêv wan diyar dikir. Bi vî cûre beg jî yektirî diçûn û xaka yektirîyan dagir dikir, hendê car beg jî deshelatê merkezî da diçûn bi taybetî ew mîrnişînî yên ku kevtbûne ser sinorê dewleta Îran û Osmanî. Deshelata ev dû layenan hemû jî nerehetî daneyêve li nêv wan mîrnişînên Kurdan, çûnke eger mîrnişînekî Kurdê Îran yekêkî Kurdê Osmanî dagir bikirana, mana wî eve bû feyde bo deshelata Îran dibû.

3- *Paş cengî yekem ê giştî û dabeşkirina xaka Kurdistan bo cara duwem:*

Herçend nexşeyê Kurdîstana Îran weka xo mawe be, belam xaka Kurdîstana Osmanî biser sê dewletên taze yê paş ceng dirust bû dabeş kira; Turkiye, Iraq, Surye. Bi vî cûre meseleyê Kurd wek kêşeyekî (pirsgirêkekî) neteweyî yê girîng li rojhelata naverast da dirust bû û ta nûha jî bi encam negeyîştîye.

IV

Bîra neteweyî wek zaraveyêk û pratîk kirina ceribandîneke li Ewropa peyda bû. Beşêke taze yê li encama Şorişa Ferensa(1878)yî serî heldaye, eger li dawîya sede û nivêk ev bîr û rayane li rêgeyî Estemol û Misirê ve geştiştûbine navçeyî me, mebesta min rojhelata naverast e, li dawîya nizikê dû sede geştiştîye komela kurdewarî, wate li dawîya salên sedeyê nozdemê.

Ta pêş derçûnî rojnemeyê *Kurdistan* (Qahîre-1898), gîyanî netewayetî (kurdayetî) bi vî mana taze li navê ve nebû, pêwendî binemale û aşîretî bû, eger bi navê “Kurd” ya “Kurmanç”î jî bibûwaye her naverok aşîretan digeyand xo. Eger awirêk li Ehmedî Xanî (1897-1810) bideyêve ew tîorî bo kurdan dana bîra paş serdemî wan bi xo bû, li dawîyê da ew tîorî bû bi meşxelen, bîra hemû kurdê ronak dikireve. Her çawa bê ewe yê Xanî zîyatir bi îlmetîyetî têda bû, çûnke ew deme rojhelat li tarîkistan da bû, herçî Hacî bû wî jî feyde ji komela Estemol wergirt bû, çûnke wê demê bîrûbawerîya nasîyonalîya Ewropa geştiştûwe welatî Osmanî bi taybetî Estemol û beşa awrupayê.

V

Her çawa bê bîra neteweyî(nasyonalî) bi mana taze yê li dawîya salên sedeyê nozdehem geştiştîye komela kurdewarî, diyarê li maweyî sedeyek da goranî gelê girîngî bi ser da hatîye. Belam sirûştê welatê kurd û rewîşt û şeweyê aşîretî û derebegî karêkî wa yê kiribû layenî pratîkî bikevête dest çînekanî sereve yê komela kurdî. Ewe rastî gîyanî netewayetî li naw mêşk û dilê xwendewar û roşinbîrê kurd ve helqulave û belavbûyêve, belam

nekarîne bi xo fermande û rêberîya ew rêkxistinê bikin ko ênanedî ew tîorîyê xistbûwe estoyî xo. Belgeyêkî yekcar girîng bo ev meseleyê dênimeve ev belge tenya pratîk kirinî bernameyê hizbî “Hîwa”nî ye, belku biser hemû tîorî û rêkxistinên kurdî disipênrê ko bîra neteweyî kirîye bi destur bo bicîhê-nandina amanca milletê Kurd. Belgeyê partîya “Hîwa” ewe ye, mêrmindal û lawê taze pêgeyîştî yê qutabxaneyên navendî û amadeyî yê wan rêkxistinên binavê “Darker” dana, li dawîyê da xwestin bikin bi hîzib. Li xo ve ranedidît bi helbijardin yekêk ji nav komeleyê bikin serok, ew bi hesêbî xo ve mindal bûn. Bîra wan ve xist, navê çend kurdan dîyar kirin bo ku bikin bi serokê xo, li dawîyê da mesele liser Refîq Hîlmî nîşteve, çûne cem wî û wî kirin serokê “Hîwa”.

VI

Li komela me da ew roşinbîrên bîrûbawerîya qewmî hênaye nav komela me ve, dikarî ewe yê nebûwe xo bixête pratîkê ve, wata xwedîtî tîorîyekê xo yê pêgirtî ya ceribandî nekirîye, liber ew projeyan ji vê babetê ve ta nûha negehîştine encam. Ew xalêkî yekcar girînge li kêşeyek da, belam li rojgarane paş belavbûna dîne îslam û ta nûha jî birêkî mesele digirêteve bo nebûnî îdiolo-jîyetêkî dînî ko li rojhelata naverast da gelêk girîng e.

Li paş belavbûnî dîne îslam bo demêk dirêj neteweyê Areb bi navê îslamê ve diletîyan dirust kir. Li piştî Abasîyan fermanrewayî keve dest Turkî Osmanî û Faris. Evana jî dikarî dîn bikin bi dardest bo bicîhênanana amanca neteweyê xo, jibo ew hêvîyan bête cî em dibînin li piştî ruxîna dewleta Arebî îslamî, dewleta Turkî Osmanî yê îslamî

peyda bû. Her weha dewleta Farisî ya îslamî peyda bû. Li pênavî berdeyamî û peresendinî ew dewletan binemaleyî Sefewî sunnî wan bi xo kire şîe, çünke dewletekê beramberî Osmanîyên sunnî bûn. Bi hoyî ev şîe vegeyîste bi navî îslamî ve, Faris karî bigeyîşte ew pileya ko nûha geyîştine.

Li wê navê di wê demê da dîne kevin ê Kurdan perçe bû, bi taybetî dîne Zerdoştî, Îslamî jî biherdû dîn zayeve li dest Turk û Acem bû, bi vî cûre Kurd bi vî navî ve nedikarî xebatêk dirust bika bo ew bi xo bigate ewe yê ko deshelatî bidest wî bi xo bê.

VII

Gelek kes basê ceribandinên Selahedîn dikin û navê wî bi dewleta Eyûbî dibin. Ew rastî fermanrewa Selahedîn û endamên binemale yê wî bi xo bû, evana Kurd bûn belam dewleta wan dewletêk îslamî bû, weke dewletên pêşiya wan; Emewî û Abasî û paş wan; Osmanî û Sefewî. Ca eger Osmanî û Sefewî edgarî Turkan û Farisan wergirt bê, bêguman Eyûbî edgarî Arebî bû.

Hoyek yekcar girîngtir jî bê ew e, Dewleta Eyûbî nebû bi binyadêkî resen bo dewletêk kurdî, ewe bû nêvendî girîng ê dewleta Eyûbî li Misir û welatê Şam bû û dewletekê li nav xak û nîştî-manî Kurd(Kurdistana) nebû.

Li vê la û li wê la, eger deshelatîya Eyûbîyan li cêgeyêkî wek "Hewlêr" hebûbê edgarî kurdayetî nedayete dewleteke, ya bi watayekî dike nebûwe bi hoyî bibête nimune bo dewletêk qewmê Kurdî.


* Ev tîbînîyane wek bernameyêk in bo basêkî tîorîyî akedemî yê firewan li dû mesele divê; yekemîn mîjûyê bîra neteweyê(kurdayetî), duwemîn bo çi ta nûha Kurd dewlet nebûwe?

Michael Chyet: Kurd bi Qîmeta Zimanê Kurdî Nizanin!

18.09.2003 - 21:15

Hevpeyvîn: Sîrwan Hecî Berko

sirwan@amude.com



Michael L. Chyet zimanzanekî cihû û Emerîkî yê zimanê kurdî ye. Ew 46 salî ye û bêtirî 30 zimanan xwendine.

Berî demekê, ferhenga wî ya 'Kurmancî-Ingilîzî' ji aliyê weşanxaneya Yale University Press ve li Emerîkayê derket. Ferheng ji 847 rûpelan pêk tê.

Gotinên kurdî bi tîpên latînî û erebî hatine nivîsandin û bi pêweyekî berfireh wateya wan a bi zimanê ingilîzî hatiye nivîsandin.

"Îpê vê xebata min bi siyaseta hikûmetan tune ye," Chyet wiha dibêje. "Ez xema paşeroja vî zimanê dixum û bi hêvî me, ku ez ê bikaribim alîkariya stan-

dardkirina wî bikim. Ez ji vî zimanê hez dikim û naxwazim ku bimre. Zimanê kurdî ne mirî ye, lê pêwîstiya wî bi pêpvebirinê heye."

Michael Chyet berpirsiyarê beşê kurdî yê Radyoya Dengê Emerîka bû. Herweha ew profesore zimanê kurdî li Zanîngeha Parîsê û Instîtûya Washingtonê ya Kurdî bû. Ew niha li Pirtûkxaneya Kongireya Emerîkî li Washingtonê kar dike.

Min li ser telefonê ev hevpeyvîn pê re kir.

MALPERA AMÛDÊ: *Di pêpgotina pirtûka xwe de, tu bi pêweyekî neyekser bangî Kurdan dikî, ku xwedî li zimanê xwe derkevin, çimkî ew ber bi windabûnê ve diçe, wek ku te xwest bêjî. Çima weqas tirs li ser windabûna zimanê kurdî?*

MICHAEL CHYET: *Berî hemî tiptî, ez mecbûr im bêjim, ku her tiptê ku ezê bêjim, dîtina min a jêxsiyê û ne ya Pirtûkxaneya Kongirêse ye. Ez mecbûr im wisa bêjim.*

Ji ber ku ez dibînim -çî li Kurdistanê Tirkîyeyê û çî li Ewropayê -, ku gelek

Kurd hene, ku bi zarokên xwe re bi zimanên din dipeyivin, çi tirkî be, çi firensî be, çi elmanî be, çi ingilîzî be. Zarokên wan bi kurdî nizanin, yanî paşeroja vî zimanî di bin gefê de ye. Dirûpma min li ba Kurdan bila wisa be: **'Zimanekî wisa ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bê paşeroj e'!**

Her tiptê ku Tirkan ta niha kiriye, ku zimanê kurdî ji nav bibin, tesîra wê nebû, yanî ziman nebîr. Lê niha her tiptê guhertin. Rewş hatîye guhertin. Û eger Kurd bi xwe xwedî li vî zimanê dernekevin, ditirsim ku 20 salên din ev ziman namîne.

MALPERA AMÛDÊ: *Tu behsa Kurdên ji derveyî welat dikî..*

MICHAEL CHYET: Çi li derveyî welat, çi li hundirê welat. Bo min niha herdu yek in. Gelek Kurd qîmeta zimanê kurdî bi serê xwe fêm nakin. Gelek Kurd zimanê kurdî bi kar tînin, da ku hikûmeta tirkî nerehet bikin. Ew bi xwe nabînin zimanê kurdî çiqasî xweş û bedew e. Eger Kurd bi xwe zimanê xwe neparêzin, ew dê winda bibe, ji holê rabe.

MALPERA AMÛDÊ: *Tu behsa Kurdên Bakurê Kurdistanê dikî. Problêma Kurdên din tune ye?*

MICHAEL CHYET: Li Kurdistana Tirkîyê navbera 12-20 milyon Kurd hene. Li Sûriyê mesele tiptekî din e, û li Iraqê jî tiptekî din e. Li wan deveran gef bi awayekî din e.

MALPERA AMÛDÊ: *Ta niha standardek ji bo zimanê kurdî peyda nebûye. Tu vê yekê problêm dibînî?*

MICHAEL CHYET: Ta niha, me nikarî zimanekî standard biafrînin. Wexta ku em - gava ku dibêjim 'em', ez jî tê de me - xwe yek bigrin, divê em zimên jî yek bigrin. Hemî hiNcetên ku berê hebûn, kêma bûne yan nemane. Niha, ji ber înternê, televizyon û radyoyê, Kurd dikarin bigehên hev. Haya min li Tirkîyê jê heye, Kurdên Sûriyê, Iraqê û Îranê çi dikin. Herweha ez dikarim di rêya înternê û televizyonê bizanibim ka ew kîjan peyvyan bi kar tînin. Kurdên Tirkîyê ne dizanî, ka xuşk û birayên wan li Sûriyê, Iraqê û Îranê çi ji bo filan peyvê digot; haya wan ji hevdû tune bû. Lê îro rewş ne wisa ye; êdî hatiye guhertin. Herkes dikare bikeve înternê û bibîne, an jî li bernameyên radyo û televizyonan guhdarî bike, ka Kurdên beşên din kîjan peyvê ji bo filan tiptê bi kar tînin. Ne hewce ye, ku ez bê agah bimînim.

MALPERA AMÛDÊ: *Standard kirina zimanê kurdî karê zimannasên kurd e, an yê siyasetsmedaran e, an jî yên mirovên 'normal'e, an karê hemî Kurdan e? Ji bo vê yekê çi divê pêk were?*

MICHAEL CHYET: Ez bi xwe gotina 'siyasetsvan' bi kar tînim; ji bo min 'siyasetsmedar' farişî ye.

Gelek Kurd wiha difikirin, ku taqeta wan ji bo guhertina rewşê tune. Lê ez dibêjim na, wisa nîne. Her bavê kurd dikare li mala xwe biryarê bide, ku 'ji îro û pê ve, em ê tenê bi zimanê kurdî bipeyivin û vî zimanî biparêzin. Li derve di nav kuçê de, ew tiptekî din e, lê di nav malê de emê hewl bidin vî zimanî biparêzin'. Her bav dikare biryareke wisa bide, çi li Kurdistanê û çi li Ewropayê.

MALPERA AMÛDÊ: *Derbarî vê yekê, tu xebata hêzên siyasî yên kurd erênî an neyênî dibînî?*

Eger ew bi xwe, xwe hînî rêzimana zimanê kurdî û peyvên nû bikin, dê gelekî bapbe. Lê ta niha, gelek siyasethanên kurd yan bi tirkî, yan bi erebî, yan bi farisî dipeyivîn. Wan xwe bi van tiptan ve mijûl nedikir. Lê bi rastî ez nizanim ka rewş îro çawa bûye.

MALPERA AMÛDÊ: *Gelek Kurd bi zimanê dagîrkeran difikirin û bi zimanê kurdî dipeyivin. Tu li ser vê yekê çi dibêji?*

Ji bo min giring e, ku gava ku mirov peyvên standard ji bo radyo û televizyonê biafrîne, gerek mirov wisa bifikire, ne 'di gundê min de çawa dipeyivin'. Daxwaza min ew e, ku ta li dûrtirîn gundê Kurdan her kes bi hêsanî fêhm bike ez çi dibêjim. Li gor vê yekê, divê ez gotinên xwe bibêjim. Bo mînak, li Kurdistana Tirkîyê gelek kes bo 'telefonkirin' 'lêgeran' bi kar tînin, ji ber ku bi tirkî dibêjin 'aramak' (bi kurdî: ezê li te bigerim, yanî ez ê telefonî te bikim). Lê eger tu ji Kurdekî Sûrî, an Iraqê an Îranê bipirsi 'ez ê li te bigerim, yanî çi?', ew ê tiptekî din fêhm bikin. Ew fêhm nakin, ku mebesta te telefonkirin e. Ew ê wisa fêhm bikin, ku tu yê derkevî û li bin kevîran lê bigerî.. (dikene)

Ji ber vê yekê, ez dibêjim, ku bila gava pêşîn ev be, ku em xelkê agahdar bikin, ku gava ew peyvên wisa bi kar binin, ev dibe astengek li ber yekgirtina zimên ji û xelkê jî. Di nav Kurdên Sûriyê û Iraqê de jî gelek peyvên di bin tesîra zimanê erebî de hene, û li Îranê jî peyv hene, ku di bin tesîra zimanê farisî de ne.

Ev gava pêşîn e. Haya kêmkirî ya ev kes agahdar kirin, ku pirsgrêkeke wisa heye, wê demê em dikarin li hev rûnên û bifikirin, ka em çi ji bo yekgirtina zimanê kurdî bikin. Eger her kes di vê

proseyê de beşdar be, hewasa wan jî dê bilindtir be. Ew dê bêje: 'weleh tiliya min jî di vî karî de heye, û ji bo min jî giring e, ku bi ser keve.'

MALPERA AMÛDÊ: *Gelek rewşên zimanê kurdî tim dibêjin, ku ger welatekî me Kurdan çêbibe, hemî pirsgrêkên zimanê çareser dibin. Tu çi dibêji?*

Belkî tu Kurdistanê çênebe jî.

Bi dîtina min, gotineke wiha tê wateya, ku 'êdî em naxwazin û em zimanzan nînin, bo me siyasethan girîng e. Em ji zimanan û ji zimanzanîyê fêhm nakin. Em ê bihêlin ta dewletê çêbibe.'

Bi rastî ihtîmaleke mezin heye, ku tucar tiptekî wisa (Kurdistan/SHB) çênebe.

Bo min, eger em weke mînak li vejandina zimanê îbrî binerin, Isarîl di sala 1948an de hate damezirandin. Lê vejandina zimanê îbrî hinekî zûtir dest pê kiribû, di destpêka sedsala 20-an de. Gelek Cihû bi vejandina zimanê îbrî ve mijûl bûn. Ez dibêjim, ev mînakeke bapê bo Kurdan. Ne hewce ye, ku em li hêviya damezirandina dewleteke kurdî bimînin, ku em zimanê kurdî bi pêşxînin.

MALPERA AMÛDÊ: *Em çi bikin?*

Bi rastî, em dikarin di rêya televizyon û înternetê gelek tiptan bikin. Fekirîna Kurdan ew e, ku her kes di geliyê xwe de dijî, bêtî li lêbikole, ka ta îro çi ji bo standardkirina zimanê kurdî hatiye kirin. Her kes wisa difikire, ku tu tipt ne hatiye kirin, û gerek 'ez ji pêşî de dest pê bikim'. Ev yek ne rast e. Gerek mirov bigere, bixwîne û bibîne ka çi heye û kêmasî çi ne.

Wek mînak, gava Kurd li ser înternetê nameyan ji hev re diþînin, her yek bi awayekî dinivîsîne. Bila her kes li

hev bike, ku li gor rastnivîsîna zimanê kurdî binivîsîne.

MALPERA AMÛDÊ: *Tu li ser gramera Mîra Celadet Bedirxan çi dibêji? Kurd dikarin wê weke bingeh ji xwe re bi kar binin?*

Ez wê pirtûkê bi kar tînim. Lê dîsa ji ew wek Quran nîye, ew ne wek kitêba pîroz e. Aþitî û kêmanî tê de hene. Ew destpêka rê bû. Bê guman, di destpêkê de wê kêmasî hebin. Lê dîsa jî pirtûkeke gelekî girîng e. Pirtûka pêþîn, ku min berî 20 salan bi dest xistibû, ew pirtûk bi xwe bû. Ez wê dîsa jî bi kar tînim. Gelek tiptên sivik tê de hene, ku gerek em îro zelaltir bikin. Bi giþtî ez baþdibînîm, ger mirov wê pirtûkê weke bingeh bi kar bîne.

MALPERA AMÛDÊ: *Berî demekê ferhenga te ya kurmancî-îngilîzî derket. Armanca te jî vê xebatê çi ye?*

Berî þanzdeh(16) salan, dema ku min dest pê kir, ku xwe hînî zimanê kurdî bikim, pir jêder tune bûn. Ji ber vê yekê, min dest bi amadekirina ferhengekê kir, da ku ez xwe bi xwe fêrî kurmancî bikim. Piþtre min dît, ku bi rastî ev yek dikare bê çap kirin, da ku berjewendiyên wê bigihên her kesî.

Ez hêvîdar im, ku ew jî bo standard-kirina kurmancî jî bête qebûl kirin.

Herweha dema min dest bi hînbûna kurdiyê kir, ferhengên kurmancî-erebî, kurmancî-tirkî, kurmancî-rûsî hebûn, lê bi rastî kurmancî-îngilîzî tune bûn. Îro 3-4 ferhengên kurmancî-îngilîzî hene. Bê guman, zimanê îngilîzî îro gelekî girîng e, ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo îngilîzîaxêvan jî. Ji bo Kurdan çêtir e, ku ew gel mesela Kurdan fêr bike. Û ger jêder û çavkaniyên bi zimanê îngilîzî

hebin, dê rê xweþbikin ji bo gehiþtina vê armancê. Herweha ji ber ku kesên biryardar di cîhanê de bi îngilîzî dizanin, dê çêtir be, ku jêderên li ser Kurdan bi îngilîzî hebin. Ez kêfxweþnînim, ku hêz di destê îngilîzîaxêvan de ye, lê rastî ev e; ez nikarim vê rastiyê biguherim.

MALPERA AMÛDÊ: *Te yê bixwesta ku hêz di destê kê de ba?*

(dikene) Ez siyasetvan nîn im; ez zimanzan im.

MALPERA AMÛDÊ: *Tî projeyên te yê din ji bo zimanê kurdî hene?*

Belê, hene. Pirtûkên min jî bo hînbûna kurmancî û soranî hene. Herweha pirtûkeke min a din bi navê 'Antolojiya Edebiyata Kurdî' bi zimanê îngilîzî heye. Ew ta niha hîn çap nebûne. Min hîn çapxane jî bo wan peyda nekirine. Ez hêvîdar im ku piþtî derketina ferhenga min, rê jî bo vê yekê xweþ bibe.

MALPERA AMÛDÊ: *Tu dixwazî tiptekî li gotinên xwe zêde bikî?*

Dixwazim bi vê dirûþmê gotinên xwe bi dawî binim:

'Zimaneke wisa ku zarok pê nepeyivin, zimaneke bê paperoj e!'

Gelek sipas ji te re ji bo vê hevpeyvînê. Em ê mesaja te bigehînin dê û bavên Kurdan.

Mala te ava!

www.amude.com
navenda çanda kurdî
Michael L. Chyet (mlmsdc.com)

Jibo Bîranîna Roşinbîr û Zimanzanê Gewre yê Gelê Kurd: *Şikur Mistefa*

Di roja 18.09.2003 da ronakbîr û wergêr û bîrmendê gewre yê Kurd (Mamosta Şikur Mistefa) li temenî 79 salîya xo da li şarê Hewlêra paytextê herêma Kurdistan da, cara dawî dilê wî lêda, xatir ji gelê xo xwest, berê xo da rêyek bê vege û bo hete hetîyê çavê xo vegirt. Mamosta Şikur Mistefa ronakbîrekî wek ensîklopedî bû û her weha her çar zimanê(kurdî, arabî, farisî, tirkî) bi hemû zaravayan ve dizanî. Ustad û şareza bû, herweha wergêrekî bêhevta û bi serhev da nîzikî çil pirtûkan li paş xwe hişt.

Şikur Mistefa ji devera Germiyanê ya ser bi Kerkûkê ve ye û ew sala 1924-ê li herêma Qerehesenê hatiye dinyayê. Ko li temenî neh(9) salîya xo da babê xo wenda dike, dayika wî bi hejarî û derdestî û sêwîtiyê wî xwedî dike. Li salên 1932-an tene Kerkukê û dayika wî li wê derê wî birêdike bo xwendina qurana pîroz. Piştî xetimkirina quranê hînê zimanê turkî, farisî û arabî dibe.

Li sala 1941-ê da dibe feqe. Li sala 1947-ê diçe Bexdayê û li qutabxaneyê "Alhidayet Alîslamî"î dixwêne. Li sala 1949-ê da jî Kolêja Şerîhî wergrîtiyê û li sala 1955-yê lêderçûye. Li sala 1957-ê da bo mamosteyî dest bi




Şikur Mistefa

kar dike. Heta salên 1970-ê gelek caran ji layê hikumetê ve jibo bajarên di tete nefikirin. Paşê li salên 1970-1971-an da tete guhêzerandin bo rêvebirîya xwendina Kurdî. Xwendina navendî ya kurdî heta pileyê dawî cîbicî dike û ligel mamosta û roşinbîrên din kitêbên dersdayin û qutabx-

aneyan amade kirin bo kurdî.

Li sala 1975-yê da li damezirandina korri zanyari yê kurd li Bexda da cî digre û 1977-ê da dibe sikreterê gişî yê qorrê zanyari. Piştê ko Baas bûye deshelat, qorrê zanyari yê kurdî jî têtê helweşandin û mamosta Şikur di kin pispore ziman di qorrê zanyari yê Iraqê da. Desteyê Kurd li sala 1998-ê da têtê Kurdistanê û sergermî karê wergêran û kitêb çapkirin û damezirandina qorrî zanyari yê Kurdistan dibêt. Mamosta Şikur li warê wergêrandinê jî da hinek kitêbên mêjûyî û fikrî û romanî jî zimanê tirkî, arebî, farisî da bi zimanekê yekcar şîrîn û rewan wergerandine kurdî. Ji wan 5-6 romanên Yaşar Kemal wek Efsaneya Çiyayê Agirî, Teneke, Efsaneya Koroğlu, Zevî Asin û Asîman Mis û wd. jî tirkî wergerandiye ser zimanê kurdî.



Şikur Mistefa û Seîd Veroj

Şikur Mistefa heta nûho îmzaya xwe li zêdetirî 40 kitêban daye û wî hem kitêb jî zimanên biyanî werdigeland bo kurdîyê û hem jî bi xwe kitêb dinivîsandin. Wî vê dawiyê kitêba Rohat Alakom ya li ser serhildana Agiriyê jî tirkî wergerand bo soranî û erebiyê.

Şikur Mistefa li Hewlêrê bi merasimeka resmî ko rewşenbîr û siyasiyên kurd tê de beşdar bûn hat veşartin.

Sinorêk Li Nêvbera Azadî û Berelayî da Heye*

Sikur Mistefa

* *Mamosta, çend rojêk dike (Nisana 1998) çejna 100 salîya rojnamenûsîya kurdî li Kurdistan dest pê diket, cenabê te yekê nûser û rojnamenûse, bi navê bangekanî vî welatî, rola binîyatnerî rojnamenûsê kurdî û rola xanedanîya (bine-maleya) Bedirxaniyan li mêjûyî ferhengê Kurd da çawan heldesengênî?*

Şikur Mistefa: Ez bi xo zor bikarî rojnamenûsîyê ve xerîk (mijûl) nebûme, belam sala par kitêbêka bi dest min kevt bi navê *Çend Belgeyê Kobûneyên Yekem Komeleyê Xaneanî û Xêzanî yê Bedirxaniyan li Estemboî*, ew kitêba bizirxe yê kak (Mihemed Teyfun) e ko bi nasnava (Malmisanij) zor (pirr) dinûsê, ew bi xo kurdê zaza ye, li ser kurmancî dinûse.

Li vê kitabê da nizîkê (44) Bedirxanî hatine nav çalakî û karê rojnamegerîyê ve, ewana li hemû meydanên kargêrî yê Dewleta Osmanî, li edebîyat, li rojnamenûsî û siyasê û zor tiştê dike da rolên gewre girtine. Ewe yê ko dikarim li berîya hemûyan da navê wî bînim (Mîdhet Bedirxan) e ko serpereştîya rojnameya Kurdistan kirîye, pitir li Qahîre ew rojname derhênaye û demeke jî li Swîsra, dawîyê ew, Hemed Emîn Bedirxan, Salih Bedirxan û Kamîl Bedirxan û komekî navên dike yên din ko herhemûyan li karê rojnamenûsî da zor aşkirane.

*Sero Qadir, *Ferheng û Lêkhalbûn*, r. 51, dezgeyê çap û belavkirin yê Mukrîyanî, Hewlêr

Ew xebat û çalakîya rojnamenûsîyê li seretayî (1908)ê ve dest pêkirîye. Her ew biradere (Mihemed Teyfun) kitêbêka li bareyî rojnamenûsîya kurdî de li çap dawê li sala (1908) ve ta (1984) e, wa bizanin ko wî biresim û navnîşanan û serdêr û babet û zor tiştî dike ve ew rojnameyên ko li wê demê da derçûne, hemûyan li kitêbêk da belû kirîye bi turkî. Ewe bi xo nîşanê ewe ye ko Kurd jî mêje ve xerîkî (pêgirtî, mijûlê) rojnamenûsî ye, belam bi zimanê rojnamenûsî yê wê demê diaxive ko bipiranî bizimanê turkî bûye, xwendewarê kurd ew wexte her biturkî xwendine. Li paşê hûr hûr bi kurmancîya jor û bi kurmancîya jêr (soranî) me tiştên xoş li Kurdistan da belavkirîye. Dîsa li vê kitêbê da ko ter-ceme kirîye zor wêne têda ye û dibînin li rojnameyîya kurdî da zor tişt jî sebarek bi dewlet, mafî mirov, edebîyat, ziman, huner û jîyan û guzeranî xelkê Kurdistanê ve, hatîye belav kirin.

* *Ev xanedanîyê li sereta da serkir-dayetî li beşêk şorişê Kurdistan dikir û duwayî li jêr barudoxêkî diyarîkirî da guheztîyane bo biwarî rojnamenûsî û ferhengî, wata xanedanîya Bedirxaniyan rasterast heta li ser nav bizutneweyê siyasî wê demê da neman, belam li nav bizutneweyê roşinbîrê Kurdistan da ta dawîyê jî bo Kurd û roşinbîrîya Kurdî rola pêşengî ya malbata wan bûye. Ti li vê rûyî ve çawan rola wê malbatê helde-sengênî, nek weku malbat, belku weku ev komele kese yê ko bitêkra li biwarî siyasîyetê ve guheztîyane bo serkir-dayetîya roşinbîrê kurdî, belam li medarêkî diyarîkirî da?*

Şikur Mistefa: Ewe bi xo tiştêkî zor siruştî ye, çunke eger seyr bikeyn dibînin li hezar û heştêd û çilî de Bedirxan

dewletêkî dirust kirîye. Ew dewlet jî sînore wî geyîştîye nizîkê Rewandizê. Ji layê dîke va dewleta Paşayî Kor e ko ji Urmê bigre ta rojavayê Dîyarbekir fire bûwe. Ev dewleta, libarî siyasîyê ve bi xo li vê serdemê da tiştêkî gewre ye bo milletê Kurd. Aşkeraye ko Bedirxanîyan cige li meydanî rojnamenûsî li biwarê dîke jî da xebat kirine û serkevtî jî bûne. Xuna sê çarêk ji wan li Misir hebûnewe, Ehmed Bedirxan yekêk bûwe ji wan ê ko çendîn filmê sinemayî derhênaye, Leyla Bedirxan hunerkarî hunermendêkî kurd e ko karibûye bibête seroka bale ya Almanya.

** Mamosta her li biwarî rojnamenûsîya kurdî da, evro teknîk û ew cûre pêwendîyê giştîyane yê ko biser dinya da zalin(serdestin, pitir) û ewê ko jê ra tête gotin cihangerayî biwarêkî yekcar zor firewanî bo karî rojnamewanî xulqandîye. Caran ta berê li (10) sal pitir li biwarê edeb û ferheng û hendê car biwarê dîke yê zanistî zal bûn, belam dinyaya êsta pitir hanê rojnamenûs diket û rojnamenûs bo te modî evro û pitir li hemû tiştêkî dîke karîgerîyetî biser pêşkevtina komelîyetî û aborîyê ve heye. Pêtiwaye li Kurdistan da rojnamenûsî bi manayî hevçerxî yê evro hebê, yan jî ti li Kurdistan da hest bi bûna rojnamenûs dekey?*

Şikur Mistefa: Rojnamenûsî bi xo bi mana siyasîyê ve deshelatî çîwareme. Li rûyî siyasî ve rolêkî gewre dibînê. Eger amancî rojnamenûsî jî geyandina heqîqet bî, bi hemû insanêk li astêkî asan û sana û bê girê û gol da, bêguman ew kate(dem) rojnamenûs rola xo dibînê. Belam sebarete bi wê ko aya li Kurdistan da rojnamenûsî geyîştîye ew astê ko lê çaverê dîkinê, ewa bi min waye rojna-

menûsî yan her tiştêkî dîke yê şaris-tanîyane yê ev serdeme, li Kurdistan da li bineret da bi barî siyasî yê milletî me, jîyan û guzeranî xelkê Kurdistan û serkirdayetîya milletî kurd ve girêdayîye.

** Eger bikaribaye te bi qûlî bas li vê medare firewane yê ko li Kurdistan da rojnamenûsî bijîyanî xelk û asta ferheng û rola serkirdayetîyê ve bestîyeve, bikiribaye.*

Şikur Mistefa: Min evan hemû bo xo weku tabloyek dibînim ko ev tablo hemû pêwendîya wan bi yekudu ve heye, ji wan her yek kargerîyetîya wê biser ewên dîke da heye. Bitaybet serkirdeyî siyasî ko dibê li vê qonaxê êsta da zor zîrek û çapuk û bikar bêt. Ew serkirdayetî eger karibe xo bigeyenête hemû malêk, hemû kesêk û li nizîkê ve hewla agadarbûna ji gîrûgirîftê xelkê da. Ewan ew dem bi min waye ev serkirdayetîy zor baş diçête niv dilê milletê ve û radeyî cemawerîyetî zêde diket.

** Ji paşvekevîna rojnamenûsîya kurdî li Kurdistan da ta çend serkirdayetî ya siyasî li Kurdistan bi berpirsyar dizanî?*

Şikur Mistefa: Renge zor bixeme estoy serkirdayetî.

** Bo?*

Şikur Mistefa: Renge serkirdayetî li zor rûyeve, pêwîstîye karê rojnamenûsî dabîn biket, belam aya serkirdayetî bo xo dawîyê rengdane karên xo dikevê. Dawîyê ewe, aya bernameyê siyasî yê serkirdayetî li tiştên zor girîng da rengdayeve û aya hîç heq û hîsabêk heye? Dibê serkirdayetîya siyasî programêkî

hebê bo ewê li xelk bigeynêt ko kurdayetî li vê qonaxê çawa ye, û pêwîste xelk çawan kurdayetî biket.

** Bi we naverok waye deshelatîya sîysî, li pêdanî azadî û bûnî azadî ko beşêkî zor gewre ye li karê rojnamenûsî da, kem û kurî heye yan kemî dawê yan her nedawê?*

Şikur Mistefa: Bi min waye azadiyekê zor dawê, belam dibê lêpîrsînê hebê, çünke azadî ewe nîye min got û bi arezuyê xo min çî jî wan xwest bikin û wan çî xwest bikin. Azadî wata encamdana ew karane ko pêwîste encam bidirêt.

** Bes evro li dinya da dibên rojnamenûs li hemû waran -rageyandin- carî wa heye deshelatî sîyasî neçar dibêt liser rêbazêk biruat, yan carî wa heye rageyandin wa diket hendê li hinek dewletan helwêstê nû yê li ber tiştêk wergerin û zor caran jî helwêstê mirovî. Herweha rayek heye ko rageyandinê evro yê dinya, bişêweyî giştî li wirûjandinî hinek babetan da bi sehiw naçê. Ko wata li mirovî dinya da hîç sinurêk bo azadiya rojnamenûsî rewê nîye, bi pêçewaneyê ew qise yê ko wa rageyandin tee-bîr li rayî dewletêk biket?*

Şikur Mistefa: Azadî tiştêke ko li hemû qonaxêk û biwarêk da pêwîst e, belam ligel ewe jî da dibê perjînêkê hebê. Dibê kesêk hebê ko bizanê ew azadî çawan bikar diête. Herweha dibê xelk fêr bikirê çawan azadî bikar bînê, çünke hêştê eme fêr nebûne azadî bikar bînin û li gelek waran da girîftên me hene.

** Beşî duwem ê pirsyarên min ewe bû, aya li Kurdistan da hest bibûnî rojnamenûs-bi mefhumî- dikey?*

Şikur Mistefa: Eger meseleke li çav rojnamenûsî Awrupa û xeyrî me bi xo da lêk bideyneve, barodoxî rojnamenûsî û hebûna rojnamenûs li Kurdistan da, weku çirûskê agirê cigareyek li tariya şevêk da dibînim.

** Te bas jî vê kir, ko li seretayî dest-pêkirina karê rojnamenûsî da, giriftên zimanî yên Bedirxanîyan hebûwe û jiber nebûna zimanê kurdî penayan birîye herve turkî. Di dirêjayî ev(100) salan da giriftên ziman li kol rojnamenûs û karê rojnamenûsî li Kurdistan, nebûye û karêkî zor kirîye ser vê rewşê. Cenabê te hewlê daye ko wan tiştan bi lehçeyek binûsê ko piranîya xelkê li wê têbigeyn. Li heman demî da şan bi şanî ê we kesanêkî weku Hejarî Mukrîyanî, karêkî zor gewre li zimanê rojnamenûsî da kirîye û şanazîyêkî gewre bo Hejarî Mukrîyanî bicî ma ko wa li duwayî xo cige li berheman, ferhengêkî kurdî yê zor gewre jî bicî hiştuwe. Zimanê di rojnamenûsîya evro da, di kurdî da çend girift yan keresteyekê libare, aya rojnamenûs û roşinbîr azar nadet?*

Şikur Mistefa: Ziman neke her zimanê rojnamenûsî ye, bigre ziman, zimanê jîyan e, zimanê cotyar e, zimanê karker e, zimanê efendî û zimanê hemû mirovêk e û her kese beşê xo lêwer-girtiye. Belam eger bitevê zorî tengasî bikeve, ewa renga li rojnamenûsî da birrê zarawe şîyaye bikar bêt ko li meydana dîke da bikar neyêt. Bigiştî bi min waye zimanê kurdî çî bişêweyê kurmançîya jorî, û çî bişêweyê kurmançîya xwarê, li vê 50 salên dawî da şan bişanî yekdî zor pêşkevîne.

We basê hejmarê xwelêxoşbûn kir, birastî Hejar rolêk zor gewre li palawtinî zimanê kurdî da hebûwe. Bitaybetî şêwezarî Mukrîyanî ko şairê klasik ên

gewre li babetî Nalî û Salim û ewan hemû bi vê şeweyê Mukrîyanî şîrên xo gotine. Hejarî Mukrîyanî jî her peyrewê vê rêgeyê bûwe. Ez bi xo zor bi vî zimanî pêxweşim û her di vê barî da jî min tiştine nûsîye. Bi giştî li Kurdistanê Iraq da zimanê kurdî li zor biwarê mirovîyê da, li fîzîk û kîmya û ewê pê dibên biwarê zanistîyê, hêşta maye. Eve jî her tenê yê me negirtîyeve, Turk û Faris û Arab jî hêşta li zor tişt da loqe dikin û li dawîya Awrupa ne. Dîyare ev jî xetayî me nîye û mêjû wa lêkirîne ko paşva bikevin û neşên li vê maydanê da, weku ewan pêş bikevîn. Ez pir xoşbextim ko bikarim li gelek tiştî da bikurdî bîr û rayên xo derbirêm.

** Mamosta li dawîya raperîn, qonexekê nû yê li jîyana milletê Kurd li hemû biwaran da dest pêkirîye. Li warê ferheng(lîterator) û rojnamenûsî da qonaxêk bû ko divîyaye pitir li hemû warên dike ew nûwênayetiye pêwe dîyar bê, çunke bidirêjayî karê rojnamenûsî li Kurdistan da, nebûna azadî astengîkî yekcar zor gewre bûwe liberamber dahênan da. Ko çî bipêçewanewe(biberavajîye) di Kurdistanê da li du raperîn, dahênan kem bûwe û çalakîya serhildana roşinbîrî, bimefhumî ewe ko wa dibe waye pal bo beşêk ji vê êş û azara mêjûyîyane jî bi awayê ko nekarîye li serdemî dîktatorî da çareserîyan biket. Belam bipêçewanewe li vê şeş salên yekem ê li du raperîn, cûrê li kuştin û paşeksişê rûdaye û ligor hendê kesan waye ko roşinbîrên Kurd nedikarî ligel azadî da biron. Cenabê te vê dîyardeyê çawa heldisengênî?*

Şikur Mistefa: Hest dikim ewe tiştêkî siruştî ye, hinek siyaseta hemû dinya dadigrê dibêti tiştê ko weku nan û avê jê dêt, li hemû meydanêk da xo

desepêne. Ew, dem bi warên dike ve dike, merivê hizbî ye û divê basê hizbî biket, ew ên dike divê basê rêkxistinî biket, ewane jî we nebêti loxetêkî wan ê taybetî hebêti, çunke sîyaset jî loxetî xo heye. Sîyaset loxetêkî xêra û kem temenî heye û li duwayî xo hîç bicî nayelê, wata tiştêkî weku şîhir, yan çîrokêk, yan dastanêk, dirûst naket, tiştêk digotirê û rojane xelk dibîhsin û dawîyê li bîra wan diçêteve. Katê sîyaset dibê bi axa, roşinbîr dengê kip divêti. Ewe jî we nîye tenha li mêjûyê me da rû dabê. Piranîya neteweyan ew haletan dîtine. Bi xunê, wextê Emewîyan hatine ser kar, qonaxê firawanxwazî û dinyagîrî ya Areban newesta. Bi vê pêyê jî hemû tiştê mefhumî sîyasî wergirt. Tenanet şîhirî jî li vê bazneye da bû. Bi berevajî ve wextê ko Abasîyan dên sîyaset, tozêk kip dibêti, temêşa dikey li serdemî Meemun da ferheng û şaristanîyet geyîştîye çilepope. Ev jî ewê derdixê ko li vê serdemê da roşinbîr pitir henase didat. Li serdemî Abasîyan da dewlet firewanî bi xo ve dît û seqamgîr bû. Ev pêye derdikevê ko seqamgîr rolêkî wî yê berçav li pêşkevtin da heye û bibervajîve barê ferhengî li naseqamgîrî da li piley duwem û sêyem da ye.

** Zor ji wan ên ko êsta xo bi mêjûyî ferheng û rojnamenûsîya kurdî ve mijûl diket, pêyanuaye bigiştî, bixişînî, roşinbîrên Kurd zor kême û kêmtir roşinbîrê Kurd li girîft û bûnî xo da hûr dibêteve û kêmtir binaxî xo da diçête xware ve. Her bo vê jî li rewşenbîrên di rawşa me da kesên wek Îsmail Bêşîkî û zor ên dike hene ko wa hendê kes pêyanuaye li xawen bîr û roşinbîrên Kurd pitir hewl dane li komelê kurdewarî bigeyn û rêwşuênî bo dabinên. Ev dîyardeye cûrêke li lixobîyanîbûn û sipardîni meseleya roşinbîran bi roşinbîrên*

bîyanî. Bi raya cenabê te ev diyardeye nav roşinbîrî Kurd ji çiyê ve dê?

Şikur Mistefa: Carê em ji pêşîyê ve bo bikevne qutabxaneyê arebî û bi arebî bixwênin, li serdemî Osmanîyan da ko li Kurdistanê Iraq û Turkiya û li hemû Kurdistan da qutabxaneyê resmî nebûwe û ne bi turkî û ne bi arebî û ne bi farisî me ne xwendîye. Belam ligel wê da ji hucreyên mela û feqêyayetî hebûwe, hucreyên mela û feqîyan, melayên çak bo ew qonaxa siyâsî yê ko Kurd têda jîyaye perwerde kirîye. Belam bo çi ewana melayên çak bûne û li ber çi navê wan heye? Li pêş hemû tiştêk da ev melayan dû tişt qêrbûne; sereta wan bi xo li kelepûrê mîlleta xo geyîştine û zanîyane folklora Kurd heye, folklor ji gelek tişte û bi vê pêyê bi temametî çunete nav mîlletê xo, wata agaya wan li mîlleta wan bûwe, têgeyîştine ewca zor li edebî farisî nizîk kevtineteve.

** Ligor we waye evana karibûna karîgerî li ferhengî Kurd bikin?*

Şikur Mistefa: Mebesta min ew bû ko ligel ew hemû melayên çak ên ko wa li sedeyê hevdehem li Kurdistan da hebûne, em tenya Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî û Nalî û Salim û Mehîwî bo me mane. Ewan hemûyan karibûne biçine nav mîlletê xo, ewca liser bine-mayî têgeyîştinîya ji kulturî mîlletê xo tiştêkî taze fêr bin. Fêrbûna farisî û têgeyîştin li roşinbîrê farisî mercêkî serekî bûwe, çunke nek her Kurd, bigre turk ji her farisî fêrdibûn. Kurd kêmtir şihîrê wî yê arebî heye, belam şihîrên wan ên farisî hene. Nalî û şêx Riza şihîrê wan ê farisî hene, belam min nebihîstîye ko şairêk me şihîrê wê yê arebî hebûbê, eger bûbête ji tiştêkî wa niye. Hest dikim Ehmedê Xanî û Nalî û Salim û

mehwî û ewan, bi temametî ferhengê serdemê xo bi xo helmijîwe, belam liser pencî kulturê xo niwanduyane.

** Mebesta min ewe ye ko bo roşinbîrên me nekarîne cige li pêgeyîştin, li biwarî giriftê ferheng da, deng arasteyê roşinbîrê gelanê dewrûberê jî bikin. Wata ti dibînî yekêkî weku Îsmail Bêşîkçî roşinbîrêkî turk e, lê kar liser roşinbîrê Kurd jî diket. Ewe digeynê ko roşinbîrê Kurd nekarîye çareserî li giriftên ferhengê kurdî biket bi şêweyekî firewan û bi cûreyêk ko bikaribe ew çaresekirinê bike bi bidengêk û bo derve jî binêrê û arasteyê gelên dike jî biket. Çunke roşinbîr û bîrmendên gelên dike bi rêgeyê ferheng û karê fikrî yê ve hatine nav gelên me?*

Şikur Mistefa: Bi min waye divê em dû tiştan liber çav bigrin; ji wan yekemîn roşinbîr divê wirya bêt, ew wiryayîye ji bi mefhumêkî zanistî, wata li vê qonaxê têbigat ko têda dijît. Her weha li hemû qonaxêkî jî da hinde tişt heye divê ev roşinbîr bizanê; bo xewne dibînin yekêkî weku Ehmedê Xanî girîngtirîn karê qonaxêkî jîyana xo pêyeve bûwe ko wa hawar bike bo mîlletê Kurd û ew hemû mîr û beg û ewan kombibine ta dewletêkî merkezî yê kurdî dirûst bikirêt, hawar bo yekgirtîya neteweyê Kurd diket, bi vê jî mefhumî netewî yê kurdî bi manayî xo hênawete gorê.

Mana wî ewe ye, ev pêngave karibû li vê qonaxê da rolî xo bibîne. Duwem jî, ême xwêndewaraxan ji kevin va fikrê wan bo ewe neçûye xwêndewarî û roşinbîrî bi mesela komelayetî û siyâsî û aborîyê ve bibestineve. Evro dema ewe ye ko roşinbîr li nîgay komelê ve seyrî hemû tiştêk bike. Ko şihîr dinûsê, bizanê beşê komelgayî çend têda ye, ko şanoyek

pêşkêş dike bizanî beşê komelî çend têda ye, mişkileyî komelî çend têda ye.

** Beşêkî zor ê li berhemên ko cenabê te wergêrayete ser zimanê kurdî, em dibînin te girîngîyekî zor bi Yaşar Kemal daye. Hemû nûsinên Yaşar Kemal û ewane yê cenabê te girîngî pê daye bi zimanêk dike yê çîya ji kurdî, miwaleceyî ferhengê komela kurdewarî ne. Aya cenabê te li vê ruangeyê bayext bi Yaşar Kemal dawê yan hokarêkî dike heye ko xwênerî Kurd nizanê. Yaşar Kemal çi tiştêke, ko te piranîya jîyana xo bo wî terxan kirîye?*

Şikur Mistefa: Ez ji salên pênçîyan vir da kevtîme ser ewe ko wa nûsinê edebîyat, dibê tiştêk bê ko xelk hezî lê bêt. Ewê bi arebî û bi turkî jî ko min xwendine pitir li vê babetê bûn. Îtir birêkevt ko min romanên Yaşar Kemal xwendin, baskirina ji mîlletê Kurd pitir raya min kêşa. Min bi xo û kes û karê xo û gund û mirovên Kurdistanê li van nûsinan da didîteve. Belam ewe ew dinyaya ko Kak Kemal basê wê diket dinyaya min e, dinyaya xelkê bedbext e, dinyaya xelkan e ko weku bi xo dibê "asmanî mis e û zewî asin e", erzê herçend dike hîç bo şîn nabê, asmanî hîç lê peyda nabêt. Wata ewe yê dema min xwendîwe basê li mîlletê Kurd dikire, nek tenha mîlletê Kurd, bigre basê li sercem hemû gelê zulim lê hatiye kirin li dinyê dikir.

Bo evan serincîyan min rakêşa û bûne cîyê keda min.

** Yaşar Kemal ji layî xwênerê welatê me da, li Kurdistana Iraq û ew ên li Kurdistana Îranê jî ko bi vê lehçeyê, bi elîf û bê yê arebî dixwênin, pitir bi rêya Şikur Mistefa ve Yaşar Kemal nasîne. Wata xelk wa dizanî zimanê Şikur Mistefa zimanê Yaşar Kemalî jî ye.*

Mebasta min ewe ye, zimanê Yaşar Kemal zimanê turkî ye, li katêk da jî kêş û hewayê nûsinê û kesayetiyên Kurd in. Xelkê Kurdistan bi rêya Şikur Mistefa ve Yaşar Kemal dinasê. Dema zimanê Yaşar Kemal kurdî nebê, dibê wasîteyek hebêt da mîllet xoş bikarê wî binasê.

Şikur Mistefa: Bi daxê min ta êsta jî Yaşar Kemal nedîye. Tenha min bi wêneyî wî dîtîye. Bi gotina hinek biraderên ku wî dinasin ez ji wan hînbûme ko peyayêkî qisexoş û zor sade kirmanc e.

** Hoyî çîye ko we berêzan hemû temen û berhemên wî bi xo bo wergêrana karê edebî û roşinbîrî Yaşar Kemal terxan kirîye, ko te çi hewl da û ji ber çi nedixwest bibînî? Te hewl neda yan nedikarî yan nedivîyayî bibînî?*

Şikur Mistefa: Mebesta min nebûye bibînim. Herçende dû-sê carê jî çûme Turkîya û min dizanî li kû ye, her hewa li derveyê Turkîya jî min dizanî li Swêde, zor kesên jî li wê ve kaxizyan bo min dinûsin û digot ewe filan kes li vira ye. Hîç rojêk nehat xîyala min kitêbêk ji wav kitêbên min wergêrandine bo wî bînim. Bo wî xoşim nizamim li ber çi. Taqeta min nebû li rastî da. Pitir mebesta min kitêb û qise xoşeyetî ye.

** Zor karê rewşenbîrî yê cenabê te birîtî bûwe li wergêrana berhemên nûserê gewre. Pê şiyaye li biwarî wergêran da, li nav roşinbîrê Kurd da bo şayîyek hebûwe liber ewe hemû demî min bi xo bo wergêran terxan kirîye. Êsta dişê bêjî te karêkî baş kirîye?*

Şikur Mistefa: Hez û arezû fakterê girîng ê karkirina mirov in. Renge ew karên ko min li vê qonaxê da kirine hez ji wan kirîye.

** Êsta dawîya ew qonaxa dûrûdirêj e, tû ew heza çawan heldisengênî (dinirxênî)?*

Şikur Mistefa: Ew wext renga pitir ez bi xo bi edebîyat ve mijûl dibûm, belam ewe demeke dîsan li mêjû meylidarim, li tiştê dike navê. Tiştê dike jî hebû bikirê bi kurdî, belam bi daxê meseleyê azadî û şiyênî belawkirinê û tiştê wa girîftî dirûst dikir. Herçend min her tiştêk kiribe bo ko bibê girîft min belaw kirîye, yaxud min bo xo rêgayek bo wî dozandîye(şopandîye).

** Êsta li Kurdistan da, cûrêk li west-an û paşek jê li karê wergêran da heye. Wergêran zor kêmbûye. Eger eve bi layek liqêranî roşinbîrê kurdî dabinê, çareserîya vê li çi da dibîni?*

Şikur Mistefa: Her karêkî hunerî yan roşinbîrî, eger li ceribandina we da serkevtî bît, ewa bi min waye ev karê namir e û dirêjey dibê. Belam eger tiştêkî demî bêt û li pirr peyda bê û henaseyî kurt bê, regê temami danekutabê, ewe zû dibirêteve û dimirê. Ewe jî manaya wî ewe ye ko xelkekê xo mandû nekirîye, çunke karê çak mandûbûnî divê, mandûbûnî jî pêwerî karê çak e.

** Roşinbîranê Kurd, liber xerîk-bûnîyan bixwêndineweyê berhemî roşinbîrî, fikrî û felsefî yê bîyanî, pitir bi lasayî kirinê ve xerîk bûn, ewe jî waye lêkirineve ko bîrnekevîne. Tenanet li biwarî wergêranî jî da xelk bîr naketeve û xo mandû naket. Ji vê rûyê ve aya li nav roşinbîrê Kurdî da bi kêmasî roşinbîrê serbexo yê Kurd heye, yan têkeliyek roşinbîrêkê me li lasayî û destdirêj kirina roşinbîrê gelên dewrûber heye?*

Şikur Mistefa: Te basê fikir kir, fikir malê kes nîye, eftarî gewre li tarîx da

mork û nîşanê neteweyan pêwe dîyar nîye. Bixune Soqrat û Eflatun li meydana felsefe da, fikrên wan mûlkê hemû mirovayetî ye. Renge ê me jî zor mirovên me yê gewre hebûbê, belam bidaxeve ji ber ko ewan bi zimanê xo nenûsîne, karê wan çûye ser hîsabê xelkê dike ve. Egîna ê me jî melayên zor gewre hene bi arebî tiştan nûsîye û li meydana fiqehî îslamî û kalam da wan karê zor gewre kirîye.

Bixune (Beytuşî)yek me heye ko li (nihu)yî arebî da tiştêkî nûsîye ko hîç arebêk neşîyaye li wê astê û bi vê firewanîyê ji wî bîdiwêt. Ê me hemû tiştêk me heye, belam li ber ewê ko yanêkî sîyasî û hikumetan nebûwe, me neşîyaye weku xelkê şanazîyan pêwe bikeyn.

** Eger meseleyê nebûna dewlet belawe binêyîn, pêşiyaye bîrmendên gewre û ferhengêkî gewre yê me heye ko derneketîye?*

Şikur Mistefa: Belê hewandine û derneketîye.

** Evro jîyan liberdem mirovî Kurd zor qurseasteng gelêk zore, mebesta min ji astengê, her astengê dagîrker û bîyanî nîye, belku basê navxo dikim, basê dinyaya derûnî ya ferhengê komelê kurdewarî dikim. Ev komelgeyê ko hemane me naçar dike waha bîr bikeyneve ko ferhengêkî me yê gewre nîye. Bi dest ev kem û kurtîyê jî ve dinalênîn, ti pê dişê ko hemane dikarî pence bo ev tiştî dirêj bikey?*

Şikur Mistefa: Bi min waha ye hemû mîlletêk û komelgayeke mirovî li her qonaxêkî mêjûyî xo da bîrmend û pîyawî xo heye, belam renga mîlletêkê dike li rûyî jîyanî û fikrî ve li ewê dike pêşkevtîr bê, eve jî bi hoyên pêşkevtinî zamanê wê ve ko waha diket hemûyan

şanbeşanî yekdî hengaw nenêyîn. Încâ ewe bi manayî ew nîye ko ê me bîr û bîr-mendî me nîye, hemû tiştêk me heye, tenha yek tiştê me nîye, eger seqamgîrîyekî siyasî ya me hebê xelkeke fêrî ewe dibê ko pitir ji wê şer diket, bîr biketeve.

** Neslê we, neslê roşinbîran û nûser-an, ew ên ko êsta li nav mîlletê me bi pêçîyan diêne jimêrdin. Wata piranîya wan li nav meydanî pîrr tengîjîye li qeyranî roşinbîrî kurdî da, bûnêkî karê wan nîye, eve jî li demêk da ye ko cîgirên we jî bi dirûst nebûye. Ev dîyardeye nebûnî cîgir û dûrkevîniya roşinbîrên neslê ê we, li çi da dibînî, pê şiyaye eve çareserîyekî hebê?*

Şikur Mistefa: Pêşîye ewe amaje bi çareser bikeyn, dibê hokareyan dîyarî bikeyn. Wa dizanim zor aşkira ye, eger em li vê qonaxa mêmîyî da bişên şeyîn û lêhatîyî xelk kombikeyne, zor tiştî ji vê peyda dibê. Renge ev xoşardîneveye jî nemênit. Bo vê pêwîste bizanin nûserê çak û qîsezanî çak kî ye, mosîqajenî çak kî ye. Bixune(Mam Hêjar) yekêk şahir e, ewe her tiştêke li xuney Hejar, ew bo li vê meydanê bûnî nîye? Wata ti dibê xelk bibijêrî, emela yekî, layekî dîke hendê li gencan destê xo daye zor babetî wa ko renga sedan sal berê nûha li Awrupa hebûbê ko çi ewane taze bi taze dên basî ev tiştane dikin.

** Wa dizanî hatinî rewî fikrî cîyacîya -helbete ez nabêm çareserî bo kêşeya roşinbîran didozine, rewîtekin diên û derin û ewane yên ko resenayetîyan nebê zû dê winde bê- dîyardeyekî xerab e yan çak e, eger bi we xerab bêt ewa ferheng bi çi firewan û gewre bibêt?*

Şikur Mistefa: Azadî tiştêkî pêwîste, belam anarşîzm nîşanê nexoşî ye. Li pal

azadî da anarşîyetî jî heye. Bi min waye dibê cîyawazîyeke li nêvbera azadî û anarşîyet da hebêt. Pêwîste berevrûyê ev kesan bibîneve ko rastîyan weku wan bi xo nageyîştine xelk, çunke erkê azadî geyandinî rastî ye.

** Ligel ew kesê çi dikey ko azadî weku pêwîst bikar nahênê?*

Şikur Mistefa: Ewê ko wa li birêve-berayîyek da zêdeyî jî heddê xo derva û amanca wî tenha dewlemend bûne û vê karê jî ligel sirûstê karekî da naguncê, çi ligel dikirê? Li dewletêkî pêşkevî û zîrek û serkirdayîyekî siyasî ko dilê wî bi mîlletê xo û mêmîyekê disotêt çi lê dike, dibê ew jî waha lê bikirê.

** Mamosta eger li hemû warêk da dijrabêrî hebêt, lêpêçanewe li biwarî roşinbîrî da dibê her bi azadî û berengar bûnîya fikrî bêt. Li vê warî da lêpêçanewe çawan çû nîye?*

Şikur Mistefa: Ez bi xo nabêm bihênî darkarî bikey. Dibêm divê li xelk bigeynî; da bi ewe anarşîyetîyê û azadî waha nabêt û azadî jî ewe nîye.

** Ca rayekî dîke liser ev boçûnê cenabê te heye ko dibê li Kurdistan da neslêk peyda bûye, zor dinûsê û kêmdixwênête. Tû dişê eve yekêk li fakterên anarşîyetî bêt ko ewe jî ji wê ve dêt ko li mesele roşinbîreke baş ê wûrd nabêteve?*

Şikur Mistefa: Bi raya min wa ye, ewana pitir hez dikin derkevin û xelk basê wan biket. Bo min bi xo her waha bûye, belam girîng ewe ye ko sinûrêk li nêwan azadî û anarşîyet da dabindirêt.

** Belam bi ya te, sinûrê azadî jîbîrkirin û di jîyana taybetî ya her mirovêk da, çende?*

Şikur Mistefa: Azadî bi mefhumekê min ewe ye, ti mehkumî bi qewanînêkî cebîrî ew cihanê ko têda dijî. Bixune rojêk li rojan mirovek nedişê bifirrê, çünke dibê li (yasay kêş) dûr bê, belam ko şiya ew yasaya bidozêteve ewa ew dem bîr li wê dikateve eger hat û şiyar tiştêk dirust biket bifirrê û nekevête xwareve, ewa mana wî wa ye ew azadîyê dirust kir. Wata xo li yasa sepaweke rizgar kir, li vê derê eve azadî ye.

** Yasa rengbê liser dozandina vê yasayê ko êsta bahs dikir, komelê bîr û ray hebût, ko wata dibê biwar bo giftugo bihêldirêteve.*

Şikur Mistefa: Hîç manîh nîye û dibê biwar bo giftugo hebê, belam girîng ewe ye bişerr nekin û yekûdî tawanbar nekin. Nebêjin ew casus e û ew peyayê ew û ew e. Wate dema eve sûdî dibê ko ti bi xo li meydanî xo da azadî bikar bînî, belam girîng ewe ye bo dozandina rastîyan bikarî bînî.

** Ew şeweyî ko ti bo giftugo yê fikrî û roşinbîrî dadeynî, li nizîkê azadîya liber-alî ya fikrî ye, li mesailî fikrî da birrwat di liberalîyet da heye yan na?*

Şikur Mistefa: Lîberalîyetî li qonax û sîyaseta xo da, xo desepênê û eve jî bidest min û te nîye. Yan ti dê vegeî bo paşve û dabiran, evana bi xo dirust bûne û ne li deshelata min û ne li deshelatî te jî da nîye, belam radîkalîyet heye, dîktatorîyetî jî ko xo desepênê. Ev dîktatorîyetî bo çîye? Aya hîç sûdî heye? Carî wa heye dîktatorîyetî jî weku pêwîstîyekî lê dêt, bi vî manayê ko gelek car pêwîst dike komelga li berelayî û destdirêjî û gavên xerab dîr bixirêteve û rê nêdirêt ko rastî mirdar bêteve. Ko wata li vira da dîktatorîyet şerîyetêkî mējûyî peyda diket, belam nek bo heta heta ye, çünke

dîktatorîyetî heta heta ye, hîç amacêkî nabê.

** Rayek heye ko wa Şikur Mistefa li biwarî bîrpêbirinê da pitir bi layî felsefê marksîst ve ye. Ewe evro li serdemî bicîhanîbûn da heye, ewe ye ko dinya bûbête gundêkî piçuk û li gundêkî piçuk da jî giftugo û hawarkirin biseryektirî da karêkî asane. Carna heye ev giftugo û hawarkirin çareserîya zor xêre bo kêşeya gelan jî dênête arawe. Milletekê weku me û dostekaxanîn ko eger rageyandina cihanî karesata kemanî bi dinya negeyandibaye li wate bû êsta ew harîkarî û çetreman bo helnediraba ko hemane.*

Şikur Mistefa: Min nek her liser marksîyet, bigre liser zor tişt dixwênim. Liser hemû tiştêk ko ez jî wî fêrbûme. Rojgarêk min tesewif jî dixwêndeve. Bi min zor xoş bû, min jî wê kar jî dikir. Ez Kurd im û hez dikim weku ew mîlletên di bibim bi tiştêk, li marksîyet û tesewif û mela û şêx û axa û ... htd. Her kê bişên wa bikin ko rizgar bibim ewa ji wan memnun dibim.

Rolê Ronakbîrên Kurd li Karê Sîyasî da

Ferhad Şakelî

Li sereta dibêim bi mefhuma (Intellectual) ko elbete bi îngilîzî (Intellectual) ye dest pêbikim, ko man-ayekê wê di Kurdî da “ronakbîr” e. Li cîyê (Intellectual) têmekê (zaraweyekê) dîke jî heye, bi îngilîzî ew jî (Intelli-ge) ko herdukan li rûyî pênasayê (lexical) ferhengîyê ve cîyawaziyekî wan nîye, belam renga şîwênî bikarhênîya wan hinek cîya bê, yan mebest li wê ko “Intellectual” û “Intelligentia” çî ye, ji ber wê dê hendê cîyawazî (cûdatî) hebit. Evan cîyawazîyan çine û çawan zorî li ser naroyin, belam bi min waye “Intelligentia” ta radeyekî zor peywendîya wê bi ronakbîrên Rusya ve heye û li serdemêk da wek grupên çînekî bi jimar hatin. Elbete ji layê Frensî û Îngilîzan jî hatîye bikarînan, belam êsta li vî serdemî me da qasî ko aga min ji zimanê îngilîzî heye, (ko hinde aga min ji zimanê rusî nîye) li zimanê îngilîzî da “Intellectual” bûye bo wûşeyî (peyva) beramberî ewe yê ko evro em dibêjin “ronakbîr” yan bi gotina hendê kes “roşinbîr” û şeweyekî standardî wer-girtîye.

“Ronakbîrên Kurd li nav hemû ronakbîrên rojhelata naverast da, kemtirîn kesêk in ko qaluqîj dikin.” Mebesta min ji meseleyê ewe ye ko kemtirîn kesêk in dengê wan tête bihîstin (rengê ronakbîranê dîke yê milletên rojhelata naverast renga ta radeyek tête bihîstinê,

belam dengê ronakbîranî Kurd nayête bihîstinê). Elbete eger basê kesêk bikeyn bi we yê ko bêjin (dengî nabîstirê) yan (bêdeng) bi du şêwe lêk dedirêteve, yekemîn ewe ye ko eger bawêk bi van sîfetan basî kurekê xo biket ewa eve nîşaneyê başî ye; wata kurekî zor bi edeb e, belam li ravedana duwem da bo ronakbîrêk eva sîfetek baş nîye ko bêdeng bimînit. Bêdeng bûn û deng kizbûn û deng nebihîstina ronakbîrî bi hîç cûreyêk dîyardeyekî baş û pozîtîv nîye.

Baskirina ronakbîr bisîfetê (bêdeng) her wekî min gotî renga bo sîfetekî (negatîv) bêt, çünke li dinyaya evro da amadebûn, hebûn yan (representation) niwênerayeti kirin bo ronakbîr tiştêkî girîng e. Wate li nêv hev kêşê (pirsgirêka) sîyasî û ronakbîrên dinya ya evro da ye. Bûn û amadebûna ronakbîrê her milletek û neteweyek, meseleyekî ji arîyew peywendî bi jîyan û mirina ew neteweyê ve dibe.

Bêguman meseleya dîyarbûnî û dîyarnebûnî yan liberçavbûn û niwênerayeti kirina ronakbîrên neteweyek yan gelek li ser astê cîhanî, meseleyeke ko ligel sîyaset û ligel terazû û parsengî hêzên sîyasî ra bitevayî têkele û têkçirave. Wata em nikarin meseleya (representation) niwênerayeti kiran yan bûna ronakbîr li meseleyên sîyasî yan hêzî sîyasî da, yan parsengê hêza sîyasîyan cîya (cûda) bikine. Dîyare ko yekser em

gotinê ji sîyasetê cîya nakine. Eva pirsyarêk diête pêşve û ew jî eve ye ko aya sîyaset karê ronakbîr e? **Aya pêwiste ronakbîr bo derxistin û seldina xo sîyaset bikit?** Eve jî wa diket ko me li sereta da bigeyne ew dûrîyane yê ko ew bas dikey min peywendî pêre heye hem jî hemû ew basê ko li bareyê ronakbîrî û desthelat û sîyasetê ve dikirê, peywendîyekî rastewxoyan pêweye. Pirsyara ko zor aşkiraye, **aya ronakbîr sîyaset dikit yan nekit? Aya dibê sîyaset bike ya neke? Eger neke bo çi nekit? Waye eger sîyaset nekire be dibê nekit û eger kirî be, dibê bikit?** Evana meseleyên girîng in ko dibê bêt kolandin. Evan (Faktor) hokarêkî girîng li van hev kêşeyan da heye, meseleya (mass media) yan dezgeyê ragehandineke dîyare li wergeraye arabîyekê (wasaal alalam) rahatuye, belam zaravayê (mass media) bi temamî ev maneya negeyanê û maneyekî dîke yê heye û Fars pê(reshanehayî gruhi) renge hêsta evanan rêk û pêktir bêt. Meseleke meseleyê peywendî ye di navbeyna ronakbîr (mass media) yan dezgeyên ragehandinê da. Çinku dezgeyên ragehandinê rolekî yekcar gewre li gehandinê deng û reng û bîrûbawerî û helwêsta ronakbîr da bi xelk heye û eva jî geyandina peyamî ronakbîr e bi xelk, belam **aya ronakbîr dikare birastî bê ewe yê guh bidate hokarî sîyasî û peyamê ronakbîrane yê xo bigehîne xelkê?** Eva jî yek ji wan pirsyaran ê herî sextane yê ko ciwap dayinî asan nîye û bi tena lêkolîna wê asan nîye.

Li sereta da min gote peywendîya ronakbîr û sîyaset yekêke ji peywendîya herî aloze û birastî jî eve yekêke li wê beraneyê ko bi min wanîye hîç sextiyek bo ronakbîr hende zehmet bît "ew yê ko ez basê wî dikim wek (ronakbîr),

mebesta(armanca) min ronakbîrê rasteqîne ye û basê (zirre ronakbîr) nakim û li vira da jî mebesta min kesêkî dîyarkirî nîye, belam li rastî da herwek çawan li nav gelek warê dîke da tiştêk(zirr) yan naresenî heye eva jî di nav ronakbîran da ronakbîrên rasteqîne û yê nerasteqîne jî heye". Eger me li goşe nîgayekî mêtûyî ve temaşa bikin ewa dîyardeyekî zor seyr dibînin ko ev jî ewe ye li vê derê ronakbîr(dîyare mebesta min ronakbîrê kurde û carûbar hêndeyê peywendî bi çimkî ronakbîrê bigiştî hebêt ewa ew demê bas li yê giştî dikim, eger na bi taybetî nebêt min basê ronakbîrê kurd dikim), katê li rûyî mêtûyî ve li ronakbîrê kurd bikolîneve ewa derdikvê ko beşdarîyekî zor çalakaneyî li sîyasetê kurd da, kirîye. Ronakbîrê kurd li pê nav ew armancê da ko wî bi xo bawerî pê hebûye, li nav ew hêz û partî û grupane yê sergorepanî Kurdistan da karî kirîye. Her ronakbîrê kurd jî bûwe ko bi payeyekî gewre û nabêm bi pileyê yekem, belam biradeyekî zor hêzî sîyasî(hizbên sîyasî) geyandîye desethelat, wata girtine destê desthelat li layên partîyên sîyasî ve li mêtûyî kurd da (ko dibêm mêtûyî kurd jî mebesta min tenya evro nîye û bas li dirêjayî mêtûyî kurd dikim) bi sayeyê rolî ronakbîran ve bûwe.

Dîyare mebesta min jî bi destgirtina deshelat ji layê hêzên sîyasî ve bi mana dewlet yan hikumet nîye û bigre ewe yê hatîye cûrêk bûwe ji deshelat û nizik li deshelat, çinku kurd hemû demêk dewlet û îdareyê wan nebûwe, belam berdewam bi şeweyek deshelatî bidestve bûwe.

Li beranber ev karê ronakbîr bo hêzê sîyasî encam daye a xo dibê çi padaşt û xelatêkî binesib bû bê? Zor bi raşkawî û bi bê cîyawazî dikarim bêjim hemû jî naşukirî û nasupas guzarî bûwe, li vê

derê mebesta min ewe nîye ko tenya layenê negatîfeke bixeme rû, bigere hêzê sîyasî ta ew dema ko geyîştîye deshelat pêwîsî bi ronakbîr bûwe û dema ko celebê deshelatê girtîye dest, ewa ronakbîr ji bîrçûneve. Bo ewe yê bas dikim rêkûpêktir bêt û bikarin li yekûdu têbigeyin wata hûn li mebestî min bigeyn ez jî we têbigehim ko hûn çawa werdirin, pêwîste pênasê yê(Intellectual) ronakbîr bikeyn ko tiştêkî girîng e.

Bo pênasîkirina ronakbîr komelê zarave(term) hene, belam ew zaravane yê ko bo pênasîkirina ronakbîr bikartên ji yê zanistekî dîke kemtîre, herçende hemû ew pênasane zor li yekûdu ve nizîkin. Wata hemû ew pênasê yên ko min bo ronakbîr xwendine netemam bîstine dema digehîte biwarê mefhumî yê giştî ronakbîr ewa li yekûdî nizîk dikeve. Ko çi katê dêine ser hûrkirineve (Details)yî meslehan dibînin ew pêwîreyê ko bo diyarkirina ronakbîr yan neronakbîr bikar diêt û li heman demî da jî jihevûdu cîya dikateve, ewa li mîlletekeve bo şaristanîyetêkî dîke li komelgayek da bo komelgayekî dîke goranî bi ser da diêt. Wata pêwîrekanî diyarkirina ewe yê ko kê ronakbîr e, kê dikare ronakbîr bêt û kê divê ronakbîr bêt, digorin û li vê pênasan da cîyawazîyekê aşkera û berçav heye.

Hemû ev jî ko peywendî bi xudî ronakbîrê kurd û pênasêya wî ve heye, ev jî pênasêkî negorîne, çinku eger li rûyê mêjûyî ve seyr lê bikeyn ewa dibînin, ew pênasêya ko bo ronakbîrê kurd danirawê ew pêwîreyê ko ronakbîrê kurd pêpêwraye li qonaxên jîyana kurd da goranî biserda hatîye, bi watayekî dîke li serdemêk da yekêk bi pê hendê pênasê û pêwîr bi ronakbîr vgvcccc cccc-cxxxxxxxdanirawê, belam duwatir û li serdemêkî dîke da ew pênasêye pêwîr-

ane, helweşa û netewê pêwîr û pênasêyê dîke cihê girtînetewe.

Eger rûbare li ser mêjûyê ve temaşa bikeyn, ew zaravayê ko bo nêvhenanî ronakbîr bikar hatîye ta salanî (1920)î jî peyva (minewer) bûwe. Wata bi ronakbîr digotina (minewer), dîyare minewerî jî ew(Term) zarave giştîyê bû ko li împêratoriyeta Osmanî da nek her bi tenya li layen kurdî ve bigre layen mîlletên dîke jî ve bikar hatîye. Wata xelk ji xwendewar û ronakbîran ra gotîye minewer ko bi manayî(mej qif)î Arebî û (roşinbîrî) êstê yê Kurd bikar dihevdîrêt û mebesta min ewe ye ko (term) zaravayekî giştî bûwe û Kurd jî wek mîlletên dîke peyva (minewer)î bikar hanîye.

Pênasêyê kevn ê (minewer)an ew kesane ko bi minewer li qelem dirawin bi goreyê ew komale têkstê ko min xwendine çi têkstên ser bi kurd bît yan têkstî ser bi xelkê dîke yê nav împêratoriyetîya Osmanî, ber li hemûyan(melayan), feqîyên(dîyare ew feqîyên li xwendina bala da bûn ne ko ew feqîyên ko taze dest bi xwendina dînî kiribû), bo wan şêx û xwendewaran, sofîyan û derebegan gotine minewer (ronakbîr) û ev pênasêya ta salên 1920 yan dawîya sedeyî nozdeyan dirêj bûye û ronakbîr ew kesane girtînetewe ko mela û sofî û şêx û derebeg bûne. Di nav van kesane da jî carubar grupekî biçuk ne ko zor gewre, ji van kesên ko li xwendîngeyên binav modêrn ê Osmanî da dixwendibûna, hebû. Evan kesane bûn ko ser bi vê çînê giştîgoyî pêşû nebûn, belam li mektebê taze xwendînege yê Osmanîyan da xwendibûyan(bi taybetî jî layî me bi xwe ve reng bê hendê navê wek (rûşdîye)yan tiştî li vî babetê hebûbê) û li dezgayê kargêrî yê Osmanî da yan bitaybetî li leşkerî Osmanî da kar dikirin, xwedî payeyê serbaziye bûne. Evana jî her ron-

akbîr li qelem dirawin û bi tenya çîn û rastê pêşû ronakbîr nebûne, evana jî beşêk bûn ji ronakbîranên ew dem.

Dûbare her sebare bi (minewer)ê, Kurd her li destpêka vê sedeyê ve yan baştir wa ye bêjin her li dawîya sedeyê rebirdu ve ye hendî(Term) zaraveyî bo xo dirust kirîye. Dû jî van zaravane serincî rakêşaye ko zor seyr û li heman demî da jî zor ji yekûdî nîzik in, yekê jî wan ew zarave ye ko li Rojnameyê Kurdistan da, Mîqdad Mîdhed Bedirxan bikar hênaye û bi wê dibê (xwenda) û ev zaraveyê liber ronakbîr bikarhênaye ko bi xwêndina têksteke bo te derdikevê ko wa ye mebesta min bikarhênana ev zaraveye(ronakbîr) bûwe.

Pîremêrd(Hacî Tofîq Begê Pîremêrd) li jimara (3)yê Adara 1943-ê da, peyva (xwêndewar)î bikarhênaye, aşkira ye ko (xwendayî) Kirmancî û (xwêndewarê) Kurdîya (Kirmancî) Xwarû herdûkan bi manayî (Educated)yan (Literate)yê îngilizî dihêt, wata ew kesê li qutabxane da dixweyne û eve jî bo mana rasteqîne yê ronakbîr bikar nayêt, belam ewan ew zaraveyan bikarhênaye.

Li destpêka sedeyê bîstem da em dibînin komelêk ronakbîrê Kurd li Estembole in û bi navê meseleya neteweyan xebata sîyasî dikin, belam ewan her çende grup û rêxistinên sîyasî jî dirust kiribê, dîsan li pal ewan da kitêb û kovarên kurdî jî belav kirine.

Ewan dawîya vegerîna bo Kurdistan Xwarû ko pîranîya wan xelkê ev beşê Kurdistan bûn, rolêkî çalakane li nêv hikumetê Şêx Mehmudê nemir da bîni û hendêk jî wan li çarçoveya hikumetê Iraqê da em rolê wan dibîni ko her li wê serdemê da dirust bibûn. Nimuneya zor pêwîst bi navhênîyan nake mebesta me ew çend ronakbîrên ko jî salên 1920-an heta 1925-an li Kurdistanê gerane û beş-

darî li hikumetê Şêx Mehmud kirine, yan weku Tofîq Wehbî û Emîn Zekî Beg ko beşdarî li hikumetê Iraqê kirine.

Wênayê ronakbîrê Kurd firealî ye ko li vî sî-çil salên rabirdu da bi xo ve girtîye ev jî peywendîyekî rastewxoyî bi wê ve heye ko wa jimara ronakbîran zêde kirîye. Bo nimûne jî seretayê vê sedeyê heta salên 1920 jimara ronakbîran zor kêmbû, belam bi taybetî li vî sî-çil salên rabirdu da, jimara ronakbîrên kurd yekcar zêde bûye û evaya jî bi xo re pênaseyekî dike yê ronakbîrî divê û min her pênaseya kevn a ronakbîr wernagrim û pênaseyekî dike yê ronakbîrî dixime rû. Evaya li pêş da me bas kir, hokarêkî ew firelayenî bûwe û hokerêkî dike jî degirêteve bo bûnî ew rêxiraw û hizb û partî sîyasî yên ko beşdarîyê li xebatî rizgarîxwazên gelî Kurd da kirîye ev dû hokaran vana kirîye ko çemkî ronakbîr li vî sî-çil salên dawî da goranî bi ser da bêt, (fakter)ên hokarî yê sîyasî yaxud grupê sîyasîyan helumercêkî zor têkçir rijawe û alozî rexsandîye bi wê yê ko ev hêza sîyasî li rastî da, li sereta da hêza opozîsyon yan astengên sîyasî, belam dawîyê maweyek li siruştî astengîyê ve digorên bo hêza xwedî deshelat û ev goherîn jî li xo da karîgerîyekî zêde kirîye ser ronakbîr û pênaseya ronakbîr. Herwek li pêşîyê jî min got, hêza sîyasî ko li pêştir da astengkar, yan opozîsyon in û kelkî bi xebatkar û cengawerê sîyasîyan dadênê, her ko bûne hikumet (mebesta min ew pênc şeş salên dawî ye ko li Kurdistanê Iraq da û pêştir hikumet nebûwe) dibin bi xwedî polis û damûdezgayê îdarî û ... htd. û her hizb jî bendîxaneyî xo peyda dibê û ev jî diyardeyekî taze ye li siyaseta Kurd da. Li ber ewe bo pênaseya ronakbîrî êsta dikarin çi bibên? Ronakbîr bi giştî mebest li ronakbîrî û ewe yê ko xelk bi

wê navî dibin, ewan ên ko nûser, şaîr, (dîyare li layî me cîyawazîyek xistiye nêv van şaîr û nûseran ve), rojnamenûs û xelkê akademî ne.

Ewe min got bo ewe yê wek(crite-ria)yan pêwirêkî giştî bêt bo ewê ko em bikarin bîr li ronakbîr bikeyne ve li nêv komelgayî kurdewariyê da pênaseya ronakbîrî pê bikeyn. Têgeyîştina ronakbîran dananî pêwer bo ewê kê bi ronakbîr dabinêin yan kê bi ronakbîr danenêyîn nakirê bi hîç şeweyek li vê nîrx û çemkaneyî ko li nêv komelgaya kurdawerî da serdestin, dûr bixirêteve, wata nakirê dûr ji vê çemkane bîr li ronakbîrî kurd bikirêteve dibê bi berçavgirtina ev çemk û nerîta ehlaqî û ruhîyanî yê ko li nêv komelgaya kurdewarî da hene bas li ronakbîr bikeyn. Dîyare evana jî beşêk ji wan dibine hoyî sinor-danan bo ewê ko bizanin kê ronakbîre, herweha hatina şêwe dîtina Awrupayî û rojavayîyan bo nêv kurd, ew jî bo xo rolê li vê da bînîve ko kê be ronakbîr dadendirêt.

Tiştêkê zor dihna min rakêşaye ewe ye ko li nêv ew ronakbîran da, ew kesên ko xwendina teqaidî yan xwendina mizgeftan xwendîye bi ronakbîr nayête jimêrdin û eve jî bi layî min ve zor seîreve li dema amadekirina ev basê da min zor bîr lê kirîye, min zor jî dihnê rakêşaye.

Nek her evana bigre ewan ê ko li mektebê(nasêkular) yan neîlmanî da xwendine bi ronakbîr nayêtin jimêrdin û naxirêne çarçoveyî ronakbîran, êsta li vê pênasîye yê ko evro bo ronakbîr dikirê ne mela û ne jî şêx û ne jî sofî her çend xwendewar jî bin bi ronakbîr nayêtin jimêrdin, meger ewe yê li vê çarçoveyê da ji dînê xo dûr bikevne, cil û bergê xo jî bigorên ewca bi ronakbîr têne jimêrdin.

Ewe zor dihna min rakêşaye û bo ewe jî nimûneyê me heye û bi belgeve basî lê dikem, evana wata şêx û mela û sofî wextêk bi ronakbîr dihatin jimêrdin ko morek dînî û şeweyê taybetî yê wan lê dabimaldirê û da bê beşdarî li xebata sêkuler da bikeyn ca çi xebata sîyasî bêt yan ferhengî, eger li vana da beşdarîyê kir bi ronakbîr tête jimêrdin.

Ew nimûne jî ko dihênime hemûyan pak girawindêkî wan ê dînî heye. Mamosta Hejar, mamosta Hêmin, Cîgerxwîn, mamosta Cemîl Rojbeyanî û mamosta mele Micemedî, mele Kerîm her pêncîyan li mekteb û mizgeft xwendine û demek jî melayetî û feqeyatîyê kirîne, belam li ber ewe yê li kêş bi hawayî xo dabirawin û bi hemû şeweyek li wê dûr kevtinêteve dest bi xebatêk sêkuler a sîyasî û ferhengî kirîne, bi ronakbîr li qelem dirawin.

Ta ko rêzperêk ko berdewam bûwe liser melayetî xo û bi ronakbîr jî hatîye jimêrdin mamosta Eladîn Seccadî. Herwek em hemû dizanîn Seccadî yekêke li ronakbîrê herî gewre yê ev sedeyê me ye û bê ewê li melayetî dabibirê (bi min wa bû, ta ew rojê ko mirî jî her îmam bû) bi ronakbîr dihatê jimêrdin. Egîna hîç kesî ronakbîrên Kurd bi ronakbîr najimêrdine ta ew deme yê ko ew mercan têda bidî kirabê ko xebatêkî sêkuler ê sîyasî û ferhengî û ... hwd encam bideyn. Li nêv ew navan da dibê navêkî dîke jî bînim ko ew jî mamosta Mihemed Emîn Borzaslan e li Kurdistanê bakur ko mela bûwe, melayê duwazde îlim, belam ta ew demê ko mela miftî bûwe kes bi ronakbîrî nezaniye, êsta ko cayî xeyrî melayetî dipoşê û wek îmanan dijî bi ronakbîr tête jimêrdin û ew jî tiştêkî zor balkêş rakêşe layî nûserên kurd û hemû evan ên ko basê ronakbîrî dikin.

Li vira da pirsyarêk dête pêşve ewe ye, mirov dişê hem ronakbîr bêt û li heman demî jî da meyla wî bi layê dinî da hebêt?

Ew nimûneyên min pêştir basa wan kirin, orûjînerê ev pirsyar in çinku ko ti ewan bi ronakbîr nezanî dibê pirsyar bikeyn, aya kesêk herçend xwendewar bît dişê ronakbîrî û dîn biyekve kom-bikateve, ewe yekêk jî vê meselane yê ko dibê giftûgo liser bête kirin. Elbet li vira da mebesta min jî dîn, dînê îslam e, çinku jî layê kulturê milletên dîke ve ew muşkîleyet dirust nebuwe, tenya li navçeyê me da ew girifte jî wî ye ko ew xelkanê ko nîzîkin jî dîn bi ronakbîr li qelem nadirên. Bi watayekî dîke mebesta min ewe ye, ko aya dişê ronakbîrî û dînan û meyla dînî kombibêteve bibê ewe yê ew ko metirsî û rîskêyê bikevête ser ko xelk jî wî têngate û bi cidî werînegrin?

Eve dîyare encamêk ko bo wan dibên(westernîzation) wata texerub yan xerîbîyet yan peydabûna aqil û mefahûm û çemkî xerbî li nêv komelgayê me da. Dîyare ew çemkane yê ko li rojava ve hatîbe nêv me weku çemkî rût hatîbin egîna hîç binaxeyekî ne aborî û ne zanistî û ne teknolojî li Kurdistan da nîye.

Mebesta min li wê jî ewe ye ko komelgayê kurdî ew komelga nîye ko li pêvdangeyê aborî, teknolojî û zanistiyê ve weku rojava xelkê ser bi dîn in yan dij bi dîn in bixate nêv qalibê ewe yê ko ronakbîrê wan ronakbîr nîye.

Ew beyax û nîrxê ruhyanê yê ko li komelgayî ciyawaz da heye, li hendê barûdoxê taybetî da, gorînîyên zor asan nîye nakirê bi asanî cî bo wan leq bikirê. Bo nimune ronakbîrêkî kurd neşê ew nîrxê moralîyê(axlaqîyê) bîneretyane yê ko layenê ciyawazî nêv komelgayî kurdî yê pê komdibîneve, piştgoiyî bixat, dibê

bi bayexe ve jî wan birvanê û dibê bîr li wê biketeve ko ew nîrxane çine bo ewê bişê wek ronakbîrêk berdeyam bêt. Dîyare eger li komelgayî kurdewarî yekêk hevcinsbaz(homosexual), bêt zor zahmete bi ronakbîr li qelem bidirêt - dîyare li mêj da mebesta min jî wê kesî ye ko bi aşkira hevcinsbaz bêt û ronakbîr jî bêt- li rojava zor biasanî mirov dikare heman demê hem ronakbîrêkî gewre û hem jî çalakîrîn hevcinsbaz bêt.

Bêguman li nêv ronakbîrên me da jî henek ko hevcinsbaz in, belam bidizîyeve. Wata herdû tişteke(ronakbîrî û hevcinsbazî) li yek dem da bo koneki-raweteve û ev jî ewe degeheynê ko komelgayî kurdî da rêge nadidet ko wa kesêkî ronakbîr heman demê hevcinsbazêkî bi aşkira jî bêt.

Bi kurtî ronakbîr neşê ew nerît û beha exlaqî û komelayetî yê ko li komelga da hene, piştguyî bixat û evana dibîne sinorêk bo nasandina ronakbîr. Li vira da mebesta min nîşandana ew ciyawazî ye ko li nêwan komelgayê kurd û rojava û ew ciyawazîyên ko litêruanînî mirovî kurd û rojavayî bo çemkî ronakbîr, hene nimuneyek dihênimeve:

Zor ronakbîrê gewre yê Awrupa ko bîaşkira -çî êsta û çî li rabirdu da- hewcinsbaz bûne. Dîyare eve jî li Awrupa jî mêjûyekê dûrûdirêj nîye. Û digêrêteve bo seretayê ev sedeye. Oskar Wailled, ronakbîrêkî gewre yê Brîtanya bûwe û bi aşkira jî hevcinsbaz bûwe, belam li heman demî da liser vê, rastê girûgift û zîndanî kirinan bûwe li rabirdu da û li sereta da kes weku nûser yan ronakbîr hîsabê bo wî nekirîye, belam duatir ev behayane goran û êsta yadî (100) salîya mirina wî dikineve û navê wî birêzeve dênin û Oskar Wailld jî bibû bi yekê li herî kesayetî yî girîng ê ferheng(lîterator) û kulturî Awrupa. Nimuneyekî dîke

liser hevcinsbazzûna roşinbîr Andirê Jîd yî Frensi ye ko xelata Nobel ê sala 1947-î wergirtiye bi aşkira jî hevcinsbaz bû.

Dîyare exlaqê kesî pêwerêkî girînge bo roşinbîrî Kurd, belam bo milletên dîke ewe hênde girîng nîye, dîyare ew cîyawzîya ko min li vira basê wî kir, ev yeke li komelgayê kurdewarî ko li komele nîrx û behayekê exlaqî û ruhîye ve serçaveyê girtiye, nakirê bîr li wê bikirêteve ko kesêkî ronakbîr bi aşkira hawcinsbaz bêt, belam seyroke ji wê da ye ko komelgayê kurdewarî ewe qebûl dikat ko ronakbîrêk xwînrêj û peyakuj bêt. Wata cîyawazîyeke li vê derê destpê diket ko bi goreyî nerît û ew nîrxên ko li komelgayê me da serdestin ronakbîrêkî kurd bi hoyî berpirsyaretî û ew beşdarîya îdeolojî û fanatîkî ya ko wêrane yê ligel hizbek da dibikat, dikare beşdarê xebata sîyasî û çekdarî biket û li serdemêk da naçare xwîn birêjêt, peya bikujêt. Li vê derê da mebesta min li xwînrêjtin û peyakuştinê, xwînrêjtin û peyakuştina dijmin nîye, mebesta min ji xwînrêjtina xobixo, kurdî ye. Li vê bareyê ve zor nimuneyê me hene bi min waha bibê pêwîst nake navê kes bînim û mebesta min jî hîç hêzek sîyasî jî nîye, belam dizanim ronakbîrê weha jî hene.

Cîyawazîyeke li vê derê destpê diket ew kesê ko xwînrêj û peyakuje li heman demî da nûser û şaîr e, ronakbîrêk baş e li nav kurdan werdigîrê sererayî ewe yê ko hemû kurdêk dîzanê filankes peyakuj û xwînrêj e, mirovêke xelkê kuştîye destê wî bi xwîna xelkê sûr e. Eva bi eyb venagîrdirêt, belam ronakbîrêk hevtayî ew eger hewcinsbaz bêt bi ronakbîr li qelem nadirêt çinku nerîtê exlaqî û ruhî yê komelgayî bezandîye.

Eve tenya wek wêne dehênimeve bi bêyî ewe yê min helwîstî xo sebarek bi vê meseleyê derbirî bêt.

Beşêk dîke ko ji wî peywendîyê bas bikimeve heye birîtîyê li pak girawnedîyan paşxanî mêjûyî ronakbîr.

Eger li mêjûyî 200 ta 300 salên rabirdû yê Kurd hûr bibîneve ewa dibînin ême çend ronakbîrên me heye ko biser mêjûyî fikrî û sîyasî yê me ve dîyare yekemîn ronakbîrêk ko serinc radikêşê, Ehmedê Xanî(1651-1705) ye.

Ehmedê Xanî nek her ronakbîrêkî gewre ye, belku bi şeweyekê sîyasî jî bîrdiketeve, bidaxe herçend êsta beytekê wî libîra min nîye, belam pêyî wate ko Kurd dibê xwedîyê kitêb û merîfet bêt û wek ronakbîrêk bîr li vê meseleyê dikate. Ew hêvî û amancên ko Xanî heyeyetî zor li hêvî amancên milletekêve nîzik in û li munteleqî milletê xo ye ve bo tîştina diçêt. Xanî ronakbîrêkî firelayan e, şarezayekî baş e li zanîstekanî serdemî xo heye, li heman demî da peywendî ligel Emaretî Botan da hebûwe ko peywendîyeke sîyasî ye bi peywendî ligel deshelatî sîyasî da li qelem dedirêt, belam hergîz ew peywendîya wî peywendîyeke xoş û baş û dostane nebûwe. Wata li layek rexne lê digrê û layekî dîke ve jiber Kurd bûnî şanazî jî bi wî diket. Li vê derê da helwêstêkî dû layenî yê Xanî heye.

Xanî li rûyî geşkirdina fikrê neteweyî yê kurdî ve karîgerîyîyekî wî ya mezin heye bi bê hêç dû dilî û gumanêk, em dikarin Xanî bi bawî netewetîya kurdî liqelem bideyn. Ev çendî min netewetîya kurd li wê kitêbê da ko min bi xo îngilîzî bi navnîşanî (Kurdish Nasyonalism in Mam û Zîn)ve nûsîye, xistote ber bas û giftûgo ko nasyonalîzma kurdî çawan liser destê Xanî ve dakevtîye, belam dîyare awrupîyan bi hêç cûreyêk ev mefhumê me qebûl nîye. Munaqaşeyek min ê zor ligel (Martîn Van Brunese)î Holendî da heye ko kur-

dologekî maweyî(20) sal dibe aşnayetiya min û wî legel hev da heye, bi wî waha ye ko bîrkirina kurdî sebarete bi vê nasyonalîzma Xanî heye û Xanî bi wî xoş e ko paşayek hebê û welatê wî yekbixat ko li wê jî da mebest kurd nîye wek merivekî eşîrî bîr li vê basê dikateve. Biherhal ewe mefhuma awrupîyan e min hîç hêvîyek biwê nîye ko dibê ligel Kurdnasên awrupîyan da rêkevîn, çinku ez dizanim ewan çawan bîrdikineve.

Xelîfeyê cîgirê Xanî, Hacî Qadirê Koyî ye ko dîsan her liser bîrûbawerîyên Xanî berdewam bûwe, geşeyî bi ev bîrûbawerîyan kirîye mefahîmê nû yê taybet bi xo xistinete ser. Belî dibe ko Hacî Qadir (30) salên dawî yên temenî xo li Estembol jîyaye (min li jîyanî têgeyîştîye) û zor peywendîya wî ligel binemaleyên Bedirxaniyan hebûye ko li bineret da mîrê Botan in û her bi rêgeyê wan jî bûwe aşnayî ligel Mem û Zîna Xanî da peyda kirîye. Her eve jî bûye hoyê ew ê ko bîra netewayetî li layê Hacî Qadirê Koyî da peyda bibê. Min li şarêk da qise dikim ko peyayêkî weku mamosta (Meshud Mihemed) komelêk tiştî liser Hacî Qadir nûsiye û min herçiyek bibêm qet nagate perawêzî qiseyên we berêzan, belam ewî jî cextî liser ewe kirîye ko Hacî Qadir li ber ewê li Kurdistan derçê ew çemk û bîrkirinewane yê nebûye duatir li Estembol peydayî kirin û ew jî diya bi rêgeyê binemale yê Berdirxaniyan û nasîna Xanî ve bûwe.

Hacî Qadirê Koyî cext liser eve diket ko bo Kurd bikarê welatê xo yê wata Kurdistan rizgar biket dibê li rûyê serbazîyê ve amade bin û xo yekperçe û tifaq biken û bixwênin. Eve ew mercin ko Hacî Qadir bo rizgarîya Kurdistan dînan wata rêxistinî, şerê çekdarî û zanyarî ye. Herwek dibê "esbabî şer peyda bikin top û tîfing û hawen".

Li cîyekê dîke jî da basî li wê diket ko pêwîste mîlletan kitêb û rojname.. htd, hebê û pêwîst bi wê nake nimune jê bînime, bi min wa bî, piranîya we bi Hacî Qadirê Koyî agadarin sebarete û çemkekani heye.

Xalêkî dîke ko girînge û pêwîste li vê derê da bas biket ewe ye ko li rûyê zemanê ve dikevête pêş Hacî Qadir, belam liber ewê cîyawazî ligel hêla Hacî Qadir û Xanî da heye bi cîya bas dikim û ew jî gerîna hezretî Mewlana Xalidê nexşibendî ye bo Kurdistan. Mewlana Xalid li 1779 da jî dayik bûwe li 1827 da wefat kirîye. Gerîna Mewlana Xalid bo Kurdistan û damezirandina tarîqetê Nexşibendî mucedîdê ko dawîyê liqê Xalidî jî lê bûwe wata ew liqê ko Mewlana Xalid bi xo li Kurdistan damezirandîye navê wan ne(Xalidî ye), ko sê liqê wî hene (Mucedîdye), (Nexşebendî) û (Xalidî ye) ew jî yan baştir waye bêjine Mewlana Xalid û tarîqetê wî karîgerîyetîyek yekcar gewre yê ronakbîraneyî bi ser komela kurdewarî da hebûwe. Ew çemkane yê ko Mewlana Xalid hênanî û ew karîgerîyetîya sîyasî yê ko Mewlana Xalid li rojhelata naverast û tena ne li dereveyê rojhelata naverast jî hebû, ew hende gewre ye ko dibê bitaybetî bas li wan bikirêt nek bi vê şeweyêk ser pêyi, belam min tenya wek nimune dihenimeve.

Eger serêk li şoreşên Kurd bikeyn dibînin li beşê cûrbecûre yên Kurdistan da, sê gewretirîn ew şoriş û raperînen çekdarî û sîyasî yên ko Kurdan kirine, serkirdayetiya wan ser bi tarîqetê nexşibendî ê Xalidî bûne, evana jî Şêx Ubeydulahî Nehrî, Şêx Seîdî Pîranî û binemaleyê Mela Mistefayê Barzanî nin ko her sisêyan ser bi tarîqetê Nexşibendî û beşê tarîqetê (Xalidî) ne.

Hemû evana rolêkî wan ê zor gewre li raperîn û bizûtneweyê rizgarîxwazên Kurd da bûyîye. Li biwarî ferhengî û roşinbîrî jî da kesên ser bi vê terîqetê rolêkê wan a gewre hebûye. Xoşbextane li van rojan da kitêbêk min bi navê (Naqshbandîs) Neqxşîbendîyan bi îngilizî belavbûye ko min têda gotarêk li bareyê binemala(Sîracedîn) ko bi navê şêxê nexşebendîyên Hewraman tete nasîn nûsiye, belam her li wê min dîrûdîrêj basê rolê terîqetê nexşîbendî kirîye li Kurdistan da û ewên dî yên ko peywendîya wan bi jîyana kulturî û roşinbîrîyê ve hebê xiraweterû û min nimuneyên zor jî li wê bareyî da hênanewe.

Dawîya gerîna Mawlana Xalid ew kar daneve xêra wî ya ko berçave ewe ye, yekser ji dûla ve dikevête nakokîyê, bi layek ve ligel hendê mîrîtiya Baban da (nek ligel hemûyan da) û be taybetî ligel Mehmed Paşayê Baban da ko navbeyna wan zor naxoş bûye ew navbeyn naxoşîyê jî obala wê li estûyî Mehmed Paşa bûwe û li layekî dîke jî ve ligel rêberên-terîqeta Qadîrî da ko li wê demê da Şêx Marîfê Nodêyê niwênerê herî dîyar ê terîqeta Qadîrî bûwe.

Berê ko Mawlana bigerêteve, terîqeta Qadîrî li Kurdistan da, terîqetêk damezirandîye ko pêgeyek wê yê firewan li Kurdistan da hebûwe.

Bidilnîayeve gerîna mewlanayekî çalak û pir li hêz û cûle bûwete mayeyî metirsî çî bo mîrekên baban û çî bo terîqetê Qadîrî. Liber ewe em dikarin li paşxan û zewîneyê ew nakokîyê têbigeyn.

Tîştêk li vê derê da, li rûyê ronakbîrîyê ve û ew ên dî yên ko peywendî bi Mawlana Xalid ve heye girîng e, ew munaqêşe ronakbîrîyê dirust bûwe nek ew munaqêşe şexsî yê ko hebûwe li nêv

wî û xelkê dîke, yan Şêx Marîfî Nodê da. Eger hun jîyana Mawlana Xalid bixwênîne(herçende min ne jimardîye) bi min wa ye nizîkê (20) kitêb li wê serdemî da nûsrawin ko beşê herî zêde yê wan Kurd nûsiwinî û her hemûyan jî giftûgo û munaqêşe ne, ko yan cuên danin bi Mawlana Xalidîyan li dakokî-kirin li Mawlana Xalid dinûsrawin.

(Debate) yan ew basê fikrên ko kirîye hokarekeyên gerîna Mawlana Xalid bûwe bo Kurdistan û eve li rûyê fikrî ve zor girîng ko komele basêk bi şeweyî ronakbîrane munaqêşe bikirên û dest bo tifeng nebirdirêt û bi şeweyî giftûgo nûsîn bêt.

Eve jî sersembûnîyeke li ber sedem ew hende sale karîbê li Kurdistan da munaqêşeyek fikrî bi rêya nûsînê ve bikirê, herwek hun dizanin dawîyê Mawlana Xalid bû bi hêzekê gewre û terîqetê Nexşîbendî bû bi gewretirîn pêge û firawantirîn terîqetê Kurdistan û bi kirdeve terîqetê Qadîrî xiste alî terîqetê Nexşîbendî û bû terîqetê yekem li Kurdistan da û êsta jî her ew pêgeyekî maye jî, belam karîgerîyatiya terîqetê Nexşîbendî li Kurdistan da bitaybet li biwarî kulturî da li gişt terîqetên dîke pitir karîgerîyatiya Mawlana Xalid û terîqetê Nexşebendî ko ez li vira da Mawlana Xalid weku nimuneyê ronakbîrêkî dînî bas dikim û mesele tenya terîqetêkê nîye û di çarçoveyê basê ronakbîrî da basê Mawlana Xalidî jî dikim. Terîqetê Mucedidî, Xalidî û Nexşîbendî ko Mawlana Xalid hênayî karîgerîyatiya wê tenya li Kurdistan da nemaye(komelê tuêjîneweyî baş heye ko reng bê, pêwîst bibe nekat ko bi dîrûdîrêjî jî wan ve biduênin, belam basê karîgerîyatiya xelîfeyên Mewlan li Endonizîya diket. Li Endonizîyaya evro da komelê xelîfeyê mewlana Xalidî lê ye ko ta êsta jî li

jîyana sîyasî û kulturî yê Endonizîya da çalakî daniwênin -li başûrê Efrîqya komelên li xelîfeyên Mewlana Xalîd hene û êsta jî çalak in çî li rûyê sîyasî ve çî li rûyê kulturî ve- li Daxistan bi min wa bî em hemû ew Şêx Şamîlî dinasin ko Resul Hemzetof li kitêbekê xo da basê wî diket, ew meriv yekêke li xelîfe rastewxokanî Mewlana Xalîd e -li Çeçanîya evro ko beşêkî zor ê ew şerê rizgarîxwazîyê ko li wê dikirê peywendîyek wî yê rastexoyî bi Mewlana Xalîd û xelîfeyên Mewlana Xalîd ve heye- li Bosna û Hersekovînya, min bi xo komelê xelîfe û mirîdên Nexşebendî dîtine ko ser bi hezretî Şêx Usmanî Nexşebendî Sîracedînî duwem bûn û li wê beşdarê sîyasetê welatê xo da beşdarî diken- mebesta min jî wê ewe ye ko karîgerîyetîya Mewlana Xalîd her li Kurdistan da nemaye, Mewlana Xalîd bû bi rêberêkî cîhanî û rêberêkî Kurd ko karîgerîyetîya wî biser cîhanê ve bû, belam bidaxeve dîyare Kurd kemtir aşneyetî. Renge bi we seyr bêt eger bibêm li Awrupa bidehan û sedan rastê lêkolînên qewl(qull) û bipêz(ewendeyî min agadarbim) bi îngilizî û liser Mewlana Xalîd hatîye nûsîn û belnîyayîyeve êsta ko xoşbextane profîsor Hamîd Alger ko ew bi xo îngiliz e û xelkê xwarûyê Lendonê ye, bûbû misilman û profîsorê rojhelata naverast e li zankoyî Bêrdkayî li Kalîfornîya, kitêbêk bidest wî da ye li ser jîyanî Mewlana Xalîd. Min bi xo pêrar li Estembol dît û çend rojêk em bihevra bûn û reng bî li van çend mangan yan li van rojan da belav bikirête û dîyare bidilniayîyê ve wênayekî baştir ê Mewlana Xalîd dida be Kurd. Dikire li biwarî karîgerîyetîya kulturê Mewlana Xalîd biser komelgayê kurdîyê ve çend tiştêk bas bikeyn.

Wek hun jî dizanin sê şairî me yê

gewre yê sofî hene(herçend şîrên me zor in), belam bi min waye şairên sofî di pileyê yekem da Melayê Cezîrî ye, Mewlewî(Seyid Abdurrehmanê Tawegozî), dû jî wan serbe Mewlana Xalîd yan xelîfeyên Mewlana Xalîd in. Herdûyan çî Mehîwî û çî Mewlewî li sereta da xelîfeyê şêx Sîracedînê yekem bûne, dîsan bi hoyî terîqetê nexşebendîyê ve, yan bi hoyî nîzîk bûnîya li xaneqayê nexşebendîyan da rolêkî wan ê gewre dibînin û ronakbîrên gewre şîyan lê derçûwe.

Her bo nimûne basî mela Hamîdê Katib (1802-1892) dikeyn ko ronakbîrêkî zor gewre bûwe û melayê şêx Osmanê Sîracedîn bûwe û beşêk jî vê karê girîngane yê kirîye ewe ye ko şerhêkî dûrûdirêj liser (mijnuuyî û mihnuuyî) Celaledîn Romî nûsîye, herweha şerhêkî liser (gelşin razê) şêx Mehmudê Şebisterî nûsîye. Kitêbêkî dike jî heye ko li cem min bi xo bidestnûs heye binavê "Rîaz Elştaqîn" ko ewe pitir bîyografîyeke di bareyê şêx Sîracedîn û Mewlana Xalîd da.

Înca tême ser kirokî baseke ko rengbê li hemû yê girîntir bêt û ew jî ewe ye(Intellectual)ê Kurd yan ronakbîrê Kurd li nav torêk da ye çawan kevtîye nav ew toreve. Bi edet wa ye li layê me dema bas li ronakbîr tête kirin dihat gotin(Conscience) wîjdanî mîllet, dîyare ev nav bo çî bo wan (Intellectual) ronakbîr danîneve. Çinku wan weha çaverê dikirê ko ronakbîr wîjdanê gelekê bêt bo vê ev navî lê danîne, aya ronakbîr vê rolê dibîne yan na, evana meseleyek dike ye, belam(ronakbîr) çaverê dikirê wê rolê li komelgayê xo da bibînet.

Eve jî dîyare peywendî bi wê heye ko wa ronakbîr ligel mîlletê xo da dijî û helgirî ew xwedî hevî û amancêyeke ko layê mîlletekê bi çavê tiştêkî pîroz seyr

dekirên, belam dema ko em dibêjin wîjdan divê cûreyên wîjdan liber çav bigrin û çend cûrêkî cîyawaz yê wîjdan heye, wîjdan heye zindî ye, wîjdan heye çalak e, wîjdan heye azar dikêşê ev têrmên sofîyan in ko wîjdan bédeng nabêt, ew bi bîra me dixête ko beşêkê li ayetêk quranê da heye û beşêkê dikey li nav têrmê sofîyan da heye û ew jî têrmî (nefs) e.

Nefs xwedî manayekê taybetî ye li cem sofîyan da, nedikarim pênaseya (nefs) bikim, belam rengbê pênaseyekê sofîyaneyî bîkrê ko dibên hendê tişt bizewq dekirê nek bi aqil, zewq û aqil cîyawaz in û li basê (nefs) da dibên(5-6) pileyê nefis hene û nefisê emare, nefisê lewame, nefisê mutemeyîne, nefisê razîye û nefisê merzîye. Evana çend pileyekê cîyawaz ê nefis in, elbete sisê yên dawîyê li ayetêkî quran da hene. Belam nefisê emare li şiwênî dike ji layî sofîyan ve bas ji wê hatiye kirin. Dibê ew berawirde ligel ronakbîr da bikirê çinku ronakbîr (nefsê) wan wîjdanê mîlletêk e, wek min gote wîjdanê zindî heye, wîjdanê çalak(activ) heye, wîjdanê azar çêj heye, belam wîjdanê bédeng na. Bi min waha bê liber ew pile cîyawazane yê wîjdan, ewe yê ko caran pê digotina wîjdanê mîllet, êsta kirîye bi dengê mîllet, wata ew pênaseyê ko (10-20) sal pêş êsta dehan kire, dehan gote ronakbîr wîjdanê mîllet e, êsta bi şeweyekê dike tebîrê lê dikirê û digotinê, ronakbîr dengê mîlletekeyetî ye. Rûbarî ewe jî ko dibên(ronakbîr dengî mîlletekî) ye çaweruanîye yê ko xelkî li ronakbîr heyetî, belam (contrast)yan nakokî ye ko li vira dest pê dikat ko ronakbîr çawan dikarî deng û wîjdanî mîlletekê bibêt?

Û li wê demê da dibê helwêsta wî li beramber sîyaset da çawan bê?

(Çinku wek hun dizanin mîllet berê hemû tiştî çavê wê li sîyaset û desthelat

e) dibê ronakbîr çi biket bo ewê bikarê dengê mîlletekî bibêt?

Li rabirdû da em dibînin Hacî Qadirê Koyî û Ehmedê Xanî dengê mîlletê xo bûn, bo nimûne Xanî mewdayî nêva xo wek şairêk û mîrê Botan wek desthelatdarêk dibînê û basê têdegan. Helwêsta Xanî helwêstêke rexnegirane ye, eger çi herweku min got hendê car rexneyekê nerm e.

Hacî Qadir li jêr deshelatêkî sîyasî da nejîyaye renga bihukmê ewe yê ko ew bi xo xelkê beşêkî Kurdistan bûye li beşêkî dike yê Kurdistan da jîyaye, rasterast rûbirûyê deshelatîya sîyasî nebûye. Renge ew dema ko li Kurdistana Îraq bûwe rûbirûyê niwêneranî desthelat (axayan û şêxan), nek deshelatê rasteqîne bûbîteve, belam li wê bîst salên dawî temenî ko li Estemboj jîyaye rûbirûyê deshelat nebûye, yekcar nebê ko basê mîrêkî Kurd (Yezdan Şêr) diket. Ew jî bi vê şeweyî dibê bîstîme ko mîrêkî Kurd maye binavî(ew navekê rastewxo nayanê) Yezdan Şêr û eger Kurd hêviyekê mabên, eger tiştêkî bo Kurd bikirê ewa Yezdan Şêr dikarê biket û tenha ew care ye basê mîrêkî Kurd diket, ewe li kitêbekê mamosta Serdar Hemîd Mîran û mamosta Kerîm Şareza li laperê(92) da bas wî kirîye.

Wek min gote ew çaweruanîyê ko ronakbîr çawan bikarê dengê mîlletekî bêt û rola wî jî li rûdawekanî mîlletekî da bibînê, çaweruanîyeke ew mefhume jî dida ko dibê ronakbîr beşdarî li sîyaset da jî biket. Ronakbîr endamêkî komelgayekê ye, xodîyê wîjdanêk zindî ye yan yekêk li pileyên wîjdanê wî heye ko hest bi azar û naxoşîya mîlletekê diket û li beramber ewe jî da dibê berpirsiyarîyetî hebê, belam dîsan carna wa heye ev barudoxe wa li ronakbîr diket ko bédeng bêt yan helwîstê cîyawaz derbîbirê.

Eger ronakbîrêk bîewê berpirsîyarîyetî ya xo qebûl biket û bîewê beramber bi komelga û neteweyek berpirsîyar bêt, ew bê guman ligel sîyaset da rûbirû dibêt, biwatayekî dîke eger bîewê berpirsîyaretî hebê ew nikarî li sîyaset û deshelata sîyasî û pêgeyê sîyasî dûr bikevêteve, eve naxoştîrîn erkeke dikevête serşanî ronakbîrêk. Çinku li layekê ve wîjdanê wî pê dibê berpirsîyar bêt û kar biket û dengê mîlletekê bibêt û li layekî dîke ve rûbirûyê sîyaset û deshelatîya sîyasî dibêteve. Li vê pêyê nexoştîrîn helwêst ew helwêst e, ko ronakbîr rastê sîyasetê dibêt.

Bo ewê ko ronakbîr berpirsîyaretîya xo wergirêt dibê li sîyaset nîzik bêtewe û li heman demî da dibê ew nîrxên ko heyatî bêt wan biparêze, çinku komek nîrxan li layî ronakbîr dirust bûwe û dirust dibê û ew neçare ko biparêze, ewe çawan dikirê?

Çinku vê demê dibê ronakbîr pak bêt, belam li ku? Li nav fezayekê sîyasî ya pîs û bogenda ronakbîr dibê li nav sîyasetêk pir dirû û sexte da, rastgo bêt ko ewe zor zehmete, belam ronakbîr dibê ev dûane biyekve kombikete bi şeweyek ko ji layekî ve bi xo rastgo bimînête ji layekî dîke ligel xelkê da helsukewt diket ko dirûtî û nerastîn ronakbîr dibe destpak bêt, belam li nav komelêk da dijît (mebesta min sîyaset e) ko diz be mijûlê dizîye û berdewam dizî li xo û mîllet û xelkê dîke diket, manewî ronakbîr divê resen(orjînal) bêt, belam ew li nav xelkêkî muzeyef da dijît û ewe jî dîsa rûbirûbûneweyekî zor naxoşe û li dawîyê da jî her sebare bidest pakîyêve, ronakbîr divê dûr bêt li bertîl xwarîyê ve(corruption) ev zaraveyê (corruption) tenha bi mana yê bertîlê nîye, mana yê dîke jî heye. Ronakbîr divê pak û xawênî û destpakîya xo li nav komelêkî bertîl-

xwar da, biparêzit.

Evana hemû ew nakokîyan in ko ronakbîr li helsukewt ligel sîyaset da têsîyan dibê û bi van tiştan ra rûberû dibêteve, belam dîsan jî eve her heman pîrsîyar dûbare dibêteve ko madam ronakbîr hest bi wîjdanê xo û berpirsîyaretîya xo kir, çawan dikarê li vê komelgayê dûr bikevête ko nekaribe li wê derkevêteve? Bi layekî ve eve waqîhî komelgayek e û ji layekî jî ve neçare helwêsta xo biparêzêt ko zor zahmet e, asan nîye.

Li seretayî eve rengbê ronakbîran komele xelkêkî dîyar kirin û bê deshelatî dîyarkirabin û biasanî bizanêt ko ronabîr kî ne, belam beramberê wan kî ye? Min bo ev beramberî wûseyî/peyva(flock) bikarhênaye ko mana wê kertêk sîyasetmedar li beramberî westa ye ko herçî sexte û dirûyî dinya ye dizanin, belam ronakbîrek eve nezanê belayê min eve amanca ronakbîr ne ewe ye û ne dibê ji deshelat û çemkî deselat dûrbêt. Herweha nabê li perawêzî deshelatî jî da bisûrêteve, egîna ew demê ko bikevête nêv ew çuwarçeweyê, zor li mercên xo didorênê.

Çinku her hengavêk ko berve deshelat bîye biqeder ew hengave li wata û nîrxên ronakbîrî dûr dikateve.

Eger bigîştî qise bikeyn mebesta min kes nebêt, sîyasetmedarêk dikarî guhê xo nedate nîrx û bûhayên bawî nêv komel, çinku ew pêyî wa ye deshelat nake amancîyetî û hewl jî didat û bo geyîştina bi vê amancê jî dikarî hemû rêgayek bigirête berve hemû wesîlekê jî bikarbênît, belam ronakbîrêk nedikarê ewe biket.

Ko dihma xo bidine ser taybetmendîyên ronakbîrê Kurd ewa hendê taybetmendî seyr li ronakbîrê Kurd da dibînin ko dibîne xweyî qurs bûnî erkekê. Ew taybetmendîyan birîtin li wê ko ji layek ve dibê opozîsyon bêt û

beramber bi dagîrkeranê Kurdistan rawestê, bibê kot û merc -mebesta min ewe ye ko dibê dijî ew deshelatan bêt ko Kurdistana wan dagîr kirîye- her weha nabê saziş liser ew prensîb û binemayan biket, ko çî sîyasetmedar dişên wa neket û bipêçewaneyê ronakbîr helwêst wer-girê. Sîyasetmedar prensîpêk wî heye û dibêje(dijminê dijminê min dostê min e), belam aya ronakbîrêk dikare weha bibê-je? Bi min waha bê yekêk ji gunehê gewre yên ronakbîr ewe ye ko wek sîyasetmedar bibîrbiketeve û bibê "dijminê dijminê min dostê min e", evana bo sîyasetmedar diguncê çinku munteleq û amanca wan cîyawaz e, belam bo ronakbîrêk naguncê ko bibê "dijminê dijminê min dostê min e", eger weha bike ji mîlletê xo dûr dekevête.

Herweha nabê dostayetiya hêzên împeryalîzmê jî biket çinku bimanewî û nemanewî û nakirê hêzên împeryalîstan doyênî û evro bidostî mîlletê Kurd liqelem bideyn. Sîyasetmedarê Kurd zor bi rêkûpêkî û cuwanî qalibêkî têorî didozêteve û ew împeryalîstê ko ta doyênî ew pêyê wa bû bi pêyên xo cîhan û dinya dagîr diket evro bi dostî dizanê û zor bi çakî jî tewqeyî ligel da diket û dibê bi dostî jî, belam eve karê ronakbîr nîye û nabê bihiç corê sazî jî ligel hêzê împeryalîstan û dagîrkeranê Kurdistan da biket. Dema ko ew sazîyan ligel da biket ewa ew sazîye liser hîsabê ronakbîrîyê li xo binêre, bi xo pê li bawer iyaên xo dîke.

Erkêk dîke yê ronakbîrê Kurd ewe ye ko divê li beramber hêzên sîyasî yê navxoyî da opozîsyon bêt, çinku eger bivê wek ronakbîr bimênêteve divê li berhelstkarî da bêt. Eve jî diya girîftêkî gewre bo wî dirust diket, çinku ew (ronakbîr) eger bivê ligel mîlletê xo da bêt ewa dibê bi pê havkêşeke liberamber

deshelat rawestê. Li vira da divê tişteki ronî bikime ew jî ewe ye ko yên (opozîsyon) berhelstkarî bi manayê dijminatî nîye û renga li vira va wergîrabêt, belam li welatên dîke bi mana berhelstî ew sîyaseta ko peyadeyîya deshelat dîke û li heman demî da bişewazêkî aştîyane û dîmokratîk û parlementerîyane hewlê dideyn deshelat bigirête dest xo û bo vê yekê ew bi xo bernamêyê xo peyade biket.

Înca eger ronakbîrêk biçête rêza deshelata sîyasî ewa bikireve liberamber mîlletê xo diwestê, çinku bi min wa ye deshelat û mîllet yekbigrêteve bi degmen û tenanet li dîmokratîkkirina rejêmê da jî deshelat û mîllet dû tiştê beramber bi yekudî rawestawin.

Eger ronakbîrêk kurd beramber bi deshelatiya xo ya sîyasî raweste binavê ewe ye ko bergirî li mîlletê xo diket -aya wê demê ronakbîr jîyana wî dikevête metirsîyê ve, mîllet piştevanî lê dîkin yan na? Cîyawaziya ko li vira ve destpê diket, ronakbîr wîjdanêkî wî yê zîndî heye û li demêk da ko bi min wa ye li beramber mîlletekê berpirsîyar e û neçare opozîsyon yan berhelstkar bêt, morî dijayeti ya deshelata sîyasî lêdîdirêt û bi vê pêyê renga bo xwînê jî birijênêt û xwîna xo helal bikirê, belam aya ew mîlletê ko ronakbîr piştevanî lê diket û xo bi parêzer û piştîvanî dizanê, dakokî lê dîken? Li rageyandinê da dibê bibêjin mîlletek piştevanî lê nakin liber hendê hokar ko li wana dikarin basê pileyê xwêndewarî, pileyê agayî û aşnayeti ligel prensîpê demokratîyê bikeyn ko wa li mîllet dikeyn ko neşê dakokî li ronakbîr biket, yan jî rengbê mîllet li ber bêdeshelatî xo bêt ko neşên piştevanî li ronakbîrê xo biket.

Belam dîsan jî dibê ewe dûpat

bikimeve ko eve bi hîç cûreyêk nabê bi serpeşî ewê ko ronakbîr xo ji wê erkê ko heyetî bêt bidizêteve.

Digehême ew serencamê ko ronakbîr dibê(dessident) berhelstkar bêt li nav welatê xo da yekêk ji vê helumercê here naxoşîyên ko ronakbîrê Kurd li van salên dawî da rûbirû bûwe ewe ye ko peywendî bi şerê Kurd kujîyê ve heye. Ew pîrsgirêka sîyasî ya ko dirust bûwe bişêweyek bûwe ko dûlayanê sîyasî dijbiyek birawestî û eve jî hende merc diêne pêşve ko gîrûgîrîftên zor gewre ji me ra derbirîne helwêsta ronakbîrane da dirust kirîye yan bi watayekî dî ronakbîr nezanê çawan helwêst wergirê yan bê helwêst bêt.

Ez bi xo geyîştîme ew qenatê ko hendê car bê helwêstî liberamber ev meseleyê da baştirîn helwêst e. Bê helwêstî nek bi wê mana ye ko ti hîç rayekî liser meseleyan nebê û ta ser êsqan dijî şerî birakuji nebêt, belku divê ta ser êsqan û ta dawî dilopê xwîn dijî şerê kurdkujî û şerê birakuji bêt, belam bê helwêstî bi wê manayê ko bi hîç cûreyêk xo bo hîç layek sax nekate. Çinku xo sax kirina ronakbîrê Kurd bo her layenêk û tenanet ewe jî ko xo biheq bizanêt dîsan her hele ye û ta ko helwêsta rast ewe ye ko dijî şerê birakuji û ew kesê bêt ko şerê birakuji diket ca herkesêk bêt.

Hendê car rengbê ronakbîrê Kurd ewe jî pê nekirê û nedikarî eve jî bi aşkira bibêje bo vê ye ko bédengîyê heldibijêrt.

Bi min waha ye eve jî her helwêst e, çinku bi min waha nîye hemû carê bédengî yeksan bêt bibê helwêst û ez ev pîrsgirêkê bi rast nizanîm.

Wek min gote şerê birakuji doxêkî naxoşî hênaye û eve li vê zaravan da derdikevê ko li maweyê heşt salên rabirdu da hatine bikarhênan. Zaraveyê "xayîn" û "niştîman firoş" zor bi aşkira

li edebîyata hêzên sîyasî da tête dîtin. Pê we dibê filankes xayîn e û filankes jî niştîman firoş e, ev zaraveya pitir biser ronakbîrê Kurd da şikaveteve.

Dû sê mentîq(lojik) heye li vê beynê da ko yek ji wan ewe ye ewê teidî ê me diket û piştgirîya me diket, "niştîmanperwer" e, ewê ko piştgirî li layenekê dîke diket "xayîn" û "niştîman firoş" e û eve yekêk ji vê lojiyan e ko tête bikarhênan. Belam ev lojîke hengavêkî dîke jî birawete pêş bi wê ko: ti ligel me yî ko wata wê bimana xo ewe ye ko ti peyayêkî baş û niştîman perwerî, bi pêçewane ve eger ligel me da nebît û tenanet bibê ewe yê teidî layenekê dîke kiribê, dijî ê me yî û bi vê pêyê ti niştîman perwer nîyê û xayîn î, eve jî hengavêk taze ye li pênasîyê niştîman perwerî û niştîman firoşî da û zor bi aşkira tête dîtin.

Ko wata mebesta min ewe ye ko hîç elternatîvêkî bo ronakbîrê Kurd nehatîye hêştin. Eger ti îda nakey ko wata xo ti mudan î, eger ti leanet li şer nakey ko wata xo ti melhun î û meseleyek awa çêbûye.

Pêdivîye eve jî bêjim ko ev helumercê karîgerîyek zor xerap li ronakbîrê Kurd kirîye, bi wê ko beşêkî kem ji ronakbîrên Kurd kevîye ewe yê ko helwêst wergirê bi piştgîrîkirina layenêk li dijî layenekê dîke. Bi min waha ye çawan ewe zirre sîyaset e, ew kesane jî zirre ronakbîrî ye. Li van salan da jî ewe em dibînin ko ev cûre ronakbîr bûnete dardest, mîkrofon, meqest, bûq û polîs û hemû rolêk dibînin ko evana jî bi ewê ve tê dijî erkê ronakbîrîn.

Li kotayî da wek encamgîrîyek bi min waha ye sê merc bo ronakbîr zor girîng in ko ronakbîrên kurd jî ji wan bider nînin û evana jî digirîteve, sê merc jî eva ne:

Yekem: Ronakbîr divê kiryar bêt - kirin bi vê manayê ko nabê tirs li hîç îdeolojîyek hebê û amade bêt hemû îdeolojîyan û fikran bixwêne û hez biket hemû fikir û îdeolojîyan binasê bê ewe yê xo li cuxjêk da heşar bida û bêje eve raste û eve yê ji derveyê wê bêt heleye- kiryarî bo ronakbîr mercêkî herî serekî ye.

Duwem: Serbixoyî yan serbixoyî ya fikrî, bi vê manayê ko ronakbîr nabê bikevête jêr karîgerîya fikrekê dîyarkirî ve, pêwîste û divê ew bi xo bi serbixoyî bê guhdana encamên wan biparêzê.

Bi wê wata yê ko eger li encama bîr-birinê bi xo geyîste helwêstêk û ew dem helbijêrê eva tiştêkî baş e, belam nek li ber hêz û tirsê sîyaseta îdeolojîyêkî serdest helwêst yan îdeolojîyêk helbijêrê. Birîyar bidest xo ve bûn bo ronakbîr zor girînge.

Sêyem: (critical) rexnegirane bê. Divê hemîşe ronakbîr rexnegirane hel-sukewt biket wexta her demê ronakbîr li wê kevt ko rexnegir bêt bi min wa ye ew dem mercê ronakbîrî jî dikevê.

* Ev babete li korêk bi heman navnîşan li rojî 21.02.1999 li holî Hotêl Hewraman li Hewlêr pêşkeş kirîye.

Liser Çîroka Kurdî bi *Helîm Yusiv* ra Hevpeyvîn

S. V: Berêz Yusiv em dê bi pirsekê giştî destpê bikin; gelo destpêka çîroka kurdî digîje kîjan salan û îro di kîjan qonaxê da ye?

H. Yusiv: Dema mirov vegere destpêka çîroka nûjen a kurdî, mirov dikare vegere destpêka vî sedsalê, yanî mirov dikare vegere salên 1913 û heta 1925-an. Li gor lêkolîneran ev e. Li gor dîtina min çîroka nûjen a kurdî bi zaravayê kurmançî, di sala 1930-î destpêdike. Çîroka nûjen a kurdî di nav rûpelên hawarê da bi çîrokên Nuredîn ZAZA destpêdike. Mirov kare wan çîrokan wek destpêka çîroka nûjen a kurmançî bihesibîne. Çîrokên wî bi navê keskesor wek kitêbek derketin.

Hewildanên Cîgerxwîn hene ko di sala 1956-an de Reşoyê Darê li Şamê weşand, ko ew bi xwe çîrokeke gelêrî ye. Li gel çend çîrokên helbestî mîna Cîm û Gulperî (1948, Şam) û Salar û Mîdya (1973, Bêrût). Lê ev hewldan nakevin warê afrandineke pexşaneyî de. Hêdî hêdî, bi weşandina kurteçîrokên "Hêsir û Baran" re yên Bavê Nazê ev bêdengiya dirêj hate şikêndandin. Di sala 1987-an de romana xwe ya yekem "Çiyayên bi xwînê avdayî" çapkir. Piştê "Stokholmê te çi ditiye bêje", roman û çîrokên "Govend li ber mirinê" (1996). Piştî wî navin din derketin, ko bi berhemên xwe pexşana Kurdî ber bi asoyên nûde ajotin, mîna Çewaz Husên (Siwarê Êşê, 1994),

Şahîne Bekirê Soreklî (Namûsa Êmo, Windabûn û berhemin din), Azad Elî (Yên perîşan - Roman), Pîr Rûstem (Çivîkên beravêfî, Pilindir, Pûtvan..) û Çewaz Evdî (Xewaro - Çîrok), Xemgînê Remo (Çîrokên Deştê Mêrdînê), Heybet bavê Helebçe, Qado Şêrîn, Ciwanê Evdal û hinekên din.

Pir zore mirov karibe hemû navan rêz bike, nemaze ku hîn ev qonax li dare. Herweha di warê nivîsandina çîrokên gelêrî û danheva wan de navên mîna Ebas Ismail, Konê Reş, Ebdulbaqî Huseynî, Salihê Heydo û Tîrêz .. tên holê.

Piştî rawestandina hawarê, çîroka kurdî bi rêya kovarên kurdî derketin pêş. Piştî çapkirina "Hêsir û Baran" a Bavê Nazê û virda, afirandina çîroka kurdî berdewam e. Ku di van salên dawî da tabloya çîroka kurdî pirr rengîn bûye û gelek berhemên hêja hatine weşandin. Wek mînak ezê navê çend çîroknivîsên dervayê welêt tenê bêjim: Fawaz Huseynî, Hesenê Metê, Kamîran Haco, ... her weha li hundirê welêt bi dehan navên hêja hene ku di warê çîrokê da afirandina xwe berdewam dikin.

S. V: Ji layê çîroknivîsanidinê da hun xwe çawa didin nasandin, çîroka we di kîjan zemînê da cî digre yan jî bi gotinekê di hun xwe nêzî ekolekî dibînin gelo?

H. Yisiv: Jibo nirixandina berhemên

min, jibo cihê ku ez lê me, divê xwen-devan vana binirxîne. Lêbelê ez dikarim bêjim "nivîsandin bo min çi ye? ez çawa û çima dinivîsim?". Ez dikarim bêjim nivîsandin bo min berhema şewata dil û rihê mirov e. Roja ku min dest bi nivîsandinê kirîye û heta nûha, min sozek daye ku ezê dilsoz bim ji vî şewatê ra û her weha dilsoz bim bi xewnên xwe ra. Ji ber ku bi giştî jîyana mirov û bi taybetî jî jîyana Kurdan, bi awayê xwe û bi rengê xwe jîyaneka sûrrealîst e, ji realîstîyê bêtir nêzikê xeyalê ye. Ez bi xwe mîna Silwador Dalî dibêje, "dema ez çavê xwe digrim, bêtir dikarim cihanê bibînim." Li gor bawerîya min nivîskarê serketî ew e; yê ku bi çavê sisêyan li dora xwe binêre û bibîne. Ez jî bi wî çavê sisêyan li xwe û li jîyana derûdora xwe dinêrim û dinivîsim. Jibo min negirînge ku ew nivîs nêzik û dûrê ekolekî be, ya girîng ew e ku ezê ala şewata nava xwe tim û tim bilind bikim û her weha bi zimanê dayika xwe him bigirîm û him jî binivîsim.

Ez dixwazim hinek mesela ekolan vekim. Di destpêkê da derketina ekolan mîna pêwistîyekê bû jibo demekê, di pêvajoya pêşveçûna wêjeya(edeba) cihanî da. Bi taybetî berê bidestdêkirina şerê cihanî yê yekemîn ra û bidawîbûna şerê cihanî yê duyemîn ra, di warê nixirandin û binavkirina wan berhemen wêjeyî da girîngîya wan ekolan hebû û bi ketina ekola realîzma sosyalîst ra ya ku heya berê demekê berê edebîyatê dabû qada sîyasatê. Hate xuyanîkirin ku laş û gewdeyê edebîyatê ji kirasê ekolan mezintire û her berhemenê edebî(wêjeyî) nixirên xwe yê taybet di hundirê xwe da hildigire. Ji ber vê yekê ye ku di çirokên nûjen da sîya hemû ekolan têda tete dîtî û dike ku ji dervayê hemû ekolan jî be.

S. V: Mamoste ez Başûrê piçûk baş

nizanim, lêbelê di Bakur da fahmekê nûh geş dibe ku edebîyat û sîyasat dijraberi hev dibîne û gelek caran jî sîyasat tete redkirin yan jî sucbarkirin. Gelo meriv dikare berhemên edebî û sîyasî ji hev veqetîne? Dema ku vê pirsê ji te dikim divê çarçova wê jî dîyar bikim; ez sîyasat ne di mana teng da, di çarçoveyek felsefî û seha ramanî da difikrim, pirsê min jî di vî çarçovê da ye.

H. Yusiv: Li gor bawerîya min, dibe ku sîyasat yan mesajên sîyasî encamek ji encamên berhemen wêjeyî be. Lê berva-jî vê dîtîne nerast e. Jibo ku mirov bigêje çareserîya têkilîya wêjê û sîyasatê, divê mirov van peyvên yan van teriman zelal bike, ku sîyasat çi ye? Mirov nikare bi nêrînekê bêje; her tişt di jîyanê da sîyasat e. Bi nêrînekê din, mirov dikare bêje gelek xalên hevbeş di navbera sîyasat û wêjeyê da hene û bi nêrîneka dîtir bêje ku sîyasat û wêjê du cihanên cûda ne. Di nav vê tevlihevîyê da ez dikarim têgehîştina xwe bi vê awayî bêjim: edebîyat yan wêjê jîyan bi xwe ye û di rêya neynîka ruh da tete holê, sîyasat jî, parçek ji parçeyên wê jîyanê ye. Carna dikare bibe materyaleka baş jibo nivîsandina edebîyatê, carna jî jibo edebîyatê ezraîl bi xwe ye ku edebîyatê dikuje û wê pûç dike. Yek ji nexweşîyên giran di wêjeya kurdî da ew e ku sazîkirina peywendîyên tendûrist di navbera herdu alîyan da yan jî herdu cihanan da naye bidestdêstin. Bawerîya min ew e ku edebîyat yan wêjê, bi giştî li ser vê pirsê(çawa?) ava bûye, ne ku li ser mijarê. Sîyasat mijareka ji mijarên edebîyatê ye. Ji ber vê girîngîya wê di dereca duyem da ye.

S. V: Bi giştî îro rewşa edebîyata kurdî di kîjan qonaxê da ye? Mirov çawa dikare têkilîyên di navbera çar parçeyan da xuttir bike?

H. Yusiv: Jiber taybetîya rewşa Kurdan, ne ez û ne jî tu nivîskarekî dî dikare bêje di warê edebîyata kurdî da ji her tiştî agedare. Lê wêneyê giştî yê edebîyata kurdî ya îroyîn, wêneyeke ku berve xweşbûn û geşbûnî ve diçe. Û bi taybetî jî li başûrê Kurdistanê piştî derxistina hêzên dagirker li wî parçeyê welatê me derfetên berfireh li ber geşbûna ziman û wêjeya kurdî vebûne. Li vê derê ez dixwazim balê bikişînim li ser xalekê pirr girîng ku edebîyat û hunera kurdî, ji hêzên siyasî û leşkerî yên kurdî bêtir dikarin rolekê di şikênandina sînoran da bileyzin. Ji ber ku çiqaşî jî hêla cografî da welatê me hatibe parçekirin jî lê jî hêla ruhî da em dikarin van sînoran jî holê rakin. Ji ber ku edebîyat berî her tiştî zimanê ruhê me ye.

S. V: Gelo li Başûrê piçûk rewşa Kurdan, nivîskarî û wêjeya kurdî di kîjan qonaxê da ye?

H. Yusiv: Piştî rawestandina HAWAR, RONAÎ, STÊR û ROJA NÛ û belavbûna rêxistina Xoybûnê li gel guhertinên ku siyaseta cîhanê û ya dewletên dagirker jî aliyekî de û xwenûkirina Kurdan jî jî hêla rêxistinî ve, bi giştî jî bilî Cegerxwîn hemû rewşenbîr û nivîskarên Kurd di bin tarîbûna rewşa siyasî de bêdeng, bê berhem û bê pirtûk man û nivîsên wan, heta berî demekê kurt, mabûn malên rûpelên HAWARê û yên dirokê. Hetanî, di warê rojnamegirîya bi Kurdî de, bêdengiyê jî 1946-an de dest pê kir heta 1968-an ko Cîgerxwîn bi derxistina kovara *Gulistan* ev bêdengî şikand. Herweha berhemên wî mîna baranê bi ser zuhabûna erda wêjeyê de dibariyan (1. Pîrîsk û pêtî, 1945, Şam; 2. Sewra Azadî, 1954, Şam; 3. Kîme ez?, 1973, Beyrût; 4. Ronak, 1980, Roja nû,

Stockholm; 5. Zend-Avesta, 1981, Rojanû, Stockholm; 6. Şefeq, 1982, Rojanû, Stockholm; 7. Hêvî, 1983, Rojanû, Stockholm; 8. Aşitî, 1985, Rojanû, Stockholm). Li gel nivîsên mîna Cîm û Gulperî, 1984; Gotinên pêşîyan, 1957; Destûra Zimanê Kurdî, 1961; Ferheng 1+2, 1962; Salar û Mîdya, 1973; Tarîxa Kurdistan 1+2, 1985-87; Folklorê Kurdî, 1988; Jînenîgariya Min, 1995.

Ji bilî rola Cîgerxwîn ya siyasî û civakî ya girîng, van berhemên rola xwe di pêvajoya zelalkirin û pêşxistina Kurmancî de listin.

Ji sala 1958-an û vir de, tevgera Kurdan ya siyasî hatiye avakirin. Lê hemû hewldanên Kurdan ber bi destxistina mafên bingehîn ve heta niha bi ser neketine. Ji salên 1958-an û vir de eynî siyaseta kevn ya inkarkirinê tê meşandin. Ji bilî vana, zêdeyî 150.000 Kurd bê nasname û ji bilî projeyê kembera Erebi bi hemû encamên xwe yên siyasî, civakî û aborî yên xerab, bi her hawayî erebkirina nav û deverên Kurdan berdeham e. Herweha qedexekirina ziman û çand û hebûnê bi tevayî berdeham e. Di hundurê vê rewşa dijwar de û li bin siyê, wêjeya Kurdî li ber xwe dide.

Pêwîste bê gotin ko, bi giştî, kovar û rojnameyên Kurdî yên ku tene derxistin bigirêdayî rêxistinên siyasî ne. Li gel ku li ser bergên hemû kovaran dihate nivîsandin "serbixwe", lê rastî tişteki dî bû, Ji bilî çend mînakên awarte mîna *Aso* an *Gurzek Gul* an *Zanîn* û vê dawiyê *Zevî*. Ji kovarên ko derketine *Gulistan*, *Stêr*, *Pîrs*, *Gelawêj*, *Xwinav*, *Rê*, *Roj*, *Bihar* û *Dugir* li Swêdê.

Li gel rojnameyên mîna *Newroz*, *Deng*, *Delav* û bi erebî *Hêvî* û *Xwendevan*, van rojname û kovaran rolek mezin di belavkirin û danasîn û

pêxistina wêjeya Kurdî dilistin. Ji xwe belavokên rêxistinên yên ku bi erebî li dervî vê çarçewê ne. Li gel çend kovarên ko Kurd bi erebî diweşînin mîna *Elhîwar, Ecras, Elmember, Elmuseqef, Elteqedumî, Edebulqediye, Mewasim* û li Swêdê *Hecelname*, û li Libnanê çend hejmarên *Kurdname*.

Ji aliyê Helbesta nûjen ve dibe ko helbestên Qedrî Can di Hawarê de mîna-ka herî zelal û berbiçav bin di vî warî de. Lê Cîgerxwîn bi şeweyê helbesta xwe gelek nav di bin baskê xwe de hiştin û heta niha. Ji vê malbata hunerî helbestên Tîrêj, Keleş, Salihê Heydo û gelekên din hene ko mane girêdayî kêşsaziye di warê nivîsandina helbestê de. Lê pêla nûjeniyê ya ko helbestên hemû zimana dabû ber xwe weha helbesta Kurdî jî dabû ber xwe ko di van salên dawî de bi dehan, eger em nebêjin bi sedan nav derketin. Ji wan Ehmed Huseynî, Tengezarê Marînî, Fethulla Huseynî, Rizoyê Xerzî, Jan Dost, Hekîm Sefqan, Royarê Amedî, Diya Ciwan, Arşevê Oskan, Nezîr Palo, Rûxweşê Zîvar, Mihemed Hemo, Axîn Arif, Ferhadê Îcmo, Hoşeng Broka, Jana Seyda ...hwd. Gelek navên din hene ko xwedî berhemên çapkirî ne, bê guman, ev nav hemû hêjayî lêkolîn û nirxandinên rexneyî ne. Dibe ko valabûna meydana rexnekirinê bûbe yek ji sedemên tevliheviya ko îro di helbesta Kurdî de li dare.

Kurdên erebnivîs; ji encamên dagîrkirina welatê me, Kurdên ko bi zimanê dagîrkeran dinîvîşînin gelek in. Ev rewş li her çar perçên Kurdistanê diyarê. Wê ev rewş bi berdeambûna dagîrkirinê re berdeamb bike. Ji van nivîskarên Kurd mîna-ka herî xuyanî berhemên Selîm Berekat in. Ji piştî sala 1973-an de bi helbestan dest pê kir û heta niha bi helbest û romanên ko piraniya

wan mijara wan pîrsgirêkên civaka Kurdî ye berdeamb dike. Di warê lêkolînê de navê Ibrahîm Mehmûd weke lêkolînerekî xwedî ked û berhemên girîng xwe dide pêş. Di warê çîrokê de, ji salên heftêyî û virde Nîroz Malik û ji heştêyî û virde E. Rehman Sîdo, Ehmed Umer, Xorşîd Ehmed, E. Baqî Yûsif, M. Baqî Mihemed, Pîra Yûsif û Rojîn Cima ..h.d. Herweha di helbestê de hamid Bedirxan, Cemîl Darî, Taha Xelîl, Luqman Mehmûd, Mihemed Efîf, Îbrahîm Hiso, Luqman Dêrkî, Îbrahîm Yûsif, Nesret Hebeş, Hisên Hemzê û gelekên din hene ko heta vê gavê bi zimanê erebî berhemên xwe yên wêjeyî diweşînin.

Bi giştî, berdeambkirina qedexekirina li ser zimanê Kurdî li gel siyaseta "înkarkirin" û çewisandinê rê nadin pêşxistinên girîng di warê wêjeya Kurdî de li rojavayê Kurdistanê, binxetê. Lê guhertinên nû yên ko ketine rewşa cihanê de, bi taybetî ji hêla tîknolojî ve, derfetên nû li ber wêjeya Kurdî vedikin. Her çiqasî ev rewş bûbe sedema binge-hîn ya koçkirina gelek nivîskar û rewşenbîran jî, lê dîsa asoyên nû li ber pêşdegavêtinê vekirin, ko dîroka afirandinê vê rastiye bi xwe re tîne. Pîrê caran dijiwarî û êşên mezin dikarin wêjeyeke bilind biafrînin.

S.V: Heta nûha pênc pirtûkên we li vira çap bûne. Hun li vê derê bi xwen-devanê xwe ra rûbirû bûn, rasterast têk-iliyên we çêbûn, berîya nûha we çi dipê û hun rastê çi hatin?

H. Yusiv: Ev cara yekem e ko ez tîm Dîyarbekirê. Berî çend rojan min Bazîd û Wanê jî dît. Bêguman ez berfireh nikarim nûha hestên xwe bêjim, ji ber ku di vê hatinê da min tiştên ko mirovan pîrê kêfxweş dike dîtin û pîrê tiştên ko mirov

xemgîn dike jî dîtîn. Ne tenê xwendevan belê min hejmarekê baş ji nivîskar û dilşewatên wêje û zimanê kurdî jî dîtîn. Ji hêla xwezayê ve dibe ko her parçeyê welatê me neşibe hev yanî newekhev be, lê ji hêla têkilîya xelkê me bi wêje û edebîyata kurdî ra her derê Kurdistanê dişibe hev. Xweza û bilindayîya çîyayê agirî, heybet û mezinbûna wan çîyayên her weha, firebûn û xweşîkbûn û hênîkayîya Behra Wanê çiqasî ez kêfxweş kirim û her weha jî têkilîya Kurdan bi ziman û edebîyata wan ra ez xemgîn kirim.

S. V: Bi rêya kovara warê mesaja ku hun bigehînin xwendevanên xwe çi ye?

H. Yusiv: Ez dixwazim hezkirina xwe ji her destê ko hevokekê kurdî saz kiribe ra dîyar bikim û bi çavekê mezin li wê kedê dinêrim. Ew keda ko dixwaze zimanê dayika min î şîrîn, mîna şitlekê di xaka wî welatî da biçîne û av bide. Ev xaka ku dagirkeran ew mîna sehayekê, mîna çolekê bêkeskayî ji me ra hiştine. Û di vê çarçovê da ez vê heskirinê jibo kovara we, jibo WAR-ê ji dîyar dikim. Ji dervayî gotina rastîyê ez naxwazim tu gotinekê bêjim. Rastî ji mîna bav û kalan gotîye "ew gîyaye, yê ku di bin kevîran da namîne". Ew gîya îro zimanê kurdî ye ko kî bixwaze, kî nexwaze wê van kevîrên giran ji ser xwe bide alî û wê roj bi roj şîn bibe, geş bibe û her û her bilind bibe.

S. V: Mala we ava be jibo ku we wexta xwe ya biqîmet ji me ra veqetand.

H. Yusiv: Ya we jî ava be. Hêvîdarim hun di xebata xwe ya bihêja da serkevtî bin.

KOÇGİRİ'DEN MAHABAD'A KÜRT ULUSAL HAREKET*

M. Emin ASLAN

A-1800'lerden 1. Paylaşım Savaşına Kadar Kürt Başkaldırıları Daha Önceden Varolan Statüleri Korumaya Yöneliktir

Osmanlı Devleti 1800'den itibaren merkezileşmeye yönelik politika güder. Fransa vilayet hiyerarşisini Osmanlı'ya taşır. Osmanlı'da bulunan Kürdistan parçasındaki mirliklerin bölgelerini vilayetlere dönüştürerek, mirliklerin yönetimine son verip merkezden atanmış valilerce yönetir.

Kürdistan, Osmanlı Devleti'nin yönetimine girmeden önce mirlik toplumsal örgütlenme esasında yönetilmekteydi. Kürtler İran Devleti ile çatışma içinde olup ve İran yönetiminin baskısı altındaydı. Osmanlı Devleti kendini İran Devleti'nin tehdidi altında görmekteydi ve rakibi olan İran'a karşı Kürtleri örgütlemekle güvencesini sağlayabilirdi. Yavuz Sultan Selim bu amaçla, Bitlisli Şeyh Molla Idris vasıtasıyla Kürt Beylikleri ve aşiretleriyle bağlantı kurar. Kürtlerin de İran baskısına karşı destek arayışı içinde bulunması bu ilişkiyi kolaylaştırır. Kürtler mevcut statükolarını korumak kaydıyla Osmanlı yönetimine geçer. Bu ilişkiyi kolaylaştıran bir neden de Osmanlıların Sünni olmasıydı.

Kürtlerin 1800'lere kadar, Osmanlılarla ilişkileri özerk Kürt Beylikleri biçimindeydi. Osmanlı Devletinin toprak mülkiyet ilişkileri, Tımar düzeni Kürdistan'da sözkonusu değildi. Kürt Beyliklerinin kendi adına para bastırma, hutbe okutma yetkileri arasındaydı. 19. yüzyılda Batı kapitalizminin ekonomik ve askeri üstünlüğünün daha da genişlemesi, Balkanlardaki uluslarda ulusculuğun gelişmesi ve siyasal eyleme dönüşmesi, Avrupa'da yaygınlaşan ulusal akımların Ermenistan'da, Kürdistan'da Ermeni ve Kürt toplumlarını etkilemesi, 1808 Senedi ittifak Anlaşmasıyla Osmanlı toprak mülkiyet ilişkilerinin yerine toprak mülkiyeti ve miras hakkının kabulü ile birlikte toplanan vergilerin büyük kısmını ayan sınıfının kendisine ayırması nedenleriyle, Osmanlı bürokrasisi Avrupa'da tutunamayacağını bildiklerinden Asya'da tutunmaya yönelik politikalar ürettiler.

Bu nedenden dolayı, Osmanlı bürokrasisi 19. yüzyılın başlarından itibaren Kürt Beyliklerine son vermek, bu beyliklere bağlı yöreleri Osmanlı Devleti'ne bağlı vilayetlere dönüştürme kararını aldılar. Kürt Beylikleri bu kararları tanımayarak Osmanlı Devleti ile çatışmaya girdiler. Ancak Kürt Beylikleri kendi aralarında

* Bu yazının Kürtçesi WAR dergisinin 12. sayısında yayımlanmıştır. Okurun isteği üzerine Türkçesini de yayınlıyoruz.

anlaşarak merkezi siyasal otoritelerini oluşturmamışlar. 1806-1809 Abdurrahman Paşa, 1814-1836 Soran Beyi Mir Muhammed, 1840-1847 Bedirhan vb. başkaldırı hareketleri ülke düzeyinde merkezileşmediği gibi, çeşitli nedenlerle kendi içinde bölünmekle yenilgiye uğradılar. Osmanlı Bürokrasisi çeşitli hile ve entrikalarla 19. yüzyılın yarısında Kürt Beyliklerine son verip, yörelerini merkeze bağlı birer vilayete dönüştürürken, çıkarılan yasa ile Mirlik toprak sistemine de son verilir.

Mirliklerin tasfiye sürecinde Kürt Aşiretleri de yerleşik duruma geçtiler. Aşiret Reisleri ve ileri gelenleri de büyük toprak sahipliğine geldiler. 1858 Arazi Kanunu ile geniş mir (Kürt Beylikleri) arazilerini de devletten ucuz fiyatla satın alarak topraklarını daha da genişlettiler. Kürdistan'da aşiretler arasında birlik ve düzeni mirlerin düzeni sağlıyordu. Mirliğin tasfiyesi ile birlikte her ne kadar valiliklerin dolaysız yönetimi başladıysa da, doğan yönetim boşluğunu dolduramadı. Çünkü aşiretler Osmanlı valiliklerini kendine yabancı unsur olarak görmekte ve güvenmemektedir. Bu yönetim boşluğu aşiretlerin çekişmesini ve düşmanlıkların körüklenmesine neden olduğundan, bir arabulucu kurum toplumsal ihtiyaç durumuna gelir. Mirlerden boşalan bu arabulucu boşluğu şeyh ve tarikatlar dolduracaktır. Mirlerin tasfiyesi ile birlikte Kürdistan'da ön plana geçen şeyhlik kurumu olur. Baskı ve vergilere tepki olarak başlayan Şeyh Ubeydullah hareketi ile birlikte Kürdistan'da başkaldırı hareketlerinin liderleri şeyh ya da şeyhlik kurumundan gelenlerdir. Elbette bu başkaldırıları, Osmanlı Devleti'nin Avrupa Devletleri ve Rusya ile ilişkilerin bütünselliği içinde ele almak gerekir.

19. yüzyıl hareketleri kültürel hareketlerdir. Tarihsel birikim olarak ortak karakteristikler olan kültür ögesi, dil ögesi, psikolojik öge ile ulusal bilinç oluşturulamaz ve toplumu uluslaştıramaz, siyasal örgütlenme ve mücadele ile ulusal bilinç oluşturulabilir ve kültürel toplum siyasal topluma dönüşür. Ancak bu koşullarda adı geçen tarihsel öğeler ulusal bilincin oluşturulmasında birer kategori olarak işlev görür.

Kürdistan'da ulusal-demokratik, ulusal-devrimci akımlar 19. yüzyıl başkaldırılarını ulusalcı hareket olarak ele almaktalar. Bu kavrayışla ulus ve ulusalcılığı tarihsel ve kültürel bir sorun olarak görmektedirler. PKK'ye göre ise Kürt Ulusal Kurtuluş Hareketi'nin kendisi ile başlatmaktadır. PKK'nin bu bakış açısı ulus ve uluslaşma olgusunu tarihsel ve kültürel bir sorun olarak ele almakla birlikte, Kürt sorunu da Misak-ı Milli sınırları içinde görmektedir. Sorunu Misak-ı Milli içinde görmekle Kürt sorununu, siyasal birim olarak değil kültürel birim esasında çözülebileceğinin de kabulüdür.

Ulus ve uluslaşma sorunu tarihsel-kültürel ölçülerle ele alan burjuva ideolojisidir. Avrupa merkezci burjuva bakış açısı, her toplumun tarihsel evrimle bir ulus aşamasına varıp ve bu aşamanın ulusal devletle neticelenmesidir. Batı Avrupa toplumlarının kültürlerinin daha gelişkin oluşundan ötürü tarihsel olarak daha önce ulusal devlet aşamasına varmışlardır. Böylelikle, ayrı ayrı toplumların uluslaşmak ve ulusal devlet kurmak, tarihsel evrimin kaçınılmaz gereğidir. Dolayısıyla bu bakış, toplulukları ve kültürleri ileri ve geri olarak aşamalandırır. II. Enternasyonal Marxizmi, ekonomik gerekçilik ya da bilimsel determinizm gereği olarak bu anlayışı Marxizm adına yaygınlaştırmıştır. Bu anlayışa göre, "insanlar bilinç ve iradeleriyle ekonomik belirlemeyi değiştiremezler" savından hareketle, sömürgeci ülkelerin sömürge

ülkedeki ekonomik yatırımları bir aşamaya geldiğinde, ulusal bilinç determinizm gereği olarak gelişecektir. Böylelikle ulus ve uluslaşma sorununda, Marx'ın 1870'de vardığı siyasi kavrayış üzerinden atlayarak, bilinçli olarak saptırmaktadır. Sosyalizm de ancak demokratik bir ulusal devletin kurulmasının ardından kapitalist gelişimin belirli bir aşamaya varmasıyla gündeme gelir. Bu savın sahipleri, ulus ve uluslaşmayı determinist bir tarihsel evrimin sonucu gördüğü gibi, sosyalizmi de ulusal gelişimin iktisadi kalkınma modeli ve toplumsal ilerleme olarak kavrar. Avrupa merkezci burjuva bakıştan etkilenen Kürt ulusal-devrimcileri, ulusal-demokratik akımları da uluslaşmayı tarih/kültür ya da ulusal/kültürel, bir sorun olarak görmektedirler. Bu anlayış, tarihsel evrimle ulusal bilincin evrimini birbirine karıştırmaktadır. Bu da, ulusal bilincin ve siyasallaşmasının çarpıtılmasına ve saptırılmasına neden olmaktadır.

Komünist devrimciler, ulus ve uluslaşma olgusunu siyasal bir sorun olarak ele alır. Asya ve Afrika da olduğu gibi Kürdistan'da da ulusal sorun birinci paylaşım savaşı sürecinde belirir.

"Her ne kadar 1911 yılında yer alan Çin İhtilali, Bengal'in bölünüşünün yarattığı kaynaşmalar ve daha başka yerlerde kabaran dalgalar gelecekte neler olabileceğini işaret ediyorduysa da sömürgelerde milliyetçilik 1914 yılında henüz bilinmeyen bir olaydır." "Bir ayrı çeşit, kendine özgü bir sömürgecilik sorunu teşkil eden İrlanda bir tarafa bırakılırsa Birinci Cihan Savaşı yıllarında hiçbir sömürge halk savaşı fırsat bilip ayaklanmadı ve hatta önemli bir zorluk dahi çıkarmadı."¹

Ulusalçılığın gelişiminde Ekim Devrimi ve ABD'nin politikasının da etkisi vardır. Emperyalist barış Kürdistan'ı dörde bölerken, 1919'larda Mahmut Berzenci önderliğinde İngiliz emperyalizmine, Koçgiri de Mustafa Kemal önderliğindeki Ankara Hükümetine karşı mücadeleleriyle belirlenir. Türkiye'nin işgal ve ilhakına karşın Şeyh Sait, Agırî, Dersim başkaldırıları, İran'a karşı Mahabad Kürt Cumhuriyeti, Güney Kürdistan'da 1931'den günümüze kadar devam eden Barzani Hareketi, Mahmut Berzenci ve Qoçgiri'den devam eden siyasi damarı oluşturmaktadır.

Kuzey Kürdistan'da ulusalçı-devrimci akım olduğunu söyleyen PKK ve diğerleri ile ulusal-demokratik akımlarının nedensellik siyasi anlayışlarının gereği olarak ulus sorununu, tarih-kültür yönüyle ele alışlarından dolayı geldikleri yer Misak-ı Milli içinde çözüm arayışdır.

B-Mustafa Kemal Hareketi, Osmanlı Bürokrasisinin Kendini Yeni bir Biçimde Sürdürme Hareketidir

Birinci emperyalist paylaşım savaşında Alman emperyalizminin müttefiki olarak savaşa katılan Osmanlı Devleti yenilmiş ve yıkılmış durumdadır. Osmanlı Devleti'nde egemen olan askeri ve sivil üst bürokrasidir, özellikle askeri paşalardır. Egemen sınıf durumunda olan bürokrasi, kendisi için ve kendine özgü bir devlet kurmak doğrultusunda siyaset oluşturma faaliyetine girer.

¹ Robert Emerson, *Sömürgelerin Uluslaşması*. S. 23-24

Mustafa Kemal ve çevresindekiler Osmanlı bürokrasisi olduğundan dolayı, Osmanlı toplumunun konumunun kısaca özetlenmesi gerekir. Osmanlı toplumunda temel üretici güç olan toprak, padişahın mülküdür. Bu mülkün mülkiyeti hakim sınıflar arasında paylaştırılmaz, dağıtılamaz. Padişaha ait mülkü korumak geliştirmek ve işlemek devletin temel görevidir.

Osmanlı mülkü devredilemez, paylaşılmaz ancak hizmet karşılığında tasarruf hakkı olarak verilir. Bu da tımar sistemidir. Tımar sahibi verilen toprağın tasarruf hakkına sahiptir. Tımar sahibinin kendisine verilen bu toprakları ve üzerinde yaşayanları sömürme hakkını yani vergiyi de saray belirler. Tımar sahibi de padişahın mülkünün korunup genişlemesi için devlete bağlılık ve hizmette yükümlüdür. Arazi miktarına göre belli sayıda asker devşirip savaşa hazırlamak ve savaş anında istek halinde hazır olmakla yükümlüdür.

Devlet ticaret ve sanatı da örgütleyip korumaya, bayındırlık ve sulama hizmetlerini ve yeni şehirler inşa etmeyi vb. faaliyetleri de yapar. Bütün bunları sağlamak için büyük çapta bürokratik bir mekanizmayı örgütler. Böylece Osmanlı toplumu, genel olarak devlette görevli ayrıcalıklı sınıf ile kullar olmak üzere iki sınıf durumundadır.

Hakim sınıf yani bürokrasi görevi padişah tarafından verilir ve istendiğinde geri alınır. Bu ayrıcalık hakkı padişah tarafından verilen ve geri alınabilen bir ayrıcalıktır. Bu ayrıcalık, herhangi birine verilebilir, kana bağlı bir asalete dayanmamaktadır.

Osmanlı bürokrasisinin toplumsal varsayımlarını üreten temel, mülkün bölünmez bütünlüğünün korunması ve devamıdır.

Osmanlı bürokrasisinde ve şehir kökenli toprak ağalarında 1870'lerde devletin devamını sürdürmek amacıyla Osmanlıcılık, *Pan-Islamizm* ve *Pan-Türkizm* ideolojik akımları kendini gösterir. Osmanlıcılık, Osmanlı devlet yurtseverliğidir. Osmanlı devlet yurttaşlarının din ve milliyet farkı gözetmeksizin, bütün Osmanlı kulları için eşitlik ve yurttaşlık hakkının verilmesini savunur. Osmanlı devleti ve bu devletin sahip olduğu toprak parçasını, tüm Osmanlı yurttaşlarının devleti ve ülkesi olarak ele alır ve teritoryal milliyetçiliği işler. *Pan-Islamizm* Padişah Abdülhamit (1876-1909) döneminde iktidar erki olarak uygulamaya konuldu. Ve bu anlayışa dayalı olarak ıslahata girildi. *Pan-Türkizm* ideolojisi, 1908'de Jön-Türk hareketi ile İttihad-Terakki iktidarında uygulama alanı bulmuştur. *Pan-Türkizm*, Fransız liberalizmi ve pozitivist felsefi akımdan etkilenen batıcı-laik akım olarak hedeflediği, bütün Türkleri Osmanlı devletinde birleştirmektir. Bu birleştirme içine Kürdistan ve Ermenistan coğrafyasının tümü de girmektedir.

1920'lerde Mustafa Kemal ve Osmanlı bürokrasisi Ankara'da yeni bir devlet kurma faaliyetine girerken, ülke olarak hedefledikleri Anadolu ile birlikte Kürdistan'ı da içine almaktı. Bunun içinde Kürdistan'da varolan Osmanlı Devlet kurumları aracılığıyla Ermeni tehdidini işlerler. Bu tehdidin maddi koşulları da mevcuttur. Savaş sırasında Ermeni katliamı ve sürgünü Osmanlı Devleti tarafından fiilen uygulamaya konulmuştur. Dolayısıyla, Ermenilere ait topraklar Kürt ağalarının, aşiret reislerinin mülküne dönüşmüş olup bu vesileyle Kürtler, ancak, Mustafa Kemal'in yanında yer almakla Ermeni tehdidini bertaraf edeceklerini düşünmüşlerdir.

Batı'da da Yunan ya da Rum yerleşik halkın toprağını ele geçirme amacıyla ağa ve aşiret kesimlerinin desteğini alır. Dolayısıyla Mustafa Kemal hareketi bir yanıyla Rum, Pontus, Ermeni topraklarının vaadi üzerinde Kürt ve Türklerin desteğini Yunan ve Ermenilere karşı örgütler.

Mustafa Kemal ve arkadaşları, daha doğrusu Osmanlı bürokrasisi yukarıda belirtilen Osmanlılık, Pan-Islamizm, Pan-Türkizm'i içermekte, ortak yanları kaybettikleri hükümlerliklerini, yani devletini yeniden kurmaktır.

Osmanlı bürokrasisinin, yani Osmanlı devletinin Kürdistan'ın büyük parçasını alabilmesinin dış politikada lehine olan bir durumda, Rusya'da Çar'lığın yıkılması ve sosyalist devrimle Bolşeviklerin iktidarı almasıdır. Osmanlı bürokrasisi, devlet deney ve tecrübesine sahip olduğu kadar, Osmanlı devlet kurumlarına da hakimdirler. Bu nedenle, emperyalistlerin politikasından ve aralarındaki çekişmelerden haberdar oldukları gibi, bunların Bolşevik iktidarına olan hassasiyetini de iyi bilmekteydiler. Diğer yandan, Bolşeviklere bürokrasi yönlendirmesindeki bu hareketi ulusal-demokrat hareket olarak sunmaları ve bunun kadar önemli bir diğer unsur da Kafkasya güvenliği için kurulacak olan Türk Devletinin gerekliliğini hatırlatmaları ile ihtiyaç duyulan desteği almalarıdır.

Osmanlı bürokrasisinin oluşturduğu Mustafa Kemal hareketi, ulusal demokrat bir hareket olmadığı gibi demokratik ve emperyalizme karşı bir niteliği de yoktur. Mustafa Kemal hareketi Ermeni, Rum, Pontus halklarının imhası ve kurtulanların ülkelerini terk etmeleriyle vatansızlaştırarak Anadoluyu; zor ve şiddetle işgal ve ilhak ederek Kuzey Kürdistan'ı Türk vatani olarak Lozan'da resmileştirmişlerdir. Dolayısıyla Türkiye Cumhuriyeti yeni kurulmuş bir devlet olmayıp Osmanlı Devletinin devamıdır.

C- KÜRDİSTAN ULUSAL HAREKETİ

1- Koçgiri Hareketi

Mustafa Kemal ve Osmanlı bürokrasisi Ankara'da Osmanlı devletini yeniden düzenleme hazırlığı içindeyken aynı dönemde Kürt ulusalcıları da; *Alişan*, *Alişêr* ve *Baytar Nuri* önderliğinde Koçgiri'de üstlenerek Sivas, Dersim mntıkasında Kürdistan devleti kurma hazırlığına girişirler. Ankara hükümetinin siyasetinin bilincinde olduklarından, Sivas ve Dersim mntıkasında örgütlenerek Ankara hükümetinin etkinliğini kırmak, Kuzey Kürdistan'ın birliğini sağlayarak Mahmut Berzenci ile ilişkiye geçmek ve Kürdistan devletinin kurulmasını hedeflemekteydiler. Ankara hükümeti bu hazırlıkların yeteri kadar kuvvet oluşturmaya fırsat vermeden ve Bolşevik'lerin desteğini arkasına alarak 1921 Nisan ayında saldırıya geçer. Koçgiri hareketi yenilgiye uğrar. Önderleri güçleriyle Dersim mntıkasına sığınır ve aynı amaç üzerinde hazırlıklarını sürdürür, ama umdukları örgütlemeyi oluşturamazlar.

Koçgiri hareketinin önemi, Kürdistanın kuzeyinde bağımsız bir devlet kurmayı hedeflemesidir.

Diğer önemli yanı da Osmanlı bürokrasisinin yeni bir Türk devleti kurma girişiminde bulunduğu süreçte, Kürtlerin de devlet kurma girişimleridir. Bundandır ki, Koçgiri hareketi Kürt ulusal kurtuluş hareketidir.

2- Şeyh Mahmud Berzenci Hareketi

İngilizler 1917 yılında Bağdat'ı, Mayıs 1918'de Kerkük'ü ele geçirdiler. *Sykes-Picot Anlaşması* gereği olarak Irak'ta İngiliz mandası altında bir Arap devleti kurma hazırlığına girdiler. Bu anlaşma 16 Mayıs 1916'da İngiltere ile Fransa arasında imzalanmış, Rusya tarafından onaylanmış ve 12 maddeden oluşmuştur. Anlaşmanın konusu Arap ve Kürdistan coğrafyasının paylaşılmasıdır. Bu anlaşmada Kürdistan ve Kürt kelimesi geçmeden Kürdistan bu paylaşmanın içinde dörde taksim edilir. Ekim devrimiyle bu anlaşma açığa çıkar ve Rusya'nın payı, SSCB tarafından reddedilmesinden dolayı bazı değişikliklerle *Sevr Anlaşması* yapılır. Ancak Osmanlı bürokrasisi, Ekim Devrimi'nin yarattığı yeni koşullardan ve yeni dengelerden yararlanarak Lozan Anlaşması'yla Kuzey Kürdistan'ı ele geçirir. Ekim Devrimi'nin yarattığı dengeler devreye girmeseydi, galip devletlerin Osmanlı bürokrasisine belirlediği coğrafyanın Sevr Anlaşması'yla sınırlı kalacağı açıktı. Kürt Ulusal Kurtuluş mücadelesinin boğularak ezilen ulus durumuna dönüştürülmesine, Misak-ı Milli sınırları olarak genişletilmesine ve TC sınırlarına dönüştürülmesine galip devletler onay vermiştir. Ekim Devriminin ardından kurulan Sovyet Cumhuriyeti, *Brest-Litovsk Anlaşması* ile Kars-Ardahan ve Trabzon'u Osmanlı'ya bıraktığı gibi yarattığı yeni dengelerle Osmanlı bürokrasisinin manevra alanını genişletmesine yönelik marifetini sergilemesine de fırsat vermiştir.

şarge: şewir+ge>şewirge: Ew cîyê ku hinkî li wê derê dicivin jibo ku şewir bikin. Zemanê çûyî da, rûsîpiyên xanedanan û beg û axayê gund û bajaran, jibo lihevdanîna kar û barê der û dorê û pana welatê xwe ji êrîşê darê zorê, ... Navê cîyê civîna wan "şarge" bû. ...

şaw: şaw: Gelî û neqebê kûr û zirav û teng û dirêj.

şax: Zinar û gulîyê daran, yanî tersê "şaw"ê. Hozan *Cîgerxwîn* dibêje:

*"Ero Sebrî kurê Faro tû kanî? ...
Gelo dîsa li ser şax û çîyan î? ..."*

Şax, bi zeman fire bûye û xêz, şemt, şivtê jî girtîye nav xwe. Ji qiloçên dirêj ra jî têtê gotin şax, jibo ku nola şaxê darê ye.

şe: ev kelîme ji "jêye"yê hatîye piçukkirin. "Jê", bi serê xwe pêşek e (wek jêkirin, jêbûn, jêketin, jêbirin, ...). Ewan muyên dirêj ên ku bi xweydan û şikalê hev digrin, bi dest û pêçîyan yek û yek ji hev kirîna wan gelek zor û zehmet bûye. Însan vî aletî dîtîye, jibo ku ji dar hatîye çêkirin, navê wî jî bûye "darikjê". Piştî ku koçerên Tirkî hatine, ewan dengê "darik" mîna "**targak**" (aletê kolanê) derxistine û îro jî bûye "**tarak**". ... Kurdan jî "darik" avêtîye maye "jê", "jê" jî wek "şe" hatîye sivikkirin. ... Şeyê darîn, şeyê hestî, şeyê hesinî, şeyê lok, ...

şefeq: şev+ik>şevik>şefeq. Şev tersê rojê ye. Şevik: Ew dema ku ronî ji hêsu-yê (ûfuq) dest pêdike lê tarî serdest e, ew dem ne şev e, lê "şevik" e, yanî şeva piçûk e. Di Arebî da "şefeq" e, ev nêzikayî belkî jî bi rasthatin e.

şehîn: Şe: Qûdret, qewt, pêkaribûn, giranî. Hîn: hînbûn. "Şehîn": Ew aletê ku dikane giranîyê hîn bike; qapan, terazî û şehîn jî dikarin giranîya tiştan rava bidin.

şel: cî+hil>şel: 1. Ax'a hev girtîya ku bi gîsin û tevr û bêr û merê ji cîyê xwe têtê hilkin. "Îro cot nabe, erd firîk nebûye, şel davêje". **2.** Di xew da kirin û nûx-aftin û ji oksîjen û hewa parastina hinkî tiştan jibo ku zirê wenda nekin, Wekî bastêx, titun, meşlul, hermo û wd. ... Ewan tiştên weha jibo ku bi şalikan têkin nûxaftin, têtê gotin "tituna me di şelê da ye", yanî di bin şelê da nûxaftîye.

şelo-şilo: Ev kelîme ji "lişo"yê hatîye terskirin. Bn. lişo(ley+şo).

şeng: Şeng: Giyakî kok pîvaz e, şîrîn e. Pelê wî hûr in, zirav in, çîn in, bi nîç in, li ser ax'ê raxistî ne, ne tîk in. Vî navî jî nîçikê pelê xwe digire, lewra dirûvê şe bi pelê wê dikeve.

şeq: 1. Şeq, dengê tabîatî ye. Tiştêkî sert dema ku dişikê, dengêkî dide, em ji wî dangî ra dibêjin "şeq". **2.** Şeq: şeqitandin, şeqizandin, şeqitî, şeqizî, şeqit; hereketa fizîkî ya ne normal. "Lingê min şeqitî", yanî lingê min ji cîyê xwe yê normal derket. Şeqiz: hereketa ruhî ya ne normal; "filankes direwa wî derket ew şeqizî". ... "Te min şeqizand, min jî te şeqizand".

şerr: Kaşana bi tekerlik; dîtina wan însanên ku şikeftên çîwayê Zaxo kolandine.

Ewan însanan alavên cengê bi wan kaşanan dikişandin. ... Bi zeman kelîma şerê hatiye firekirin, bûye navê herb û pevçûnê.

şeqil: şan+qûl>şanqûl>şeqûl: Tiştêkî weka malaya ku diwar pê têtê seyandin, bi tenê texteyê wê qalind e, di rûyê wê yê binî da çend qûlê kor bineqîş kolandine. Axayê gund yan jî serkarê wî(jibo ku rênçber ji keda xwe nedize) koma zadê wî dişeqilîn. ... Şeqûl>şeqil: Ewan qûlên ku komê nîşan dikin. Bn. şane.

şev-şem: Ew 24 seetên ku em jêra dibêjin "rojekî", dema wî ya tarî, navê wê **şev** e, dema wî ya ronî, navê wê **roj** e. Li gora dîne asîmanî ku yek ji wan jî dîne me(dîne Îslamî) ye; Xûda vê alem di 6 rojan da çêkirîye. Ji ber vî hawayê, însan jî 6 rojên birêz ji xebatê ra, rojekî jî, jibo hêşabûna xwe daniye ku bi tevî wî hejmara rojan dibe heft. Jibo her yek ji van heft rojan ra jî divê navekî hebe. ... Jibo ku dema ronî; dema kar û xebat û tevatîyê ye, hejmara 1, 2, 3, 4, 5 têtê ser navê rojê(şem) dibe: Yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem. Roja şeşan, li gora rêza rojan divê navê wê "şeşşem" be, jibo ku sê tene "ş" di kelîmekî piçuk da dicivin, gotina vê kelîmê giran dibe, yanî "şeşşem", ... bûye "în".

şews-sews: şî+weş>şews>sews. Şî: çû(çûyin). Weş: Leq û pêldana bêdaxwaz û hay hejîyan. ... Sews: Nelihevîya ruhî, tersê "şewşe". Şews: nelihevîya bedenê ye. *Filankesî piştî ku wî nexweşîyê derbas kirîye sews bûye.

şeytan: şewtan>şeytan: Navê serkanîya nepakîyan e. Bi zimanê sanskirît "yaksa", bi zimanê Îbrânî "haştan-xaştan", bi zimanê Arebî û Kurdî "şeytan". ... Ev kelîme bi şewatê ra hevdeng e, bi devê Quran'a me misilmanan, çêkirina şeytan jî jî agir e û agir jî tabîatê wî şewitandin e.

şeytanok: Navê kêzikeka gilêzok e ku li cîyê şilek û şînayî dijî. Qaşikekî wê yê gilorê badayî yê sedefî heye ku ew mala wê ye jî. Gelo vê kêzika çilmoka reben vî navî jî kîjan rewşa xwe girtîye? Bi sê rewşan ew ji hevalan vediqete: 1- Mala wê qaşikekî sedefî ye, kûr e, badayî ye û bê mirin jê naye der. 2- Dema ku ji cîkî birêkeve, mala xwe dide ser piştê xwe û dimeşe. 3- Yek orxazma wê (niyana bikêfxweşî) bi hindikî deh seet dajo. Me însanan vî navî li vê rebenê bi kîja rewşê daniye? Min siparte we. ...

şêf: ji+hev>şêf: Zemanê berê, ewan meşk û heban û çekûrê ku jibo çarox û derdanîyê bikêr nedihatîn, kevanîyan, bi kêrê wan çermikan dikirin zulikê zirav û dirêj. Paşê neh qat dihonan û dû tewandinê bi sêpikê ve girê didan, herdu serê kêrûya meşkê, derbasê qûlpê serê wan dikirin. Şêf, di gelek îş û karê malê û cotkarîyê da dihatin xebitandin. Mu, herî û pemu bidestê herkesî nadiketin.

şên: Cîyê avakirî. Dema ku dibêjin "gundê me şên e", yanî gelek avayîyê tijî meriv têda hene.

şêrgele: şêrê+gelî>şêrgele: Di çîrok û xeberojkên kurdan da(... şêrekî di gelî da hebû. ... Pez û dewar nehêştibû. ... Şêrê gelî rê dibirî. ...) însanê zorbe yê bêperwa, xwe bi serbestî serdest dike, jiber vê jêra têtê gotin "şêrgele".

şifa: Ev kelîme di zimanê kurdî da bi "êş+ve" ra nêzedeng e, bi şîfaya Arebî ra jî yekmane ye. ... *Ez bêkeys dêşam, min derman xwar êşa min ve bû. ...

şijk: **şi+jê>şijî>şijk:** "Şi": Di zarava Dimilî da "çû" ye. Piştî ku dew liser agir tête qusandin û dikeve turê jibo ku awa wî jê bête weravtin û bibe toraq; dengê weravtina avê ku turikê -şir, şir, şir - diçe, bûye navê wê ava toraqê, yanî ew ava ku jê(jî toraqê) çûye.

şik: ji "şikandin"ê tête û dengekî tabîi ye.

şik: **şik+al>şik:** Sola kevin. Piştî ku sol kevin dibe, jibo ku çermê wê diqir-miçe serhev, piçuk dibe, ji linga ra teng dibe, ji aliyê pahnî da tête şikandin û navê wê dibe "şik". "Qûreyê şikal bigu": Yanî sola te bûye çekûr tû nikarî cotek solên nû bikirî, tû nizanî liser destavê rûnî tû bi sola xwe dirrî, tû ji vê qûretîya rijî jî nazivîrî.

şikeft: **şik+hev+tê>şikhevtê>şikeft:** Ew tiştê jihev şikandî yê ku "tê" ye, yanî dibe ciyê ku tiştê têda bicî bibe, ne wek şikêrê, bêkeys û bêhewa ye. "şik", çend tiştê ku yekpare bin, yan jî yekpare xuya bikin; eger wek kevirê sert bin, tête gotin "şikandin", eger ne sert bin tête gotin "qetandin. "tê" zerfê cî ye (zerfê mekan).

şikêr: **şik+gêr>şikgêr>şikêr:** Qelş û terkên fire yên bêhawa ku lihev gerandine, di erd û dar û keviran da. "Kûrm û kêzik ji şikêrê dîwar têtin der.

şimar: **şun+mar>şunmar>şimar:** Şûna doxînê, di zarî û dirêjî û nesertîye da, doxîn û mar digihîn hev. ...

şimbêl: **şun+bi+hêl>şunbihêl>şinbêl:** Ewan paleyên ku bi das û darê zad diçînin, dema ku bermila wan tije sap dibe ew wî sapî şûnda dihêlin û karê çinîne berdewam dikin û her cara ku bermila wan tije dibe ew li cî da dihêlin û karê xwe berdewam dikin. Jiber vî navê wê koma piçuk bûye "şinbêl". "Şun": paş, cî. "Şinbêl": Paş bihêl, cî bihêl. ...

şimik: **şun+pê+ik>şimik:** Şuna pê, ciyê pê; ew ciyê ku însan piyê xwe dike nava wî.

şipil: **jî+pil>jîpil>şipil:** Însan û heywan û çandiyên ku ji heval û hogir, der û dora xwe zûtir û pirtir pêşta here gewî bibe. Dema ku tête gotin "ev zarok şipil(jîpil) e", yanî di jîyanê da pil dide. ... Ji hevalê xwe şîttir e, dirêjtir e, haydartin e, ...

şitil: **şîn+têl>şîntêl>şitil:** Têla şîn. Ew welatê ku avhawayê(îqlîma) wî sert be, hinkî çandiyên avî, jiber kinîtiya zemanê germ, pêra nagîjin ku di beriya hatina sermayê payîzê da ber dibin, wek îsot û balîcan û firingîyan, titûn û wd. di meha Sibatê bi derengî Adarê da, di çend mişarên fire da bi gûbra tarîş tête ajotin, di pêlê serma da tête nûxaftin, bi firaqan tête avdan. Gava ku nû şîn dibe, jibo ku zirav û dirêj e, navê wî "şîntêl>şitil" hatiye danîn. Di meha Gulanê da rojê hinkî ji wî şitlî tête rakirin û bi rêz di nava xetan da tête çikandin. ... Li başûrê Hind û Çînê, hinkî zevîyên ku ava wan dereng diwêrive, birinc jî bi şitlan tête ajotin. ...

şivt: **şiv+tê>şivt:** 1. Çova zirav, çekê wî merivê bêçek. 2. "Palas reş e, lê şivtê

wê sipî ne", yanî ewan xetê ku têda ne wekî şivê zirav û dirêj in. "Xaliya me bi şivt e, a we bigul e". **3.** Di hinkî devokan da têtê mana "semt" û "tax"ê.

şiyandin: şiyandin-çûyandin: "ç" û "ş" jibo ku hevdeng in, "şî" Dimilî di Kurmancî da wek "çû" têtê gotin. Şî+andin>şiyandin.

şiyar: hiş+yar>hişyar>şiyar. Yar: heval, dost, ew kesê ku di xew da be, hişê wî ne yarê wî ye, ne dost û hevalê wî ye. Piştî ku ji xew radibe, hişê wî dibe yarê wî, wê demê jêra têtê gotin "hişyar".

şî: Şî: Qûdret, pêkaribûn, giranî, ... Di hindek devokên Kurmancî da û di zaravayê Dimilî da "şi-şê" têtê pêşîya lêkerê("ez şe nakin-ez ne şe me", "ez şe dikim- ez dişê me"; yanî "ez nikanim", "ez dikanim". Bi Dimilî jî: "Ez şikena- ez nêşikena") qûdret û pêkaribûnê dide zanîn. Di hinkî devokên Kurmancî da jî "şi-şê" dikeve paşîya lêkerê(fi'ilê). Şîyîn-şîn: Qûdret. Xanî di hejmartina sîfetên Xûdê da dibêje:

*"Xweşî, şîn û zanîn û vîn kelim,
Bihîstin digel dîtîne bûn temam".*

şîn: jîn>şîn. "Tovê me şîn bû", yanî jîyan kete tov, nemir. "Rûyê erdê şîn bûye", yanî jîyan ketiye rûyê erdê. ...

Ew şîna jibo mirina merivan têtê danîn, jiber civîn û pirhatina însan e, jibo ku dilragirtinîkî bidin dilşewatîyên mirî, yanî wendabûna wî însanê mirî, bi dilgirtin û alîkarî piraniya xwe bidin wendakirin.

şîret: şîret: jîrîtî. Dema ku yek şîretekî li yekê dî dike, ew dixwaze jîrîtîkî bide wî. "Xoce. şîret li zarokan dikin". Ji gotinê nerast ra nayête gotin şîret. Her wekî ku *Melayê Cizîrî* dibêje:

"Xelkno li min kin şîretê, ew dilbera zêrîn kemer."

şîrêz: çîr+rêz>şîrêz: Ew tiştê ku jihev çîr bûye, qetyaye herdu aliyê wê ji rêza hev derketine, ew tişt wan dike rêz, digihîne hev, jibo vî navê wê hatîye danîn "çîrêz>şîrêz".

şîrîn: şîr+în>şîrîn: Ew tiştê ku wek şîr e. Însanan şîrînîyê berîya her tiştî di şîr da dîtîye, jiber vî, herçî tiştê ku şekir têda hebe, jêra gotîye "şîrîn", yanî tama "şîr" dide.

şîp: cîyê+pe>cîyêp>şîp: Ew kevira dirêja yekane ya bi kobe ku li jêrê derî bi dirêjayî têtê danîn, ew jibo derî dibe çarçeva jêrîn. Liser herdu serê wê jî, her aliyekê şeş-heft kevîrê bi kobe ku ji wan ra dibêjin "sehem-xibe", li ser hev têtin danîn, ew jî dibin çarçevyê rast û çepê derî, derîyê xan û sera û kela û suran bi kevîrên weha têtin honan. Xanîyê kevin yê Dîyarbekir, derîyên wan û pencereyên wan bi tevayî ji van kevîran hatine honan.

Jibo ku di zimanê Arebî da dengê "p" tune, di devê medresê da "şîp" bûye "şîf".

şolî: şo+lêl>şolê>şolî: Ava şolî: Ew ava ku bi rengê xwe wek ava leyî(lehî) ye, yan jî pê tişteki hatîbe şuştin, rengê wê digûhûre, şolî(şêlo) dibe. "Lîşo" jî têtê gotin.

şonik: **şo+nig>şonig>şonik:** Ew darê ku cil pê têtê şuştin, têtê kûtan, nigê cil şuştinê. Bi Dimilî jî dibêjin "kûwenî, konî".

şorax: **şor+ax>şorax:** Ax yan jî erdê şor. Ew ax û erdê ku xwey têda pirr be, jî çandinîyê ra nabe. Ev gotin derbasê Tirkî jî bûye û bi Tirkî jêre têtê gotin "çorak".

şoreş: **şur+weş>şurweş>şoreş:** Mûcadele, tekoşîn û şerkirina bi "şûr". "Weş": weşandin, dawêşandin, lêxistin. Jibo ku berê "şur", serekê çekê şer bûye, navê tekoşîna biçek, "şurweş" hatiye danîn. "Şûrweş" hatiye sivikkirin bûye "şoreş".

şuş: Tiştê zirav û dirêj(wek marr û xişt û tîr) gava sert û zû diçin dengekî derdix-in, wekî ku bibêjin "şuşuş". Ew dengê ku ji wan têtê der, bûye navê wê çûy-inê. Her wekî ku têtê gotin "marr şuş bû", "xişt di ber serê min da şuş bû". ... Bi zeman hereketa(şuş) tiştê zirav ê dirêj ê madenîyê navtije jêra bûye nav, jibo ku hereket û navê wî jihev bête veqetandin, "şuş" bûye "şîş".

T-t

ta : **1.** Navê nexweşîkî ye, bi zimanê tibê ji kamuta(mîqroba) wî ra têtê gotin "plazmodyom vîvaks". Di welatê me da ta, ji sedî da zêdeyê notî, ji wê kamutê, bi xortoma kermêşê (cinsê ku jêra têtê gotin "anofel") derbasê xuna însan dibe. ... Vê nexweşîyê navê xwe ji dermankirina xwe girtiye. Serbûriya (macera) vî navî ku li vê nexweşîyê hatiye danîn ev e: Dibareya dîtina mîqro-ba tayê û dermanê wê nexweşîyê da; ew kesê bi wê nexweşîyê biketa jibo ku bêhiş xeber dida, nexweşî diket ûstûyê cin û perîyan. Jibo dilragirtinê "ta"ki benê xam li zendê wî kesê nexweş dihate girêdan. ... Piştî ku mûsilmanî hat, hinkî girêk û xwendin û pîfkirin jî ketin kêleka tayikê xam, dilragirtin jî zêde bû. ... Navê vê nexweşîyê, ji wî "tayê xam" hatiye.... *Xoce taya min girêda min şîfa dît. ... **2. Ta:** Max. *Çend tayê axurê vevatine, xwar bûne. ... **3. Ta:** Jibo dirêjkirina zeman têtê xebitandin. *Ez te dipêma tu werî. **4. Ta:** Jibo dirêj û dûriya cîyekî: *Mala me waye ta li perrê gund e. **5. Ta:** Qat, tebaq. *Xaniyê me du ta ye; du qat e. *Xaniyê mala apê min sê ta ye; sê qat e. **6. Ta:** Fera barê dewarê barkirinê. * "Barê qantira pêşîn takêş e", yanî ferkî ji fera dî girantir e. **7. Ta:** Tiştê zirav û dirêj ê nebatî(çandî). Wek: Takî hevda, takî gîya, takî firîgê noka.

taban: **ta+bin>tabin>taban.** Ta: fer. Bin: Tersê ser, zemîn û qatîyê tiştê avakirî; wekî wan herdu tayê ku bihevra dibin "bar". ... Ev herdu tayê ku ji wan bar çêdibe, paralelê hev in. Ev herdu tayê ku ji wan avayî çêdibe, tîkanîyê hev in. Her wekî: Taban û tawan, taya bin û taya ban. Bi vî hawayî herdu jî dibin taban, jibo ku ji hev bêtin veqetandin, di fera jorîn da, "b" dibe "w", "taban" dibe "tawan". ... Dibe ku eva jorîn "tawan" be, yanî cîyê "ta"yan, cîyê maxan.

tabut: dar+but>darbut>tabut. *But:* Tiştê ku wek tûmûk ji dora xwe bilindtir be. Butika nava rezan, jibo ku ji derûdora xwe bilindtir e, vî navî girtî ye. Tabut>darbut: Ew tiştê ku di nava der û dora xwe da li cîyekî bilind e, liser mila ye. ...

Tabut, dibe ku ji veşartinê jî hatibe. ... Hinkî nexweşîyên ku di qunê da têtin dermankirin, gava ku hekîm şeklê xebitandina wî dibêje, ... Hun vî dermanî derbasê "tabutê" bikin. **Tabut:** tarî+but.

taht-text: Kevirê pahnê mezin. Text: Darê pahnê mezin. Ev herdu kelîme hevşekil û hevdeng in. "Taht" tabî'î ye, "text" destane(sûnî) ye. Hevdengîya "text" bi "teht"ê ra, ji hevşekilîya wî ye.

tajî: Kuçikê nêçîrê, jibo ku purtê wî hûr e; di nava cinsê xwe da li gora yên din hûrepurt e, wekî ku tazî be. Bn. tazî.

tane: tay+ane>tayane>tane: (mîrane, dîwane. Rojane, salane, mehane, ...) Bi pirranî li pey hejmarekî da têt: Du tane, deh tane, ... Du tane zebeş bi destekî nayêtin girtin.

tarak: darek>tarak. Şe, însan jibo ku porê xwe duz bike, çend tene pîjik kêlekane(peralel) bi hev ve girê dida, gincîyê porê xwe bi wan jihev dikir. Jibo ku darik, bi pirranî di perçikê avêtî da dihatin xebitandin. "Şe" kete cîyê wî. Bn. şe.

tar û tur: *Dar û tur:* Fêkî û zêrzewatên ku ji kemê û lemê têtin. Dar(tar): Ew nebatê ku ji erdê tîkanî radibe; dara sêvê, dara zerdelê, kema balican û îsotê, ... Tur: Ew nebatê ku liser erdê bi dirêjkanî pahn dibe; tura lema xiyarê, kundirê, ...

taştê: tav+eşt+î>taştî>taştê: "eştîş" bi Dimilî "avêtin" e. "Tav eşt"; Tav avêt, tav derket. "Taveştî": Ew tiştê ku di wexta tav avêtinê da têtê kirin. Jibo ku berê kar û bar hemî bidestan û milan bû, însanê rençber dibe'riya rojavêtinê radibûn. Wê gavê tiştê ku dixwar, navê wî "xûrînî" bû(xûrê nû-xwarina nû). Piştî ku roj bilind dibû, hê nû xwarina pahtîya bitevayî dihat çêkirin, navê wê xwarinê "taştê" bû. Ev, dibe'riya ku hê zimanê kurdî şax û gûlî nedabûye, yanî nebûye çend lehce(dîyalekt). Gotinê weha di Kurdî da gelek in.

tatêl: ta+tol>tatol>tatêl. *Ta:* Ew nexweşîya ku însan dilerizîne. Bn. ta. *Tol:* heyf. Dema ku têtê gotin "filankesî tola xwe girt", yanî heyfa xwe girt. Bi zeman "total", bûye "tatêl". *Ez di tatêla te da me; ez di taya hafa te da me, gelo tiştêkî hate serê te yan na, te pêk hanî yan na, ez di taya te da me. ...

taw-tawan: *Taw:* qebûl, zimanê çandîyê(kulturê) jibo ku di bin giranîya medreseyê Arebî da hatiye pelaxtin, "taw" hatiye jibîrkirin. Bi tenê di devê leyztika zarokan da û li hinkî cîyê ku di dûrê medresan maye da maye, di cîyê wî da qebûl hatiye gotin. ... *Ez vî îşî, vî tiştî taw dikim. Ez vî hawayê taw nakim. ... Ew "taw" e ku bûye "tawan(cerîme)". **Tawan:** taw+van >tawvan> **tawan:** Ew tiştê ku ji ber sucekî ve têtê tawkirin, qebûlkin. Ev "tawan" û "tawan"a ku "qatî" ye, bi cotenivîs û qalîn xwendinê jihev belî dibin.

taybefî: ta+bi+ta>tabita>taybefî: Du tiştê dengê(qasê) hev, du tiştê hingê hev,

du tiştê jibo hev, du tiştê hev girti, du tiştê lihev. Li vê derê "ta", ferê bar e. "Taybetî", taya bi tayî, yanî barê ku divê herdu tayê wî dengê hev bin, ku bibin xasê hev. ... *Bi taybetî tû vî îşî çêke; yanî çêkirina vî îşî xasê(hasê) te ye. Ev avayî bi taybetî hatiye çêkirin; yanî her tiştê wî xûsûsî ye.

taze: da+za>daza>taze: Ew tiştê ku ji dê zaye, paşê firew bûye û di hinkî herêman da jî "teze" têtê xebitandin. * Ez teze hatim. * Nanê teze bixwe. * Filankes xortekî teze ye.

tazî: da+zê>dazê>tazî: Tiştê bêcil û pirç û purt, em jêra dibêjin "tazî". Lewra ew bi hawayê ji dê zayî ye. Tû tişteki di hawayê ji dîya xwe bûyinê da namîne; eger însan be, cil lê têtê kirin; eger heywan be, hêdî hêdî purt lê têt; eger ji cinsê rut be jî, çermê wî sert dibe. ... Bi zeman tazî fire bûye. ... "Mala tazî": Ne raxistî. "Kêra tazî": Bê kalan. "Kerê tazî": Bê cil.

tegel: du+kêl>têgel: Dûrûtina dukêl, du tew, du qor.

tek: ta+k>tak>tek: Li vê derê "k" jibo zeximkirina yekîtiya "ta"yê ye. *Filankes hevala wî mirîye, ew tek maye. Di vê malê da kevanî, tek qîza malê ye. "Filankes tek e", yanî yek ta ye, tayeka bi tenê ye.

tek-tuk: *Tek:* yek, *fer.* *Tuk:* Duyik. * Di çarşiyê da tek-tuk însan hene, yanî yek û eva du yekî ku dudu ye, wekî ku bibêje yek-du însan hene.

tene: ta+i+ne>tayîne: Tiştê ku libê wî bêhejmar bin, yanî "ta"yê bêhejmar. Ev kelîme bi zeman bûye navê zad. ... *Par, tene nehat, îsal baş in.

tenê: ta+i+nî>tayînî: "Ta"yê lixweser. * "Filankes bitenê maye", yanî ew maye wek tayê lixweser.

teng: tenk>teng: Piçukîya ji firetîyê. "Axur ji pezan ra teng e", yanî firetîya wî têrê pez nake. "Ta", li vê derê kêmanî û piçukatî rava dide.

teneke: tenik+e>tenike>teneke: Ew tenika ku sîfet e, jibo ku bûye nav, "e" hatiye dawîya wî. "Teneke" ji kurdî derbasê zimanê Girek bûye û di Girekî da bûye "tenekhos".

"Tay", di lehceya Dimilî da jî piçukî, kêmanî, carana, hinkî û hindikî rava dide. Tête zanîn ku gelek gotinên ku hindikî, kêmanî û piçukî di wan da heye, koka wan "ta" ye.

tenik: tayînik>tenik: Piçukatîya ji pahnatîyê. Li vê derê jî "ta" kêmanîki dide çêkirin. *Kirasê te tenik e, ma tû nacemidî? Palas tenik e, tû ê bicemidî.

terzî: derzî>terzî: Ew kesê ku îş û karê derzîyê dike. *bn.* derz, derzî.

tej: tîş>tej: Cîraxa zirav û dirêj, hola erdê zirav û dirêj. ... Ev nav ji tîşê hatiye; ewan tîşê axê û cîraxê, wekî ku berê bi hinkî dî ve yekpare bûne, paşê bi tîşkirina ji wan hatine jêkirin. ... *Rîs qedya teja me nîvco ma. Me teja erdê ber çem kirîya kûncî(li vê derê tej bi mana perçê erd e). ...

tekuz: têk(di+êk)+duz>têkuz>tekuz: Tiştê ku bêtêmanî bête çêkirin. "Xaniyê me tekuz bû", yanî bêtêmanî qediyaye, tû xirabîyekê nayte ser. "Min vî îşî tekuz kir", yanî min wî îşî kêmanî têda nehişt, bêtêmanî qedand.

tekerlek: di+ger+li+êk>digerlêk>tekerlek: Ew tiştê ku li êk(lihev) digere. Ev tiştê ku jêra têtê gotin tekerlek, ew dîtina însanê ku di şikeftên çîyayê zaxo da,

berîya miladê bi hezaran sal jîyîne. ... Navê arebaya wan jî "ser" bûye.

tencere: tendure>tencure>tencere: Ew tiştê ku di nava tendurê da tête danîn. Di hinkî herêman da "d" werdigere bi "c", di şuna ku bibêjin "dîya min", dibêjin "ciya min". Însanê berê dan û avê dixistin dîzikê û dîzika xwe dixiste nava tendurê, jiber vî navê wê dîzikê "tendur" hatibû danîn. ...

tendur: tîn+dor>tîndor>tendur: Ew tiştê ku dora wî bi tîn(germ) e; ew cîyê ku agir têda tête vexistin, dora wî germ dibe, tîn dide jibo ku nan bipêje. Di gelek herêman da ji wî ra dibêjin "tendur".

terîşandin: der+hêş+andin>derêşandin>terîşandin. Hêş: ew kel û pel û perçik û pîjikên ku bi daran ve ne, ji zirîya darê dixun û ne sî didin ne jî fêkî digirin, ewana hêşa darê ne, yanî der û dor li darê digirin. Di terîşandina darê da ev hêşana têtin jêkirin.

terk: der+ik>derik>terik>terk. Der: Tersê hûndir. "-ik": Paşeka nav çêkirinê ye. Ew tiştê ku bi derva da hatîye avêtin. Ev terka Kurdî bi "terk"a Arebî ra dibe yek, bi min ew ji Arebî nehatîye. "Hevalê min cixarê terk kirîye", yanî dev ji cixarê berdaye. "Min terka hevalan nekirîye". "Min leyztika qumarê terikandîye"....

ters: vajîyê rast e. Ev tişt ters e yan çewt e, berpaş e, nameş e. ... Serîya vê kelîmê **t, r, s** tiştê ne rast û nepak nîşan dike: Tirs, teres, ters, turs,...

terxan: der+xan>derxan>terxan: Ew kesê ku bi xanî ve(bi malê ve) benê wî nemaye, ji dervayê malê dimîne.

tet: destê piçuk, destê zarokê piçuk ê ku nû bi ser piyan dikevin, jibo ku hînê gav avêtinê bibin, malî wan radikin ser pîyan û piçekî xwe dûr didin, destê xwe bi alî wan da dirêj dikin dibêjin "tetê, tetê, ..." , yanî tû jî destê xwe bide min(dest jibo sivikîyê ji zarokan ra dibe "tet"). Zarok ji jibo ku nekeve, gava xwe davêje û destê xwe pêra dirêj dike.

tev: di+hev>dihev>tev. Wan daran tev bîne; dihev bîne. ... "dihev" bûye "tev", hingî di hev da kelyaye bûye wekî kelîma yekrû. Jibo vî, em dema ku hinkî gotinan dipişkêfin; wekî "tevdan", "tevkirin", "tevîhev", ... Tevdan: di hev dan, tevkirin: di hev kirin, tevîhev: Di tev î hev. ... Binge û kokê gelek kelîman hingî kûr in, eger hemî bête kolan, roj û rûpel têra wan nakin. Jibo vî hawayê, ez bi tenê ji serê hokê girê dipişkêfîm û bi we disipêrim. Di devê rê da dê gelek girêyên kor derkevin, lê eger dilxwaz bigerin û bifikirin dê wan koregirêkan bipişkêfin. ...

tevayî: di+heva+î>dihevaî>tevayî: Di zikê hev da, bi pirranî. * Bi tevayî gundî ji bajarîyan diristtir in. * Be tevayî sextekarî di nava xwendayan da ji nexwendîyan pirrtir e. * Kompleks, di jinan da ji mêran pirrtir e.

tevir: di+hev+herr>tevir: Ew tiştê ku herîyê lihev dide, serûbino dike. Bi zeman tevrik bûye navê wî aletê ku ax'ê dikole. Di dîyalekta Dimilî da jêra dibêjin "kolbe".

tevn: ta+di+hev+in>tadihevin>tevn: *Ta:* ben. *Dihev:* Xistina nava hev. *În:* Daçêka nîsbetê ye. Ew dezgayê ku li ser wî "ta" dihevda tête bûhûrandin, der-

- baskirin ku dibe cil û kincê wergirtinê. Tevna kerkît, tevna hûr, ...
- tew:** Ev gotin bi eslê xwe "tû hawa" ye, dema ku em dibêjin: "filankes tew naye", yanî bi "tû hawayê" naye.
- tewş: ta+weş>tewş:** Ewan tayê zad û fêkîyan ku tenê fêkîyên wan ji wan weşiyabin, ewana çawa vala ne, hêvîya zad û fêkî dayinê ji wan hatiye birrîn, her weha ew kesên ku ji xwe ra û ji der û dora xwe ra bikêr nebe, xebordanê wî vala bin, tevgerên wî ne di cî da bin, ew jî dibe wekî sap û dara berweşandî.
- tezgah: dest+gah(ca)>destgah:** Cîyê dest; cîyê ku liser wî yan jî navgînên ku bi wan kar û xebata destan dibe.
- tê: 1.** Lêkera alîkar e. Di serê hinkî lêkeran da têt, mana digûhêre: Dayîn-têdayîn, bûyin-têbûn, çûyin-têçûn, kirin-têkirin, ... **2. Tê:** Qebûl. Ev îş *tê* ye; hatiye qebûlkirin. Ne *tê* ye, nehatiye qebûlkirin.
- têjik: tê+zik>têzik>têjik:** Ew tiştê ku zik tê dike, diwerimîne, tije dike.
- têkda: di+êk+da>diêkda>têkda:** Hemî bi hev ra. ... Melayê Batê di mewludê da dibêje: ... *Têkda rabin û biçine cenetê.* ...
- têkra: di+êk+ra>diêkra>têkra:** Tavayî, ûmumî. Ev baran *têkra* ye; ûmumî ye. ...
- têl: dêl>têl. Dêl: du+hêl>duhêl>dêl:** Duva zirav. Ew tiştê ku li du wan, li pişt hêla dawî zirav û dirêj in(jibo ku bitevayî duvê heywanan zirav û dirêjin) ... Navê tiştê madenî yê ku zirav û dirêj in, "têl" hatiye danîn.
- tif-tuk:** Avêtina gilêz û ava dev. Wî vî navî, ji dengê avêtina xwe girtiye.
- tifik: tê+vê+k>têvêk>tifik:** Koka wî "têvêk" e, yanî ew cîyê ku têda vêketin, agir vêxistin çêdibe. Şeklê wê: Ji axa sor a bê ka têtê çekirin û ji bûhûstekî zêdetir bilind e, fire ye û ji sê bûhûstî jî dirêjtir e, lê niv dayre(helqa) ye. Carna ku ji nişka ve nan biqede, kevanî çend nanê hişkava lê dide, ev nivten-dura nava malê ji sê nanan zêdetir jî napêje.
- tîlî: dêl+î>dêlî>tîlî:** Duvê zirav û dirêj. Jibo ku pêçî jî weka duvikê zirav û dirêj ji navdest bi derva da dikêşin, vî navî girtine. Jibo ku ji duvik veqetin jî, "d" bûye "t", "dêl" bûye "têl" û "î" jibo wekbûnê ye. **Tîlî:** Ew tiştê ku wekî dêlê ye.
- tîlîlî: tû+lê+lê>tûlêlê>tîlîlî:** Dengê ku jibo dîyarî û şênîya dawet û dûgûnan têtê derhanîn. "tû lê", yanî tû lê binihêre. Di nava xelkê da, gava ku tişteki jî normalê derva be, têtê gotin "tû lê, tû lê", yanî tû lê binihêre. Di şênahîyê dûgûn û dawetan da, jibo ku rindî û xeml û xêza bûkê, ji berbûrî û xwendî û derûdorên ra dîyar bikin û bala wan bi alîyê bûkê da bikişînin, bi piranî keçik û jinên ku ji alîyê mala bavê zava ve bi qoro dibêjin, "tîlîlîlîlîlî. ... Yanî tû lê binihêre, tû lê binihêre. ...Bûka me çi rind e, çi bi xeml û xêz e, çi hêja ye. ...
- tir:** di dawîya sîfet û zerfan da têt, jibo pêşxistina wan a ji hevalê wan: Hêk ji gozê mezintir e, çiyayê Agirî ji Sîpanê bilindtir e, roj ji hîvê dûrtir e, ...
- tirê:** Bi dawîya navan û demîran va dibe, cîyê texmînê digre. *Ji min tirê, îro baran nabare. *Ji bavê min tirê, dunya hê jî a berê ye.

tirnak: tilî+nûk>tilnûk>tirnak. *Til:* pêçî. *Nûk:* Çinika ku bi tişteki ve zêde dibe, dengê tabîi ye. Bn. nûk. Jibo ku Kurd û Tirk pir zûda bi hev da çûne û hatine, di nava hev da mane, hinkî gotinan jihev girtine. Bn. nûk, tilî.

tîr: tê+ra>tîr: **1.** Ji kevan têtê avêtin jibo ku di tişteki da here xwar, çik bibe. **2.** *Tîr:* Hevber tenikê herikî. * Mastê çêlekê tenike e, ê gamêşe tîr e. Şîrê terşe terzayî tenik e, ê kandoyan tîr e.

tîrêj: tîj+rêj>tîjrêj>tîrêj: "Tîj" bi Dimilî navê "roj"ê ye. "rêj" jî, ji "rêtin"ê ye. "Tîrêj": Dirêjbûna, 'rêj'bûne zereyên rojê.

-tî: Di dawîya hinkî navan da têt, jibo sîfetekî ji sîfetê xûdîyê wî navî di yekî di da nîşandan; "filankesê di vî îşî da kerîtî kir", jibo ku ker di nava xelqê da bi hovîtî û dengliserî hatîye naskirin.

Dema ku em dibêjin "wî kerîtî kir", wekî ku em bibêjin "wî hovîtî kir, ahmaqî kir". "Filankesî rovîtî kir", jibo ku rovî bi fenekî têtê zanîn, wekî ku em bibêjin, "wî fenekî û lêpbazî kir". Eger "-tî" di dawîya sîfetekî da bête, wekî "dîn", "pîs" yan jî navekî ku têda sîfet jî hebe, wekî; jin, mêt, pîr, qîz, law, ...

Wê gavê ew jibo cî girtina wî sîfetî yan cî negirtina wî, di wî navî da gûhartina mana çêdike; pîsîfî, dînîfî, jinîfî, mêtîfî, pîrîfî, qîzîfî, lawîfî, ... Ewan "î"yê ku di berîya "-tî" da hatine, ew jibo hevkelî ne, jibo ku dawîya wan tîpê bideng in. Eger kelîme du deng be û tîpa dawîn jî bideng be, wê gavê di pêşîya "-tî" da "-a" têtê. Wekî: Mezinatî, piçûkatî, merivatî, westatî, xirabatî, ... **2.** *Tî:* Li gora jinê, birayê mêtê wê. **3.** Av wendakirina wicud, ihtîyacîya bi avê.

tîş: Dengê ku têtê der, ji çîrbûna dar liser dirêjayîyê. Çîrbûna tiştê tevnî, kêrran bûye "tîş". *Tîş li ûstunê ketîye. *Dîwarê gomê tîş bûye. *Tîş li kendalê sor ketîye. ...

tol: **1.** Ew tiştê nehêja yê avêtiyê ber piyan. Wek: Kertol: kerîyê nanê avêtî. *Kartol:* Ew jî jibo ku di nava axê da gevizandî ye, wek kartolê ye. **Pertol:** *per+tol>pertol:* Perikê dik û mirîşk û êd. ku ji wan weşyane, ketine ber piyan. ... **2.** Tol, bûye navê heyfê û întîqamê, lewra dema ku yek xirabî bi te bike û tû jî heyfa xwe ji wî negirî, wê gavê ew heyfa te dibe wek kerîya nanê ku tol e, yanî ew heyfa te dibe wek tişteki avêtî yê nehêja, dema ku te heyfa xwe ji wî girt; têtê gotin ku te, wî tiştê ku tol bû, yanî avêtî bû, nehêja bû, te wî jiber piyan hilanî û ji xwe ra kire mal.

top: Ji dengê tabîatê têtê. Bn. ttep, ttepik, ... Ttep: nîv top. ...

topal: top+al>topal: Ewê ku alîyekî wî top bûye, çûye serhev, kin bûye, xwar bûye, jê bûye, ... Bi pirranî jibo kêmanîya di lingekî da têtê gotin.

topîç: top+pîj>topîj>topîç: Şonika mezin. ... Berê jibo ku zivînekê xanîyan ji pîjîk û gezîyan bû, ew axa ser wan ku baranê lê fikir, nerm dibû, ewan pîjîk û çîrpîyan jî jihev diketin, hev berdidan. Jibo ku ewan pîjîkan top bibin, bi wê şonika mezin dihate kûtandin.

toraq: do+rok>dorok>doraq>toraq: Di lehca Dimilî da ji "dew" a Kurmancî ra dibêjin "do". Dew piştê ku liser agir têtê kelandin diqûse, kevanî wî bera

turê dide jibo ku ava wî biwerive. ... Ew bermayê ku di turê da dimîne, navê wî hatiye danîn "toraq".

tur: **du+rû>durû>dur>tur:** Du parçeyê tevnî ku hatine rû hev; ewan tiştên ku du rûyê wan digîjin hev. Tête gotin "me wan merivan, wan tiştan hanî rû hev. ... "Xaniyê min li rûyê xaniyê we ye". Tête zanîn ku rû hevî, nêzikî û berhevî ye. ... bn. dûrun, dûrutin.

tuzax: **duz+ax>duzax>tuzax:** Davika ku di binê axê da hatiye danîn û ax li ser wê hatiye duzkin.

tû: **1.** Demîra şexsê rûbirû yê faîl, jibo tevî zemanan(bi tenê lêkera gerandî ya zemanê çûyî ne têda: Ew ê te ye.): Tû hatî, tû çûyî, tû dihatî, tû diçûyî, tû dê bêtî, tû dê biçî, tû dibî, tû yê bibî, ... **2.** *Tû:* hêç. Filankes, filan tişt ne "tû" ye; hêç e. **3.** *Tû:* Tişt, di hinkî zaravayê Kurdî da, wek: di Dimilî û hinkî devokê Kurmancî da "çû" di cîyê "tû" da têt. Di gelek zimanan da jibo ku nêzedengê hev in; yanî ji serê ziman û paşîya dindanê jorîn têtin der, **c, ç, s, ş, t, r, l** cîyê hev digrin, bi hev digûhêrin. "Filankes ne tûye(ne çû ye)", yanî ne tişteke e. Jibo zêde ravadana nepakîyê, "ne tû tişt e" jî têtê gotin.

tûhaf: **tû+hev>tûhev>tûhaf:** Gotinê hevnegirtî. ... "Ev gotina te bi min tûhav e", yanî hevgirtin têda tûne ye. Carna jibo îş û kar jî "tûhav" têtê gotin: "Ev kirina te bi min tûhav hat", yanî min ji te tiştê weha hêvî nedikir.

tûlinc: **tew+ling>tewling>tûlinc:** Rûniştina bi tewandina lingan(çokan) bê ku kûlêmek bigîjin erdê. Bi piranî jibo însan û heywanê bi pencik têtê gotin. * Zarokan liber dîwar tûlinc dane. *Kûçik liser tenûrê tûlinc daye. *Pisîkê li ber tîfikê tûlinc daye.

tûne: **tû+ne>tûne:** *Tû:* qet, hêç. *Ne:* tersê hebûnê. *Tûne:* Nebûn, qet, hêç, na. "Tû" û "na" di hev da kelyane bûne tek kelîme, jibo vî hawayê em dikarin bibêjin "tûne" yan jî "tûne ye". Tişt na(ne). "Îsal zadê me tûne", yanî zadê me 'tiştê na' ye; tiştê ne xwedîyê hebûnê ye. Li vê derê "tû" û "ne" hingî bi hev ve kelyane ku bûne wek kelîmeka sade, jibo wî, em lê hay nabin yan jî em gûh nadin vî hawayê ku em ji neheyîkî ra dibêjin "tişt". "Tenê" û "tane", ew jî ji "tû" û "ne"yê hatine çekirin. "Dane" jî, ji "tane"yê û ew jî, ji "tûne"yê ye. Ew jî me li jorê gotibû koka wî "tû+ne" ye. "Nîne" û "nîye" jî, ji "ne"yê têtin: Zadê me nîne; zadê me nîye, ... Evana devok in, di xebirdanê herêmî da dimînin, nakevin zimanê qelemê.

ttapan: **tta+pahn>ttapan.** *Tta:* Maxê xanî. *Pan:* Pahn. Dema ku dibêjin "xanî ttapan bû", yanî ttayê wî daketin xwarê, li erdê pahn bûn. ... Ttapan: Ttaya ku kesekan pahn dike. Jibo ku şelê nava şûvan bêtin hûrkin, ttayekî(maxekî) giran, di cîyê halet da peralel bi nîr ve dihatin girêdan. Hem kesekan hûr dikir, hem jî tov dinûxaft

ttar: Ev nav, ji dar hatiye wergerandin. Dar, mana wî pirr fire ye: Dara fêkî, dara bîyê, darê şivan, darê şewatê, ... Piştî ku bûye navê şeklê tişteki ku ji dar hatiye çekirin, di kelîma wî da guhartinekî çêbûye, yanî "dar" bûye "ttar". "Ttar": Ew tehtikê pehnê tenikê dirêj ku lihev hatiye tewandin û herdu serê

wî bi hev ve hatine perçinkirin, bûye wekî legeneka piçuk a bê binî; *ttarê bêjîkê*, *ttarê moxilê*, *ttarê sergînê*, ... Ev kelîma *ttar* jibo bêkeysîyê, tenganîyê têtê gotin: Dinya li min teng bû wekî *ttarê bêjînkê*. Ew kesê ku *ttar* derbasê serê wî bibe ew dora xwe nabîne.

Ew "tarî"ya ku tersê ronîyê ye, ew jî ji "ttar"ê hatiye: "Dinya tarî bû", yanî çav tiştê nabîne, wekî ku ketibe nava *ttarê*. Bi zeman mana vî gotinê fire bûye, bûye navê tersê ronîyê. *Tarîyê bi ser me da girt. Tarî rûnişt. Dinya bû tarî.

ttep: Destekî nîvgirtî ku sert li tiştêkî bête xistin, ew dengê ku ji wê lêdanê derdikeve, bi dev jêra têtê gotin "ttep". Eger ew tişt hinkî bi av be jî, şuna navê dest *rep* dimîne, ji wî ra jî têtê gotin "ttepik(ttep+ik)". Paşê fire bûye; herçî tiştê ji der û dora xwe bilindtir "ttep" e. **Tepe:** *tep+e>tepe*. Têpa serî, ...
tto: Qaşîkê ku ji tiştê ron bijor dikeve û wî dinixwêfe: Ttoyê şîr, ttoyê mast, ...
ttol: Ew jina çavlider a ku li pey tolazîyê digere, jiber vî hawayê, ew li gelek ciyan têtê dîtin.

ttolaz: *ttol+zî>ttolaz:* Ew mêrê ku li pey "zî"yê(tiştê ku mê, bi wê mê ye) digere.
ttolik: *ttol+ik>ttolik:* Navê gîyakî ye, pelê wî gilor in, bi nîçik in, jibo ku ew jî wekî jina *ttol*; cî û warê wî tûne ye, li her ciyê şîn tê, vî navî girtiye.

ttov: *tto+ve>ttov:* Tiştê çandî, wek genim, ceh, nok, ... Jibo ku di axê da têtê veşartin, ax liser wî dibe wek *tto*, piştî ku ew jêrda zîx dide, bi dîyar dikeve, bivênevê, ew wî "tto"yê vedike, kûn dike ku bidîyar dikeve, jibo vî jêra têtê gotin "ttov". Yanî wî, ew axa ku liser wî wek "tto" ye, vekir. Bi zeman fire dibe, dibe navê toximê ajotî û neajotî tevda.

ttovil: *tto+ve+hil>ttovehil>ttovil:* Ew ttoyê(qaşîkê) ku ji ciyê xwe ve dibe û hil dibe, wek qaşîkê dara bîyê, dara tûyê, ... Dema ku ji ciyê xwe ve dibe û têtê hilkirin, ew dibe ttoyê vebûyî, hîlbûyî. Ttovilê darê, ttovilê pîvazê, ...

ttošil: *tto+şil>ttošil:* Ttoyê şîl: Ew qaşîkê ku bi şîlîti, bi terîti têtê rakirin. Ttoşilê zebeşê, ttoşilê xiyarê, ttoşilê bîyê(dema ku bi terîti bête jêkirin).

V-v

va: Ji îşareta tiştêkî berçav, bi şert ku di berîya wî de navekî yan jî demîrekî hebe û ew jî wî nîşan bide. ... Mînak: *Mala me *va* ye. "merivê ku min ji te ra gotibû *va* ye. **Va:** Lêkera zemanê bûhûrî ye; ... birayê min jî *va* ku were, îş lihev nehat... **Va**, ji vayînê ye, wekî ma'ya-mayînê, da'ya-dayînê.

vajî: *ve+jî>vejî>vaji.* **Ve:** Ters, berpaş. **Ji:** Ji jiyînê ye; ya rast, sax. Dema ku em dibêjin ev tişt vajî ye, yanî tersê rastî û saxîyê ye. bn. *ve*, *jî*.

vala: *ve+alâ>veala>vala:* Alîyê ne tije, dema ku em dibêjin: Ev cer vala ye(Cer, du alîyê wî hene, yek şeklê wê ye, yek jî nava wê ye), yanî alîyê wê yê hundir ne tije ye. bn. *ve*, *al*.

valêr: *vala+er>valêr.* "-er": Di Dimilî da bi dawîya kîjan fêkî *ve* were, ew

kelîme dibe navê dara wê fêkiyê. Wekî: Tûwêr; dara tû ye, guzêr; dara guz e, vamêr; dara vam(hihîv) e, ... Dara ku fêkî bide ew dar tîjî ye, yanî avis dibe, zarok tîne. Ew dara ku fêkî girtin di tabiatê wê de tune be, ew dar vala ye. Jibo vî, navê wê jî dibe valêr, yanî ew dara ku fêkiyê wê valatiya wê ye. Di Kurmancî da jî ji wê darê ra têtr gotin "bî", jibo ku ew jî weka *jina bî* ye, zarok nayîne, bêfêkî ye.

vam: ve+hem-hev>vehem(vehev): Ew tiştê jihev têtê qetandin, jihev vedibe. Ev kelîma "vam"(D), navê bihîvê ye, jibo ku qaşikê bihîvê; wekî du tiştê ku bi hev ve hatine şirêzkirin, bi kurmancî navê wî *bihîv* e, yanî du tiştê bi hev ve, ... Eger em baş bifikirin, em dibînin ku di Dimilî da, bi çavê piştî şikandinê ev nav li vî fêkiyê hatiye danîn, di kurmancî de jî, bi çavê berîya şikandinê ev nav lê hatiye danîn.

-van: Di Kurdî da paşek e. Bi paşîya kîjan kelîmê ve bête ek kirin; nifşekî karkerî dide xwediyê wê kelîmê. Wek: *Gavan*; ew kesê ku îşê çêrandina gayan dike, berîvan; ew kesa ku îşê bêriyê dike, heyvan; ew tiştê ku îşê hebûnî û mayînê dike(eger heyvan tunebe, ne hevîr hilatî dibe ne jî şîr dibe mast). Di hinkî kelîman da, di cîyê kelîma "van" da "wan" têtê. Ez dibêjim jibo ku zimanê Osmanî di binê giraniya zimanê Areb da pelixîye û em vî jî dizanin ku di zimanê Areb da v-ew dengê ku ji nava lêvê jêrîn û dindandê jêrîn da têtê der- tune, ewan kelîmeyên ku ji Kurdî derbasê Osmanî bûne û ketina diyalakta nivîsandinê, "van" ew kelîman bûye "wan". Wekî: *Dîwan*, *sîwan*, *çadirwan* û *karwan*. Ewan kelîme yê ku neketine çembera diyalakta nivîsandina dîl-êsir (Osmanî êsirê zimanê Arebî ye), jibo herêmi di şeklê xwe yê pêşîn da mane. Wekî: *Şivan*, *berîvan*, *heyvan*, *gavan*, ...

varik: ver+hak: vero+hak>varuk>varik: Ew mirîşka ku hêk kirinê berdaye, bivênevê ewê xurt be... Bi zeman varik(varuk), bûye navê mirîşka ku hêj neketiye kirasê hêk(hak) kirinê.

vatiş: vet+îş>vatiş. Di Dimilî da "vetiş" têtê mana "deranîn"ê, "vatiş" têtê mana "gotin"ê. Jibo ku însanekî, bi xeberdanê, tiştê nava xwe dertîne, dirêje, navê "gotin"ê di Dimilî da "vatiş" hatiye danîn. Eger em qenc bifikirin em vî jî dibînin ku, ew lêkera emrê "vatiş"ê ku "vaje"(ve+jê) ye, hatiye çêkirin. Yanî dema ku em dibêjin "vaje", wekî ku em bibêjin "veke jê", ew tiştê ku bi dilê te ve girêdaye, veke jê. ... Di Kurmancî da jî têtê gotin: "bi axîfe", yanî ew tiştê ku di nava te da veşartîye, birêje.

ve: yek ji wan lêkerên alîkar e, tede nifşekî newetî(nefîy) heye. Jibo ku karê wê alîkarî ye, ew lixweser di nava xwberdanê de kêmbicî dibe. Dema ku lixweser cî bigre jî, wê gavê ew di şûna dûrî û cîyabûnê de ye. Wekî ku *Melayê Cizîrî* di dîwana xwe da gotiye:

*"Xaliba ehlê zemanê ma mele ademî in?
Ve nemayîn ji kerê mey reş û gayê tey beş ..."*

Mela deng li xwe dike dibêje: (Mela! Qey qirê însanê vî zemanî ademî ne?

Na-na belkî evan însanan ve nemayîne, "dûr neketine" ji kerê me yê reş û gayê te yê beş-benî, çar-).

Carna ku hinkî meriv pirr hêrs dibin ew jî xebardankî dikin ku di wê da jî "ve" lixweser", di şûna dûrxistinê da têtê gotin. Wekî însanekî dema ku bixwaze, yekî bê minet bike dibêje: (Ji filan tiştê kûrê min ve) yanî xirabîya ku ji te têt bila dûrî wî be û hew. ...

Ev lêkera alîkar, di serê kîja fi'îl da were, mana wê digûhêre û newetî'ya xwe jî têtê bicî dike, emrê ku ji wê fi'îlê bête çêkirin; ji serê wê daçêka emrê "bi" dikeve. Wekî emrê ye; fi'îla zemanê ku têt, yanî daçêka wê jê dikeve. Heçî fi'îla ku "ve" jî wê ra bibe pêşek, çawa newetîkî di wê da bicî dibe, ew bi wê ra, lêkerekî dî çêdike ku bîna lêkera berê difure. Wekî: Xwarin-**vexwarin**, bûn-**vebûn**, mirin-**vemirin**, ketin-**veketin**, hatin-**vehatin**, ...

Em vî dibînin ku *ve* lêkerekî nû çêkiriye, lêbelê mana lêkera dijî têtê jibîr nekiriye.... Xwarin-**vexwarin**: "ve", xwarinê ji cûtîne kiriye mêtin. Ketin-**veketin**: Ketin, têrabûna bêdaxwaz e, "ve" wê gerandîye kiriye dirêjketina bi xwestin. Hatin-**vehatin**: *Hatin*, cî guhartina bi tevayî, *vehatin*, cî guhartina nifşanî. Em dibêjin: Ev kêran vehatiye, yanî herdu serê wî tevnegeryane, lê nava wî daketiye. Mirin-**vemirin**: *Mirin*; çûyina bêveger, *vemirin*; mirina bi veeger.... Tiştê ganî, piştî ku bimire êdî venagere, lêbelê agir ku vemire dîsa dibe ku bizivire.... Herçî lêkerên ku "ve" bibe pêşeka wan hemî jî weha ne. ...

vejî: ve+jê>vejê>vejî: Derketin. Derketin û veqetîna tiştêkî ji tiştêkî dî. Vebûna wî ji vî ye. Bi Dimilî têtê gotin "vejîyayîş".

vejîyayîş(D): ve+jê+a+îş>vejêyayîş: Jêvebûn, jêderxistin, jêderketin.

veşarî: ve+şar+î>veşarî. **Şar**: Xelk, gel, derûdor. Tiştê veşarî (veşartî): Ew tiştê ku "ve" ye, ne nêz e, ne xwe ye, dûr e ji şarê, ev wî nabînin.

veta(D) : Tiştê derxistî, ew tiştê ku ne nûxaftî be, têtê gotin ew "veta"ye, wekî tiştê ku ji nava qaşikê xwe derketî be.

veynan: ve+înan: Poşmanî; ew kesê ku ji gotin û kirina xwe vegeryaye. Veînan: Ewê ku înan hanîna dora xwe bi xwe, ji xwe daye vekirin.

vêkra: ve+êk+ra>vêkra. **Ve**: Ciyêbûn; **êk**: Yekbûn; **ra**: Dîtî. Ew yekîtiya ku ji hev ciyêbûna wê têtê dîtîn. ... Dema ku em dibêjin: Em her sê bi hev ra hatin, yanî, ew hevîtiya me xuyabû, dihat dîtîn, lê ne hevkel bû....

vêre: ve+hêre>vehêre>vêre: Ew tiştê ku hawakî hêranê dike; çawa aş dan dişikîne û dihêrine, mîde jî xwarinê diperçîfîne, dimelizîne, ev îşê mîde jî nifşekî ji hêranê ye...

vêtiş-vitiş: Di Dimilî da têtê mana "bêjing kirin"ê. "Wêtin", ev jî ji "vejîyayîşê" ye. Lewra, "wêtin" û bêjink kirin jî, hûr û girê tiştan ji hev dertîne.

vîn: Îrade; daxwaza bidil, ne ev a ku bi dev têtê gotin. Min va, ez divê, ... Em dibînin ku vaye lêker jî ji vî mesderî hatine çêkirin, piştî ku em baş difikirin em vî jî dibînin ku; *vîn*, *evîn-hevîn*- hemî jî ji kelîma *hev* hatine çêkirin.

hev: yekîtiyê dide zanîn, ... Evîn jî yekîtiya du kesan e. ... Vîn(îrade), ew jî gihîştin û yekîtiya xwestox û daxwazîya wî ye.

virnî(D): verinî>virnî: Ew heywana ku zemanê zayina wî bûhûrîye, yanî; zayina wî bi derengî ketiye ji zayina hevalê wî. ...

virr: ve+rê>verê>virr: Ew tiştê ku ne li rê ye, ne li ser rêya rast e. ...

vizîg: Navê nifşekî nanê sêlê ye. Çêkirina wî: Hevîrekî pirr ron-jî mastê rontir ji çeqilmastê tîrtir- bêmaye, dema ku bi heskê tête rokirin li ser sêla germ a kevirîn dengêkî jê têt, wekî ku bibêje; vizzzz.... Ev deng wekî nav li vî nanî hatîye danîn. Eger ew hevîr bi heyvan be û hinkî jî hilhatî bibe, wê gavê, jibo ku hevîr pirr bi heva ye, rûyê wan kûnî kûnî dibe, ji wî ra tête gotin; nanê kûnik, eger hevîr ji ardê destarê be, ji wî ra tête gotin "nanê şilekî" yan jî "şilekî".

vizik: vê+zîk>vêzik>vizik: Ew tiştê ku di zikê wî da vêketin hebe. Ev kelîme; jibo wî agirê ku liser vemirandinê ye, ... tête gotin: Vizika agir di tifikê da nemaye. ... Hema ku vizik di nava xwelîyê da mane. ... Ev vizik bi zeman bûye navê hindik dîtina çav. Ji ber ku herdu jî di hindikiyê da wekhev in; yanî agir di hindik diyina xwe da û çav jî di hindik dîtina xwe da wekî hev in. ... Gelo çavê te çawan in? Hêj vizik têda heye? Ez ber xwe dibînim. ... Filankes çavê wî vizik di wan da nemaye, êdî tû tişteki nabîne.

Vizik: Wî tiştê ku zarok ben lê dipêçin û davêjin erdê, ew jî li dora xwe digere.

Dengê ku ew li gera xwe da dertîne, jêre bûye nav.

vizêr(D): vej+ro>vizêr: Ew roja ku derket, bûhûrî; do, roja ku çû.

Gotinên ku ji Kurdî Derbazê Tirkî Bûne-I

Seîd VERROJ

Înkarkirina Zimanekî, Înkarkirina Milletekî Ye

*Meriv tenê bi ziman û di nav ziman da dikare
xwe wekî kirdeyek (subjekte)ê peyda bike.*

E. Benvenîste

Berî her tiştî dixwzim armanca vê lêkolînê diyar bikim: Qesta vê lêkolînê ne we e ku em danûsendina di navbera çand û zimanên cûda da tişteki neyînî, nebûyî û nexwezayî dibînin; bervajê vê yekê, danûsendina navbera çand û zimanên cûda, jibo jîyana mirovatî û komelîyetî wek hebûna roj û avê, xwezayî û mîsoger e. Ziman berhemê têkilîyên komelîyetî û dîrokî ye; her zimanek cûda berhemê têkilîyên komelên axaftvanên cûda ye û di nav pêvajoya dîrokî da digîje formatek giştî û standart.

Di vê çarçovê da em dê rabirduya van têkilîyan binêrin. Di nav pêvajoya dîrokî da, di navbera têkilîyên komelên cûda da hergav tesîra çanda komela şûnwarbûyî û xwedî şaristanîyê liser komelên(civakên) koçer û barbar da hebûye. Bi gotineka din, ji aliyê çandî ve komelên cotkarîyê bêtir tesîr liser komelên koçerî kirine. Lêbelê ji aliyê sîyasî ve bêtir bandûra komelên koçerîyê liser komelên şûnwarbûyî

çêbûye. Lewra komelên koçerî, hîn bêtir şervan û rêxistinkirî bûn. Ev yek, jibo sihêtikirin û bandûrîya liser yên din, rewşa wan zeximtir dikir.

Bidestxistina desthilatîya sîyasî, di navbera hêza desthelat û komelên bindest da nakokî û dijraberîya çandî peyda dibe. Yên xwedî desthilat jibo berdewamkirina rewşa xwe ya heyî, hemû nirxên komela bindest wek yê xwe qebûl dikin û her tiştê bi navê wan înkâr dikin. Dixwazin hemû rêç û şopên aîdê yên din, wenda bikin. Dîrok bi van mînakên tijeye.

Di dema desthelatîya împêratorî yên mezin da, ji aliyê çandî ve, di komelê da pirrêngîtî û xweşbînî ya li hember çandên cûda hebû. Lê piştî geşbûna pêvajoya dewleta netewî ya unîter gelek caran pirrêngîtî, pirçandîtî û xweşbînî hatiye jibîrkirin. Pirrî caran jî bûye sedemê tevkûştin û jenosîdên giran.

Komara Tirkiyeyê jî yek ji wan şopgerên modêla dewleta unîter yê herî tund e, ku heştê sale jibo misilmankirin û tirkkirina cografya anatolyayê, her cûre rê û rêbazên helandin û înkarkirina çandên din bikartîne. Sîyaset û îdeolojîya wê ya fermî ev e: ku hemû rûniştevanên cografya Tikkîyeyê Tirk in, yên ku ne Tirk bin, bi peymana Lozanê hemû heq û hîquqê wan hatiya

naskirin û dayin. Komela Tirkîyeyê, komelek yek dîn, yek millet, yek ziman û yek ala ye. Hinek dîyalektên herêmî bête axaftin jî, ji wan her yek dîyalekteke zimanê tirkî ne, ne ku zimanên serbixwe ne.

Zimanê kurdî jî, yek ji wan dîyalekta tete qebûlkin. Jibo îspatkirina vê lênêrînê, di vî derbarî da bi navê zanistî û zanyarîyê gelek pirtûk ji aliyê sazî û rayedarên dewletê ve hatine weşandin.

Ev lênêrîn ji aliyê hemû sazî û rewşenbîrên dewletê ve tete parvekirin. Hêç unîversîteke Tirkî heta nûha jibo pêşxistina zimanê kurdî lêkolînekê belav nekiriye, bervajî vê, heta nûha jibo înkarkirin û helandina Kurd û kurdî gelek pirtûk û nivîsîn hatine weşandin û belavkirin. Heta jibo qedexekirina navê cîyan û gundan, navê zarokan gelek biryar ji aliyê dadgehên Komara Tirkî ve hatine girtin û belavkirin.

Li gor politîka fermî ya dewleta Tirkîye û hinek nijadperestên Tirk bi navê kurdî zimanek nîne, dibêjin, zimanê ku bi navê kurdî tete binavkirin ji hinek gotinên farisî û arebî pêkhatî ye. Em nabêjin gotinên farisî û arebî di nav zimanê kurdî da nînin, lê qasê ku di zimanê kurdî da gotinên farisî û arebî hene, çend qatê wî di zimanê tirkî da jî hene. "Ferhenga tirkî ya ku di sala 1969-an da ji aliyê TDK-yê ve hatiye amedekirin têda 29 hezar peyv hene; ji van peyvên 3 hezarê wan tirkî ne, 6 hezarê wan jî peyvê bîyanî yên ku bi parekên tirkî hatine çêkirin in. 20 hezarê wan jî bi temamî peyvên bîyanî ne."¹

"Peyvên di nav zimanê tirkî da bi nêzikayî jî %50-î yê wan arebî, farisî û kurdî ne. Lê ev dîyar nake ku tirkî şaxekî zimanê arebî, farisî û kurdî ye."² Eger em jî ligor peyvên farisî û arebî yên di nav tirkî da, bêjin bi navê tirkî zimanek nîne, hun dê bêjin çî? Roj bi bêjîngê nayê veşartin. Rastî ew e ku tû kes bawerî bi derewên wisa neke. Fahmekê wisa hem ji aliyê etîka zanistî û hem jî ji aliyê pîrrengîya çanda mirovatî ve şaşî û çewtîyek dervayê rastî ye û tû qîmeta wê nîne.

Ji kes û politîkayên weha ra bersîva me ev e, ku di dinyayê da zimanekê saf nîne. Ji salên hezaran vir de Kurd û Areb û Faris bihevra jîyane, dîne wan yek e, Kurd û Faris herdû jî Arî ne; û zimanê wan jî wek gulîyê darekê ne, pîr normale ku peyvên zimanê farisî bikevin nav kurdî û yên kurdî jî bikevin nav farisî. Digel wî beşek zêde yê Kurdan misilman e û nêzikê hezarûdused sal e ku piraniya wan di bin tesîra kultura îslamî da jîyane. Îslam jî di bin bandora kultura arebî da ye. Jiber vê yekê bi wesîta medresan-tesîra arebî pîr liser kurdî çêbûye û gelek peyvên arebî derbasê kurdî û farisî bûne. Ev jî tiştekî xwezayî ye. Em bi vê yekê ne aciz in, ne jî înkâr dikin.

Zimanê Kurdî, Zimanek Qedîm ê Malbata Aryanî Ye

Zimanê kurdî, di nav malbata zimanên Hindî-Awropayî da şaxekê ji zimanên Îranî ye û zimanekê ji koma

¹ Dr. Cemşit Bender, *Kürt tarihi ve Uygurlığı*, Kaynak yay. s. 48, 1991)

² M. Emîn Zekî, *Kurdistan Tarihi*, s. 153, Beybûn yay, 1992)

zimanên tewandî ye. Di nav koma zimanên Hindî-Îranî da zimanên qedîm ên wek Sanskrîtî, Awestayî, Pehlewî, Hîtîtî û Armenkî hene. Digel van zimanên qedîm Farisî, Kurdî, Peştûyî, Belucî, Osetî, Tacikî, Derî û wd. hene.

Îro jî kurdî, gelek taybet û şopa zimanên malbata Hindî-Îranî ji hemû şaxan bêtir di nav xwe da dipê. Li gor bawerîya gelek kurdologan kurdîya îro, xwe disipêre zimanê Medan û Awestayê. Zimanê kurdî, zimanek zindî ye û di cografyayêk fireh da belav bûye; "çîyayê Zaxros û dorberê wî navend bête qebûlîkirin ji aliyê rojhelat da ji Xoresan û Afxanîstanê, ji aliyê rojava da heta Enqera-Qonyayê, li aliyê bakur da digîje Ermenîstana Sowyetê û li başûr da ji başûrê Îranê destpêdike, bakurê Iraqê û bakurê Suryeyê digre nav xwe."³

Pêşkevtina ziman, pêşkevtina hiş-yarbûn û rêxistinbûna axavtvanê wî ye. Pêşkevtina ziman, ji aliyê civakî û siyasî ve bi pêşkevtin û rêxistinbûna civakê ve girêdayî ye. Ew milletên ku pêvajoya netewebûnîya xwe temam kirine; ji aliyê siyasî ve rêxistinbûna xwe ya navendî pêkanîne; sazîyên xwe yên netewî dirist kirine, li gor milletên din zimanê wan pêşkevtîr e. Lewra jibo pêşkevtina ziman sazîyên netewî û navendî pirr girîng in. Milletên ku pêvajoya netewebûnîya xwe temam nekirine û sazîyên xwe yê netewî pêkneanîne, zimanê wan jî qels e. Zimanê milletekê, remz û desteka herî girîng a hebûna wî milletê ye. Kurdî jî remzê hebûn û yekîtiya gelê kurd e,

lewra yên dagîrker dixwazin ziman piçûk bixin, pûç bikin û ji têkilîyên jîyana civakî û nivîsînê derînin û wek biranînekî otantîk nîşan bidin. Îdea û rewşa yên dilnexwazan dîyar e, lê gelek însanê me jî di bin tesîra vê lînêrînê da ne, dibêjin; kurdî zimanekê feqîr e, pê siyasî û felsefeyê naye gengeşîkirin û nivîsandin, lêkolînên zanyarî nabin. Ew kesên wisa difikrin, bila xwe aciz nekin, bi vê yekê ziman nezanîya xwe, bi feqîrbû û pêşnekevtina zimanê kurdî ve girêdidin, nabêjin em qasê ku felsefeyê û siyasî biaxivin û binivîsînin bi kurdî nizanin.

"Dewlemendî û feqîrîya zimanekî bi nivîsê ve girêdayî ye, ji aliyê straktura xwe ve tu zimanekî feqîr tune ye, her ziman xwedî gramer, fonetîk û vokabler e. Lê ji aliyê nivîsê ve feqîrî û dewlemendîya ziman heye. Îro gelek ziman hene ku nayên nivîsîn, lê ji aliyê qaîde û awayên gramerê ve tu ferqeke wan û zimanekî ku pê tê nivîsîn tune ye. Heta hin ziman hene ku pê nayê nivîsîn, lê ji aliyê qaîdeyên gramerê ve ji gelek zimanan bi rêk û pêktir in."⁴

Zimanê kurdî zimanekê dîrokî ye û xwedî kevnêsopeke nivîsarî û edebîyatek dewlemend e. Qasê ku em dizanin ji destpêka sedsala dehan(X) virde, gelek berhem bi kurdî hatine afirandin û nivîsîn. Baba Tahirê Hemedanî(930-1010), Abdussamed Babek (973-1020), Elî Herîrî (1010-1077), Elî Termukî (Hicrî sedsala IV), Feqîyê Teyran(1302-1375), Melayê Batê (1417-1494) Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî (1592-1653), Şerefexanê Bidlîsî (1689-1709).... Ji xeynî vê, pirtûka pîroz a Êzidiyan, Mishefa Reş

³ Kemal Badılı, *Türkçe izahlı Kürtçe Gramer*, r. 21, med yayinlari, ikinci baski, 1992)

⁴ Emir Hesen Pür, Kovara War, r. 90, hej: 10-11

di sedsalên XII û XIII da bi kurdî hatîye nivîsîn.

Zimanê kurdî, ji 1920-ê vir da ji wek zimanekê perwerdeyî û dersdayînê, li başûrê Kurdistanê di dibistanan da têtê xwendin û nivîsîn. Berîya wê jî di hinek medreseyên Kurdistanê da zimanê kurdî zimanê dersdayînê bû.

Kurdî Çiqas Farisî ye, Farisî jî Ewqas Kurdî ye

Kurdî û farisî şaxekê ji zimanê Hindî-Awropayî û di koma zimanê Îranî da her yek gulîyekê ji dara zimanê Îranî ye. Kurdî jî û farisî jî her yek zimanekê xweser e, ne ku kurdî lehceyekê zimanê farisî ye. Kurdî Çiqas farisî ye, farisî jî ewqas kurdî ye. Lewra peyvên di nav kurdî da, di tû lehce û zimanên din yên Îranî da nînin. Eger em bixwazin di navbera kurdî û farisî da pevgirêdanîyekê bigerin, mimkune Avesta û hinek zimanên din yên qedîm, vê pevgirêdanê pêk bînin. Sdney Simith di pirtûka xwe ya bi navê

Tarîxa Asurî da wisa dibêje: "Zimanê kurdî lehceyekê zimanê farisî yan jî şiklekê wî yê xerabûyî nîye. Bervajî vê, xwedî pêvajoyekê dîrokî ye, zimanekê xweser e û ji farisî kevintir e."⁵ Rojhelatnas û lêkolînerê dîroka Kurd Edmonds jî di vî mijarê da weha dibêje: "Bi awakî vekirî dîyar bûye ku kurdî, lehceyekê farisî nîye. Bervajî wî zimanekê xweser û pakî jî koma zimanê Arî ye. Xwedî dîrokekê qedîm û taybetên xwe yê xas e."⁶ Her weha rojhelatnas û kurdolog ê meşhur

Soane jî dibêje: "Zimanê zikmakî yê wan û kurdî ya ku îro Kurd pê dipeyvîn, wek zankirina hinekan zimanekê bêserûber û bêrêz nîye. Parçeyek ji farisî yan jî lehceyeke wê jî nîye. Bervajî wê, saf, saxlem û xwedî taybetîyên xwerû û zimanekê Arî ye. Kurdî, berîya wendabûna dîroka mezin a Îranê, ku di şûna wê da dîrokekê ku bi çîrok û evsaneyan ve tijeye ma, di çîyayên Kurdistanê da bi awakî herî saf û pak hebûna xwe parast. Piştra hinek peyv û gotinên bîyanî ketin nav vî zimanî. Bi taybetî jî di vê yekê da rola îslamîyetê hebûye. Lêbelê şertên neyînî yên sed salan ji pêşkevîna vî zimanî ra bûne asteng. Jiber vê yekê divê ji nav lehceyên kurdî yekê wek bingeh bête pejirandin, peyvên bîyanî ji nav bêtin derêxistin û di cîyê wan da ji lehceyên din peyvên xwerû yê kurdî bêtin bicîkirin."⁷

Hinek Xisûsiyetên Kurdî û Farisî

Nêzîkayîya di navbera kurdî û farisî da ji merivatiya wan têtê. Cûdatîya di navbera wan da jî, wek cûdatîya navbera duhatî yan jî mîrasxûrên malbatekî ku çendîn esir liser borîye.

Kurdî û farisî ji alîyê hevoksazî, fonetîk, rêziman, tewandina lêkeran ve dû zimanên ji hev cûda ne:

1- Di zimanê kurdî da *mêyîtî-nêrîtî* (*cinsiyet*) heye, di zimanê farisî da nîne. Her wekî tirkî di farisî da jî bi peyvên cûda nêrîtî-mêyîtîya giyan-daran têtê nîşandan, yan jî bi sîfetan cinsiyeta wan têtê nîşandan. Mînak:

⁵ Gotar: M. Emin Zekî, *Kürdistan Tarihi*, r. 152, Beybun yay, ikinci baskı, 1992)

⁶ Jêdera berê.

⁷ Jêdera berê, r. 153

mere gaw(ga- öküüz)/ made gaw(manga dema bihûrî ya lêker dimîne. Di kurdî -inek)), ker /nêreker- ker/manker, ... (Kurmcancî) da “-in” e.

2- Cûdatiya di navandina çêleyên heywanan da:

farisî	kurdî
sag/tule seg	Kûçik/cewrik
mirx/cucemirx	kerğ/liçik(d)
gaw/gasale	ga/golik
biz/bizxale	bizin/karik
alax(ğ)/kire alax	ker/dahşik

3- Kurdî xwedî fonetîkekê xwerû ye: Ji xeynî "av", "agir" û wd. hinek peyvên kevin ên Îranî, dengê "h" bi giştî dikeve. Wekî peyvên haş/aş, havêtin/avêtin, harî/arî, hewe/we, henîşk/enîşk, hêvar/êvar, hevraz/evraz, "Di peyvên farisî yên wekî hasp(at), havt(yedî) da, gelek caran em rastê "h" yên zimanên Samî têne. Dengê "L" ji "L"ya silavî û tirkî hinek cûdatire, beramberî dengê "r"ya sivik "r"ya girover, dengê "v" yê ku bi lihevketina herdu lêvan; di serê peyvê de hebûna du tîpên bêdeng; mînak dengê "n" û "r"yê dizime.⁸

4- Cûdatiya di peyvên da: Di gelek şîweyên kurdî da li beramber van peyvên farisî: amad, avurd, şindî, fristad, tuxemî murx, hemam, dewa, rusta, sup, saeqe, kişwer, gurbe, gulabî, melafe, merîz, xîs, kuwkeb; van peyvên kurdî têne bikaranîn hat, anî, bîst, nard(şand), hêk(hak-d), awke, derman(darû-d), gund, şorbaw, birûsk, welat, pisîk, hirmê, lehêv, nexweş, şil, stêrk, ...

5- Mesder: Di farisî da pareka mesderan “-en” e, “-en” bête rakirin koka

farisî	kurdî
buden/bud	bûyin/bû
nişesten/nişest	rûniştin/rûnişt
xerîden/xerîd	kirrîn/kirr
reften/reft	çûyin/çû
ameden/amed	hatin/hat

6- Ji aliyê hevoksazîyê ve: Bi taybetî di kelîmeyên hevgirtî da, parastina şiklê nediyar ê lêkerên têper (sergerandî) di dema borî da. Mînak: Kûestan-îan le brîvîn. Kelîme bi kelîme wergera wî: Kûhistan ji layê wan ve ji me ra hate brîn, yanî "me ji kûhistanê mehrum kirin."⁹

7- Peyvên ku çavkanîya wan yek e (Awesta/Avesta), ji aliyê fonetîkê ve guhartinên mezin têda çêbûne.

Awesta	Kurdî(k-d-s)	Farisî	Tirkî
bereza	bilind, berz	bolend	yüksek
draçâh	dirêj, derg	draz	uzun
canay	jin, ceney	zen	kadın
ezm	ez, min	men	ben
masiya	masî, mase	mahî	balık
mexşî	mêş, meys	meges	sinek
was	xwaz, waz	xwasten	istemek
maza	mezin, gird, gewre	bozorg	büyük
mazga	mejî, mezg	meğz	beyîn
pireta	pir, pird	pol	köprü
hor	tav, ro	afitab	güneş
raoçah	roj	rûz	gün
veraxa	berx, verrek	bere	kuzu

⁸ Minorsky, *Kürtler*, r. 78, Koral yay, 1992

⁹ jêdera berê, r. 78

kurtebirrî:

kur.	kurmancî
sor.	soranî
dm.	dimilî
zaz.	zazakî
hew.	hewramanî
far.	farisî
sansk.	sanskirîfî
tr.	tirkî
etm.	etîmolojî
zool.	zoolojî
bot.	botanîk

abdest, *avdest*: ab/av(su)+dest(el): Di zimanên Arî da dengê **b** û **v** bi hev diguherin. Di Kurdî da ev peyv di şiklê "destav"ê da jî têtê gotin.

abdesthane, *avdestxane*: ab/av(su)+dest(el)+xane(mekan, ev, yer). Ew cîyê ku têda karê avdestgirtinê dibe.

ada, *avda*: av+da: Ew reşayiya ku di nava avê da ye; girav. bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN, Kovara WAR, Hej: 5-6.

agah(haberdar, bilgî), *agah/aga*: a(belirtme, dikat çekme anlamında zamir)+go(söylenen, duyulan): Di kurdî da dengê "a" û "o" bi hev diguherin. Li vê derê mana "agah/aga" ev e; tiştê hatiye gotin, tiştê hatiye bihîstin, tiştê hayî jê heye.

ağa, *axa*: ax(toprak)+a. Yanî yê xwedî axê, mezin, giragir, gewre. Her wekî "a" ya li pey peyva/gotina "xwenda û zana", "a" ya li vir jî pareka nav çekirînê ye.

ağıl, bn. ahir.

ağu(zehir), *awxu-awxwî*: aw(su)+xu/xwê(tuz).

ahenk, *aheng*: a+heng>aheng>ahenk.

Heng, di zaravayê dimilî da navê mêşa hingiv e. Ew tiştê ku bi hevrêz be (sistemafîk) jî wî tiştî ra têtê gotin ev tişt, gotin bi aheng e, yanî ew weka kewara mêşa ye. Çawa ku di kewara mêşan da parvekirina kar heye; yanî hinek îşçî ne, hinek tiral in, li benda mêşa mak in ku ew wê bi dol bikin, jibo ku ew jî di wan çavînekên ku bi xebata wan îşçiyan hatiye amadekirin da hêkên dolkirî bike, ... bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN, Kovara WAR, hej: 5-6

ah!, *ax!*: Dengê xwezayî yê ku li hember rewşekê awarte dertê.

aha(îşte, bak, ...), *aha*: a(îşaret zamirî)+ha(îşte, ne var). Ew a *ha!*

ahır, *axhûr/axûr*: ax(toprak)+hûr (ufak, ince, küçük)). Cîyê ku heywan têde têne hewandin û axa binê wê hûr e, binê wê nayê şebkirin, jibo ku heywan bi rehetî liser mexel bibe û necemide.

ajda(isim), *az/aj*: az/aj(filiz)+da(vermek mast. dili geçmiş hali): Di fonetîka kurdî da dengê "j" û "z" bi hev diguherin.

al, Kokek yek kîte ye, ku di zimanê tirkî da gelek gotin jê peyda dibin. Mînak: al-danmak, al-i Osman, el, al(kızıl, alev). Di kurdî da jî çar maneyê wê hene: **1.** "alî" di mana teraf, kenar, hêl da ye. **2.** *alîgir*, alîkar. **3.** "al/ala" navê beyraqê ye. **4.** Di mana pîrozî da têtê bikaranîn. Mînak: Xanîyê nûn li we xêr û ala be.

alîç, *alûç*: Di lehca dimilî da navê dara vê fêkîyê "alûçêr", fêkî bi xwe jî bi navê "alîç/alûç" têtê binavkirin. Di lehca dimilî da pareka "-êr" were

dawîya kîjan fêkîyê navê dara wê dîyar dike.

ama, *ama*: a (işaret zamiri)+ma/ mayî (kalan, geri kalan). Ama, qertafa veqetandinê ye. Di axaftinê da dema ku meriv bi gotina xwe ne bawer be ku ewê bi tevayî were cî, jibo ku ewê bi tevayî were cî, jibo ku meriv wan astengan bigre ber çav, bi *ama*'yê meriv xwe ji bin barê lomeyan derdixîne û dibêje; *a ma...* bn. Etm. Zimanê Kurdî, A Uçaman, Kovara War, Hej: 5-6

amaç(erek, hedef), *amac*: ame(gelme-dm.)+ca(yer-dm.): Tiştê ku pêkhatin û bicîhatina wî bête hede-fkirin.

ambar, *hembar/ambar*: ham-hem-hev(bir önek olup, kelimenin başına geldiğinde denklik, eşitlik anlamını verir)+bar(yük): Ciyê ku bar têde berhev dibe. Her wekî ketina "h" ya "hembar", di kurdî da gelek caran "h" ya li serê peyvê dikeve.

ar, *ar*: "ar" kokekê yek kîte ye û bi tevî ku di zimanê tirkî da ji vê kokê gelek peyv hatine çêkirin jî, man-ayek wê ya dîyar nîne.

Di kurdî da pênc maneyên vê peyvê hene: **1.** Ar(ateş). **2.** Ar/arvan(un). **3.** Ar-î(nijada ku Kurd jê tene). **4.** Are/arye(geğirmen). **5.** "Ar/are (yemlik)", di lehca dimilî da tete mana "afira" kurmancî.

arşin, *arşîn*: a+ra+şehîn>arşin : Aletê kêşan û pîvanê. Li vê derê "a" jibo rastî û diristiyê ye. "Ra" jibo nîşandanê ye. *Şehîn*, navê mêzinê ye. Ji vir hate zanîn ku arşîn navê wî aletê ku pîvanê bi diristî rava dide. Di nava zeman da derbasê zimanê

Osmanî bûye, sade jibo dirêjayiyê hatiye karanîn ku li dora heftê cm. ye. (bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. Uçaman, WAR, hej: 5-6)

asayîş, *asayîş*: asa/asan(dm./zaz.) (kolay, rahat)+iş(iş): Îşê aramî û hêskirinê. Peyva "iş, -iş" ji Kurdî derbasê tirkî bûye.

aşina, *aşinas*: a(işaret zamiri)+şinas (Kürtçenin dımılı lehçesinde "tanıdık, bildik, alışlagelen" anlamına gelir). Ev peyv di lehceyên hewramanî û soranî da jî wekî "aşinas" tete binavkirin.

avare/avare olmak (işsiz güçsüz, başı boş dolaşan, dengesiz), *averê*: a(işaret zamiri)+ve(ayrılma, kopma anlamında önek)+rê(yol): Ew tişt yan jî kesê ku ji rêya ku divê ew teta be, ji wî dîr keve jêra tete gotin, ev "averê" ye, yanî ji rêya xwe û ji xeta xwe bi tevayî veqetyaye.

avrat, *afrad(sor.)/awrad/awra(dm.)*: aw(su, +ra(-den, -dan anlamında sonek) Bi ketina dengê "d" peyv a "awrad" di lehca dimilî da bi mana "awra(gebe)" tete bikaranîn.

bac(Osmanlı imparatorluğunda güm-rük vergisi), *pac>bac*(p ve b ses dönüşümü sonucu): pa(ayak)+ca (yer): Heqê cayê pay(dm.)(ayak bastı parası).

baca, *baca>paca*: ba(rüzgar, hava)+ca (yer, konum): Ew cîyê ku hewayê wî ji aliyê ba ve tete kişandin.

bacak, *paçaq*: pa(ayak)+çaq(ayak bileğiyle diz arasındaki kısım)> bacak. Li vê derê dengê **p** û **b** bi hev diguhere.

badava/bedeva(çaba ve emek harcan-

madan; havadan elde edilen şey), *badawa*: ba(rüzgar) + di (edat)+ hawa(hava). Tiştê ku bê cehd û kedê be; ji bayê hawayê were bidestxistin. Di dîyalektên hewramî û soranî da dibêjin “bayhewa”.

bağ, *bax*: ciyê mezin ê ku hatiye çandin bi darên fêkî.

bahar, *bihar*: Bi zimanê Sanskritî "bahâr" navê kûlîlk e. Di zimanê kurdî da jî têtê mana demsalekê ku mehên Adar, Nîsan û Gulanê digre nav xwe û di van sê mehan da jî gul û kûlîlk geş dibin.

bahçe, *baxçe*: bax+çe. Baxê piçûk ê ku sînorê wî diyare.

bahçivan, *bexçevan*: bax+çe (kûçültme soneki)+van(bir sonek olup, sonuna geldiği kelimeyle ilgili işi yapanı bildirir). Kesê ku li bexçê xweyîti dike û li ber bexçê newbetê digre.

bahş(bağış, hibe, yardım, teberru), *bexş*: Tiştê ku bedewa bête dayîn, belavkirin.

bahşîş, *bexşîş*: bexş+îş: Bexş a ku bi munasebeta qedandina îş û karekî têtê dîyarî kirin.

baht(yazgı, alinyazısı), *bext*: Ev peyv bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye.

bahtiyar, *bextiyar*: bext+î+y+ar. Ew kesê xwedîyê bext, mesud.

bakla(bir bitkinin adı), bot. Ev peyv di kurdî da di şiklê “baqla-kur.” û “bankila-dm.” da têtê gotin.

balaban(yüksek sesli), *balabang*: bala(sor./yüksek)+bang(seslenme). "Bang" kelimesindeki "g" sesi düşerek "ban" olmuş.

ban-la-mak, bang(ses, çağırî)+la-mak (türkçe ekler). Yanî bangkirin.

bari(hiç olmasa, en azında), *barî(dm.)*,

zirav, zayıf. Bi firebûna wateya xwe ev bêje di mana "qe nebe", "kêm be jî" de têtê bikaranîn.

batman, *batman*: **1.** Pîvanek giranî ye qasê 8 kilogiramê. **2.** Navê bajarekê Kurdan ku bi neftê xwe dewlemend e. **3.** Man/ Men(unite, birim).

bayir(sürülmemiş, ekilmemiş, verimsiz toprak), *biwûr-bihûr- bûre* bû(olmak fiil. geçmiş zam. hali) +rê(yol): Erdê ku çandinî têda nehatîye kirin, bûye bihûr, rê.

bed(kötü), *bed*, xerab, nebaş, çepel.

bedbaht, *bedbext*: bed(kötü)+bext (baht). Ev peyv di şiklê bextreş, bextxerab da jî têtê gotin.

bedbin(kötümser, olumsuz görme), *bedbîn*: bed(kötü)+ bîn/ dîyin (görme). Dîtina neyînî, ne erînî.

bedel(karşılık, değer, kıymet), *berdêl*: ber(1- ürün, mahsul, döl. 2-ön, yan, nezd. 3 yerine, karşılığında) +dêl (değişme, yerine): Ew ber û mahsulê ku bi ê yekê dî ra bête guhartin.

behre: bare(dm./zaz.), par/pay(kur.).

bel-li(belirti, yükseklik, iz), "bel", di zimanê kurdî da têtê mana tiştê "tîk ê bilind". Herwekî ku têtê gotin "zinarê bel"; di nav zinaran da yê tîk û bilind ê dîyar. Dema ku têtê gotin "heywanê gohbel" jî, qesta bi vî gotinê ew e, ku ev heywan guhê wî tîk in yan jî tîk kirîye.

belge, *pelge>belge*: pel(yaprak)+ ge/geh; per+ kom>perkom. Pelê ku nivîs têde hatiye nivîsîn û komkirin.

beli, *belî*: bel+î. bn. bel.

ben, men(azerî), *men>min* : Derbazê azerî bîye û ji azerî jî bi guhartina dengê m/b di şiklê "ben" de derbasê tirkî bûye.

bende/bende-niz(kul, köle, tutsak), "bende", ewê ku di derdestê ji xwe

xurttir "di ben de" ye, pê girtîye, pê girêdayî ye, xulam e, mirîd e, qul e. Gotina "ezbenî" jî di vê manê da ye; yanî dibê ez bi benê te ve girêdayî me, di benê te da me, amadeyê emr û fermana te me. Nava zeman da mana vê gotinê fire biye û jibo rêzgirtinê hatiye bikaranîn.

benek(herhangi bir şey üzerinde bulunan ufak leke, kabartı, belirti), *benek/binek*: ben/bin+ek. "ben" di kurmanci da tête mana lekeyê piçûk ên di rûyê çermê mirov da. Di diyalekta dimilî da jî dibêjin "şanik", yanî nîşanek; nîşana ku di rûyê çermê wûcud da ye. Pareka "-ek" hem di mana piçûkkirinê û hem jî mana yekanîyê da tête bikaranîn.

beraber(yan yana, birlikte), *beranber*: ber (yan, ön)+a(îşaret zamiri)+ber (yan, ön). Ew tişt yan jî kesên ber hev, bi hev ra bin. Sîyahpoş weha dibêje:

*"Herîfan anî textek pur ji gewher
Muqabil textê Şah danîn beranber."*

beraber-lik, beraber+lik(türkçe ek). bak. Beraber.

berbat, *berbad*: ber(ürün)+bad/bed (kötü): kötü ürün/ berê kotî, berê xerab, berê nebaş.

berhane(büyük, harap, kullanışsız ev), *barxane*: bar(yük, eşya)+xane(ev, mekan). Ew xanîyê ku bar û alavê zêde, kêrnehatî têda berhev dibe.

berhava(yararsız, boş), *berhawa*: ber(ön)+hawa(hava, boşluk). Tiştê ku ber be hawayê, valahîyê here.

berhudar(çok yaşa, dirençli ol, mutlu ol anlamında dilek olarak kullanılır), *berxudar*: ber(ön, nezd, yön)+xu(kendi)+dar(bir işi yapan anlamında sonek). Gelek maneyên gotina/peyva "ber" di kurdî da hene; yek jê, pêşek e, ku were

pêşîya hinek gotinan/peyvan, lêkererek yan jî pêkhatinek dide nasandin. Mînak: beravêtin, berketin, berçûn. Duyemîn, tête mana "ön, ön cephe, yan nezd, -e yakın, -e doğru" ya tirkî. Mînak: berêvar, berbang, ber wî, ber bi jêr. Li vê derê wateya peyva berxudar ev e: ciyê tu sekinî, xeta ku tu liser dimeşî, îstîqameta tu têdayî ... di wê şopê da liberxwe bide.

berdevam(sürmekte olan, sürüp giden), *berdewam*: ber(yön, istikamet) +dewam. Tiştê ku berê da destpêkirîye û hîn jî dom(dewam) dike. "ber/berê" di zimanê kurdî da tête mana "önce, önceden" a tirkî.

berdoş(başiboş, serseriş verimsiz), *berdoş*: ber(kendi)+ doş(gezinmek, dolaşmak): Yê ku ji ber xwe da, bi xwe ser, ser serê xwe digere, doş dibe.

beri(ön, yakın, bu yan): ber(yan, ön, nezd)+î(Kürtçede yer, konum, mekan belirten ek). Sîyahpoş dibêje:

*"Liser tabê ji husnê reng perî bû
Ji nuqsanî we eyban ew berî bû."*

beste(1. bir müzik eserini oluşturan ezgilerin bütünü. 2. bağlamak): *beste*: Di kurdî da du maneyên peyva "best" hene: **1.** Werisê kurt ê ku ji muyê bizinan hatiye honandin **2.** Di diyalekta dimilî da tête mana "girêdayî"ya kurmancî.

bestekar(besteci), *bestekar*: beste (örme, bağlama)+kar(iş). Ew ê ku karê honandina/bestina gotinên mûzîkê dike.

beter, *bedtir/bêter*(dm.)/*bêtir*(kur.): bed (kötü) +tir(pekiştirme eki). Xerabtir, nebaştir.

beyan(açıklama): *beyan*: **1.** Beyankirin

(açıklamak). **2.** Roj beyanî (sor.)
(gün aydın).
beyanat(demeç, bildiri), beyankirin,
daxuyanî.
beygir/bargir(yük atı, yük kaldıran/
tşıyan), *bargîr*: bar(yük)+ gir(girt/
girtin): Ew heywanê ku bar hildi-
gre, bihêz e.
beyhude(boşuna, yararsız, faydasız),
bêxudî: bê(olumsuzluk ön eki)+
xudî(sahip): Tiştê ku bêxwedî be,
bêfayde ye, ji tiştêkî ra nabe. Ji ber
ku di alfebeya tirkî da dengê “ê”
nîne, li şûna wê da dengê “î” û “e”
bikar tênin.
behuş/bihuş(aklı başında olmayan,
sersem), *bêhiş*: bê(olumsuzluk
öneki)+hiş (bilinç, belek, hatıra).
Ew ê ku hişê wî/wê ne li serê wî ye.
bezar(aciz, dilsiz): *bêzar*: bê(olumsu-
zluk öneki)+zar(dil).
biçare(çaresiz, zavalı), *bêçare*: bê (ol-
umsuzluk öneki)+çare(çözüm, yol).
biçare-lik: bak. biçare.
bigane(bir şeye karşı ilgisiz, cansız,
yabancı), *bêgane/bîyane*: bê(olum-
suzluk öneki)+gan(can)+e(parek e,
were dawiya hinek gotinan mana
wan teng dike.)
bikes (kimsesiz), *bêkes*: bê(olum.
öneki) +kes(kimse, şahıs, kişi): Ew
ê ku kesekê wî tune be, bêxwedî be,
bêkes be.
bingöl(şehir ismi), *bingol*: bîn(koku)+
gol(gül). "bîngol" tête mana gola bi
bîn. Navekê dî yê vî bajarî "çewlîg"
e, ku tête mana cîyê avî û bibexçe.
birader(dost, arkadaş, kardeş): *birader*:
bira(kardeş)+der(kapı, dışarı, yer).
Ew kesên ku ne ji dê û bavekê bin,
lê wek dû birayan nêzikê hev bin.
biryan/büryan(tandırda pişirilen bir

kebab türü), *bûryan/birryan*:
Cûrekî kebabê ku di tendûrê da tête
pijandin û peyderpey jê tête birîn
jibo xwarinê.
biteraf/tarafsız, *bêdiref/bêteref*: bê
(olumsuzluk öneki)+ di(edat)+
ref(grup, yan, sürü). Ewê ku di
ref/rex yekî da cî negre.
bizar(isteksiz, istememe, usanma),
bêzer-bêzar: bê(olumsuzluk öneki)
+ zer/ zar(istek, günül).
bol(çok, geniş), *bol*: Di diyalakta dimilî
da tête mana pirranî û kerîyê pes.
Mînak: bolê bizan, bolê mêşnan.
boranî((bir yemek türü)bak. Ismet
Zek. Eyupoğlu, Türk Dili Etm.
Sözlüğü): *boroanî*: bor(Dimili
lehçe. "yemek" fiilinin emir hali)
+anî(sıfat takısı. "Şîr-anî" de
olduğu gibi). "Boranî", di diyalakta
dimilî da navê şîranîyek e, ku bi
tevihevkirina kûndirên zivistane
yên xaşandî û mast û dimsê çêdibe.
bulgur, *pelxûr>belxûr*: pelx(ezme)+
xûr/xûrek (yemek) >pelxûr. Ew
xûreka ku bi avdan û nermkirinê
tête pelixandin û xwarinê.
bülent(isim), *bûlend>bilind*(yüksek).
can, *gan>can*: Jiber ku di arebî da
dengê "g" tune ye, "gan"a kurdî
wekî "can" derbasê arebî bûye û ji
arebî jî derbasê tirkî bûye.
canan(sevgili, sevilen), *canan*: Ew
can yan jî kesa ku meriv qasê canê
xwe ji wê hesdike.
canî(kan dökən, adam öldüren), *canî*:
can+î(isimden sıfat türeten sonek).
Ew kesê ku canan digre, merivan
dikûje.
cansiper(canını verircesine, özveriyle),
cansiper/cansîber: can (can) +sî
(gölge)+ber(ön, nezd, yerine). Ew

tiştê ku jibo bidestxistina wî meriv bi rastinî canê xwe nede jî, herwekî jibo bidestxistina wî sîya canê xwe bide li ber wî.

cambaz(canıyla oyanayan, korkulu oyun gösteren), *canbaz*: can(can, vücut)+ baz(bir sonek olarak oyuncu anlamını verir). Leyiztikvanê ku bi bûhayê canê xwe dileyze. Mînak: qumarbaz, seydbaz, dek-baz, ...

canavar, *canawer*: cana+wer. Ew heywanê dirinde yê ku canan dixwe.

cayigir(yer edinen, yer alan, dünyaca tanınan), *cagir/cîgir*: ca(yer)+ y (kaynaştırma)+i(çekim eki)+gir (almak).

cevher(öz, maya, değerli mücevher, fel. töz), *gevher/gewher*. Jiber ku di arebî da dengê "g" tuneze, "gewher"a Aryanî wekî "cewher derbasê arebî bûye û ji arebî jî derbasê tirkî bûye.

cihet(yön, istikamet, yan), *cîhet*: cî (yer, mekan)+het(yön, taraf, ... doğru). Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

civan(genç, yakışıklı, yiğit), *ciwan*: Ev kelîme bi mana xwe ya kurdî derbasê tirkî bûye.

civanmert(sözünün eri, yiğit yaratışlı), *ciwanmerd*: ciwan(genç, yakışıklı, yiğit)+ merd(insan). "merd" ji "merdim"a dimilî têtê.

civar (yerleşim, yerleşim yeri(bak. Ismet Zekî Eyüpoğlu, age...), *cîwar*: cî(yer)+war(mekan, yerleşim yeri, yurtluk).

civciv(yavru, küçük yavru), *cûcîk*: Di kurdî da ev kelîme bêtir jibo çêjikê mirîşk û çûçikan têtê gotin. Îro jî dema ku qut didine mirîşkan bang

dikin dibêjin "cûc, cûc, cûc, cûc!". "-ik" pareka nav çêkirinê ye.

cop(sopa, değnek), *çob/çov*: Di fonetîka kurdî da dengê "b" û "p" bi hev diguherin. Ev kelîme bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

coş/coş-ku(taşma, fıskırma, kaynama), *çûş/coş*: çû(gitmek)+jê(ji wê, ondan). Ew kel û hereketa ku tişan ji cî û warê wan dibe, difurîne, derdike. Di navbera dîyalektên kurdî da dengê "jê", "jî" û "ş" bi hev diguherin.

cömert: bn. civanmert.

cüda(ayrı, bak. istiklal marşı): "cûda", di lehca soranî da têtê mana "ayrı, farklı" ya tirkî. Di lehceyên kurmancî û dimilî da jî raberê vî kelîmeyê "cihê" û "cîya" têtê karanîn.

çadır(otağ): *çavdor>çader>çadir*: çav(göz)+der(dışarı). Ew perda ku bête kişandin û ji layê der va da ji dîtina çavan ra bibe asteng û ê nav xwe biparêze.

çapak, *çapak*: çav(göz)+pak(temiz). Derçûn û pakbûna qirêja nava çav ku der û dora bijang û çavikê têtê der û berhev dibe. bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN, Kovara WAR.

çapraz, *çeprast*: çep(sol)+rast(sağ): Liser xêzek, bi alîyê çep û rast ve rêzkirina tiştina. Her wekî gelek kelîmeyên din ji vî kelîmeyê jî, bi parekên tirkî, gelek kelîmeyên nû jê hatine çêkirin. Mînak: çaprazlama, çaprazlamak, çaprazlaşma, çaprazlaşmak, çaprazlık, çapraşık, çaprazvari.

çaput, *çaput*: çar+pot. Ew çara(çala) ku wek perde ye, dema biqete, dibe pot. Ji wan potan ra jî têtê gotin

çaput. bn. tem. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN, kovara WAR

çardak: *çardarik* > *çardak*: çar(dört) + dark(küçük ince uzun ağaç). Ew cîyê havîne yê ku jibo sî û raketinê bi pevgirêdana çar darên sivik têtê çêkirin.

çare(çözüm yolu, çıkar yol), *çare*: çi(soru zamiri)+rê(yol, yöntem, çözüm). Jibo çareserkirina pirs-girêkek çi rê û rêbazên divê.

çarık, *çermik* > *çarox*: çerm(deri) +ok (isim yapma ya da küçültme eki).

çark(1.tekerlek, 2. vazgeçmek, geri dönmek), *çerx*: Ev kelîme di kurdî da hem têtê mana "tekerlek"ê û hem jî têtê mana "sazûman"ê. Dema dibêjin "çerxa dinyayê weha digere..." mana wî ew e ku sazûmana dinyayê bi vê awayê digere. Di lehca dimilî da têtê mana "gerandin"a tiştê helqayî û girover. Di zimanê sanskrîtî da ev kelîme wekî "câkra" têtê binavkirin.

çarmih, *çarmix*: çar(dört)+mix /mîx (çivi-dm.). Şiklekê êşkence û cezakirinê ye.

çarşamba, *çarşewe* > *çarşeme*: çar(dört) +şewe/şev(gece). Di teqwîma Kurdan da vegera rojê bi ser "şew/şevê" da têtê qebûlkin û hejmartin. Rojên piştê wê şevê, bi hejmartina şevên piştê wê şevê têne binavkirin. Destpêka rojê yekemîn ê heftê bi navê "şewa yewin/yewşewe" yan jî "yekşev", yê rojê duyemîn "dişewe" yan jî "duşev", ... bi vê hawayê heta roja pêncan têne hejmartin. Di şeva şeşan da dema ku têtê gotin "şeşşew/şeşşev" di peyvekê da sê dengê "ş" bihevra têne gotin. Jiber ku dengê "ş" giran

û sert e, di nav peyvekê da hebûna sê dengê "ş" wê peyvê pir giran dike. Jiber vê yekê di şuna "şeşşem"ê da bi mana şewa/şeva piştî wê di şiklê "hêne, êne, îna" da têtê binavkirin. Di nav fonetîka zimanên aryanî da dengê **w, v î m** bi yekudu ra digorin.

Çareşew yan jî çarşem, di nav rêza rojên yan jî şevên hefteyê da navê roja yan jî şew/şeva çaremin e.

çarşî, *çarsûk* > *çarşû*: çar+sûk(bazar, alışveriş alanı): Cîyê danûsandinê ku çar alîyê wî vekîrî be. "çar"ê di vira da wekî "çar" a peyva çarmedorê ye.

çat/çat-al, *çet/çetal*: Ew nûqta ku du rê, du çem yan jî hîn zêdetir tiştinê di bigîjin hev. Her wekî têtê gotin "çetrê/çetê rêyan", "çetê çeman".

çatak, *çetax*: çet(iki şeyin birleşme noktası, kavşak)+ax(toprak). Cîyê ku axa du newalan digîje hev. Çetax, heman deman navê qezekê Muşê ye.

çayir, *çêhre/çêre/çere*: Cîyê çêreyê hûr ê gurr. Di kurdî da dengê "h" bi pîranî yan dikeve yan jî werdigere ser dengê "y" û "w" yê.

çember(halka, kasnağ), *çenber*: Tiştê girover û nava wî vala.

çenebaz(çok konuşan, çenesi kuvvetli), *çenebaz*: çene+baz (oynayan, yapan anlamında sonek). Her wekî "-baz" a dekbaz, qumarbaz, seydbaz, hilebaz....

çengel(ucu kıvrık araç), *çingil/çongil/çengal*: Tiştê serê wî xwar û çendik kirî.

çerçeve, *çarçove*: çar(dört)+çov(çubuk)+e. Tiştê ji çar çovan hatiye çêkirin. Bi farisî dibêjin "çarçobe".

çerçi(gezici satıcı), *çerçi*: çer(nasıl, ne gibi)+çî(ne). Ew firotxê seyar ê ku tû "çi" bixwazî û tiştê "çer"a bêjî pêra hebe.

çerik, çeyrek(dörtte birlik bir ölçek (1/4)), *çaryîk/çarik*: çar (dört) +yek(bir). Pîvaneke ku ji çaran yekê tiştêkî diyar dike.

çevgen(baston, asa), *çovgan/çogan*: ço(sopa, değnek, asa)+gan(can). Ew "ço" yê ku merivên nexweş yan jî pîr didine ber xwe, da ku jibo taqeta çokê xwe teqwîye bikin.

çevre(bir şeyin yakını, dolayı, etrafı), *çevre*: çar(dört)+hawîr(yan, etraf). Çar hawîr, çarmedor, çaralî.

çıra(ışıklık), *çûra/çira*. Ew dara wers ê ku zû bi agir digre û meriv bi wê çûna rêya tarî ronahî dike.

çift(iki, ikili), *çift(dm.)/cot(kur.)*. Bi farisî dibêjin "coft".

çifte(hayvanın iki ayağıyla attığı tekme), *çifte*: Pehîna ku heywan bi du lingê xwe yê dawî davêje.

çil(döğme sonucu yüzde kalan iz), *çil/çilo*: (yüzü çok miktarda benekli ya da lekeli olan sarışın kimse). Ew kesê zerik ên ku di rûyê wan da ben(şanik) û daxên zêde hebin, di lehca dimilî da ji wan ra dibêjin "çilo".

çile(zahmet, sıkıntı, acı çekme), *çil/çile*: çil(kırk-40)+e. **1.** Demek dijwar a perhîzbûna derwêşan ku çil roj berdewam dike. **2.** Rojê çilemîn ê piştê mirîyan, ku ew êş û şûna wî têtê bîranîn. **3.** Çil rojên dijwar ê zivistanê bi navê çilpêçe têtê binavkirin.

Dîyar dibe ku her sê maneyê cihê xwe dispêrin kelîma "çil", û naveroka van sê maddeyên cihê jî

mana "zahmetî, tengasî û dijwarî" di nav xwe da dipê.

çilekeş(çile çeken), *çilekêş*: çile(bak. çile)+kêş(çekme). Yê di nav zahmetî, tengasî û dijwarî da ye, çile dikşîne.

çimen(yeşillik, yeşil otlarla kaplı alan), *çemen/çîmen*: çem(nehir)+en/in(mastar eki). Ciyê ku çem derbas dibe avî ye, derûdora wî herdem şîn e, biçîm e.

çirkêf(pis, çirkin), *çirkav-çirkev*: çirk(pis, kötü, dağınık)+av(su). Tiştê wek ava pîs, genî, bîno.

çirkin, *çirkîn*: çirk(pis, kir, dağınık)+în(mastar eki). bn. çirk.

çoban(koyun, keçi sürülerini güdüp otlatan kimse), *şebvan/şevvan/şivan*: şeb/şev (gece) +van (türkçedeki -cı, -ci, -cü, -cu anlamında sonectir). Di kurdî da dengê "b" û "v" bi hev diguherin. "Şivan" têtê mana newbecîyê şevê, yanî "şevvan/şevan". Ji çerandina şevê ya pez ra ji têtê gotin "şevîn".

çor(hastalık, dert), *şor>çor*: Ev gotin di lehca dimilî da bi mana "derd, nexweşî" da hîn jî têtê karanîn û weha dibêjin: "To çor veto! ti vanê ez nişêna". Her wekî bêjin tû jî bûyî wek axa şor, ku berhem nadî.

çorak(tuzlu, kireçli, verimsiz torak), *şorax*: şor(tuzlu)+ax(toprak). Bn. şor.

çorba, *şorbaw(sor)>şorba*: şor(tuzlu) + aw(su). Ava şor. Bi rastî jî "şorbaw/şorba" xwarin û vexwarina feqîran e. Di wexta nangiranîyê da ji ber ku yên feqîr nedikarîn nîsk bikirrin û bipêjin, "şorbaw" yanî "ava şor" çêdikirin û dikelandin jibo xwarinê.

çor-lu(hastalıklı, dertli), bn. çor.

çok-mek: çok(diz)+dan(etmek, yapmak, vermek anlamında yardımcı fiil). *Çokdan:* Liser çokan rûniştin.

çöl(verimsiz, kumlu toprak), *çol/çûl:* Erdê biqum ê bêber.

çöp(değnek, odun, çalı, sap, dal), *çov/çûv>çob>çop.* "çov/çop", di eslê xwe da bermayî yê tiştê darîn e. Di nava zeman da mana wê fireh bûye, bi mana bermayî yê hemû tiştan têtê bikaranîn.

çuha(yünden dokunmuş kumaş), *çûxe:* Tevî yê ku diçe nav hev, qilin dibe. Bn. Etm. Ziman Kurdî, A. UÇAMAN

çuval(yünden veya pamuktan dokunmuş büyük torba), *cûwal/ciwal.*

çünkü(bundan dolayı), *çûnku/çiku:* çi(soru zamiri)+ku(istek ve dilek kiplerinde şart zamiri. Her weki têtê gotin: Ez û xûşka xwe hatin, ku baran nebarîya dê û bavê min jî wê bihatana.

çürük(çözülmüş, bozulmuş, sağlam olmayan), *çûrûk/çirûk :* Ew tiştê ku ji xwerûtîya xwe xera bûye; bîn dide, genî bûye. bn. *çirk.*

dadı(çocuk bakıcısı), *dada/dadê:* da(ana)+da(ana). "da" di kurdî da têtê mana "dê-dayik". Dema di şeklê "dada" da bête gotin hem mana wê biqewet dike û hem jî maneyek dilînî dide peyvê.

dağ(yara iz, damga, belirti), *dax:* 1. Ew nîşan û daxkirina ku bi tişteki maddenî yê sorkirî bête kirin. 2. Ew gotina ku di dilê meriv da birîn veke, wî pirr biêşîne, dilê wî bidaxîne.

dağ-lamak, *daxkirin:* bn. dax.

damar, *tamar/temar:* Bi zimanê sanskritî "tamar" têtê mana avê.

dar-ağacı(idam mahkûmlarının asıldığı ağaç), dar(ağaç, direk)+ ağacı. Ev kelîme were wergerandin bo zimanê tirkî, dibe "ağaç ağacı".

darbe(vurma, vuruş), *darbe:* dar(sopa, ağaç)+be/bi(yerine göre hem yar. fiil hem de edat görevini görür). Ew lêdana ku wekî lêdana dar(ço, sope) be.

değer(paha, kıymet, eder): *dekir>deger*(bûha). bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN

dek(hile, tokuşma, çatışma), *dek:* Di lehca dimilî da du maneyên vê peyvê hene: 1. Têtê mana "hile" ya tirkî; "deke bide kerdîş". 2. Têtê mana "tokuşma, çatışma" ya tirkî; "bide dekirnayîş", "yewbin dekirnayîş".

dem(zaman, çağ, vakit), *dem:* Ev peyv bi heman mana xwe derbasê Tirkî bûye.

derbeder(darmadağın; barınacak beli bir yeri olmayan kimse, kapı kapı dolaşan), *derbeder:* der(dışarı, kapı+dışarı)+be/bi(edat)+ der(yer, kapı). Pejmûrde û bêkes ê ku ber derîyan digere, bê cî û war e.

derdest(yakalama, tutma, el altında), *dardest(sor.) /derdest:* dar(sopa, hikûm)+dest(el). 1. Yê bindestê dar (hikûm), girtî.

dere, *derah>dereh>dere.* der(yer, zemin)+ra/re (yol). Zemîna ku bi berve jêr da nizim dibe av têtê diherike, nasekine. Di lehca soranî da dibêjin "awdere" û bi sanskiritî jî dibêjin "dara".

dergah(tekke): *dergah:* der(kapı)+gah(eşik, kapı eşiği, yer anlamında sonek). Ber derîyê mala mezin; mala şêxan, yanî cîyê ku endam û derwêşên terîqetan têda dimînin.

Her wekî peyvên nivîsgeh, stargah, çêregeh, seyrangah.

derman(1. ilaç. 2. takat, güç), *derman*:

Bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye. Bi lehca dimilî jî dibêjin *darû*.

dert(üzüntü, hastalık, sıkıntı), *derd*:

der(dış, dışarı)+de(edat). Ew tengasî û nexweşîyên nava meriv ku xwe didin der. Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

dervîş(bir tarikata bağlı kimse), *derwêş*:

Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

deste(tutam, bağ), *deste*: dest(el)+e.

destek(dayanak, tutacak, elcik),

destek: dest(el)+ek(küçültme soneki). Di nava zeman da çarçova vê peyvê wekî "destdayin, piştgirtin, piştdayin" fire bûye.

destur(izin, mücade), *destûr*:dest(el) +

û(bağlaç)+ rê(yol): Ev rêçûna min bi îzin û destê te be.

dev(olağan üstün güce sahip olan bir

masal kahramanı), *dêw>dêv*: Ev peyv, bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye

devasa(dev gibi, çok büyük), *dêwasa>*

devasa: dêw(dev, büyük)+ a(işaret zam.)+sa(gibi). Ew tiştê ku wekî dêw/dêv mezin xûya dibe.

didem(isim), *dîdem*: dî(görme)+dem

(zaman). Dîtina dem.

dik(düz olma, ayağa kalkma, yük-

selme), *dîk/tîk*: di(edat)+êk(bir, düz)). Ew tiştê ku bi rabûna û bilindbûna xwe jêrejor rast be, düz be, yek(êk) be. Li vê derê dengê "t" û "d" bi hev diguherin; her wekî "dihere" û "tehere" ya serhedîyan.

dilaver, *dilawer*: dil(yürek)+wer

(türçedeki -lı, -cı eklerinin yerini

alır): (yürekli, cesaretli). Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

dilber(alımlı, güzel kadın), *dilber*:

dil(gönül)+ber(yan, nezd). Ew jina delal a ku dilê meriv berve xwe bikşîne.

divan(görüşme, görüşme yapılan yer),

dîvan:dî(görme)+wan/van(bir işi yapan kimse anlamında sonek).

"Dîwan", bi eslê xwe tête mana hevdişînê. Di nava zeman da bi firebûna mana wê, cîyê hevdişînê û hevcivînê jî wekî "dîwan" hatiye binavkirin. *Dîdevan* jî di mana "görüştücü" yê tirkî da tête karanîn.

divanxane, *dîwanxane*: dîwan(bak.

divan)+xane (ev, mekan). Ew xanîyê ku têda dîwan çêdibe, cîyê civînê.

diyar(yurtluk, bölge, ülke), *dîyar*:

dî/dîtin(görme)+y(kaynaştırma)+ar (yer). Warê bilind ê ku tête dîtin, xûya dibe.

dost(sevilen, güvenilen yakın

arkadaş), *dûst/dost*: "dûst" ji peyva "dûrist" peyda bûye. Têkilîya hevaltî ya ku liser esasê rastî û dûristî be.

dostane(dost-ça), *dûstane*: dûst(bak.

dost)+ane(türkçedeki -lük, -luk, -ça, -çe sonekleri anlamındadır). Têkilîya ku wek tîkilîya du dostan be.

duman, *dûman*: dû (arka, art, geri)+

man (kalmak)>duman. Bi şewitîna tiştêkî ew şopa gazê ya ku li du wî dimîne. Bi sanskrîtî dibêjin "dhumâh".

dumur(körelmek), *dûmir*: dû(arka,

art)+mir(ölme, öldü): Ji berhem dayinê ketin, bêdawî, bêpaşeroj

mayina gîyandar jêre dibe wek mirin.
duvar, *dîwar*: dî(görme)+war(yer, yapı, mekan): Ew bendê ku cî û warekî ji dîtina derva da dipê û diveşêre.

dûgme, *dûgme*: dû+gih+hem+e> dûgme. Ew tiştê ku du perçeyên jihev bûyî digihîne hev. bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. Uçaman.

dükkân, *dikan*: dik(öteberinin üzerine yığıldığı yer)+an(çoğul soneki). Dikan şiklê piranîya dik e. Nûha jî di lehceya dimilî da ji cîyê ber rojinê ra ku ji zemîna giştî bilindtir têtê çekirin û ji cîyê alav danîna nav malê ra dibêjin "dik". bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN, WAR, Hej: 7

dûn, *doîn/dûîn*: do/dû (bir önceki gün)+în(gün, ay, yıl gibi zaman birimlerinin sonuna gelerek Türkçedeki -kü, -ki anlamını verir).

dûrbûn, *dûrbîn*: dûr (uzak)+bîn (görme): Ew aletê ku tiştê dûr nêzîk dide xûyakirin.

dûrûst (doğru, düzgün, sağlam), *durûst /dirûst*: di(edat)+rûst/rast (doğru, düzgün, gerçek): Ew ê ku di xêzek rast û dûz da be, di xêza çûyina xwe da hok û fitlan li xwe nede, gotin û kirinên wî hev bigre.

düşman (aleyhte, karşıt, hasım), *dûjmin /dijmin*: dij(aleyhte olma, karşıt)+min(birinci şahıs zamiri). Ew kesê di alehê me da ye, dijî me ye.

efsane, *efsane/evsane/estane*(masal, söylence, hikaye): Ev sanekên ku bi giştî pêkhatin û bihûrîya bûyer û hebûnî yên xûdanî û xaybanî bînin ziman. Ev peyv di şiklê *estane-k* îro jî di lehceya dimilî da têtê bikaranîn.

enayî/enaye(kendini bilmez, avanak, kendinden geçmiş): *enayî*: e(ez) (birinci şahıs zamiri)+na(değil)+y(kaynaştırma)+î(çekim eki): Ewê ku ne li xwe ye, kar û zararê xwe nizane.

erişte(kesilip kurutulmuş hamur), *rişte*: "rişte", tayê honandî yê 3-4 tixt. Jiber ku xamurê "erişte" jî wek ta têtê honandin vî navê girtîye.

eş-mek(toprağı vb. bir şeyi biraz kazı-mak), *aşanayiş*: aş(çukur, derinlik) +nayiş(dimilî lehçesinde yapmak, etmek). "Aşanayiş"a dimilî têtê mana vekolîna kurmancî.

evlek(tarlanın, tohum ekmek için saban iziyle bölünen bölümlerinden her biri), *hevlek*: Di kurdî da dengê "h" yê li serê peyvîna carna dikeve; her wekî hewe/we, hevîn/evîn, hembar/embar, hewr/ewr, ... Li vê derê "h"ya li serê "hevlek" a kurdî ketîye û "evlek" bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye. Bi kurmancî dibêjin "tej". Ferhenga TDK-yê vê peyvê wek peyvek yunanî nîşan dike.

eyvah!, *eywax!*: Xemgîniya li hember tiştêkî ku çêbûna wî ne di hisabê da ye.

eyvan, *hêwan/êwan/eywan*: Cîyê ku pêşîya wî vekirî ye, ji der va hêwa digre.

ezber, *jiber/ezber*: ji(edat tr. -den anlmında)+ber(ön, yerine, göğüs). Bi guherîna dengê **j û z**, "jiber" wek "ziber/ezber" jî têtê xwendin. Ji ber xwe da, bê nihêrîna eslê metnekî, xwendina wê.

ferah(bol, geniş), *ferah/fireh*: Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

ferahî(bolluk, genişlik), *ferahî/firehî*: bn. ferah.

firtına, *firtine*: fir(uçma)+tîne (getirme): Bayê baran ê xurt ku bi tevî xwe tiştan fir tîne.

fil(zool.), *fil/pîl*, Navê heywanekê kovî ye. "Pîl", di lehca dimilî da têtê mana tiştê gewre, xurt û qirase.

gerçi(her ne kadar, ise de), *gerçî*: eger/ger(olursa, olaki, öyleyse)+çi (ne).

geveze(lafazan, çok konuşan, çenesi düşük), *kebbaze(far.)-gepbaze (kur.)*: gep(agız ve burun kısmı)+ baz(bir sonek olup yapan, eden anlamındadır). Ew kesê ku ji ber qisekirinê devê wî nasekine, pîrr qise dike.

girdap(ters akıntıların oluşturduğu dönme, burgaç), *gerdab/gerdav/girdav*: ger(dolaşma)+ab/av (su). Di encama guherîna dengê p, b, v da, "gerdab/gerdav" di şiklê "girdap"ê da derbasê tirkî bûye.

girift(karışık, girişik, çapraşık), *girê* (döğüm)+ve(olumsuzluk anlamı veren yardımcı fiil)+tê (oluşmak). Ew tiştê ku wek girêkê li hev geryaye, tevîhev bûye.

göçer(yazı yazlıkta, kışın kışıkta konaklayan kimse, topluluk), *kohçer/koçer*: ko(dağ)+çer(otlatma). Di lehça dimilî da "koh/ko" di mana çiyayê kurmanci û "dağ" a tirkî da ye. Ew ên ku jîyana xwe havînê li zozanan, liser "koh/ko" an derbas dikan, koh bi koh digerin heywanên xwe diçêrinin, yanî karê wan li koh/ko çêrandina heywana ye.

göl(derin ve geniş durgun su birikintisi), *kolaw(hew.)/golaw/gol*: Dixwazî xwezayî be yan jî çêkirî be, cîyê kolandî yê ku av têda berhev dibe.

guguk(guguk kuşu), *kuhku/kehku*:

Navê teyrek e, ku çîrokekê wê ya mîtolojîk heye. Di zimanê sanskrîtî da wek "Kuhuka" têtê binavkirin.

gül(güllerin kokulu olan örnek bitkisi), *gul*. Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

gülistan(gül bahçesi), *gulistan*: bexçê gulan, cî û warê gulan.

gül-suyu, *gulav/gulaw*: gul(gül)+aw (su). Ava gulan.

gür (bol ve güçlü olarak çıkan veya fışkıran): *gurr*(yüksek ses, gürlemek, sığ). Ev peyv di sanskrîtî da jî wekî "kur" têtê gotin.

güya (sözde, sözüm ona), *goya*: go (söyleme)+y(kaynaştırma)+a(işaret zam.). Li gor ya têtê gotin, yan jî gotin a têtê kirin.

hafta (artarda gelen yedi günlük dönem), *hefte*:heft(yedi)+e(isim yapme eki). Pîvanekê zeman ê bi rojan e; heft rojên dûhev.

hala (babanın kız kardeşi), *xala*: **1.** Xwenga bavê meriv. **2.** Anûha.

halı (yünden dokunmuş yer örtüsü), *xalî*: Tevî ku ji hirî hatiye çêkirin jibo raxistina erdê.

ham(olgunlaşmamış), *xam*: **1.** Fêkîyên têrnegehiştî. **2.** Merivên têrnegehiştî. **3.** Keçika berzewec(xama). **4.** Heywana barkêşî ya ku nû têtê barkirin.

hamur, *hemhûr>hevûr*: hem+hûr-hêr. Ew hûrên ku hev girtine.

han(ev, konak, konaklama yeri), *xan*: Ciyê xew û vehêsan û razanê. Bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN.

hançer(silah olarak kullanılan bıçak), *xunçir/ xençer*: xun(kan)+çir(yirtma). Ew kêra ku bi çirandina can xun derxîne.

hane(ev, konut), *xane*: Avayî û cîyê

rabûn û rûniştina malbatê.

hanedan(konuksever, soylu aile),
xanedan: xane(ev, mekan) +dan
(etmek, yapmak, vermek anlamın-
da yard. fiil) Ew ên ku zadegan bin
û derîyê xaniyê wan ji her kesî ra
vekirî be.

hani(nerede, ne oldu), *kahani/kanî*:
"kanî" di lehçeya dimilî da zemîrê
pirskirinê ye.

hanüman: *xanûman*: xan(ev)+û
(bağlaç)+man(öteberi anlamında
pekiştirme eki).

harabe(yıkılmış, bozulmuş), *xirabe*:
xirb(yıkık, bozuk)+e. Avayîya xirb
bûyî, xera bûyî. Dengê xwezayî
ye. "xirb" jî di mana "pag"ê da tete
bikaranîn.

has(özel, özgü, saf), *xas*: xu(kendi,
öz)+as(asayîş: görünüm). Ew tiştê
ku bi hemû layên xwe yê saf û
xwerû ve dîyare. "asayîş" di
lehçeya dimilî da tete mana
"xuyabûn, dîtin"a kurmancî.

hasret(özlem, ulaşmak isteme), *hesret*:
hesir/hêsir(göz yaşı): Ew xwezî û
bîranîn ên ku tene bîra meriv û
meriv didine girînê, hêsirên çavê wî
tênin xwarê.

hasta(sağlığı bozulmuş, rahatsız),
xistî>xiste>xeste: Ev gotin ji
xistinê bûye têrker (ismê meful).
Wekî ketî, mirî, kuştî ku ji ketin,
mirin û kuştinê tene çekirin. Bi tenê
xistî dema ku bibe wesfa yekî belî,
dibe xeste. Bn. Jêdera berê, A.
UÇAMAN, Kov. WAR.

hastahane(hasta evi), *xistexane*:
xiste(bn. hasta)+xane(ev, yapı,
mekan). Ew cîyê ku ev nexweş û
xeste têda jibo derman kirinê tê
razandin, ew cî navê wî xestexane

ye. Yanî xaniyê xistiyan û nexweşan
e. bn. Jêdera berê, A. UÇAMAN,
Kov. WAR.

havar(çağrı, imdat, yardıma gelmek),
hawar: ha!(haykırma anlamında
ünlem) +wer(gel, gelme): Her wekî
meriv bête; ha werin!, ha werin!

havlu(kurulanmaya yarar havlı bez),
xavlê/xawlê/xawlî: "xav-ik" tiştê
zirav ê tenik. Ew desmala ku serê
wê bi tayê zirav ê tenik hatiye
çekirin, xwêdan û ava canê meriv
dikêşe û zuha dike

havuz(su biriktirme yeri, suluk),
hawz/hewz(kur-hew.-dm-sor.):
aw+zê. Dengê "h"yê ku liser peyvê
tê, gelek caran dikeve, li vê derê jî
"h" ya li serê *hawzê* dikeve û
dimîne "awz", yanî cîyê ku jê av
dizê û berhev dibe..

hayal(düş, düşte görülen, varlığı tasar-
lanan), *xûyal/xîyal*: "Xûya" dîtin e.
Xûyayî: Ew tiştê ku bi çav tete
dîtin. Ew tiştê ku însan bê mêzeki-
rina bi çav, yanî lêgerandina bi
fîkrê; tiştê ku bi fîkrê tete dîtin,
xûyakirin, ji wî tiştî ra tete gotin;
aliyê xûya (xûya+al > xîyal). Bn.
Jêdera berê, A. UÇAMAN, Kov.
WAR.

hayalî(hayal niteliğinde, hayal ürünü
olan), *xûyalî/xîyalî*: xîyal(bak.
hayal)+î(sonek olup ilgili, alakalı
anlamına gelir) Bn. hayal.

he(evet), *herê/erê/e*: Dengê "h" yê li
pêşîya hinek peyvên dikeve.
Mînak; herê-erê, hewe-we, hem-
baz-embaz, hewr-ewr, ...

hedik(kaynatılmış buğday, bulgur):
hebik: heb(buğday tanesi)+ik(isim
yapma eki).

hem(daha, dahi, ile, aynı), *hem*: Mana

pêrabûnê, digelbûnê, beraberîyê dide. Mînak: Hem xwûşk û hem bira, hemdem/hevdem, hembar, hemşehrî, hem bi wî ra û hem bi min ra, hemhudut, ...

hempa(ayakdaş, arkadaş, eş görünüşte olan), *hempa*: hem(ile, birlikte, eş)+pa(ayak). Ew ên ku bihevra gav diavêjin, bihevra hereket dikin, bihevra dibezin, rêhevalê hev in.

hemşehrî(ildeş, bir ilden olan), *hemşehrî*: hem(bak. hem)+şehr(şehir)+î (ilgili, ile anlamında sonek). Ew ên ku bajêrîyê hev in, herêmîyê hev in, welatîyê hev in.

hemşîre(kelime anlamı sütteş), *hemşîre* (*hew.*, *sor.*): hem(eş, özdeş)+şîr/şîre(süt): Ew keçen ku bihevra ji pêşîrên dayikekê şîr vexwarine, qasê xweng û birayan nêzikê hev in. Di nava zeman da mana vê peyvê fire bûye; bûye lênêrînera dilînî ya nexweşan.

hendek(kazılmış derin çukur), *xen-dek/kendek*: kend(kazmak, kazılmış çukur) +ek(küçültme soneki). Cîyê kolandî yê kûr

hengâm(anında, zamanında), *henagam/hengam*: hena/ena(bu)+ gam(an, zaman). "Hena/ena" di lehceya dimilî da têtê mana "ev, ew" a kurmancî, "gam" jî têtê mana "gav" a kurmancî. Hengam, yanî "ev gav, ew gav".

her(hep, sürekli, bütün), *her*: Ev peyv bi heman mana xwe ya kurdî derbazê tirkî bûye. Hema hema di hemû zimanên Aryanî da têtê bikaranîn.

herkes(her kişi, her insan, bütün insanlar), *herkes*: her(hep, bütün)+kes(kişi). Ev peyv bi heman mana xwe ya kurdî derbazê tirkî bûye.

hepsi(bütünü, tamamı), *hemîzî* > *hemîsî*: hemî(bütün, tüm)+zî(de, da). "zî" di dimilî da têtê mana "de, da" ya tirkî.

xercümerc(karmakarışık, darmadağın, alak bulak), *xercümerc*: xerc/xercil-yayış(karmakarışık uğraşı) +û(bağlaç) +merc(pekiştirme eki).

hergele(bineğe veya yük taşımaya alıştırılmamış eşek sürüsü), *hergêlê/hergele*: Her(eşek)+gêlê/gele(dolaşma). Ew kesê ku bi kerên wekî xwe ra gêle dibe, bêsêr û bêber digere, kêrê tiştêkî nayê.

hırılî(boğazdan çıkan boğuk ses), *xirxir*: Dengê ku ji qirikê dertê û nayê têgehîştin. Gotinekê pêşîyan heye dibêjin "mirin mirin e, xirxir çi kêrê min e."

himbil(işe yaramaz, tembel, uyuşuk), *himbêl/himbêl*: him(deng)+bê(gelme)+lê(o, ona). Dema em dibêjin filankes "ne him dike, ne gim dike", mana wî ew e ku deng û hes jê naye. "him" dengekê xwezayî yê bêmane ye. "Himbil", ew kesê ku xwe bêdeng kirîye, haya kesî lê nîne, ew jî xwe tev nade, kesî bi xwe naheşîne.

hırçîn(geçimsiz, öç almayı seven, art niyetli), *xirçikin*: xirçik+in. "Xirçikin", di lehca dimilî da têtê mana kesê xuyteng, nîyetxerab, çavnebar, hesûd.

hıyar, *xiyar*: fêkiya nebatekê ji cinsê kundiran.

hiç, *hêç*: hê(daha, başka) +çi(soru cümlelerinde "ne" anlamında belirsizliği anlatır). Her weki em bêjin, "tiştên ku te dîyar kir ji dervayê wî hê çi maye?"

hiza(düzlük, doğru çizgi, doğru yol),

xêz/xîz(çizgi)+a(parek e). Dengekî xwezayî ye. Dema ku erdê hişk yan jî kevirekî bi tişteki sert bête xêzkirin dengekî jê dertê, ew deng di nava zeman da bûye navê wê lêkerê, ku bêtir jibo xêza rast û dûz têtê karanîn. Di xêz û rêzekî da bûyina kes û tiştan.

hor(değersiz, aşağı, düşük), *xwar>xor*: Yekî ji xwe xwartir, berjêrtir, piçûktir ditin. Ev kelîme bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye.

hoş(çekici, beğenilen, zevk veren, güzel), *xweş/xoş*: Ev peyv bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye. Di zimanê tirkî da ew peyvên ku ji "hoş"ê peyda bûne: Hoşça, hoşgörü, hoşgörülü, hoşgürsüz, hoşgörüsüzlük, hoşlanış, hoşlanmak, hoşlaşmak, hoşluk, hoşnut, hoşnutluk, hoşntsuz, hoşnutsuzluk, hoşsohbet.

hoşav(komposto, leziz su), *hoşav/xoşaw*: xoş(hoş)+av/aw(su). Ava xoş.

hoşbeş(hoş sohbet, iyi söz, söylemek), *xoşbêj>xoşbêş*: xoş(bak. hoş)+bêj(söz, söyleme). Bi hev ra gotûbêja xoş û baş kiran.

hovarda(yiyici, yiyip içen, eğlence düşkünü, çapkın), *xwardin>xwarda*: xwar(yeme, içme, aşağı, eğri)+da(de, da anlamında edat). **1.** Yê ku jibo kêfê pir dixwe û vedixwe, qasê ku ji rê derkeve, dakeve vî dike. **2.** Tolaz, yê ku di rêya xwar da ye.

huda(tanrı, sahip), *xuda*: xu(kendi, kendini)+da(verme, yaratma). Ev kelîme bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye.

hun(kan), *xun/xwîn*.

hunhar(kana susamış, kan dökücü),

xunxar: xun(kan)+xar(yeme, içme). Ew ê ku mêrkûj e, xun dirijîne, xun dixwe.

hunrîz(kan dökücü), *xunrij*: Ew ê ku xun dirijîne. Di kurdî da dengê **z** û **j** bihev diguherin.

hurda(parçalanmış, bozulmuş, dağılmış), *hürde>xurde(da)*: hürde (ufalmış, parçalanmış, dağılmış). Di lehca dimilî da "hürdek, würdek" têtê mana tiştê piçûk, hêrayî, jihevbiyî.

huy(yaratılış, mizaç, davranış biçimi, alışkanlık), *xuy*: xu(kendi)+y(kaynaştırma). Ew hereket û xususiyetê me yên ku ji tabîata me têne, bitevî şexsiyeta me bûne, ji me ra bûne adet, me didin xuyakirin jibo yê dervayê me. Her wekî ku di nava gel da têtê gotin "xuyê şîrî heta pîrî".

hüner(beceri, bilgi, ustalık), *huner*: Ev kelîme bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye.

kâh(kimi dönem, arasıra): *geh*: Ev kelîme bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye. Her wekî ku têtê gotin: Geh li vir e, geh li wir. Geh li jêr e, geh li jor.

kahkeşan (saman yolu), *kakêşan*: ka(saman)+kêşan(taşımak): Ew şopa ku li dû kakêşanê maye. Çîrokekê mîtolojîk a vê peyvê jî heye. Digel kakêşanê "kadiz" jî têtê gotin.

kahya(evin efendisi, sahibi), *keyxuda*: keye(ev)+xuda(sahib). Di nava zeman da mana vê peyvê fire bûye, di şûna yê malê xwedî dike, diparêze da hatiye bikaranîn.

kant(bitkilerde çıkan şeker), *qend*: Şekirê nebatan.

kâr(iş, güç, çalışma, emek), *kar*: Ev kelîme bi heman mana xwe derbasê

tirkî bûye. Her wekî gotinekê pêşîyan dibêje: "karê wext paşayê text.", "karê îro nehêle sibê".

kel(kılsız, saçî dökülmüş kimse), *kelçel>kel*. **Kel:** 1. *Kele:* serî.2. Bi lehca dimilî têtê mana "nêrî"ya kur-mancî. 3. Ew manga ku zîya wê hatiye kel, li pey ga digere, yanî bûye *kelaz*; kela daxwaza têkilîya cinsî bi wê ra peyda bûye. 4. Qonaxa heraret û kelhatina tiştên avî. Mînak; "kela şorba, kela aw, kela şîr, ... 5. Daxwaz û xwestina kirina karekî. Dema ku em dibêjin filankes "kelagirî bû", yanî hate nûqta girînê, dixwest bigirya. Yanî her wekî ku bi dimilî dibêjin "kela yê/ya kela şorba ya, bêro nêvînde-na." 6. *Kela:* kel+a(pareka nav çekirinê ye): Ew dîwarê mezin ê ku jibo parastina avayîya nava wî têtê çekirin. 7. *Kele:* Rûnê malê-nivîşk (kur.)/riwenê keyî(dm.). Rûnê nivîşkê dema ku di nav meşkê da hev digre dibe wek kelekî piçûk. 8. *Kele:* Têtê mana kevirên piçûk ên girover.

kelek(olgunlaşmamış, yetişmemiş kavun ve karpuz vb.), *kalek/kelek*: 1. Kal (olgunlaşmamış, pişmemiş+ek(sonek). Zebeş, qawin û xiyarên ku tam negehîştine. 2. Ew navgîna ragihandinê ku ji meşkan têtê çekirin û pê barkêşanîya ser avê têtê kirin.

kelepçe, *kelepêçe/kelepçe*: kele(hayvanların başına bağlanan bağcık) + pêç(sarma, dolama)+e. Di lehceya dimilî da ji benê ku pê serê heywanan têtê girêdan ra dibêjin "serkele"; yanî kele yê ku pê serî têtê girêdan. Di nava zeman da

mana vê peyvê fire bûye, ji benê destgirêdana girtîyan ra jî hatiye gotin kelepêçe/kelepçe.

kelepir(bir şeyi değerinden çok düşük fiyatta olamsı), *kelepûrt/kelepûr*: kele(baş)+pûrt(tüy, kıl): Ev gotin jibo wan kesên ku çavên wan li tiştên biçûk ê bedewa ye, ku ewan tiştan bi fiyeta di dereca pûrtên serê heywanan de ye; yanê, goşt û post û herî bi destên wan nakeve. Bn. Etm. Zimanê Kurdî. A. UÇAMAN, Kovara WAR.

keleş, *keleş/keleş*: kel/kele(baş)+leş(vücut). Ew pehlewane ku jibo lejkerî û şervanîyê hatiye amade-kirin.

kem(noksan, eksik, kötü, bozuk): *kem-kêm*: Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

kemer(kuşak, bel bağı, kayış), *kember/kemer*: kem(az, eksik noksan)+ber(en, genişlik). Ew şerîtê dirêj ê ku berê wî kem/kêm be, kember be. Hem navê piştîya piştî merivan e û hem jî navê kemera çarmedorê avayî ye.

kenar(kıyı, uç), *kendwarr>kenar*: kend(kazma, kazılmış)+war(1. warr: aşağı. 2. (sınırları belli yer, alan). Di lehceya dimilî da "kend" têtê mana cîyê kolandî yê kortal, "warr"a ku têda dengê r stûr têtê xwendin du manayên wê hene: 1. Cîyê jêr; li gor taxekî bilind zemina jê berjêrtir. 2. Bicibûna erdê ku tixubên wî diyar bin.

kene(bir asalak böcek), *gane>gene*: gan(can, vücut)+e(sonek). Navê ew parazita ku bi mêtîna xwîna di "gan"ê meriv û heywanên wek ga, manga, ker, kûçik, pez û wd. da dijî ye.

kepçe(büyük kaşık), *kawçe/kewçe/kevçe*:kaw/kew(aşık kemiği şeklinde oval şey)+çe(küçültme eki) darê tenik ê di şiklê kaw(kab) da.

kepek(buğday, arpa vb. etrafında bulunan ince zar), *kapek*: ka(saman)+pê(ile)+k(isim yapm eki): Ew kirasê ku bi tene ve zeliqandî ye, piştê ku ji cihê xwe têtê rakirin, dibe wek kayê. *Kepek*: ew kayê ku pê dikeve. (Bn. Etm. Zimanê Kurdî, A. UÇAMAN.)

keran(direk, çatı direği), *kêran*: Ew dara mezin a ku di çêkirina banê xanîyan da liser dirêjayî wek kîrîş têtê bicîkîrin. Di dîyalekta dimilî da jêra têtê gotin *pirê jî*.

kerhane(genelev), *kerxane*: ker(binek, eşek)+xane(ev).

keriz(kolayca kandırılabilen, pislik), *kerrêz/kerîz*: ker(eşek)+rêz(sıra, seviye). Ew kesê ku têgehîştina wî di rêza têgehîştina keran da ye.

kerpiç(duvar ürmekte kullanılmak için saman ve balçık karışımından oluşan tuğla), *kerpîç*: kere+pûç/pîç: Ew tuxla ku bi tevîhevbûna ka û herriyê hatiye çêkirin, wek kevîrekê sexte ye û di çêkirina avayîyan da li şûna kevîrê têtê bikaranîn.

kertik(işaretlemek için çizilmiş çendik, iz), *kirt/kertik*: Bi kêr yan jî birrek niqirandina tiştêkî sert(tund). Ev peyv ji dengê xwezayî têtê.

kervan(uzak yerlere yolcu ve ticaret eşyası taşıyan yük hayvanı katarı), *karwan/karvan*: kar(iş, kazanç)+wan(bir işi yapma bildiren sonek).

kepir(çamurlu çorak toprak, verimsiz toprak), *keppir*.

kes(bir nesneyi bölümlere ayırmak,

dilimlemek), *qes*: birr bi birr qeskirin û jêkirina tiştêkî. Her wekî ku di lehceya dimilî da têtê gotin: "êzime qeskerdiş", "por qesnayîş".

keş(argo. 1. sersem, 2. esrar, eroîn çeken), *kêş(kêşandin-çekmek)*: Ew kesên ku maddeyên serxoşkirinê dikêşin, di encamê da dibin girêdayî van maddeyan û gêj dibin.

keşişhane(manastır, keşişlerin bulunduğu yer), *keşişxane*: keşiş(rahip, papaz)+xane(ev, mekan). Ew xanîyê ku keşiş têtê dimînin.

keşkek(et ve buğday karışımından yapılan bir tür yemek), *keşkek*: Navê xwarinek e ku ji dan û goşt çêdibe.

kevgir(köpük tutan uzun saplı ve delikli kepçe), *kefgîr*: kef(köpük) gîr(tutma, alma): Ew aletê ku bi wî kefê ser tiştê kelandî têtê girtin.

kın(bıçak, kılıç gibi kesici aletlerin özel kabı), *kûn*(delik, yuva): Kûna di vira da her wekî kûna gur, kûna mar, kûna mişk e.

kır(yayla, geniş ova), *khôr>kur*: Di zimanê Sumerî da têtê mana "zozan". Di lehceya dimilî da "koh" têtê mana cîyê "çîya" û "zozan".

kıraç(bitek olmayan toprak), *khora>qerac(qeraj)*: kho(dağ) +ca (yer). Cîyê ku têtê çandinî nabe, ber nade, nayê ajotin.

kız(dişi çocuk, bakire), *qûz(venûs)qîz(zaroyê keçinî)*: "Qûz", navê cîyê cinsî yê jinan, venûs. "Qîza" kurdî jî, jî "qûz"ê têtê. "Qîz"a kurdî bi heman mana xwe derbazê tirkî bûye.

ki(anlam bakımından birbiriyle ilgili cümleleri birbirne bağlar), ku, kû, ki, ke: **1.** Pevgirêdank. **2.** Rengdêrê pîrsyarî.

kil(balçık, çamur), *gîl>kîl*: herî û axa nerm a şemitok(xijok) ku rehet tête şekilandin. Di zimanê Sanskrîtî da dibêjin "kîlî".

kim("hangi kişi" anlamında özne, tümleç ve yüklem olarak kullanılır), *kamî*(hangi kişi)>*kam*(kim): Bi Sanskrîtî "kîm", di mana "çima, jibo çî" da tête bikaranîn.

kin(öç, hınç, öfke), *kîn*: Ev peyv bi heman mana xwe derbasê Tirkî bûye.

kindar(kinci, nefret eden): *kîndar*: kîn+dar(yapan eden anlamında sonek). Ew ê ku kîn pêra heye.

kizir(kahya, köy muhtarının yardımcısı), *gizîr*: kehya, nobedarê gund, berdevkê axa.

kol(insan vücudunun omuzlardan parmak ucuna kadar olan bölümü), *qol*: Di lehceya Hewramanî û soranî(senedajî) da "qol", navê beşekê laş e, ku ji sermilan heta serê pêçîyan e. Di lehceya dimilî da jî dibêjin "pol".

köhne(eskimiş, yıpranmış, çağ dışı), *kohene>kohen>kehen*: Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

kömüş(manda, camız), *gamêş*: Di cinsê gayan da yê mê.

köpe(kulağa takılan süs takısı): guh (kulak)+pê(ile). Ew tiştê ku bi guh ve tête daleqandin. Bi dimilî dibêjin *goşare*, bi kurmançî hinek cîyan jî dibêjin *guhar*.

kör(görmez, görmeyen), *kûwîr>kûr*: 1. Yê bi çavan nabîne. 2. Tête mana "derin"a tirkî. Ev peyv bi heman mana xwe derbasê tirkî bûye.

köse(seyrek sakallı, tüysüz), *kûse>kose*:kû/ko(körelmiş)+se(gibi). Ew

mêrê ku rûyê wî wek aletê kobûyî ye, bi temamî mîsyona xwe nayîne cî.

köşe(birbirini kesen iki çizginin, iki düzlemin oluşturduğu açı), *goşe*: goş(kulak)+e.

kötek(sopa, değnek vurmak), *kutek/kotek/kotiş*(vurmak): Kotena bi çûwa(dim.)/lêxistina bi ço(kur.).

kulunç(omuz ağrısı): *qolunc/qolinc*: Êşa sermil.

kurt, *gurd>gur*: Ji cinsê kûçikan heywanekê dirinde.

kus-mak(istifra etmek, reddetmek), *qûsîn*: qûs(kesme, bozma)+în(-mek, -mak anlamında türkçe mastar eki). Dema em dibêjin "şîr qûsya", "mehîr qûsya", mana wî ew e ku şîrê me xera bû, mehîra me xera bû; bû wek tiştê ku ji mîdeya me paşve derketîye derva.

küçe, *kûçe*: kûç(taş)+e. Rêya bi kevir.

kûlah(erkeklerin taktığı keçeden, ucu sivri başlık), *kulah>kulaw*: Di fonetîka kurdî da bi pirranî dengê h dikeve û carna jî bi dengê "w û y"ê ra diguhere.

küme(tümsek biçimindeki yığın, tolu-luk): *kome(kombîyayene)*: 1. Tiştê berhevîyî yê ku loda wî bilind bûye. 2. Grub, ref, komel(topluluk).

küçük, *piçûk-kur/qiçik(qijek)-dim.*: qîç-qij(küçük)+ik(isim yapma eki).

küşne(kara burcak), *kişne*: Cûrekê xûreka heywana ye, bi taybetî tête ajotin.

ÇAVKANÎ

- 1- Eyüpoğlu, İsmet Zeki, *Türk Dilinin Etimoloji Sözlüğü*.
- 2- TDK, *Türkçe Sözlük*. Cilt: 1-2
- 3- UÇAMAN, Abdurahman, *Etimolojiya Zimanê Kurdî*, Kovara WAR, hejmar: 5-13.
- 4- Ziya Şûkûn, *Farsça-Türkçe Lûgat*, Milli Eğitim Bakanlığı yayınları, no: 3014, 1996
- 5- Badıllı, Kemal, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grame*, İkinci Baskı, Med yayınları, İstanbul-1992
- 6- S. VERROJ-A. UÇAMAN, *Ferheng-Vajname: Kurmancî-Hewramanî-Dimilî-Senendajî (Sorani)*, Weşanên WAR, 2002-Stenbol.
- 7- Şahinoğlu, M. Nafiz, *Farsça Grameri*, Kitabevi yay.
- 8- Porzig, Walter, *Dil Denen Mucize*, Kültür Bakanlığı Yayınları: 631
- 9- Malmîsanij, *Ferhengê Kirdkî-Pehlewî-Kurmanckî*, Apec, çapa yewin, 1997-Sweden
- 10- Bulut, Faik, *Kürtçenin Tarihçesi*, Tûmzamanlar yay.
- 11- Berdîrxan, Emir Celadet & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgîdsî*, Doz yayınları.
- 12- Kovara Kurmancî, weş. Institutuya Paris.
- 13- M. Emîn Zekî, *Kurdistan Tarihi*, Beybûn yay, 1992)
- 14- Faik Bulut, *Kürt Dilinin Tarihçesi*, Tûmzamanlar Yayıncılık.
- 15- Minorsky, *Kürtler*, Koral yay, 1992

Kurtiyek Ji Jîyan û Serhatîya *Hemzeyê Miksî*; Rewşenbîr û Xebatkar û Sîyasetvanê Gelê Kurd

Qedrîcan

Hemzeyê Miksî êk ji rewşenbîr, zana, sîyasetvan û xebatkarê gelê Kurd kû di destpêka sedsala bîstan da bûye. Bo destve anîna hêviyên gelê Kurd xebitiye û afirandinên mezin di çand û dîroka veşartî ya gelê Kurd re çê kiriye. Em her gav navê Hemzeyê şehîd di nava sitranên dengbêjên herî nevdar ê gelê me de guhdarî dikin. Zaf kes hene navê wî bihîstine û çî zanyarî li ser jîyan û xebata wî nînin.

Hemzeyê Miksî li dawîya sedsala nozdan li serdemê şoreşên Botan û Şêx Ubeydulahê Şemzînan li Miksê ya Wanê ji dayik bûye. Xwandina xwe ji dibistanên Wanê dest pê kiriye û heya xwandina îlahiyat li Stenbolê domandiye, li ser malbata wî zanînen berçav nehatine xuya kirin.

Hemze li sala 1910-ê zayînî çûye nava refên xebatkar û rewşenbîrên Kurd di rêxistinên wî serdemî yên ku li bajarê Stenbolê ava bûyin.

Mezintirîn xebata wî ya çandî û edebî xirve kirin û çap kirina *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî li sala 1918 yê zayînî bûye û pêşgotinekî têr û fireh jê re nivîsandiye, emê di dawiyê da

bijardeyek ji wê pêşgotinê ji hogirên çand û edebiyata Kurdî re pêşkêş bikin.

Hemze êk ji damezrênerê *Civata Feqîyê Kurdan* bû ku li sala 1912-an hate damezrandin. Govara *Jîn* ku organa fermî ya wê rêxistinê bû, pitir ji 30 hijmaran lê derçû û ji hejmara yekem heya hejmara 20-an, Hemze berpîrsê wê bûye. Her wisan êk ji damezrênerê *Komela Pêşketina Kurdistanê* bû. Komela navbirî "Şerîf Paşa" wek nûnerê gelê Kurd dişîne Konfiransa Parîsê û peymana Sêvirê imza diket ko mezintirîn hêviya gelê Kurd "Serxwebûn" ji soz û xalên wê peymanê bû ku eva han nîşana hişyarî û xebata siyasî ya Hemze û hevalên wî bû, li ser bextê Kurdan ev peymanê mirî hate zanîn.

Piştî weşandina hijmara 20-an a rojnama *Jînê*, Hemze tê girtin û wisan tê xoya kirin ku Hemze şehîd bûye, heta di rojnameya *Jîn* de seba şehîd bûna wî nûçeyên balkêş hene û Ebdurehîm Rehmî yê Hekarî wek pexşan û çîroknivîsê wê govarê de ko yekem şanoya Kurdî a "Memê Alan"

di wê govarê da weşandiye, helbestek bi navê "şehîdê Kurdistan Hemze" di hejmar 36-an de, a 17-yê Gulana sala 1920-an weşandiye. Lê şehîd bûna wî rast der neket. Hemze li serhildana Şêx Seîdê Pîran carek din tê girtin, bi hêceta wê çendê ko di devera Mardînê gotiye: "Dema ku hemû miletên cîhanê heqê xwe bistînin, çima Kurd ji Pirensîpên Wîlson fêde nebînin."

Bi wê axavtinê bi guneha "xiyanet bi welat re" hatiye girtin, ko ji gor govara *Jîn* a wî serdemî îşkence kirine û şandine hepsxana Dîyarbekirê û cezayê sêdaredanê jê re dane. Li gor pêkolên Mihemmed Emîn Boz Erselan û Dr. Nuredîn Zaza li Surye cihwar dibe.

Hemzeyê Miksî bilî zimanê Kurdî, zimanê Turkî, Farsî û Erebi bi başî dizanî, li Eyndewerê bajarekî biçûk di nava Cizîrê di bin desthilata Feransewîyan û dewleta Suryê da ku bi destê Feransewîyan ji bo koçerên Kurd, Asorî, Ermenî û Kildaniyan hatibû ava kirin, cihwar dibe. Hemze di wî bajarî da ku gelek kes wek gund lê nêrîne dibe mamosta û rêveberê dibistanê, ji Kurdan kes zarokên xwe naşîne dibistanê, wek tê zanîn Hemze diçe ber deriyê wan û bi kurmancîya xwe ya Miksî, daxwaz û ricayê ji wan dike ko zarokên xwe bişînin dibistanê, heta bi Erebi jî be, gava ku dît fêde naket, rojekê cendirmeyekê tev xwe dibe ber deriyê xaniyan û ji wan re dibêje: "Heger hûn zarokên xwe neşînin dibistanê, dewlet dê ceza bide we."

Di sala 1940-an Feransewîyan û dewleta Suryê ji Eyndewerê paşda vekêşan û gundê Eyndewerê ji wê derê rakirin û birine ser tuxîbê Îraqê.

Bi wî terzî Hemzeyê Miksî bi heyamê 20 salan bûye mamostayê zarokên Kurd, Erebi, Sûryanî û Ermenîyan û zaf ji zarokên wê dibistanê gehîştine xwandina bala di bajarên mezin ê Suryê da.

Tê zanîn ku Hemzeyê Miksî bi tev Dr. Kamiran Bedirxan elfabeya latînî ji Kurdî ra danaye. Jina wî wek jina Êhsan Nurî Paşa Turk bû û heya dawiya jîyana wî tevî kul û derdên wî ra ma.

Li ser roja wexera wî gotinên cor bi cor hene, hinek kes dibêjin sala 1958-an û hinek kes sala 1965-an roja wexer kirna wî dihijmêrin.

Hemzeyê Miksî piştî jînekî bi kul û keser tev xebat û têkoşîn bo rizgariya welatê bab û kalan, bi destê evîndarên çand û edebiyata Kurdî di nava axa bab û kalan de di gundê Dugerê devera Cizîrê nêzikê bajarê Tirbe Sipiyê teslim axê hate kirin.

Li ser kêla wî helbesta xwarê hatiye nivîsîn:

*Mamosta, Hemze beg,
Rehberê fidakar
Pir kes ji xwe te kirine hişyar
Raze bi xweşî bes em sala
Peyman delême ev hevala
Roja welat bijî bibînim
Ev mujde bi xwe bo te bînim*

Hilbijartiyek ji "dîbace"ya Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi nivîsîna Hemzeyê Miksî.

Hemzeyê Miksî di destpêkê da wiha nivîsandîye: "Ji bo her qewm û miletekî edebiyat û asarê edebî wek xîmê qewîne, ji bo serayêt alî miletê

xwe ê edebiyat çi qedr bikevite serayê seldeneta wî yê maddî bi herifit dîsa bi himetekî têtê temîr kirin."

Hemze rizgariya gelên din ên kû pêştir bindest bûn, wek nimûne aniye: ". . . bingehê li vî heqîqetî her qewm û mîletê kû arezûya mewcudiyet û seldeneta xwe ya millî bikin, hewceye ewelê emir ve ihtimadekî qewî bidene edebiyat û asarê xwe yê edebî.

Ev heqîqeta han di pêşiya çar esran da Hezretê Ehmedê Xanî derk kiriye û ji bo wê xebitiye. Dîbêjît: "Min lîsanê Kurdî anîye nîzam û intîzamê:

*Da xelq nebêjin ku Ekrad
Bê merîfetin, bê esl û bînyad*

Xasma di wî esrî da di alema medeniyetê da hucet û beratên mîletan lîsan û edebiyata wan e, mîletê bê hucet, bê berat dewa wî nayête se kirin, kes guhê xwe nadetê meger meelom bibe . . . "

Her wisan li ser dîroka vehandina Mem û Zîn û jîna Ehmedê Xanî û bandora wî li ser xelkê Kurdistanê bi giştî, wiha nivîsandiye: ". . . di (1061) ê da hatiye dunyayê.

*Lewra ku dema ji xeyb fek bû
Tarîx hîzar û şêst û yek bû*

Tarîxa nivîsîna Mem û Zînê (1105)e, merhumê mexfor piştî nivîsîna weladeta xwe axirê (Mem û Zîn)ê da wihe dîbêjît: *Îsal gehîşte çil û çaran wî pêşrewê gunahkaran*. Sed heyf ku rêkefta wêfata wî meelom niye, medfena wî li Bayezîdê ye ziyaretgeha Kurdan e, çend eser nivîsîne, hemî Kurdî ne (nûbihara biçûkan) eserekî

xayet nivîsîye di (1094) da, dîbêjît min ev eser nivîsîye:

*Ne ji bo sahib rewacan
Belkî ji bo biçûkên kurmancan.*

Tarîxa heyata wî ger çi "mutezîmen" ne meelome, ema ji asarê wî têtê zanîn kû Ehmedê Xanî wek Firdosî ji bo mîliyeta xwe xebitiye, temamê mewcudiyeta xwe di wê rê da serf kiriye, asarê Ehmedê Xanî di Kurdistanê xayet mueteberin, her kesek bi ihtîram navê wî zikir dîket.

Feqet dereca tesîrê da negihaye Firdosî, çünke Firdosî bi qelema xwe Îran hejand, Ehmedê Xanî nehêla ku Kurdistan temam bimirît ji mewta muebed xilas kir. Ema temam ehya nekir, çünke zemanê Firdosî ji bo fikra wî musaid bû, zemanê Ehmedê Xanî xayet bere bad û çetin bû, dewleta Osmanî digel hikûmeta Îranê muttefîqen Kurdistan di navbera xwe da teqşîm kiribûn, dest û pîyê wan wisan girêdabûn kû ne dikarîn xwe bihejînin, çinku made bi her terefan da çawan esker soq li ser wan dikirin bi cûrên hîle ixtîlaf û şîqaq êxistibûne nav Kurdan."

Hemzeyê Miksî derbarê egîdiya xortên Kurdan û zîmanê Kurdî û di dawiyê da gazindan ji xortên welat dike û ji xwedê daxwaza serketina wan dîket: "Hezretê Ehmedê Xanî xayet muteesîr bûye, himeta wî hatiye . . . bi wî terzî kiriye hewar.

*Ez mame di hikmeta xudê da
Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wech mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm*

Temaşa Kurdistanê û Kurdan
kiriye, şucaet û xiret û hîmeta di
Kurdan da dîtiye, di miletekî dî da
nedîtiye, dest bisîna a Kurdan kiriye.

*Her mîrekê wan bi bezlê Hatem
Her mîrekê wan bi rezmê Rostem
Bi fikir ji Ereb hetawe Gurcan
Kurmanciye bûye şîbhê Burcan . . .*

Ji ber wî qasî lîsana Kurdî lîsana
resmî nebûye, rewac nekiriye ax û
keser ji dil aniye.

*Ger dê hebûye me jî xudanek
Elî keremek letîfe danek
Min dê elemê kelamê mewzun
Alî bikara li bûnê gerdun
Nînin ji qumaş ra xerîdar.*

Birastî bazara xortê me jî wek
bazara Ehmedê Xanî kesad e, çi qedir
izhara himîqî diken . . . Xilas nabin ji
kola welat ji wir selamet namînin, ya
reb tu wan mehfoz bidêr û muwefeq
bike."

qedrican@yahoo.com

Jêder:

- 1-Govara Rojnamewanî jimar 6 -7
- 2-Mem û Zîna Ehmedê Xanî, şîrove kîrin û vekolî-
na Emînê Usman
- 3-Govara Jin, xirve kîrin û çap kirina Mihemmed
Emîn Boz Erselan

TEWRAT Û WELATÎ MEDAN

Mehmet UZUN

Kîtabî muqedesî

"Yew nesil şinû, yewna nesil yenû, la dunya ebedîyen vinderte ya." ⁽¹⁾

Tarîxê kitabani muqedesan çar hezarî serran ra vîyerena. No wextî mîyan de nê kitabani ra zêdêr kitabî niamê wendiş. Kîtabî muqedesî tarîxê merdimey û medenîyetî de yew cayo muhîm ginî. Tarîx de sewbîna kitabani hendê nê kitabani îtiqad û emelî merduman ser o tesîr nikerdû. Nê kitabani yew het a însanan rî huzir û sadet ardû, heto bîn a zî bîy sebebî herban, qetliaman û felaketan. Kitabani muqedesan tarîxê miletan de ziwan, kultur, edebîyat, folklor û heyato komelkî (cematkî) ser o zaf tesîr kerdû.

No nuşteyî xo de ez wazena hîrê heme kitabani muqedesan, la hînya zaf Tewratî ser o, vindirî. Mi cuwa ver hem bi erebkî hem zî tirkî Qur'an çend girangî wendibî. Û mi hedîsî pêxemberî (vateyî Hz. Mehemmedî) û çend tefsîrî zî wendibî. Încîl zî bi tirkî û qismen swêdkî û îngilîzkî wendibî. La Tewrat mi qet (çerey) seraser niwendibî.

Elheq, mi mereq kerdîyen, gelo bênatey (mîyanî) nê kitabani û dînan de çi ferqî û çi zî ortax nuşteyî estî? Wexto ez ney vûna qestî mi hetî dînî ya nîyo; qestî mi hînya zaf hetî tarîx, ziwan, kultur, edebîyat, mahîyet û strukturî nê kitabani a yo. Bêguman, armancê mi aya zî nîya ke ez tîya de îzahato dînî bidî wendoxan.

Mi zaf wêştîyen ke ez nê hîrê heme kitabani muqedesan sere ra heta bin pêro pîya biwanî û bidî pê ver. Çi heyf ke mi çerey firsat nidî. Emser firsat kewt (kot) mi dest û mi no waştîyê xo ard ca.

Tewrat, Încîl û Qur'an (Qurûn) hîrê kitabî muqedes î. Qur'an de Zebur zî yew kîtabo muqedes yenû qebul kerdîş. No kîtab Hz. (Hezretî) Dawidî rî amo. No derheq de ayetî Qur'anî vînu: "Dawidî zî ma Zebur dey ci." ⁽²⁾ Manayî Zeburî "sahîfe" ya. ⁽³⁾ La her di dînanî bînan de Zebur sey yew kîtabo xoser niamo (niûmo) qebul kerdîş. Zebur, yew qismî Tewratî yo. Tewrat, Hz. Musa rî amo û kitabî yahudîyan (cuyan) o. Încîl, Hz. Îsa rî amo û kitabî xirîstîyanan o. Qur'an zî Hz. Mehemmedî rî amo û kitabî mislimanan (bisilmanan) o. Nê hîrê heme dîn û kitabî, ê "semavî" yê, yanî dîn û kitabî heq î. Homayî yew û tek qebul kenî.

Merdîm rey-rey yew kîtab çeng girangî wûnenû, la her girang çî ko newe tede veynenû, her girang yewna netîce tira vecenû. No biney zî dem û eleqe (întrese) ra girêdaye yo. Merdimî ri çiney lazîm bû, ey hînya rehet veynenû. Cuwa ver wexto mi nê kitabî wendîyen tayê meselan zaf dîqetî mi niantên. Ma vajê ke hetî tarîx, ziwan,

kultur, edebîyat û folklorî ya nê kîtabî mi rî zaf balkêş nîbîy. Tesîro ke nê kîtaban miletan ser o virêştû hend mihîm nîyebi. Narey ke mi nê kîtabî seraser wendî, mi tayê çîy neweyî tede dîy. Bîlxeşa Tewrat de. Xelet yan zî raşt Tewrat de xêlek yew melumato tarîxî estû. Medan û welatî medan (Medya) ser o zî xêlek melumat danû.

Bingeyî nê hîrê (yan zî çar) kîtaban eslê xo de Tewrat û. Çî ko nê kîtaban de yo % 80 tarîx, şecere û efsane (mîtolojî û hîkaye) yî. Efsane û hîkayeyî ke Tewrat de vacîyenî pêro bi kilmey Încîl û Qur'an de zî tekrar benî. Çî ko zêdêr, Încîl de, Îsa mucîzan mujnenû ra: Îsa nêweşan kenû weş, merdan kenû ganî, pê yew leteyî nanî ya hezaran a merdiman kenû mird, kerre ra awk vecenû û tayê hedîseyî tarîxî ca ginî. Qur'an de zî Hz. Mehemmed mucîzan mucnenû ra. Qur'an de tarîx ra behs benû, herbî ke o wext bîy tede ca ginî. Bîyê nînan şertî Îslamî, ê îmanî, ferz û wacîbî, prensîbî komelkî (cematkî) û îdarî û çî winayenî estî. Nînan ra wet merdim eşkenû wacû ke hem Încîl de hem Qur'an de % 80 çî ko Tewrat de vîyerenû tekrar benû. Hetî efsanan, hîkayan, tarîxan, mintiqan, miletan, bacar û medenîyetan a nê kîtabî hema hema sey yewbînan ê, yewbînan tamam kenî. Hetta bêteatey Tewrat û Încîl de hetî îtîqadî ya ferqo pîli çînî yo, cuweka ekserîya nê her di kîtabî sey yew kîtab hesibênî. La bêteatey nê kîtaban de zaf ferqî û tezatî zî estî; ca-ca tarîxî, nameyî, hedîseyî yewbînan nitepsînî.

Qur'an nê her di kîtaban û dînan heq veynenû. Welakîn Qur'an, hukmî nê kîtaban darenû wi û hetî dîn û îtîqadî ya prensîban û şertanî newan anû. Goreyê muslimanan Tewrat û Încîl amey tehrîf kerdiş (bedilîyêyî), ewro heqîqî Tewrat û Încîlî orte de çînîy. Qur'an, kîtabo heqo peyen û, ey ra dim sewbîna kîtabo heq (semawî) nîamo û hinî nînu zî. Îslam zî dîno mukemelo peyen û.

Goreyê hîrê heme kîtaban zî Homayî (Rebbî) erd û asmîyen (kaînat) şeş rojî û şeş sewî de virêştî. Goreyê Tewratî Homa rojê hewtin aresa yo, o zî "sebt" û. Yahûdî na roj gure nîkenî. Ney rî vûnî 'Sebt'.⁽⁴⁾ Na roj gure kerdiş gune yo. Xeleqnayîşî Hz. Ademî û Hewa û cenet ra vetîşî nînan, tufanî Nûhî, hîrê heme dîn û kîtaban de zî hema hema eynî şekîl de vacênû. Uca ra pey tarîxa ortax bi Hz. Îbrahîmî (Îbramî) dest pêkena.

Qewmî Hz. Îbrahîmî welatî keldanîyan ra yo û yew qewmo putperest û. O qewmî xo de pîye nîkenû, werzenû wi bacarî Ūrî ra vicênû, yenû Heran de ca benû. Tewrat de: "Ū Terah lajî xo Îbrahîm, lajî Heranî, torinî xo Lûti, vêyvê xo Sara, yanî cinê lajî xo Îbrahîmî; pêro pîya girotî, tewrî nînan a bacarî keldanîjan Ūr ra viciya ke şîyerû dîyarî Kenanî; nê amê Heran û uca de ca bî."⁽⁵⁾ Qur'an de nameyî baykî Hz Îbrahîmî Azer û. "Îbrahîmî, baykî xo Azerî ra: Tayê pûtan [ti xo rî] Homayan qebûl kenî? Raştey ez tu zî qewmî tu zî eşkera mîyanî delaletî de veynenû, vatibi."⁽⁶⁾ Qewmî Hz. Îbrahîmî keldanî ê ke Iraqî de bî o qewm bî. No qewm rojperest, aşmperest, estareperest û pûtperest bî.⁽⁷⁾ Hz. Îbrahîm yew deme Heran de mûnenû. Zulmî Nemrûdî ver werzenû wi şînu Fîlîstîn.⁽⁸⁾

Tewrat û tarîxê Tewratî

Manayê Tewratî çî ya? Tewrat bi xo senî yew kîtab o, yan zî çend kîtaban ra amo werte? Hem hetî mana ya, hem hetî naman a, hem zî hetî nuşteyê ke tede estî ya,

Tewratî ser o zaf fikir û vateyê cîya-cîya estî. Ferhenganî kirdkî, fariskî û tirkî de "Tewrat" ekserîya yew çekuya (kelîmaya) erebkî yena qebul kerdiş û sey "Tewrat", "Tevrat" nusîyena. La sey çeku (kelîma), "Tewrat", yew çekûya îbranîkî (hebru) ya. Îbranîkî de manayê Tewratî ("Tora", "Torah", "Tora?", "Tora'h", "Thora"), yanî "qanûn" û "zanayîş" û. Latînkî de Tewratî rî vûnî "Pentateuch" û manayê ci zî "panc cildî" (pente: panc, teuchos: cildî) ya. Yan zî manayî Tewratî, "Kîtabî Qanûnî" (Books of the Law), dûnû. Tewrat, bi kirdkî (zazakî) "Pêameyîşo Kehan", "Kîtabo Muqedes"; kurmanckî "Peymana Kewn", "Kitêba Muqedes"; tirkî "Ahd-i Atîk", "Mukaddes Kitap"; îngilîzkî "The Old Testament", "Pentateuch" ûsn. vacîyenû.

Tewrat yew kîtabo gird û. Kîtab bi xo 39 qismî yo. Nê qismî nê yî: Xeleqnayîş, Vejîyayîş, Levîlijî, Hûmarî, Namekerdiş, Yeşû, Hakimî, Rût, Samuel I, Samuel II, Qiralî I, Qiralî II, Tarîxî I, Tarîxî II, Ezra, Nehemya, Ester, Eyub, Mezmûrî, Meseleyî Suleymanî, Vaiz, Neşîdeyê Neşîdan, Îşaya, Yeremya, Mersîyeyî Yeremyayî, Hezekîel, Daniel, Hoşea, Yoel, Amos, Obadya, Yunûs, Mîka, Nahûm, Harakkûk, Tsefanya, Haggay, Zekerya, Malakî.

Her qîsim xo ser o hendê (qandê) kîtabîyek o. Tirkî ci 900 rîpelî yo. ⁽⁹⁾ Xirîstîyanî bawerîyê xo tînya Încîl nîye, la her di kîtaban zî, hem Tewrat hem Încîl, anî (ûnî). Yahudî bawerîyê xo tînya Tewrat anî. La yew qîsmî yahudîyan û ekseriyetî aliman (îlahîyatçîyan) tînya panc kîtabanî verênan sey Tewratî qebul kenî. Nê panc kîtabî: Xeleqnayîş (Tekvîn), Vejîyayîş (Çýkýş), Levîlijî, (Levililer), Hûmarî (Sayýlar), Namekerdiş (Tesnîye). Bi îngilîzkî nameyî nê kîtaban: Genesis, Exodus, Leviticus, Numbers û Deuteronomy î.

Tewrat, rojhilato mîyanin (orteyîn) de kîtabo semavîyo verên o ke Hz. Musayî rî amo. Tarîxê Tewratî heta hîrê hezarî û panc sey (3500) seran veynena. Tewrat bi xo destpêkerdişî merdimey (însanetey) ra hetta seserrê çarin V.Î. (Verî Îsayî) behsî qewman, bacaran, medenîyetan, dînan, herban, felaketan ûsn. kenû. Tewrat, yew girang de nînuşîyo, teqrîben mîyanî 900-1000 seran de amo pîyeser ardiş û nuştiş. Nuştişî no kîtabî 1450 V.Î. (Verî Îsayî) ra dest pêkenû hetta seserrê diyin V.Î. dewam kenû.

Nuştişî Tewratî ser o zî îxtîlaf û muneqeşe estû. Yahudî (cuyî) ê muhefezekarî û tayê tarîxwan û teoloxî (îlahîyatçî) îdia kenî ke "panc kîtabî verênî Tewratî" Musayî bi xo çewres seran mîyan de nuştî. Tewrat û Încîl de zaf cayan de, hetta Qur'an de, yenû vatiş ke Musayî bi xo no kîtabî (Tewrat) nuştû. Tarîxê nuştişî nê panc kîtabanî verênan wina yo:

- 1) Xeleqnayîş (Genesis): Tarîxê nuştişî: 1450-1410 V.Î., nuşttox Musa.
- 2) Vejîyayîş (Exodus): Tarîxê nuştişî: 1450-1410 V.Î., nuşttox Musa.
- 3) Levîlijî (Leviticus): Tarîxê nuştişî: 1450-1410 V.Î., nuşttox Musa.
- 4) Homarî (Numbers): Tarîxê nuştişî: 1450-1410 V.Î., nuşttox Musa.
- 5) Namekerdiş (Deuteronomy): Tarîxê nuştişî: --1410 V.Î., nuşttox Musa. ⁽¹⁰⁾

Feqed no veynaye (fikir) raşt nîyû. Zaf îlahîyatçî û cigêrayoxî (arastîrmacýlar) ney rî îtiraz kenî. No war de zaf cigêrayîşî xori (arastîrmalar) estî. Musa hetî qal kerdiş û nuştişî ya merdimo ke zaf hunerin nîbîyû. O, yanî Musa, bi xo zî ney qebûl kenû. Wexto Homa tira vûnû: "Şue Firewnî het û qanûnî (dînî) Homayî ci rî eşkera bikir", Musa vûnû: "Ez merdimo ke lewbêsunet a". ⁽¹¹⁾ Musa wazenû vacû ke "Ez waharî yew belaxetîyo (qal kerdişîyo) holî nîya." Û Musa, Homayî ra nîyaz kenû ke

birayî ci Harûn zî pa şiyerû Fîrewnî het. Homa no waşteyî Musayî qebûl kenû, Harûn pa şinû Fîrewnî het. Harûn, xeberdayîş de (xîtabet û belaxet de) zaf xurt bîyû.

Tewrat, bi destanî zaf kesan a amo nuştiş. A raşt merdim eşkenû vacû ke no yew kîtabo anonîm û. Cuweka zî hetî tarîx û melumatî ya û tayê nameyê cayan, kesan û tarîxan de te de zaf xeletî û tezatî estî.

Orijînalî ziwani Tewratî îbranîkî yo. Tewrat, hêverî tadîyo latînkî û cuwa pey zî ziwananî bînan. Tadayey (tercumey) ziwananî bînan de bînge îbranîkî û latînkî yê. Metno orijînal ey Tewratî de ziwanan bînan ra zî zaf çekuyî estî. Bîlhesa ziwano ke Misir de hekîm bîyû û ziwani ereban, asûran, babîlan, keldanan, medan, roman ûsn.

Panc kîtabî verênî yê Tewratî pêsero sey yew tek tûmara ke qed nixerpîya seser-rê dîyin de mintiqayê Behro Merde (Ölü Deniz) de ameyî veynayîş. 1947 de zî verî Behro Merde de mintiqayê Qûmranî de yew bedewîyo şîwan yew mexara de tayê nushanî destnuşteyanî Tewratî veynenû. Ney ser o na mintîqa de xebata arkeolojîk dest pêkena û des serrî ra zaf rûmena. Netîceyî na xebat de yewindes mexeran de nîzdêyî 800 destnuşteyî û sewbîna belgeyî vicîyenî. Nê belgeyan ra çar ra yew metnî Tewratî yê. Nê metnî en zaf çerme û dima zî papîrus û paxir ra tabletan ser o nusîyeyî. Ziwani nînan îbranîkî, aramîkî û ziwani bînî ê mehellî yê. Metno en kihan V.Î. 250 de, en newe V.Î. 68 de nusîyayo. Teqrîben no wext de (V.Î. 68-70) ordî roman Qûdusî (Yerûşalîm) genû û bacarî Qûmranî zî vêşnenû. Na mintîqa de o wext yew qewmo ke tira vûnî Essenîyan ciwîyo.⁽¹²⁾

Tewrat de Medî û Medya

Tewrat de welatî medan û bîlhesa no welat de tayê ceyan ra zaf behs benû. Tayê cayan de zî herindê Medya de nameyî Mezopotamya vêrenû. Tewrat de medî û persî ge-ge pîya, ge-ge zî ciya yenî behs kerdîş. Wexto ke Koreş (Cyrus) qiral bi medî û persî sey yew împaratorîyeyî pîya bî û nameyî welatî nînan sey "Medo-Persia" amên zanayîş. ⁽¹³⁾ Nameyî Heranî, Dîjleyî, Firatî, Araratî, Şûşanî (Sûsa) zaf munasebetan a û zaf cayan de vêrenû.

Ararat yew cayo (koyo) muqaddes û. Goreyê Tewratî gemîyê Nuhî, Araratî ser o nîşt. Qewmî Nuhî benû fasiq û Homa wazenû no qewmî helak bikirû. Homa, Nuhî rî emir kenû. Nûh darê Goferî ra yew gemî (keştî) virazenû. Her mexluqo ke rîyî hardî (erdî) sero estû tira yew nêr û yew maki (tayê cayan de û Încîl de 7 çutan) genû. Nûh û aileyê xo nişinî gemî, çores roj tufan werzenû, sed û pancas roj her cayî dunya binî awki de mûnenû, heme mexluqato ke hardî (erdî) ser o yo helak benû. Gemî bena berz, badî (bacî) awk nişena û "Gemî aşmê hewtin de, rojê hewtêsîn ay na aşmî de serî Araratî yo nişena rue." ⁽¹⁴⁾ Tewrato tirkî, îngilizkî û swêdkî de cayo ke gemîyê Nuhî ruenîştaya koyî Araratî yo. La goreyê nushaya aramîkî gemîyê Nuhî koyî Cûdî ser o nîşt. Qur'an zî vûnû gemîyê Nuhî Cûdî ser o nîşt. Qur'an de: "Ey erd awka xo banc! Ê ey asmîyen [awka] xo tepîş!" vacîya. Awk ancîyê; gure ame qedênayîş; [gemî zî] serî [koyî] Cûdî ya ruenîşt. Ê: 'Gûnî nê zaliman wa cehenem rî bû' vacîya." ⁽¹⁵⁾ Tûfanî dim a Nûh û efradî ey hetî rojhilatî de deştê Şînarî de ca binî. ⁽¹⁶⁾ Tewrat de, Ararat, yew ca yo saxlem û ke zaf rey merdimî şînî uca de xo seternînî. ⁽¹⁷⁾

Destanê Gilgamişî de zî sey tufanî Nuhî yew tufan estû. Çîyo ke tufanî Nuhî de

vîyerenû hema eynî hewa destanê Gilgamişî de zî estû. Hetta goreyê tayê nuştexan çimeyî (kaynak) meseleyî tûfanî a ke hîrê heme kîtabanî muqedesan de vacîyena Destanê Gilgamişî bi xo ya. Welakîn, ferqo bingeyîn o yo ke, kîtabanî muqedesan de tînya yew Homa estû, Homa yew û tek û, no Homayî heme kaînatî yo. Destanê Gilgamişî de Homayî zaf î. Homayî hard û asmîyenî cîya yî. Destanê Gilgamişî de badî tûfanî ya gemî welatî ermenîyan de yew ca de, koyî Nisirî ser o vindena. ⁽¹⁸⁾ Na destan teqrîben 2000 serrî V.Î. (Verî Îsayî) nusîya. La tarîxê nê meselanê ke destan de vîyerinî hêna kehan a. Gilgamiş bacarî Ûrûkî ra yo. ⁽¹⁹⁾ Pîrikî Gilgamêşî Ûtanapîştîm meseleyê tufanî ey rî (Gilgamişî rî) vata.

Tabletanî destanê Gilgamişî û sewbîna tabletan reya verên A. H. Layard vecenû werte. A. H. Layard 1845 de xerabanî paytextî asûrîyan Nînowa de dest bi xebatê xo ya arkeolojîk kenû. Nînowa nîzdîyey Mûsûlî de yew ca de awabîya. Babîliyan, wexto ke welatî asûran îşxal kerdû, Nînowa şawi (kerda xirabe) û wêşna. Na xebatê Layardî 1845-1847 de û reya dîyin zî 1849-1851 de bîya.

George Smith, asîstanî (ardimkerdoxî) ey H. Rassam, xebatê A. H. Layardî dewam kenî. George Smith 1873 de duyes tablatanî destanê Gilgamişî wanenû. Nê tabletî kutûbxaneyî xususî ey qiralî asûrîyan Asûrbanîpali de bîy. Nê tabletan ser o muhrî Asûrbanîpali estû. Tabletî kîl ser o bi (pê) mixan a (cuneiform, çivi yazısý) nusîyê. Heme tabletî ke na xebata arkeolojîk de vicîyey pêro piya 1854-5 de berdî Îngilîstan û nika hê British Museum (Gallery of the Assyrian Saloon) de yî.

Destanê Gilgamişî efsaneyî xeleqnayîşî (viraştîşî dunya), tûfanî, heyatî Gilgamişî, embazey Gilgamiş û Engîdûyî, Gilgamiş senî geyrenû ke mergî rî çare veynû, vate û fixanî Îştari (Ishtar, the Lady of the Gods) ra behs kena. Destanê Gilgamişî 12 tabletî ya û heme manzûm a. Xêlek cayanî nê tabletan bîyo vîn, xerpîyo û nîamo wendiş. Meseleyê Tûfanî tabletê yewindesin (11) de ca gena. Wexto Ûtanapîştîm, Gilgamişî rî qalê tûfanî kenû, semedê (qandê) Îştar a zî, wina vûnû:

"117 Îlahe Îştar sey yew cinîya ke qijî ver d' a zarî kena.

118 Xanimê homayan pê yew vengo weş a [vûna]:

119 Roja verên ge biçarnîyen bibîn çamur,

120 Çünke mi mîyanî homayan ra emir da şeytanî.

121 Mi senî mîyanî homayan ra emir da şeytanî,

122 Emrî cengî, qey helak kerdişî xelqî xo?

123 Mi bi xo xelqî xo rî no elem ard,

124 Ke sey masanî qijikan behr kenî pirr?" (Tablet 11)

Goreyî George Smithî, meseleyî tufanî sere de mîyanî destanê Gilgamişî de (ori-jînalî ey de) çinîbîya. Qismî tufanî cuwa pey kotû mîyanî na destan. ⁽²⁰⁾ Û goreyî George Smithî zaf versîyonî destanê Gilgamişî estî û nê versîyonî bi akatî, sumerkî, asûrkî, babîliyonkî ameyî nuştîş.

No îzahatî ra pey ez reyna ageyrena meseleyî Tewratî, medan û Medya ser.

Goreyê Tewratî Medya zaf yew welato gird û. No welat de qiralî zaf î. Tîya de yew çeşît konfederasyonî qewman, qiralan, mîran, began estû. Cuweka rey-rey "qiralî medan", rey-rey zî "qiralanî medan" nusîyenû. ⁽²¹⁾

Tewrat de royî (rueyî) Dîjle û Firatî zî zaf muhîm î. Hetta nê her di royî muqedes î. Awkê nê royan mubarek (bimbarek) a. Na mintîqa ra, bëntarey nê her di royan ra,

Mezopotamya vacêna û no ca welatî Medan o. Ehdo Kehan de (Tewrat) zaf ceyan de nameyê nê her di royan vîyerenû. ⁽²²⁾? Qiralî Misirî, Fîrewûn-neko, semedo ke qiralî asûran de herb bikirû, tewrî eskerî xo ya şînû verî royî Firatî. Fîrewûn-neko, qiralî asûran Megîddoyî kişênû." ⁽²³⁾ "Û Davûd vexto ke şîn hetî Firatî de ge hekimîyetey xo ronû (ruenû), verî Hamatî de qiralî Tsoba kîşt." ⁽²⁴⁾ "Û qiralî asûran îsrayîlî sur-gun kerdî û nê şawitî hetî Halah û royî Gozanî û Xaburî û bacaranî medan a." ⁽²⁵⁾

Tewrat de çekuyê (kelîmeyî) "Zaza" û "Zîza"

"Çi estibi, o benû; çi bîyû, o yenû kerdîş; binî roşnî rojê de çi ko newe çinîyû." ⁽²⁶⁾

Tewrat de yew çîyo ke balkêş zî no yo ke çekuyê "Zaza" û "Zîza" tede vêrinî. Zaza, sey nameyî qewmîyek nîye, la sey normal nameyî yew merdimî vîyerenû. Yanî Zaza û Zîza nameyî di camêrdan ê. Tewrat de: "Yeter û Yonatan; Yeter bê (bîye) lajî merd. Û lajî Yonatanî: Pelet û Zaza. Nê lajî Yerahmîl bî. Û lajî Şeşanî çinîbî, la keynê ey estibî." ⁽²⁷⁾ Eynî qîsim, la babê çarin de zî wina vacîyenû: "(...) Zîza lajî Şîfînî, nê naman a nê merdimî mîyanî eşîretanî xo de begî bîy; ecdadî nînan ra zaf keyeyî virazîyê." ⁽²⁸⁾ Tarîxî Dîyin de zî: "Û Mahalattan apî Maakay keynê Abşalomûnî girot; ay ci rî Abîyay, Attay û Zîza û Şelomît ardî dunya." ⁽²⁹⁾

Yahudî û Medî

"Çi bîyû rewna nameyî ci nîyo pa." ⁽³⁰⁾

Tewrat de tim medan û farisan ra bi dostaney a behs benû. Yahûda yan zî Benî Îsraîl nînan xo rî dost û embazan veynenî. Hetta, yahudî, dişmananî xo bi medan tersnî û tehdît kenî. Asûrî, babîlanîjî, elamî, filîstîniyî, ammonî ûsn. wexto zor (zuar) dînî ci, yahudî, medan anî xo vîr û hêvî kenî ke medî bîrî nê dişmananî nînan bikişî. No war de zaf mîsalî estî.

"Biewnî (bûnî), ez qarşî nînan medan wereznenû, qey (qandê) nînan rî qîmetî sîmî çinîyû, zerrê nînan pê zerdî ya weş nibena. Tîrkemanî nînan xortan dînî erd ri, qijî ke hema hê pîzeyê mardê xo de yî rî merhemet nikenî. Û Homay senî ke Sobom û Gamorra kerdî xerabe, Babîlo ke xemil û xûrîrî keldanîyan o, o tewir benû." ⁽³¹⁾ Yewna ca de zî wina vûnû: "Tîranî xo tuj bikirên, gurzanî xo wişk (pêt) tepîşîyen; Rebbî, ruhî medan hewn ra kerd aya; çunkî miradî Homayî helak kerdîşî Babîlî yo; çunkî no, qesasî Homayî yo. (...) Rebbî semedê kesî ke Babîl de rueşînî hem nîyet kerd, hem zî vate ko vatibi ard ca. Ey Babîl (!), ti awkan zafan ser o rueşînî, waharî xezînanî zafan ê, peynîyê tu ama, peymey (ölçü) qezencî tu yo xirab ame. Rebbî ordîyan xo ser o sond wend: Raştey senî ke meleyî debînî ez ge o tewir tu pê merdiman kena pirr; nê qarşî tu ge nara berzî." ⁽³²⁾ Yewna ca de: "Welat de beyraq (al) wedarên, mîyanî mîletan de borî bicinên, mîletan qarşî ey hezir bikirên, ver bi ey qiralanî Araratî, Mînî, Eşkenazî vicîyen; qarşî ey yew serdar tayîn bikirên; astuaranî sey melanî pîrçîkinan berşawîyen ser. Mîletan û pêroyê qiralan, walîyan û qeymeqamanî medan, dîyarî ke binî saltanatî nînan de yî hezir bikirên. Welat ho decî ver recîfîyenû...?" ⁽³³⁾

Tewat de, kîtabî Danîelî, rîpel 840 ra heta rîpel 855 behsî medan kenû. No qîsim

de Daniêl, med û faris û roman ser o hewnan veynenû. Goreyê hewnanî ey medî roman mexlub kenî. Kîtabî Haggayî, babê yewin, rîpelî 889-890 de, kîtabî Zekayayî, rîpelanî 891-899in de zî medan ser o nusîyenû.

"Û serra verên a qiralî farisan de, semedo vateyî Homayî biyerû ca feki Yeremyayî ra, HOMAY ruhî qiralî farisan kerd aya û ey heme cayê welatî xo de îlan kerd û hem zî nuşt û va: Homayî asmîyenan Yehova hekimîyetî pêro dunya da mi û mi rî emr kerd ke ez Qûduso (Yerûşalîmo) ke ho Yehûda de yo ci rî yew keye (mabed) virazî. Qewmî ey ra kamko şima mîyan de estû, Homay ey tewrî eyî ya bû û wa şiyerû Qudûso ke ho Yehûda de yo û keyeyî Homayî Îsrailî ey Yehûdayî (Homa o yo) ko ho Qudûs de yo virazû." (34)

Medan tim yahudî hîmaye kerdî û paştî da ci. (35) Wexto şî surgun, hetta demo normal de zî, zaf girangî tayê yahudîyan medan rî xizmet kerdû. Nînan ra kesî zaf muhîmî estî. Mavajî ke sey Daniêlî (36) Ezrayî, (37) Yeremyayî, (38) Habakkûkî. (39) Nê kesan Medya û medî hol sinasney, no derheq de xo dim a zaf zanaye û belgeyî verdê.

Waştî tacê xo ra bena û Ester bena qiralîçe

"Homay dunya de yew çîyo newe ard: Cinî, camêrdî pawena" (40)

Tewrat de xoser yew qisim estû, nameyî no qismî ESTER û. Ester, Tewrat de kîtabî hewtêsîn o. Ê Ester, nameyî yew keynek/cinêk o. Pêroyê no nuştî hewt (492-499) rîpelî û des babî yo. Tiya de seraser qalê medan/farisan bena. Goreyê nuşteyî, Waştî (Vaştî), cinîyê Ahaşveroşî ya, (41) yanî cinîyê qiralî medan a, qiralîçe ya. Waştî, sey Ahaşveroşî nikena û qiralîçeyey ra kuena, hirêndê ay Ester gena. Ester, yew keyneka yahudî ya. Wextî qiralî babîlan Nebûkadnetzari de yahudî surgun biy, tira yew qisim zî surgun biyû şiyû welatî medan (Medya). Ester, birarkeynê Mordekayî ya. Mordekay, yew merdimo yahudî yo, zana û wahaî tecrubî yo. Mordekay, Ester kenû wiye û ay perwerde kenû.

Hikayey Ester bi kilmey wina yo:

Ahaşveroş bacarî Şûşanî de rueşenû. Hindîstan ra hetta Hebeşîstan sed û vîst û hewt (127) wîlayetan ser o hukum kenû. O çar serrî yo ke viciyo text. Ahaşveroş, serrê çarin de, pîlanî (girdanî) medan û farisan dawet kenû, hewt rojê û hewt şewî zîyafet dînan. Cinîyê Ahaşveroşî, qiralîçe Waştî zî, veng do cinîyan û ha zîyafet dûna nînan. Saray de wer û şerab û kêf ra her kes halî xo ra zaf memnun û.

Waştî zaf rind a, vengî rindey ay her ca ra biyû vila. Rojê hewtin qiral Ahaşveroş emir dînu axayî hewt keynan (yedi kîzlar ađaşy) û wazenû ke Waştî tewrî (torî) tacê xo ya viciyû dîwan ke hukumdari, prensesî û serdari ke her cayî welatî medan ra dawetkerdeyî, rindey Waştî veynî. La qiralîçe Waştî qebul nikena û niviciyena huzirî nînan. Ahaşveroş zaf yers benû, goreyê edetî, veng danû mayetî xo û merdimanî zanayan. Karşena, Şetar, Admata, Tarşîş, Meres, Marsena û Memûkan yenî verî qiralî, nê hewt merdimî reîsî medan û farisan ê. Ahaşveroş nînan ra persênû, vînu: "Ma se biki Waştî? " Nînan ra Memûkan vînu: "Çi ko Waştî kerdû tînya qiralî ri heqeret nîyû, la heme pîlanî (reîsanî) welatî Medya rî heqeret û. Eke tedbîr nigirîyû, o wext ge heme prensesî cesaret bigerî û qarşî (dustî) prensesanî welatî Medya vici

û no bibû sebebî xirabêyeka pîl. Eke weşî qiralî şîyerû, eke qiral ca de veynû, ez wazena qiral Waştî caverdû, xo rî yewna qiralîçe veynû." Ney sero qiral Ahaşveroş bi ziwani her qewm û welatî ya yew ferman vecenû ge keynê heme wîlayetanî Medya ê tewr (en) rindî bîrî vîjnayîş û şawitiş. Samedê ney gurî ya wezîfe û selahîyet dînu axayê keynan, Hegayînî.

Şûşan de yew merdimî yahudî, Mordekay, benû. Mordekay, bi qiralî yahudîyan a, nameyî ci Yekonya yo, Qudûs ra surgun amo Medya. Qiralî babîlan Nebûkadnezar nê yahudî surgun kerdî. (599 V.Î.) Yew keynek zî, nameyî ay Ester û, tewrî nînan a. Dayk û baykî na keynek merdî. Ester, keynê Abîhailî ya û Benyamînî ya. Benyamîn yew qebîley yahudîyan o. Nameyê Estere o raşt Eddîssa (Hadassah, myrtle) yo. Ester keynê apî Mordekayî ya. Mordekay, Ester kenû keynê xo û zaf hol ay resnenû.

Mordekayî na keynek zî kenû hedre û şawenû mîyanî keynanê ke Şûşan de qesrê Ahaşveroşî de hazîrî. Hegay, axayê keynan, Ester ridîyenû û ayê zî kenû mîyanî nê keynanê ke samedê qiralîçeyey a namzedî yê. Mordekayî, Ester tembîh (temîye) kerda ke nivacû a yahudî ya. Her kes Ester yew keynê medan zûnû. Xora (xuera) nameyê ay zî, Ester, yew nameyo medkî yo.

Saray de her keyneka namzed duyêş aşmî zaf hol wîye bena û her het a terbîye veynena. Wext benû de, yew serr a pey, dorê Ester yena. Serrê hewtin ey qiraley Ahaşveroşî de, aşmê Tebet de (Tebet aşmê desin a), Ester şîna Ahaşveroşî het. Ester zaf yew keynaya rind û delal a. A zaf weşî Ahaşveroşî şîna. Ahaşveroş zaf ay ridîyenû (ecibîyenû). Senî ko Mordekayî tira vatû Ester o tewir (otir) hereket kena, qiralî ra tawey niwazena. La, a qiralî ra zaf lutûf û înyet veynena. Ahaşveroş, mîyanî keynan ra hirêndê Waştî de Ester xo rî sey qiralîçe vîjnenû.

Mordekay zî her roj yenû verî sarayê qiralî ra geyrenû ke Ester ra yew xeber bîgerû. Rojêk Mordekay verî berî (çêberê) saray de raştî qal kerdîşî di merdimanî Ahaşveroşî yenû. Nê her di merdimî (Bîgtan û Tereş) Ahaşveroşî rî hê nîy dekûdolanban (komplo) virazenî. Mordekay, bi wesîtey Ester a bin ra xeber dînu qiral Ahaşveroşî û qiral nînan îdam kenû. Ahaşveroş emir dînu merdimanî xo ke Mordekayî xelat bikirî. Na mesela zî kewna (kuena) arşîvanî qiral Ahaşveroşî.

Haman koşkê (sarayê) Ahaşveroşî de yew merdimî pîl û, sey yew wezîrî yo, waharî quwet û qudretî yo. Her kes ay rî secde kenû. La Mordekay ci rî qet hurmet nikenû. Ney ser o Haman zaf yers benû. Hamanî eşnawitû ke Mordekay esil ci yahudî yo. Haman wazenû ke Mordekayî û heme qewmî ey, pêroyê yahudîyan, qirr bikerû. No samed a zî ho geyrenû yew fîrset veynû.

Serrê duyêsîne text vîciyayîşî Ahaşveroşî de, aşmê Adarî de, verî Ahaşveroşî de "pûr" erzenî, yanî keyî "qeder-qîsmetî" (şans oyunu) keykenî. Her kes çî ke mirad kenû. No sarayê Şûşanî de yew edet û. O wext Haman fîrset veynenû qiral Ahaşveroşî ra vûnû: "Mîyanî qewmanî welatî de yew qewm esto ke qanûn û edetî ey cîya yê û no qewm xoser o ciwîyenû, qanûn û nîzamî welatî medan nîsinasnenû. No qewm zarar dînu welatî ma. Eke zerrê qiralî zî biwazû ma ge yew ferman vecî û no qewm qetil bikirî, orte ra wedarî." Ahaşveroş no vatê Hamanî ca de veynenû û engîştuneyî (gîştûne) xo dînu ci ke pê (bi) ey ferman mor (muer) bikirî. Haman û maîyetî ey anî (ûnî) bi ziwani her millet û her welatî ya yew ferman nusenî, bi (pê) engîştuneyî

Ahaşveroşî ya (engîştuneko muerî qiralî ho ser o) testîq kenî, dînî qasidanî esparan û şarî her wîlayetî rî erşawinî (rusnenî). No fermanî paytext de, Şûşan de zî, kenî vila.

Mordekayo yahudî ney xeber genû, dînû xo ri bermenû, xo sawenû erd ra, kincanî kehanan genû pira û şinû verî qesrê qiralî. Goreyê qanûn û edetî çew nişkenû kincanî kihanen xo ra dû şiyerû verî koşkê (kueşkê) qiralî. Ester zî xeber gena ke Mordekay zaf qerqirîyenû, kincî kihanî dey xo ra û ho verî berî (çeberê) saray ra geyrenû. Ester, cilanî newan dûna Hatakî, o axayê keynan o, erşawena Mordekayî hetî ke, a bizûnû mesela çi ya. Mordekay, ser û binî meseleyî Hatakî rî vûnû, yew suretî fermanî yahudîyan zî dînû ci. No hewa Ester mesela pê hesîyena. Mordekay, Esterî ri xeber şawenû, vûnû: "Ti mevac ke ez qiralîçe ya û ez ha qesrê qiralî de mûnena, cayî mi saxlem û, çew (ço) mi ra tewey niwûnû. Eke tu ewro vengî xo nivecî, verbî na plan nivindirî, pêroyê qewmî tu yo ke no welat de yo helak benû. Tu rî hinî rojê xoeşkera kerdişî ameya."

Rojê hîrin, Ester warzena kincanî qiralîçeyey gena pira, şina verbî meqemî qiral Ahaşveroşî de pawena. Saray de edet û, heta qiral pê asayê xo kesî îşaret nikirû, kes nişkenû şiyerû meqemî qiralî. Ester xo xemelno û ha verbî textî qiralî de pawena. Qiral Ahaşveroş, Ester veynenû, asayê xo hetî aya ya derg kenû ay wazenû xo het. Ester şina huzir û Ahaşveroşî ra vûna: "Eke qiral zerr kenû, lutf û destûrî qiralî estû, ez wazena qiralî xo û Hamanî rî yew zîyafetî bidî." No dawet weşî Ahaşveroşî ya şinû.

Roja bîn qiral û Haman şinî zîyafetî Ester. Wer weş û, şereb şimîyena, her çi mukemel û, Ahaşveroş zaf kêfweş benû, vûnû: "De vac Ester, ti mi ra çi wazena, miradî tu çinê yo?" Ester vûna: "Ez mirad kena ke qiral û Haman siba reyna şeref bidî bibî meymanî mi." Ahaşveroş reyna qebul kenû.

Haman wexto vicênû teber Mordekay reyna ey ver ra niwerzenû. Haman zaf qehrîyenû. Keye de cinîyê xo Zereş û merdimanî xo ra vûnû: "Ez û qiral ma siba (meşt) reyna meymanî qiralîçe Ester ê. La no merdim, Mordekayo yahudî, zaf mi qehernenû. Ez nêzûna ez se bikirî." Cinîyê ey Zereş û dostî ey vûnû: "Bîya zerd (altun) ra pancas vîncey (arşinî) berz yew daraxacî viraz, qiral Ahaşveroşî ra vac, wa siba Mordekayî na dar a bialeqnû. " No fikir weşî Hamanî ya şinû, sey nînan kenû, a şew benû rehet.

A şew hewnî (hûnî) qiral Ahaşveroşî remenû, arşivan û kîtabanî tarîxan wazenû, nişenû rue wûnenû. Ahaşveroş, o emro ke derheqî Mordekayî de dayo, ey emrî veynenû. Mordekayî, plana ke Bîgtan û Tereşî dustî (qarşî) qiralî virêştibî, a plan bin ra xeber deybî ci. Qiral merdimanî xo ra persenû, vûnû: "Qey na holey Mordekayî şima çi şeref û mukafat do eyî? " Merdimî qiralî vûnû: "Tawey ci nidiyo." Qiral veng danû Hamanî, çiko lazimû tira vûnû, ci rî emir kenû. Haman mecbur benû, roja bîn şinû astuarê Ahaşveroşî zîn kenû û xemelnenû, kincanî Ahaşveroşî genû benû dînû Mordekayî ra, tacê Ahaşveroşî nûnû ey sare ya, wîlarî astuar tepşenû, Mordekayî sukê Şûşanî ra çarnenû, vûnû: "Biewnîyen, merdimo ke qiral şeref û paye dînû ci wina qedr û qîmet veynenû." Haman a roj zî bêkêf şinû keye, cinîyê xo Zereş û merdimanî xo ra vûnû hal mesela wina ya.

Benû şan (şûn) merdimî Ahaşveroşî yenû keye, veng danû Hamanî, ey benû keyeyî Esterî. A şew zî keyeyî Ester de wer wirênû, şereb şimîyena, kêfî qiral Ahaşveroşî yenû. Qiral Ahaşveroş Ester ra reyna (finya) persenû: "Ester, qiralîçeyê

min, de wac, ti mi ra çi wazena? Ti nêmeyî welatî min zî biwazî ez dûnû qey xatir û rindey tu!..." Ester vûna: "Ey qiral!..." û dest kena ci derg û dila mesela (planê Hamanî û fermanî qirkerdişî yahudîyan) qiral Ahaşveroşî rî vûna. Ahaşveroş zaf yers benû, hîddet û celal a werzenû we. Emir dûnû ke Hamanî dara ke ey bi xo qey Mordekayî ya hezir kerda û ha keyeyî ey de ya, a dar a bialeqnî. Emrî Ahaşveroşî yenû ca û Haman cezayê xo veynenû. Ester, a roj eslî xo eşkera kena. Mordekay vicîyenû huzirî Ahaşveroşî. Ahaşveroş, morî (muerî) engîştuneyê xo yo ke dabi Hamanî, a roj teslîmî Mordekayî kenû.

Vîst û hîrêne aşmê hîrên de, na aşmê Sîvanî ya, bi emrî Mordekayî katibî Ahaşveroşî, Hîndîstan ra heta Hebeşîstan heme walî, reîs û hukumdarani sed û vîst û hewt wîlayetan rî, ziwan û nuştîşî her şarî û mîletanî nê wîlayetan a yewna ferman nusenî, bi muerî qiralî muer kenî, dûnî qasidanî siwariyan, lez û bez a finînî rahar. No ferman de, hîrêsi (13) aşmê Adarî de, azadey heme yahudîyan, ê ke welatî Ahaşveroşî de yê, welatî Medan de ciwîyînî, îlan bena. Ney ra pey, Mordekay kincanê xo yê reng sipîyan û lajîvertan, taca girda zerdin, keteno tenik ra cubeyê xo yo ergûwanî ya qiralî het ra vicîyenû teber şînû bacarî Şûşanî ra geyrenû. A roj mîyanî yahudîyan de roşney virazîyena, mîyanî nînan de kêf û fêrahey, îzet û şeref estû. Her wîlayet de, her şarîstan de, emir û fermanî qiralî reso heta kamca, uca de, yahudîyan rî benû rojê şahî, kêf û weşîyey.

Fermanî qiral Ahaşveroşî sed û vîst û hewt wîlayetan ra benû vila. Heme yahudî yew roj, hîrêsi aşmê Adar de, her bacaro ke tede ciwîyînî yinî pîyeser, hazirey xo kenî. A roj heme dişmenanî xo kişînî, dest nûnî mal û milkî nînan ser. Çi ke qiral Ahaşveroşî, fermanî xo de musade dayo ke, yahudî heme dişmenanî xo qetil bikirî û dest malî nînan sernî. Saray de, qiral Ahaşveroşî het de, rumetî Mordekayî zaf û, o waharî qedr û qîmetî yo, paştay yahudîyan hinî nîna erd. Yahudî, Şûşan de zî panc sey merdiman kişînî û heyfî xo ginî. Yahudî, des lajanî Hamanî zî kişînî. Çi ke Haman dişmenî nînan bi. Parşanatay, Dalfon, Aspatay, Poratay, Adalyay, Arîdatay, Parmaştay, Arîsay, Arîday, Vayzatay lajî Hamanî bî ke pêro kişîyê. Yahudî çaresî aşmê Adar de reyna kom binî, na rey hîrêsey merdiman kişînî. La qet talanî kesî nikinî. Ney ra pey yahudî yê ke welatî medan de ciwîyînî rehat kenî. Na roj, çaresî aşmê Adarî, yahudîyê ke welatî medan de mendîyen rî bi rojê xelasey, rojê şahî, rojê weşey, rojê roşanî. Mordekay, heme yahudîyan rî, ê ke heme welatî qiral Ahaşveroşî de rueşînî, name (mektub) û fermanî nûştî, nînan rî teblîx û îlan kerd ke nê her di rojê, hîryes û çaresî aşmê Adarî, her serr û pêro pîya sey rojê xelasey û azadey bimbarek bikirî. Çi ke dişmenî nînan, Agagî Haman, nînan rî Pûr (vîcak) eştibî.

Ney ra, nê rojan ra vûnî Pûrîm. O wext ra pey heme yahudî nê rojan, Pûrîm, sey roşanî pîroz (bimbarek) kenî. Keynê Abîhaîlî, qiralîçe Ester û Mordekay, mektubî xo yo diyin de no roşan heme yahudîyanî sed û vîst û hewt wîlayetanî welatî qiral Ahaşveroşî rî kerd ferz; no hewa Pûrîm kot tarîx û heta ewro ûme. Pîley (girdey) qiral Ahaşveroşî û qedr û qûdretî Mordekayî, sey yew hekat, tarîxê qiralanî medan û farisan de ca girot. Mordekay, qiral Ahaşveroşî dima, mîyanî qewmî xo de, mîyanî yahudîyan de pîley, qedr, qîmet û holey ser merdimî diyin hesabîyenû.

Ester ser o tayê vateyî

Tewrat de qismo ke yahudîyan mîyan de tewr (en) zaf yenû wendiş ra yew zî Ester û. Ester, seserran o ke keyanî yahudîyan de, bîlxessa Pûrîm de her serr yenû wendiş. Ester, yahudîyan mîyan de yew kîtabo namdar (populer) û. ⁽⁴²⁾ Ester, yew kîtabo ke, kameyî (kimlîgî) yahudîyano milî û waharî xo vicîyayîşî îfade kenû. Pûr, sey rojê dişmenan ra xelesîyayîşî, rojê xovîrardişî û pîrozkerdişî yenû bimbarik kerdiş. ⁽⁴³⁾ No kîtab nameyî xo, nameyî na keynek ra, yanî Ester ra genû.

Meseleyê Esteri, teqriben V.Î. (Verî Îsayî) 486-465 de qewimîya. Nameyî qiral Ahaşveroşî tarîx de sey Xerxes vîyerenû. Îbranîkî (hebrû) de (û Tewrat de) "Akhashverosh" nusîyenû. Îngilizkî "Ahas-uerus" û. Tayê tekstanî îbranîkî de sey "Xerxes" zî yenû vatiş. ⁽⁴⁴⁾ Latînkî de zî sey "Xerxes" vîyerenû. Xerxes, miqabilî Ahaşveroşî yo. Ahaşveroş (Xerxes, Xusrev) lajî qiral Darîyusî û qiralîçe Attosa yo, wextî baykî xo (Darîyusî) de duyey serrî sey naîbî Babil de hukumdarey kerda. ⁽⁴⁵⁾ "Qiralî keldanîyan Belşatsar a şew kişîya. Qiralî medan Darîyus wexto şêşt û di serre bi qiraley girot" ⁽⁴⁶⁾

Şûşan (latînkî Susa, îbranîkî Sushan) yew deme paytextî elaman bîyû. Cuwa pey Darîyuso Yewin (Darîyus I) newe ra îmar kerdû. Yew deme bîyû merkezî îdarî ey medan/persan. Şûşan ewro Îran de yew ca yo. ⁽⁴⁷⁾ Alexandero Gird, Şûşan îşgal û talan kenû. M. A. Dielafoy reya verên Şûşan de yew cigêrayîşo arkeolojik virazenû. Şûşan de odayî qiralî, harem, "cenet" (bexçeyî cenetî), qenalî awka ke royo nîzdî ra arda, vicîyenî orde. ⁽⁴⁸⁾

Nameyî Ester ser o zî zaf munaqeşe estû. Nameyî Ester o raşt bi îbranîkî Îddessa (Hadassah, 'myrtle') yo. Wina eysenû ke Ester ya nameyî Homayê (îlahe) babîlan Îştâr (Îshtar) ra, yan zî fariskî 'sîtar, 'star' ra yenû. ⁽⁴⁹⁾ Wextî sumeran û babîlîyan de Îştâr nameyî "Xanimê Homayan" o. ⁽⁵⁰⁾ Îştâr, sumeran û babîlîyan het de, nameyî "Xanimê Homayan" o ⁽⁵¹⁾ La eslî xo de, no name, yanî 'Ester', yew nameyo kurdî û fariskî yo. Manayê ci zî "estare" yo.

Zazakî de 'estare', 'astare', 'istare' yo. (yýldýz)

Kurmanckî de 'stêr', 'stêrk'. (yýldýz).

Pewlewki/fariskî de 'ster', 'star', 'starek'. (yýldýz).

Vaştî (Waştî) zî yew nameyo kirdkî û pehlewki/fariskî yo. Kirdkî (zazakî) de manayê "Waştî" bi tirkî "sözlü", "nişanlı" û ge-ge zî "güzel sevgili" ya. Pewlewki/fariskî de çekuyê "Vaştî" (vêşt, vêştî) manayê rind (güzel) de yo.

Goreyê tayê nuştux û cigêrayoxan, Ester, dinî yew kîtab nîyo; çunku tede nê (nîye) behsî Homayî, Musayî, Dawidî û Qudisî (Yerûşalîmî) benû; nê îtîqad û emelî yahudîyan (cuyan) ser o merdim tawey tede veynenû; nê zî kultur û karekterî yahudîyan îfade kenû. La hûncî zî kilîsey xirîstîyanan B.Î. (Badî Îsayî) 120 de Ester sey yew kîtabo dinîyo ke resmî her ca de vîyerenû qebul kenû. Welakîn Martin Luther, kîtabî Esteri sero vûnû "werrîkna kîtabo winayen çinîbîn" û Ester ra (no kîtab ra) nefret kenû, ey bin ra red kenû. ⁽⁵²⁾ Temayê Esteri, surgunî yahudîyan û xelasey nînan ser o ya. Tede motîfî dinî çinîy, la kamey û milîyetperwerrey yahudîyan tede eşkera ya. Heto bîn a no name, Ester, zaf nîzdîyey Ishtar (Îştâr) o, ke Îştâr nameyê yew Homayê (îlahe) putperestanî ey demeyî yo.

Goreyê sewbîna nuştuxan "Festê Pûrîmî" hînya zaf nîzdîyê "roşanî wesarî" ey

medan/persan a, yan zî festê babîlonijan a. Nînan gore "Pûr", sey çeku, ya çekuya asurîkî "puru/pûrû" ra yena, ke manayê ci "ca/mevqî" yo, yan zî "lot" (vîcak) ey farisan a ke merdim yew çeşît key şansî key kenû. ⁽⁵³⁾ Pûr yew nameyo îbranîkî yo. Pûrîm roşanî musewîyan o, aşmê sibat yan adari de yo, semedê vîrardişî xelasey qewmî yahudîyan o ke binî zulmî Hamaîni ra qedîyo, pîroz (bimbarik) benû. ⁽⁵⁴⁾

Kîtabî Ester kamî nuştû belu nîyo. Tayê vûnî Ezra nuştû, la no vate zaf muteber nîyo. Tayê vûnî Mordekay bi xo nuştû. Tayê zî vûnî Nehemya nuştû. Nehemya, Artexerxesî rî, ke o lajî û xelefî Ahaşveroşî yo, hizmet kerdû (465-424 VÎ). ⁽⁵⁵⁾ Tayê zî vûnî ke Ester yan wextî qiral Ahaşveroşî de, yan zî wextî lajî ey Artaxerxesî de, Şûşan de çap bîya. ⁽⁵⁶⁾ Heto bîn a tayê nuştuxî zî vûnî Ester raşt a yew kîtabo tarîxî yo û çîko ho tede heme raşt û, tayê zî tam tersî ney vateyî vicênî û vûnî Ester yew fantazî yo. La wina eysenû ey ke Ester nuştû qanûn, orf û edetanî medan/persan û mîmarî bacarî Şûşanî, sarayê Şûşanî û welatî medan hol sinasnenû. ⁽⁵⁷⁾ Mumkun û ke yew yahudîyo ke surgun bîyû şîyû uca, o deme welatî medan de ciwîyo, bîyû şahidî na mesela û na mesela nuşt a, yan zî fek ra neqil kerda.

Tewrat de zîwan û edebîyat

Tewrat de dîn, îbadet, qanûnî, duayî, tarîx (kronolojî), heyatî pêxemberan, edebîyat, mîmarî, coxrafya ûsn. babetan gore xo mîyan de qisim qisimî yo. Hetî edebîyatî ya Tewrat hem nesîr, hem zî manzûm û. Tewrat de yew edebîyato rind û weş estû. Goreyî ey wextî (4000 serrî cuwa ver) bi yew zîwano edebîyo weş a nusîyo. Qismo manzûm de şîirî, qesîdeyî, mersîyeyî, neşîdeyî, duayî estî. Qismo manzûm hînya zaf bi tewiro (şeklo) lîrîk, dîdaktîk û mîstîk a nusîyo. Nê qisman de bi tewro nazm a "neşîdeyî", "mersîyeyî" (axitî), "mezmûrî" (îlahîyê ke pê zel (lulî) vacîyenî, Sûreyê Zeburî yê ke Hz. Dawidî vatîyen) babetî tewr (en) edebî yê. Tewrat de "erotîzm" zî zaf xurt û. Hetta, ma caverdî yew kîtabo dînî, "sosyal realist" yew roman de bîle, belkî end (ehend) "erotîzm" tolerans niveynenû. Bîlhesa Neşîdeyê Neşîdan de, ke Hz Suleymanî nuşt a, sere ra heya peynî keynan, rindey, fantazî, eşq û meşq, erotîzm sero ya. Nê neşîdan de qet qalê Homayî, dînî, pêxamberan û çîyanî manawîyan nibena. ⁽⁵⁸⁾ Bes "erotîzm" tînya Tewrat de çînîyû. Încîl û Qur'an (bîlhesa Qur'an de) zî "erotîzm" estû. Sey numuneyî: "Xizmetî nînan de, xortî sey încîyan [ê ke qafikanî xo de nimite yî] [xîlmanî] dormarey nînan de çerixênî û geyrinî." ⁽⁵⁹⁾ Sewbîna sûreyan de zî no tewir ayetî estî. ⁽⁶⁰⁾

Tayê çekuyê (kelîmeyî) ke Tewrat de vîyerinî manayê nînan (Hitchcock's Bible Names Dictionary" de) bi îbranîkî (hebru) û îngilîzkî wina ya:

Adem (Adam): Erdîn, sur.

Îbrahîm (Abraham): Bayko pîl. (Yüce peder)

Mordekay: Sert, tuj/tal.

Sara: Xanimê mi, prensesê mi.

Sarah: Xanim, prenses.

Waştî (Vashtî): Çîyo ke şimîyenû (içilen şey), şûrûba gireynayey (kaynamýş şurub)

Zaza: Aîdî herkesî. (belonging to all: Her kese ait)

Zereş (Zeresh): Derd, izdirab, dej, bedbextey.

Zîza: Roşn, roşn dayîş; peyser şiyayîş. (Aydîn, aydînlîk; geri gitmek). ⁽⁶¹⁾

Îbranîkî nameyî aşman wina yo: Nisan (Nîsan), Iyar (Ayar), Sivan (Sîvan), Tammuz (Temuz), Av (Ev), Elul (Îlûl), Tishrei (Tîşray), Cheshvan (Çeşvan), Kislev (Kislev), Tebet (Tebet), Shevat (Şevat), Adar (Adar). Nînan ra namey çend aşman kurdî, fariskî û tirkî de zî vacîyenî.

Qewmo vîjnaye/erdo bexşkerde

Goreyê dînî yahûdîyan, "yahudîyey/cuyîyey, yahudîtî/cuyutî", tînya dînî yahudîyan o. Keso ke dayk-baykî ey yahudî nîy, nişkenû bibû yahudî. Yahudîyey, yahudîyan rî hem dîn hem milîyet a. Qewmî yahudîyan, yew "qewmo rez û vîjnaye ey Homayî" yo ('the unique people of God', 'the glory nation'), Homayî no qewm qey xo ya xeleqno. ⁽⁶²⁾ Homay heq û wezîfe do no qewmî ke rîyî hardî (erdî) ser o miletanî bînan îdare bikirî. Qur'an de bile qewmî yahudîyan yew qewmo rez û vîjnaye yenû qebul kerdîş. Qur'an de wina vacîyenû: "Ehd bû ke ma, kitab, hukum û pêxemberey dey Benî Îsrailan. Ma ey bi rizqo rind a kerdî wîye û ma ey aleman ra berzêr kerdî." ⁽⁶³⁾ Hardî (erdî) yahudîyan (Benî Îsrailîyan) yew hardo muqedes û ke Homayî no qewmî rî wead (bexş) kerdû. Hardî Îsrailîyan (Dîyarî Kenanî) "hardo weadkerde" yo ('the promised land, the land of Canaan') No "hardo weadkerde" sînorî ci Nîl ra resenû heta Firat ('from the Nile to Eufrat'). ⁽⁶⁴⁾

ÇIMEYÎ Û DÎPNOTÎ

1) Tewrat, Waiz, bab 1/4, rîpel 659.

(Kitabî Mukaddes/Eski ve Yeni Ahit. Ybrani, Keldani ve Yunani dillerinden son tashis edilmiş tercümedir. Kitabî Mukaddes Şirketi, 481 Ystiklal Caddesi, İstanbul, 1974.)

Eski Ahit, Tevrat û; Yeni Ahit, İncil a. Tewrat û İncil piyesser o çap bîy û her di piya 1175 ripelî yê. No nuşte de mi no çap esas girotû.

2) Qur'an, Sûreyê Nisayî, ayet 163, rîpel 103. Sûreyê Enbiyayî, ayet 105, rîpel.

(KUR'ANI KERİM VE TÜRKÇE AÇIKLAMALI MEALY, Hadimü'l-harameynî'serifeyn Kral Fehd Mushaf-ý Şerif Basým Kurumu, Suudi Arabistan Krallýdý, 1412/1992)

3) Qur'an, Sûreyê Fatirî, ayet 25 û dîpnot, rîpel 436.

4) Tewrat, Xeleqnayîş, bab 2/2-3. (Sebt: hewt, hewtin.)

5) Tewrat, Xeleqnayîş, bab 11, rîpel 10. Qur'an, Sûreyê Hûdî, ayetî 72-76, rîpel 229.

6) Qur'an, Sûreyê En'amî, ayet 74, rîpel 136. Sûreyê İbrahîmî, ayetî 34-42, rîpel 259.

7) Qur'an, Sûreyê En'amî, dîpnot, rîpel 136.

8) Qur'an, Sûreyê Meryemî, dîpnot, rîpel 307. Sûreyê Ankebûtî, ayetî 24-27 û dîpnot, rîpel 398.

9) Tewrat, Biewnî dîpnot 1.

10) Walton, John H; Chronological and Background Charts of the old Testament, Grand Rapids: Academue Books, 1978.

Internet:

Old Testament Gateway-Pentateuch

www.otgateway.com/pentateuch.htm

Pentateuch

www.religioustolerance.org/chr_tora.htm

11) Tewrat, Vejiyayîş, bab 6/12, rîpel 59.

12) Baignent, Michael; Leigh, Richard; The Dead Sea Scrolls Deception; Touchstone, New York, 1961. Shanks, Hershel; The Mystery and Meaning of the Dead Sea Scrolls; Random house, New York, 1968.

13) Huntzinger, Allyn; Persian in Bible, May 1978, chapter one.

14) Tewrat, Vîjiyayîş, bab 8/5, rîpel 7.

15) Qur'an, Sûreyê Hûdî, ayet 44. (Qur'an de new sûreyan û vîst û di ayetan de meseleyî tûfanî Nuhi vîyerenay.)

16) Tewrat, Vîjiyayîş, bab 11/3, rîpel 9.

17) Tewrat, Îşaya, bab 37/38, rîpel 701.

18) Budge, Wallis E. A.; The Babylonien Story of Deluge and the Epic of Gilgamesh, 1929.

No nuştixî, Budge, Destanê Gilgamişî ser o 57 rîpelî yew broşur nuştî.

19) Ûrûk, bacarî sumeran o. Seke Tewrat de zî vîyerenû (Tekvîn bab 10/10) bacarî Ûrûkî Nemrûd lajî Kaşî awa kerdû û çar bacaranî pîlan ra ey diyo ne welatî Şînarî de awa biyo. Sumeran û babilîyan Ûrûkî ra vatû "UNU KI", ke vateyo verên manayê "îkametgah"î û vateyo diyan manayê "welat"î de yo. Erebi ney cayî ra vanî "Warkah" yan zî Al-Warkah û ewro ho Iraq de yo. W. K. Loftus serranî 1849-1852 de no bacar de xebata arkeolojîk kerda û zaf çiy binî hardî ra vetî. (Budge, Wallis E. A.; The Babylonien Story of Deluge and the Epic of Gilgamesh, 1929. Tabletê yewindesin, dipnot, rîpel 56.) Tewrat û çîmanî (kaynaklar) rojawanî de nameyî Ûrûkî sey Erech (Erech) nusîyenû.

20) Budge, Wallis E. A.; The Babylonien Story of Deluge and the Epic of Gilgamesh, 1929.

Ez wazena tiya de yew kilmnuştîyî (ozetî) destanê Gilgamişî zî bîdî. Tiya de ez broşurî Wallis E. A. Budgeyî esas gena: Gilgamiş, qiralî pancinê hanedaneya Ûrûkî ey sumeran o. Goreyî vatişan Gilgamişî 126 serrî hukumdarey kerda. La wextî hukumdarey ey tam belu niyo. Gulgamiş yew qiralî ke "NAGBU IMURU", yanî "Keso ke heme çi diyû" yo. O yew hukumdaro aqil o, zanay o, rîyî hardî û behran ser o geyraye yo, hîkmet kefş kerda. Nemeyî ey orijînalî xo de "Izdubar", "Gizdubar" yan zî "Gishdubar" o. Gilgamiş (Gilgamesh) versiyonî yûnankî yo

Gilgamiş, hîrê ra di Homa, hîrê ra yew zî merdim û. Xelqî Ûrûkî Gilgamişî ra zaf hes kenû. O zaf xurt û, yew cengawer û. Îlahe Aruru, Gilgamişî rî yew raqîb xeleqneha, nameyê ey Engidû yo. Engidû yew daristano zaf gird de ciwîyenû. O sey yew heywanî yo, zaf gird û zaf xurt û.

Gilgamiş, yew plan virazenû ke Engidûyî biyarû bacarî Ûrûkî. Gilgamiş na planê xo de serkewnû. Hêverî Gilgamiş û Engidû danî pîyer, la çew zorî çewî nibenû. Badî zî her di benî emabazî yewbînan (embazî qederî). O wext Daristanî Sedirî (darî sedirî, darî erzî) miyan de yew diyebo merdimwer estû. Nameyî ey Xûmbaba (Khumbaba) yo. Gilgamiş û Engidû şînî ge ney diyebe merdimwerî (Xûmbaba) bikişî. (Tabletê çarin) Ê badî zaf zehmet û meşeqatan a Xûmbaba kişîni.

Wexto Gilgamiş û Engidû ageyrenî Ûrûk îlahe Îştar bona aşiqî Gilgamişî û wazena ey de bizewicîyû. La Gilgamiş qebul nikenû. Îştar şîna asmîyen (asîman) baykî xo Anû (Anu) û daykê xo Antû (Antu) de, ke her di zî homa yî, gerreyî Gilgamişî kena. Anû Îştar ra vanû "xetayê tu ya." La o (Anû) huncî zî qarşî (dustî) Gilgamişî yew mexluqo sey boxeyî xeleqnenû û ey şawenû ke bacarî Ûrûkî xirabe bikirû. Gilgamiş û Engidû bi zar û zor a ney mexluqî zî kişîni. (Tablet 6) Îştar zaf yers bona, kena fixan û kilaman vûna. Gilgamiş û Engidû bi awkê Firatî destanî xo guyn ra kenî pak û yenî bacarî Ûrûkî. Ê bacar de yew festa gird virazenû. Homayan ra, Homa Enlîl, sey yew ceza qerarî mergî Engidû danû ke, Gilgamiş têna bîmanû. Engidû benû nêweş (niweş) û merenû. (Tablet 7) Gilgamiş embazî xo rî zaf bermenû û loriyan kenû. Mergî Engidûyî ra pey tersî mergî kewnû ey zerre û merg ra remenû. Vanû:

"Ez bi xo zî merena, ez zî o wext nîbena sey Engidû?

Keder nefret kewt ruhi mi,

Çi ke ez tersena, ey ra zî ez seraser welat ra geyrena." (Tablet 7)

Gilgamişî warzenû wi şînû geyrenû ge çareyî mergî veynû. Ûtanapîştîm (Uta-Napishtim) pîrikî Gilgamişî yo. Ûtanapîştîm û cinîyê xo nêmerde yî. Goreyê Destanê Gilgamişî, Homayî wazenî yew tûfan virazî û emir danî Ûtanapîştîmî ke yew gemî virazû. La Homayî badî (bacî) poşman (puşmîn) binî ke tûfan virazû. Ey ra Ûtanapîştîm û cinîyê ey rî heyato ebedî (nemirey) bexş kenî. Gilgamiş ney zanû. Gilgamiş danû purî şîno welato ke pîrikî ey tede ciwîyo. Raharî xo ser o raştî zaf bela û zehmetan yenû. Peynî de Gilgamiş, Ûtanapîştîm veynenû. Ûtanapîştîm ey ra vûnû: "Binî dengizî (behrî) de yew vaş estû, eke (eg) ti ey veynî û ey ra burî, ti binî merdimî nemir." Gilgamişî kerran bestenû xo linga a, xo erzenû dengiz, no vaşî veynenû. Nameyî ney vaşî "Şîbû îssahir amelu" (Shîbu issahir amelu) yo. Yanî "merdimî extîyar [pê] benû ciwan" o. Gilgamiş, no vaşî genû û verî xo çarnenû hetî bacarî Ûrûkî ya. Raharî xo ser de yew ca raştî yew awka (gola) serdin yenû. Gilgamiş û embazî xo Ûr-Şanabî (Ur-Shanabi) kewnî na gol û xo şîwenî. O wext yew mar buyê vaşî heyatî genû, yenû ey wenû. Mar ca de verî erzenû, benû ciwan. Gilgamiş bêçare ageyrenû bacarî Ûrûkî. Gilgamiş, merg rî yew çare nîveynenû, nibenû merdimî nêmerde.

Qey hînya zaf malûmatî bîewnî:

Loftus, Chaldea and Susiana, London, 1857.

R. C. Thompson, The Epic of Gilgamesh.

R.C Thompson, A Century of Exploration at Nineveh.

N. K. Sanders, The Epic of Gilgamesh, Revised Edition Incorporating New Material, Penguin Books, 1972.

21) Tewrat, Yeremya, bab 25/25, rîpel 748. Yeremya, bab 51/28, rîpel 777.

22) Tewrat, Daniel, bab 10/4, rîpel 852.

23) Tewrat, Qiralî Dîyin, bab 23, rîpel 396.

24) Tewrat, Tarîxî Dîyin, bab 18, rîpel 417.

25) Tewrat, Qiralî Dîyin, bab 18/11, rîpel 389.

26) Tewrat, Waiz, bab 1/9, rîpel 659.

27) Tewrat, Tarîxî Yewin, bab 2/32-35, rîpel 401.

28) Tewrat, Tarîxî Yewin, bab 4/34-38, rîpel 403.

29) Tewrat, Tarîxî Dîyin, bab 11/20, rîpel 439.

30) Tewrat, Waiz, bab 6/10, rîpel 662.

31) Tewrat, Îşaya, bab 13/17-20, rîpel 682.

32) Tewrat, Yeremya, bab 51/13-14, rîpel 777.

33) Tewrat, Yeremya, bab 51/27-30, rîpel 778.

34) Tewrat, Ezra, bab 1, rîpel 466. Ezra, bab 3, rîpel 468. Ezra, bab 4, rîpel 469.

35) Tewrat, Ezra, rîpelî 466-476.

- 36) Tewrat, Daniel, babilî 10-11, rîpelî 852-853.
- 37) Tewrat, Ezra, rîpelî 466-491.
- 38) Tewrat, Yeremya, rîpelî 724-780.
- 39) Tewrat, Habakkûk, rîpelî 883-886.
- 40) Tewrat, Yeremya, bab 31/22, rîpel 755.
- 41) Ahaşveroş bi îbranîkî nameyê qiralî medan ey Xusrevî yo. Latinkî de Xerxes û fariskî de Haşyarşah û. (Persian in Bible, Allyn Huntzinger, May 2001) Tarîx de hinya za sey Xerxes yenû sinasnayîş. Xerxes lajî Dariyusî yo. Îran de serî yew kerî de wina yew nuşte estû:
"Ez qiralo pîl (gird), qiralî qiralan, qiralî welatanî ke zîwanî çîya-çîya qal kenî, qiralî na kaînata pîl, lajî qiral Dariyusî, nesebî Ahamenîşan ra Xusrev a."
- (Temel Britanica, cilt 11, Ýstanbul 1992, maddeyî Kserksesî.
- 42) Joyce, G. Baldwin, Esther: An Introduction and Commentary, Downers Grove: Inter-Varsity Press, 1984, rîpel 13.
- 43) Breward, S. Childs, Introduction to the Old Testament as Scripture, rîpel 607.
- 44) Baxter, J. Sidlow, Explore the Book, Grand Rapids: Zondervan Publishing House, 1960, volume 2, rîpel 262.
- 45) Whitcomb, John C.; Esther: Triumph of God's Sovereignty, rîpel 31.
- 46) Tewrat, Daniel, bab 5/30-31, rîpel 847.
- 47) Whitcomb, John C.; Esther: Triumph of God's Sovereignty, rîpel 31.
- 48) Joyce, G. Baldwin, Esther: An Introduction and Commentary, Downers Grove: Inter-Varsity Press, 1984, rîpel 20.
- 49) Joyce, G. Baldwin, Esther: An Introduction and Commentary, Downers Grove: Inter-Varsity Press, 1984, rîpel 21.
- 50) Joyce, G. Baldwin, Esther: An Introduction and Commentary, Downers Grove: Inter-Varsity Press, 1984, rîpel 24.
- 51) Budge, Wallis E. A.; The Babylonien Story of Deluge and the Epic of Gilgamish, 1929, rîpel 56.
- 52) A. L. MCMAHON, For Esther Woodall, The Catholic Encyclopedia, Volume V.
- 53) LaSor, Hubbard, and Bush, Old Testament Survey, rîpel 626.
- 54) Redhaouse, Ýngilizce-Türkçe Sözlük.
- 55) Gary, W. Drickson, "An Argument of Esther", [paper submitted for the course 372 Seminar in Old Testament Historical Literature, Spring 1989], 2.
- 56) MCMAHON, A. L., For Esther Woodall, The Catholic Encyclopedia, Volume V.
- 57) Hill, Andrew E. and Walton, John H., A Survey of the Old Testament, rîpel 238-239.
- 58) Tewrat, Neşîdeyê Neşîdan, rîpelî 667-672. (Neşîde: beyta/misra meşhur; şiir; gazel.)
- 59) Qur'an, Süreyê Tûrî, ayet 24, rîpel 523.
- 60) Qur'an, biewnî Süreyê Dûxanî, ayet 54, rîpel 497. Süreyê Rahmanî, ayet 56, rîpel 532. Ayetî 70-72, rîpel 533. Süreyê Weqayî, ayetî 15-40, rîpelî 532-534.
- 61) "Hitchcock's Bible Names Dictionary", by Hitchcock; "Hitchcock's New And Complete Analysis of the Holy Bible", published in the late 1800's.
- 62) Tewrat, Îşaya, bab 43/21, rîpel 706.
- 63) Qur'an, Süreyê Casîye, ayet 16, rîpel 499.
- 64) Tewrat, Vîjîyayîş, bab, 12-24.

Siyapoş

Wergerandina jibo tîpên latînî: **Cemîl AMEDÎ**

Sîyapoş bi eslê xwe Sorî ye û bi serê xwe hatiye Silîvan û bi navê Kûrbeytê li gundekê bakurê Silîva(Farqîn)ê bicî bûye û li wê gundê jîyaye û nûha jî gora wî li wê derê ye. Nedîyare Siyapoş kengî hatiye Farqînê. Mana gotina Siyapoş "porreş" yan jî "serreş" e. Bi gotina Şêx Mîzbahê Silîvî ku ew jî ligor dîroka kûştina Ferhoyê Êzeyr Axa dibêje, Siyapoş teqrîben di nîva sedsala şanzdeyan da ji dayik bûye. Lewra Ferhoyê Êzeyr Axa teqrîben berê 230 salan ji alîyê dewleta Osmanî ve hatiye qazoxkirin. Di vî derbarê da çîrokekê Siyapoş û Ferhoyê Êzeyr Axa heye, dibêjin rojekî Ferho ji Siyapoş dipirse dibêje "Siyapoş ez merivek çawa me, tû min diecibînî yan na?" Siyapoş dibêje "ez te diecibînim-im, ama" Axa dibêje "ama" çiye? Siyapoş dibêje tû têkilî min nebî ezê bêjim. Axa dibêje "soz ez ji te ra tiştekî nabêjim". Siyapoş dibêje "axayê min axa ye, lê quna wî quna qazoxa ye". Bi rastî jî Ferho Axa ji alîyê dewleta Osmanî ve tete qazoxkirin.

Sîyapoş nezewicîye û tu kesê wî jî nîne. Siyapoş merivekî zarxweş, hazirci-wab û pirr feqîr bûye; heta dibêjin mirina wî jî ji ber birçîtî bûye. Bîtevî feqîrî û bêkesîya wî, berdewamî mêvanên wî jî hebûne. Dibêjin rojekî ji gundê Narîkê mêvanên wî tene û Siyapoş jî wê şevê wan li mala xwe mêvan dike. Mêvan serê sibê zû radibin diçin. Siyapoş dema ku ji xew radiibe, dinêre ku mirêşkên wî nînin(ji xwe du mirêşkên wî hebûne), fahm dike ku mirîşk ji alîyê mêvanan ve hatine dizîn. Liser vê bûyerê van malikan dibêje: "Ehlê Narîk ehlê nar in, bi dev dost in û bi dil neyarin".

Bi gotina Şêx Mîzbah, Siyapoş merivek ateîst bûye. Şêx Mîzbeh vê lênêrîna xwe sisipêre van malikên Siyapoş:

*"Min qebûle xemr û saqî dêr û zenar û sanem
Min nebit secade û ewrad digel sendaneyê.
Ger hebîba min cehenem dafî bit tû dane bî
Sed qesem dê biçime nêvda ez bi qesta daneyê.
Mubetê kûştî Siyapoş sûbhetê Sefûlmûlûk
Lew liser me ferz û eyane secdeya pûtxaneyê."*

Seyfûlmûlûk: Merivekî alîm û hakîm û hikumdar e. Kîjan demê jîyaye nedîyare. Anûha gundek Dîyarbekirê heye ku xwedîyê wî Şêx Mehdî ye û navê gund jî Sefûlmûlûk e. Sefûlmûlûkê ku Siyapoş jê bas dike, ew bi xwe jî li wê gundî da definkirî ye.

.....
.....

Mukemel bûn ji âdab û kemâlan
 Di hîna herdû bûn ew çardesalan.
 Îlahî tû mukemmel îlahî
 Îman û sidq û min sahib gunah.î
 Bi xefrînî ku nahanî Sîyapoş
 Ji cahê muhbetê kî mest û medhoş.
 Munewer kî birehmet ya mumecced
 Ji nûrê me'rîfet qelbê Muhemmed.
 Di hîna xunçe bişkift ez gulîstan
 Xumarî bûn uyûnên meyperestan.
 Sedaya endelîbê sewtê Bilbil
 Ji xew rakirin şîrîn dû nergîs û gul.
 Di âlem da gerand deng û xeberdan
 Munewer bûn dû bedr ez burcê sefwan.
 Me'el-qisse kû seyda dîtî ew reng
 Lipaşan gotê Seyda tû çirayî
 Mukemmel bûn dû gul ezboxê ewşeng.
 Digel min tû jî yek bo min birayî.
 Digel subhê kû şemsê we'd-duha xwend
 Liser tabê şeland xwû û Şahê Asim
 Mufereh ber bi dîwanê qedem rend.
 Jibo Seydayê pur îrfan û alim.
 Cewab çû şahê Asim hatî Seyda
 Çi qasî min hebî her tû şerîkî
 Surûr û xurremê bûn bo wî peyda.
 Pir û endek ji sed hetta bi yekî.
 Kû bînin hey xulaman wî bi î'zaz
 Lipaşan şah kû emrê çawîşan kir
 Libal min cihê wî çêkin bised naz.
 Letîf û nazenîn û mehweşan kir.
 Herîfan anî textek pur ji gewher
 Digel Salih poşîn îbn-ê Hame
 Muqabil textê Şah danîn beranber.
 Mesahib hem dîwan û xas û ame.
 Şeker hat û we Seyda çûbû ser text
 Duâ kir wî ji bo Şah tâlî û bext.
 Şehê Asim ji wî ra merheba da
 Selâm û emn û hem xeyr û sefa da.
 Go bînin Şahê Asim şerbet û mey
 Ji xem ra xas û kû mirîyan dikit heyy.

Jibo Seydayê me dil pê bikit geş
 Li paşan xoş xeberdan halê mehweş.
 Gulab û şerbet û hem xemr û saqî
 Li dîwanê bihevra bûn mûlaqî.
 Rewşandin ser serê Seyda gulabe
 Lipaşan dane dest xemr û şerabe.
 Wekî serxoş bû Seyda în çûnîn guft
 Cewher rêhtin û elmasî suft.
 Biîrfan gote wî ey Şahê Asim
 Neman qet kes di dunyayê çû alim.
 Kû îlmê wan me nanî nepur kesef
 Heta luqman û Eflatûn û Asef.
 Bicarek min nîşanê Seyfulmûlûk dan
 Jiber min wî nîşanê Sa'dulmulûk dan.
 Ji adab û suwarê nîze bazî
 Çi lê bû nerd û setrenc û tinazî.
 Hilanîn yekbiyek cumle biîtmam
 Ji şerqê xerbê le'bû xas û hem âm.
 Neman esla di dunyayê çi îrfan
 Kû nizanin bi wî ya îbnê Seftwan.
 Wekî Asim bihîst ew reng ji Seyda
 Hezar keyf û surûr bûn bo wî peyda.

PERŞE

Rosan Lezgîn

Na Pîra Eyşa ke nê serê çend aşman o amîya bîya cîranê ma, ez tim vînena ke ha mîyanê berê hewşî de ronîştê û kam kuçe ra vîyarêno, înan temaşe kena. Dewlete dewa înan zî sey dewa ma bin ra nêveşnaya; mehleyêk te ra bîyê qorucî û mehleya înan zî veşnaya. Ma bîy sey heba genimî mîyanê di kerranê arêyî de. La çi esto ke ma çend aşmî verê înan ameyê, coka zî ma binêna bişans ê; êyê ke verê cû ameyê şaristan, binêk rew herinda linga xo viraştê.

Ameyîşê şaristanî ma ameyî, la hewn û xîyal û qiseykerdiş û meseleyê ma heme dewe ra yê.

Çi wexto ke ez kuçe ra şona yan zî yena tim çimê mi na Pîra Eyşe ser o yê. Rerey, bi destêk mêsan xo ra qewernena û bi destê bîn zî qulikanê zinca xo de xebitêna. Rojêk mi wina bi dîqet ewnîya te ra, hebê didanî fek de nêmeno. Lewê aye ro zereyê fekê aye pelîşîyê.

Belkî şima bi mi bihuyê la wexto ke ez ewnêna aye ra, ez xo rê xo de vana ke "Ya Rebî, gelo na Pîra Eyşe zî wextêk rinde bîya? Gelo zerrîya camêrdan perraya aye zî?" Çünke tu eserê cinîbîyayene tede nêasenê. Goştê însanî çiqas pîs o! Senî bedilêno? Mûyê zimbêlanê aye sey dimê merreyî her di kîştanê lewanê aye ra ameyê war û heta ke herdişa aye zî esta. Gilareyê aye veradiyo war, çiqrê qatqatî pêser o ginayê ro çermeyê rîyê aye; şahidiya hezaran sîrr û razan kenê. La yew kêna ha keyeyê aye de, ez vana qey kalêko heştayserre zî çim bigino aye ro, belkî xo ra şoro. Qama aye eynî şitlê rîhanî. Mîyaneyêko bari ser o. Wina îfadeyêko saf hayo rîyê aye ser o ke rengê koyanê ma, rengê awa zelale ya hênî û çemanê ma ano ra mi vîrî. Ya Rebî, çende çiyê şeytanî yenê ra vîrê mi! Ez gama ke ewnêna a kêna ra û dima ra ez ewnêna na Pîra Eyşe ra, na rey ez xo rê xo de vana, "Bena ke roje bîyo eynî na kêna rinde zî ko bibo sey pîrika xo!.." Û a game, zerrîya mi heme cinîyan ra manena.

Serê sibayî gama ke ez texmê berê înan ra vîyarêna, zafê reyan ez vînena ke yan hewş şuwena, yan zî çiyê wa gurêyena. Ez binê çiman ra ewnêna aye ra la a rasterast peynî Pîra xo Eyşe ra wina masum masum qama mi feselnena.

Çi heyf! Cayê na kêna wareyî, zozan û koyê ma yê. Şaristan ko safitîya aye

bihetikno!

Heta nika çende rey mi xo kerd pirr û kerd veng ke ez binêk na Pîra Eyşe de qisey bikerî la mi cesaret nêkerd. Şarê mehla ma zaf vatvatok ê. Homa nêkero ke teqê çîyêk bikerê, eynî danê defî ro! Ê ez sey nameyê xo zana, ko vajê, "Qestêna Pîra Eyşe de qisey keno la meqsedê ey kêna ya!" Wa nameyê merdimî nêvejiyo, wa çimê merdimî vejîyo!..

Şewtira bine nêzdî eşayêk yewî da berê mi ro. Mi ber akêrd ke na Pîra Eyşe ya, vana "Ceryanê ma ariza dayo, xeyrê xo ti bîyê virazê. Ha qurwanê to wî, bayyê min o!.." Ti vanê qey ez ceyrancî ya!

Ez şîya. Mi leze ceryan viraşt. La wina şikîya mi zerrî ke no arizadayîşê ceryanî de şeytanîyêk estbî û şikê mi şîyêne a kêneya rinde ser!

Pîra Eyşe çend rey vengda ci, va "Herê Perşê!.." Coka mi zî va qey birra, rast nameyê aye Perşe ya û mi zî sey safikan va "Perşê, xeyrê xo a pensa bide ra mi..." Vatişê mi de pîrî gina hemine ro, bi mi huyayî. Qey mi se kerd?! Ez rebenê Homayî seke here ser o bî, xo rê cayê xo de şeqizîyaya. La badê ke mi ceryan tamîr kerd û kêneka rinde mi rê yew qehweyo şîtin viraşt (çi leze musayê viraştîşê qehweyê şîtinî!), na Pîra Eyşe verê çokanê mi de nişte ro û dest pêkerd, mi rê qalê mesela Perşe kerd:

"Zemanê dewa ma de cinîyêk estebî, nameyê aye Perîşane bî, la şarî ci ra vatêne Perşe. Zaf hare bî. Perşe wexto ke rayîr ra şîye, eynî mendinê astore. Temamê şarê dewe aye ra xo pawitêne. Perşe belayê xo bisawitê kamî ra, sey nameyê xo wina merdîman perîşanî kerdêne. Wext bêwext, şewe û roj çi gama ke nişka ra qîştî ginêne piro, eynî sey astorêka heşerîye hîrayê; vengê aye kendalê mîyanê her di mehlan de zimêne. Her nenge fek ra perrêne. Neûzûbîllah! Nengê ke Perşe çînayê hema çewî emrê xo de nêşinawitê. Bi her di destanê xo pêşê xo de girewtê, mîyanê faqanê xo de tadêne, tadêne kerdê sey ewkê camêrdan û wazena camêrd wazena cinî bo, vatê "Ez nêyî wina winayê şîma kerî!.." Yan zî eke dar an çuyêk dest kewtêne, kerdê mîyanê linganê xo ra, berdê û ardêne... Dayî, cinî û nêzana heta bi hewt sulaleyê merdimî kerdêne pol û pereyêk; ver û peyê merdimî pîya kerdêne yew û berdê diyarê gilê gazan û ardêne war...

Eke di veyvikê tezeyî xo rê verê berêk de qisey bikerdêne û Perşe ê bîdiyê, vatê:

-Erê law, boqeboq bikerê! La çi rê lewê şîma nêwedariyê! Şîma xo rê verara mêrdanê xo de yê...

Tenya cahîlan ney, kokîmanê dewe û zafê merdîman çi gama ke çim ginayêne ra Perşe ca de verê xo tadêne û lezalez xo firêznayêne; xo te ra nimitêne. Xora qet hewce nîyo ke yewî xisarêk bidayêne Perşe ro, senî ro hesabê aye biamêne wina kerdê. Aye het a ne çarşeme û ne pancşeme bi; heme rojî sey pê bî. To ewnîyê yewî de da pêro, dinya de çî nêmend ci ra va, la hema xeberî fek ra nêqediyê, na rey to ewnîyê yena çîyê wazena, vana:

-Erê Zerê, Homa miradê to bikero, yewêko bi zerrîya to, qilçikêk bide, ez

şayaxanê Golikî pîne kena...

Yan zî şîyê mehla weverî, ema Seyre ra do waştêne, Kewe ra zî hemtîya meyîre girewtê û amêne keye de beroşê meyîre nayêne kuçike ser.

To ewnîye, na rey verê berê nacinîya Ase de ya:

-Lê lê nacinîya Ase, Homa lajê to bikero zama, hela qalibêk sabûn bide, ez cilanê Golikî şuwena...

Kam aftarêno Perşe ra vajo ke to heta nika ma ra nengî çînayî!.. Silametî a ya, ke cade şo qalibê sabûnî bîya, verê Perşe de rone û qet xo dima zî mewnîye, rayde şo.

Zafê dewijan xeyrê xo ney la tersanê qina xo ra ci rê kolî birnayêne, ro here barkerdêne û ardê verê berê aye de kerdêne ro. Wextê cuwînan kamcu keyeyî malê Homaî nêdayne Perşe, ganî a serre dewe de nêsetirîyê. Perşe heta serêna wextê cuwînan ê heteknayê, kepeze kerdêne.

Perşe gore, hemeyê dewijan neyarê aye bîy. Rastî zî wina ya. Payîzî ke kar qedîya, her kesî qût û pûtê xo kerd zere, a o wext, hendî wextê pêrodayîşê dewijan o. Hêna, ê seranê verî de, rojê dewe de pêrodayîş vejîyabi. Hemeyê dewijan kewtbî têpîze. Kam dano kamî ro belî nîyo. Her di mehleyî kewtê tēmîyan; nat ra kerreyî yenê wet ra şînê. Hayleme yo, kulpî û repî ya, serey şikênê... Zafê dewijan gonî û gonîşêr de mendê. Qewlê Perşe ra wexto ke mêrdeyê aye weş bi, ci ra vatê "Pûno!" Homa rehma xo ro ci kero. O zî rebenê mi şîno keweno mîyanê pêrodayîşî ke dewijan cê ra bikero. Xora her di mehleyê dewe zî eslê xo ra yew babî ra yê, la no reben o mêrdeyê Perşe tenya xerîb bi; macirê hetê Mûşî bi ke herbê Urisî de remabi amebi tîya, dewe de golikwanî kerdêne. Û dima ra xo rê na Perşa ke mêrdeyê ayo verên merdbi, na rey ê a mare kerdebî. La wexto rebenê mi mîyanê şerrî de maneno, nêzano ke kamî de bigîro û kamî de nêgîro, wina fekakerde nat û wet ewnêno, a hinge de nişka ra yew kerra nêzana kam het ra yena û ginena kaleka eya venge ro. Camêrd sey dilope gineno war ro. Tew kes hayî ro ci nêbeno. Dima ra xo ver o warişto, kaleka xo de girewta û şîyo keye, vato "Kerra gina kaleka mi ro!" Derdê serê derdan, Perşe zî o kuyayo û vato "Pûno, çi îşê to mîyanê pêradayîşî de esto! Ti hê nêşkenê heqê mîyanê faqanê mi ra vejîyê!.." La mêrdek a derbe ra anceno, anceno û rojê gineno piro, mireno.

Eke mêrdek merd, na rey Perşe xo eşt meydan û va "Şîma mêrdeyê min o dalyanê camêrdan kişt!" Û hemeyê dewe têreyde xo rê kerdî neyar.

Badê mergê ey ra Perşe pa yew domanê lajînî wa mende vîya. Doman zî nêzana nameyê ey çi bi, la seba ke babê ey golikwanê dewe bi û rasta zî lajê Perşe mendêne sey golikî, coka zî her kesî û Perşa dadîya ey bi xo zî ci ra vatêne "Golik". Golik zî hema golik bi! Perşe o ende bi nan û rûn kerdêne wey, wina goştêko pûç niştbi pa wa, merdimî vatêne qey meşka pifkerde yo. Ehend goştin bi zî la qet qewet tede çinbi. Emrê ey pancîyês ra vîyartbi, hendî zimbêlî û herdîşa ci vejîyaybî la yew tuto deseserre zî gale bikerdê, Golikî eştêne xo bin.

Golik, kamca qulêka morcelan esta, o zî sero bi. Verê tîje de heta şan morcelan verdêne pê. Peynî de zî payê xo nayêne ser, hemeyê morcelan binê linganê

xo de pelixnêne. Eke Golikî û domanêk dayêne pêro, ewilî nûzîniyêka sey vengê pisînge yan zî sey vengê bocîyî te ra şîyê û dima ra heta ci ra amêne, qîrayê:

-O dadaaaa!..

Û eke Perşe o veng bişinawitê, xora şinawitê zî, a roje heta şan hendî veng Perşe ra nêbirrîyê. Çi bi amêne fek tepîya nêdayêne:

-Ewkê Golikî dadîya, waya, xala, ema û nêzana çi û çîyê şî ma ra... Şîma mêrdeyê min o babaegît, betlê camêrdan kîşt, na rey dore amîya lajê min?!..

Yewî tersanê Perşe ra nêafterêne ke eleqeyê Golikî bikero û o zî hayî na yewe ra estbî, loma zî mîyanê baxçanê dewijan kerd bi rayîrê hênî. Axuran ra gêrayê, dizdîya hakan kerdê... Nê serranê peyênan de hendi bibi miseletê heran! To ewnîyê, hema mîyanê meydanî de, ke mankerêk qefelnayê, berdêne daldeyê darêk yan zinarêk û niştêne pa wa!

Na rey dewijêkê ma est bi, ci ra vatêne Xelo Xirtik. No Xel şilabendesistîye de nameyê ey vejîyabi. Heme cinîyanê dewe te ra xo pawitêne. Bi o porê xo yo gijvar ke eynî mendêne pûrtê pisînge û bi o didanê xo yo zerdo zengarî ke qereçîyan ci rê qaş kerd bi, ke tim fekê ey o akerde de asêne, kamca çim bikewtê ra cinîyê, çimê xo ser o ziq kerdê û awe fek ra herikîyê. Keyeyê Xelê Xirtikî cîranê Perşe bî. Perşe a nêbiyayî ardêne sereyê cinîya Xelî ya vinike. Çi rey nanê destanê aye zî nêwerdêne.

Rojêk xebere bîye vila ke astore paskul dayo çeneyê Xelî ro. Keyeyê Xelî bîyo pîrr cemat ke halê Xelî pers bikerê. Dima ra Perşe zî yena. Vana:

-Êra Xelo, se bîyo? Çi hewalê to yo?

Xel vano:

-Perşê, ez şîya ke mahîne qîşawin bikerî, la mîrate paskul da çeneyê mi ro...

Perşe vana:

-Xirtik, ti mayînan ra çi fam kenê! Merdim heta mayîne tîmar nêkero, binêk nêmusno xo û hema ca de warzo çîl bido serê paştîya ci, ko paskul zî û çutikan zî bido merdimî ro!..

Şewa verê cû zî xebere bîya vila ke bi şewe yew ameyo kewtê binê lihêfê Perşe. La senî ke Perşe bi xo hesîyaya, qîştî kewta ra ser û o merdim zî remayo. Perşe kerra weşanaya ey. Şanso xirab, senî camêrd fetelêno ke xo dima biewnîyo, kerra ginena piro. Tarîti de yew ey nêşinaseno. Hema çi wexto ke Perşe nê vatişan mîyanê cematî de Xelê Xirtikî ra vana, hendî dewijî mesela nanê pê wa! De hendî Homa bizano ke dima ra çîyê bîyo yan ney. Labelê dewijî hem ro Xelî û hem zî ro Perşe manayan gêrenê û bi pistepiste mesela çarnenê. Xora dewijî hema xile meydan de nîya çembilan zî nanê pa wa!

Badê ke wina name kewt ra aye dima, na rey lajanê Xelî belayê xo sawit Perşe ra. Di hebî lajê Xelî estbî. O pîl nişka ra qame eştebî, eynî mendêne rewte. No lajek û lajê Perşe emrê yewbînan de bî. Na rey cinîya Xelî her tim lajê xo musnayê û verdêne lajê Perşe.

Rojê hêna bîye hawar hawarê Golikî. Her di lajanê Xelî zereyê dereyî de Golik eşto xo mîyan û danê piro. Perşe senî ke resena înan hema êyê pîlî zereyê

dereyî de erzena xo bin û dest kena qirike. Lajê Xelî o qij zî hema diwêsine de bi. O zî cor de birrêk dest de ya û dano Perşe ro. La heta Perşe keno ra, lajê Xelî yo pîl binê Perşe de ruh dano.

Ê de Perşe eynî mendêne heşe. Qey lajek eşkayo xo binê Perşe de têt bido!

Welhasil na mesela ra dima hendî Perşe keye ra nêvejîya teber. Perşe pelîşîya. Rerey, şarî xeyrê xo tikê nan berdê, seke berzê verê kutikî, wina eştê aye ver. La Golik, ende ehmeq bi ke qet xemê ey nêbi ke dadîya ci ey sero lajê şarî kişt. Hêna sey verî xovero gawanîya dewijan kerdê.

Xelo xirtik seba ke heyfa lajê xo hewano, na rey kardî dano ra destê lajê xoyê bînî û kunê ra Golikî dima. Heta ke rojêk yaban a, zereyê dereyêk de keyse ro Golikî anê. Xel pey ra wişk lajekî de gîno û no lajê xo yê qijî ra vano, "Piro de! Heyfa kekê xo bigî!.." Lajek zî çimanê xo wişk gîno û kardî pêsero pêsero anceno ra sîne û pîzeyê Golikî ra, heta ke rebenê mi ruh dano.

Badê ke Golik wina bêkeysî de ame kiştîş, Perşe serê mezelê ey ra nêaqîtya. Şewe û roj uca serê mezelî de sey keftaran zûre zûre aye bî, vatê "Lawo, lawo!.." Heta ke a zî merde.

Perşe merde la nameyê aye ziwanan ser o mend û mend...

Nika zî ça kêna yan zî cinîyêka hare esta, ma vanê "Ti manena Perşe!" A mesela Perşe na ya."

Heta ke Pîra Eyşe na hikaya qisey kerde, mi qehweyê xo yo şitin şimit la a kêna rinde zî çimê mi şimitî û vengê Pîra Eyşe yo ke hendî mendinê sey vengê astorêka pîrbîyaya ke binê barê xo de çamor de menda û bi ufe-uf qirika xo ra fişşena, goşanî mi de mend.

FERHENG

Seîd VERROJ

**Kurmancî - Dimilî - Tirkî
&
Tirkî - Dimilî - Kurmancî**

WAR

Rojî Kurd

مدرع شیبی :
۱۳۱

155

9. 4

1974 G-3

در آیه: فَمَنْ أَعْرَضَ عَنْهُ فَاِنَّ اللَّهَ فَاعٍ لَهُمْ يَوْمَ تُغْلَبُ الْجُوهَارُ

سازمان موقوفات - خاندان حضرت عالم
 در سن ۱۳۰۰ هجری قمری در شهر
 تهران از طرف ارباب / سلطان صلاح الدین آقاي
 - ۱۷ -